# LÊKOLÎN

## Li ser Bedîûzeman Seîdê Kurdî

Weşanên

Înstîtûta Kurdî
ji bo lêkolîn û zanist

Lêkolîn

Kovara Înstîtûta Kurdî ji bo lêkolîn û zanist-Hejmar 17-payîz 2012

Berpirsiyarê giştî
Fehmî Balayî

Edîtor
Fevzi Özmen

Redaksiyon û Mizanpaj
Fevzi Özmen

Körnerstr. 94
58095 Hagen

Tel.: 00 49.23 31 97 18 913

institutakurdî@yahoo.de
www.enstituyakurdi.com

Tekiliya Bank: Sparkase Hagen
Konto-Nr.: 100 184 804
BLZ.: 450 500 01

Înstîtûta Kurdî

ISBN: 3-930943- 59 - X

Naverok


| | | | |
|---|---|---|---|
| 1. | *Gotar* | **Mîrhem Yîgît** | 7 |
| 2. | *Hevpeyvîn* | **Medenî Ferho** | 37 |
| 3. | *Gotar* | **Yusuf Serhat Faik** | 62 |
| 4. | *Hevpeyvîn* | **Mele Şafiî** | 99 |
| 5. | *Gotar* | **Zeyzelabîdîn Zinar** | 117 |
| 6. | *Gotar* | **Günay Aslan** | 161 |
| 7. | *Hevpeyvîn* | **Ronî Alasor** | 164 |
| 8. | *Gotar* | **Gernas Koçer** | 172 |
| 9. | *Hevpeyvîn* | **M. Malmîsanij** | 178 |

هەوڵنامەی کتێب

## Pêşgotin

Di vê kovara xwe ya vê carê de, me xwest li ser alimekî nasyar ê Kurdan lêkolînê bikin.

Ev alim-zanyar **Seidê Kurdî** ye.

Li ser vî alimî gelek gotin hatine gotin, pir nivîsandin hatine nivîsandin û pir lêkolîn hatine kirin.

Di nava vanan da yên pozîtîf jî hene û yên negatîf jî hene, lê li gel van herdu aliyan, bi navdaniyek din eger were gotin, dibe ku baştir cihê xwe bigre; em bawer dikin gelek neheqî û bêbextî li vî însanî hatiye kirin.

Li goreyî tê xuyakirin, hinek ji yên bi navê şopdarên wî tên nas kirin, ev neheqî û bêbextiya mezin li vî alimê Kurd kiriye.

Yên serê vî karê xerab û qirêj dikişîne cemeata **F. Gulen** e.

Bêbextî û xerabiya herî mezin ew e ku, berhemê mirovekî alim bi naveroka wê, bi orijinaliteya wê were lîstin; hinek gotin û têgîn jê were derxistin û hinekî din lê were zêde kirin.

Dema mirov berhemên orîjînal û yên pê hatiye lîstin dide ber hev gelek eşkere dibe ku çendîn pê hatiye lîstin û hatiye xera kirin.

Mijara herî giring jî ev e ku, di berhemên **Seidê Kurdî** de gotinên Kurd û Kurdistanê hema hema hemû jê hatiye derxistin.

Şûna van gotinan, valatî bi gotinên olî an jî yên Tirkîtî hatiye dagirtin.

Li gel qetlîamên din ên sor û sipî û hwd, ma gelo ji bona vêna jî mirov nikarê bêje **qetliama ilim, komkujiya zanistî**?

Lewma me ev mijara gelek giring dît û me ev lêkolîn xiste nava yek ji karê xwe yê sereke yê Enstituyê yê aktuel.

Em bi giranî gihiştin wê qenaetê û baweriyê ku, vî alimî, kar û xebat û xizmetek hêja û berfireh, him li ser dîndariyek rast û him jî li ser netewetiyek zanistî kiriye.

Di vî warî de gelek êş û elem û zahmetî jî kişandiye, û heta roja miriye jî, ji vî kar û doza xwe gav paş ve neavêtiye.

Bêgûman dewleta Tirka ya faşîst, eha ji ber vê bawerî û helwesta wî, êdî tehamula qebra wî ya li Kurdistanê jî nekirin,

laşê wî rakirin birin, hîn jî ne diyare ku li kuderê ye; weke yê **Seyid Riza, Şêx Seid** û gelek navdar, rêber û alimên din ên Kurd.

Vêja ya mirova gelek aciz dike jî ev e ku; ev munafiqên **F. Gulen** û şagirtên wî **Receb** û cemeeta wî , bi navê vî alimê me yê hêja derbê lê dide û vî karê wî yê bi rûmet dixe xizmeta nijadperestiya Tirkîtiyê û dixe xizmeta faşizma dewletê.

Hilbet divê mirov gelek nerihet bibe û mirov ji bo rastiyê, weke ku heye derxe meydanê û raxe ber çavan, bi vî awayî gelê me, yên bi van munafiqan hatiye xapandin bikişîne ser rêya rast û ruhê **Bediuzzeman Seidê Kurdî** jî şad bike.

Me jî, rêvebiriya Enstituya Kurdî, ji bo zelalkirin û sererast kirina vê mijarê, weke karekî giring û pîroz da ser milê xwe.

Li ser vê bingehê, me bi hinek nivîskar û lêkolineran ra hevpeyvîn kir; weke **Mele Şafî, Ronî Alasor, M. Malmisanij û Medenî Ferho.**

Her wiha di kovara xwe da, me cih da hinek gotarên nivîskar û lêkolîneran jî; weke **Mirhem Yîgît, Yusuf Serhat Faik, Zeynelabîdîn Zinar, Gunay Aslan û Gernas Koçer.**

Em hêvî dikin ku me di vî warî de xizmetek mirovahî pêk anîbe.

## Gotar

**Mîrhem Yîgît**

### Xwenaskirin wek bismilaha her tiştî:

Em di qonaxa xwe û hevnaskirinê de ne, xwe û hevnaskirineke7 çendalî; bi qasî mikun tekûz, saxlem û ewle, têr û tesel û bi mohra lêkolîneriyeke kurdî.

Ev jî karê saziyên rewşenbîrane, kesayetiyên xwedîpênûs, bikêr û neteweyî ye.

Wek her aliyên din yên jiyanê, di vî alî de jî em gelekî bişûnde mane û mesafeyeke mezin û pehn di nav me, gel û welatên li ser axa xwe, dîrok û çanda xwe xwedîgotin, dirêj dibe.

Navçe û herêmên zelalîxwaz û nenaskirî, nîvrê û sererû têne zanîn, beş û kategoriyên li bendeyî destavêtin û pêdaketinê ne, li hêviya lêkolîner û şîrovegeran in, kesayetiyên di gorên xwe de çavên wan qerimîn û lihêviya ciwamêr û ciwanikan in lîsteyeke dûr û dirêj in.

Zemanekî me ji sebebên bindestiya xwe, ji nebûna azadiyê, îmkan û derfetan, nebûn yan jî kêmbûna materyal, belge û wesîqan gazin dikirin û ji bêberhemdarî û stewriya xwe re dikirin palik û hincet.

Şert û mercên îro, keys û fersendên ber û berhemên şoreşa 30 salên dawî ne, medya çendcoreyî, agehdarî û pêzanîna bi hesanî herkes di dem û katê helî kurt de dikare xwe bighîniyê bi awayekî çu core gazin qebûl nake li meydanê ne.

Ji îro û pêde û heta ji cîhekî ji doh, pêr û pitirpêr û pêde, gazinên bi rengê heta niha hebûn, ne bi tenê nerast in, neîknakir in, belê ewçendî jî nekirkêriya xwediyê xwe, ango kesê gazinok didin dest.

Gotineke hunermend John Hillê berî bi salan li Emerîka îdamkirî ku serokwezîrê Siwêdê Olof Palme jî gelek caran ev gotina wî dubare dikir û demekê di dîwarên metroyên bajarê Stokholmê de hatibûn kolan wiha ye:

*Bes ji reşayê gazinan bikin, li şûna gazinan mûmekê vêxin !*

Em jî em dê bi hest û rihekî di vê banga John hill de bilaş û gewd bûye, têkevin pey şopa Bediuzeman Seîdê Kurdî û ji bo

jihevderxistina kîbûn û kînebûna wî, ji bo serwextbûneke baştir, em jî em dê bi hewil û mebesta tiştên em di vê derbarê de bêjin bibin mûmek em dê têkevin ser rê.

**Awirek li Lêkolînên 30 salên dawî.**

ji destpêka salên 1990 î û bi vir de lêkolînên li ser Bediuzeman Seîdê Kurdî têne kirin zêde dibin, sempozyûm têne li darxistin û konferans, programên di televizyonan û radyoyan didin pey hev.

Ev lêkolîn pişta xwe didin mebest û meylên cihê û her yek ji wan di nav hewla pêşkêşkirina Seîdekî de ye ku ji meramên wan re xizmetê bike.

Gelek ji wan li gora daxwaz, xwestek û siyasetên xwe wî dadrêşin, wek kesekî ji nîzama serdest re hurmetkar, serîtewêner, hinek ji wan jî mîna ku Seîdê Kurdî alimek be ku di nav derya ramangîriya sikolastîk de teqinî be yan jî kesek be ku tu têkiliya wî bi dinyayê û bi jiyanê re tunebe, kesekî devjixweberdayî û bêtêkilî be didin naskirin û bi taybetî eslê wî, nasnameya wî, dîtinên wî çendî ji dest wan tê girikî dikin.

Ev jî her wîjdanê nemirî û objektîf nerehet dike. Di vê eniyê de aliyekî hinekî be jî bêhna mirov derdixe, dilê mirov avreşandî dike hin lêkolîn û analîz in ku xwedîpênûsên wan kurd in.

Di serî de Malmisanij û Rohat Alakom û piştre bi dehan kesayetiyên din bitaybetî derdora Civaka Îslamiya Kurdistanê, Zehra, Nûbiharê û Hwd.

Ev hêviyan biterr vedikin û nimûneyên xwedîderketinê ne, monopolê van kesên dest danîbûn ser jiyan û berhemên Bediuzeman Seîdê Kurdî û bi qîma dilê xwe hespên xwe dibezandin dişke û xwediyên rasteqîne êdî îro daketine meydanê.

Nîşanên xwdîderketineke heralî em dibînin di nav kurdan de, xwedîderketina li dîrok, wêje û kesayetiyên xwe.

Ev jî tê û wê bê wateya naskirineke biserûber, naskirina Bediuzeman bi nirxên xwe yên rasteqîne û şikenandina xwdîderketinên li gora siyaseta sîstem.

Ev jî wê bi nisbetekê Bediuzemanê rasteqîne kî ye, çawa ye, çi gotiye, çi kiriye û jiyana wî çawabû pêşkêşî raya giştî û gel bike.

Ev wê yeke din jî bike. Bediuzemanê ku heta niha di dilan de hatibû zîndanîkirin wê derkeve ser dika jiyanê û em jî pêwiste ji aliyê xwe çendî ji me tê û hêza me têrê dike bibin alîkar ji vê pêvajoyê re.

## Mirovê bi çend navan

Mîna tê zanîn li ser navên Bediuzeman û hilbijartina navekî ji navên ku di jiyana xwe de bikaranîne jî dîtin ne mînahev in.

Di salên Bediuzeman Seîdê Kurdî li jiyanê bûye û gelekî berî wî jî, rewşenbîrên Kurd wek paşnav û laqab, gund û bajarên jidayikbûna xwe, malbata xwe bikaranîne. Wek Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Mele Mehmûdê Beyazidî, Pertew Begê Heqarî, Kemal Fewziyê Bedlîsî, Evdirehîmê Hekarî, Mûsa Anter û Hwd.

Ev mesela navan jî i serê xwe êşeke xwedî şop e:

kîjan nav ?

Bediuzeman kesayetiyeke ku navê xwe, bi dilê xwe nikare biazadî, bê pirsgirêkên cidî, wek zîndan, kuştin û sirgûn jî di nav de bikar bîne, naçarê bikaranîna nav û paşnavê corecor bûye.

Dîroka komarê bi nimûneyên kurdên di bin zext û tehîddan de navên xwe, paşnavên xwe û malbata xwe guhertine tije ye. Ev bi serê xwe lêkolîneke dixwaze.

Cemal Kutayê Bedirxanî, Çinarên Bedirxanî Hwd. Gelek ji malbatên kurdan yên di dema xwe de doza mafê kurdan kiribûn roj hatiye nav û paşnavên xwe guhertine.

Sala 1998 an Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistan xelata yekemîn rojnameya kurdî Kurdistan bela kir, ji malbaateke wek ya Bedirxaniyan, malbateke ewçendî mezin kesekî xelata Mîqdat Bedirxan, damezrênerê rojnamgeriya kurdî bê û bigre nehate pêdekirin.

Salên dawî bi xêra xwurtbûna Tevgerarizgarîxwazî me Senem Bedirxan nas kir û em hinekî bûn xwedî agehdarî li ser ferdên malbatê.

Em dê bêjin Bediuzeman Seîdê Kurdî. Navê em dê ji bo vê lêkolînê bikar bînin wê Bediuzeman Seîdê Kurdî/Nûrsî be.

Peyva *Nûrsî * jî û ya *Kurdî* jî xwedî bingeh in û ne ling li hewa ne, hem "Nûrsî " û hem jî "Kurdî"du ling û du realîte ne. Yek mekan e, ya din jî netewiyet e. Gelek kes bi navê gund,

bajar, herêm û welatê xwe yan jî li gora miliyeta xwe hatine binavkirin.

Wek Kemal Fewziyê Bedlîsî, Mele Evdirehmanê Axtepî, Mele Mehmûdê Beyazidî, Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî û hwd.

Bedîûzeman Seîdê Kurdî, bi dirêjaya temenê xwe hejmarek nav bikar anîne. Têkiliya van navan bi şert û mercên siyasî, civakî û coxrafîk re hene

Navên Seîdê Kurdî; Seîdê Nûrsî, Bediuzeman, Saîd Nursu, Ibn-i Mîrze, Said-i Kurdi, Meşhur Molla Said, Saidul Meşhur, Ceride-i Seyare û gelek navên din, li pey hev bûne mohrên qonaxekê ji qonaxên jiyaneke di ser 80 salan re.

Hin kesan, çendî ji dest wan hatiye û bi dest wan ve hilatiye ji vê lîsteya navan, navê helî gilover û hevbeş Bediuzeman, hinan navekî ku qet bêhn û têhna welatê Seîdê Kurdî jê hatiye, gel û xelkê ew ji nav derketiye jê neyê, wek Seîd Okur, hinan * Ustad* û hin kesên din jî ku di nav wan de beşek ji lêkolînerên kurd yên salên dawî jî hene navê Bediuzeman Seîdê Kurdî tercîh kirine.

Wekî din di nav hevalbendên wî de kesên dilê wan ranegirtiye û ji hurmeta zêde, jê re Sofî, Mêhdî, Şêx, Ezîz ewliya û Hezret jî gotine ne kêm in.

Ji awira xislet û dirûvên têkiliya wan bi kapasîte, kesayetîya wî, cîh û rola wî re hene ew wek reformator û şoreşgerekî îslamê, rêbereke olî, niwênerê ramaneke ortodoksî, nivîskar û rewşenbîr

hatiye navandin û nirxandin.

Hinan gerokê bexteweriyê, hin kesan ji ber cesaret û hinek helwest û hewildayînên wî sifatên neyênî wek şerletan, kesekî xeyalperest, lingnelierdê, mirovekî xerîb û heta jê re şêt jî gotine.

Ji vê û pêde piraniya xebat û lêkolînên 50-60 salên dawî li ser Seîdê Kurdî hatine kirin, bi giranî û piranî jiyana wî di sê qonaxan de digrin dest:

1. Seîdê kevin (1876- 1926)
2. Seîdê Nû (1926- 1950)
3. Seîdê Sêhem  (1950-1960)

Piraniya nirxandinên wiha ku di çarçeweyeke sêseîdî de jiyana Bediuzeman dikin qonax û movik, ji mebesteke hevbeş û ne dûrî hev bixwedî dibin, piştа xwe didin stratejiyekê ku tê de damarên antîkurd, nîjadperest û fethulahiyane serdest in.

Li gora hevalbendên vê dîtinê Seîd di nav salan de û ber bi qonaxa Seîdê Sêhem de ji Seîdê ewil dûrketiye, xwe jê bêrîkiriye, dawşandiye, ew îmzeya ku di serdema Seîdê Kevin de bikar dianî, xelk û welatê li ser dinîvisî, zimanê ji bo wî ji deshelatdaran zanîngeh û dibistan dixwestin, giş dane aliyekî û mîna hinek meylên ciwantî û salên nebalixbûyî li pey xwe hiştine.

Di vê angaşt û îdîayê de ku dixwaze bêje “Seîd ne Seîdê Kevin e” hewla avakirina portreyeke zorlêkirî (zorakî) serdest e.

Ev meyil, angajmana Seîdê Kurdî di nav kurdan de wek ku bi tenê ji bo demekê be, di jiyana wî de aliyekî wextî û katî be, nexislet û birêveçûneke giş jiyana wî be û ji vê awirê Seîd ne Seîdek, belê sê Seîd bin û tu têkiliya yê duhem û bi taybetî yê sêhem bi yê nav salên 1876 û 1926 an bi hev re tunebe roleke mizawir û mebestnepak dilîze.

Belê çi girêdayê pirsgirêka kurdan yan jî ya ol û oldariyê yan jî girêdayê meseleyeke din be di dîtinên Bediuzeman Seîdê Kurdî de tiştekî bi nakok tune. - Rohat Alakom-

Ya ku bi awayekî xwiya bandêra xwe li jiyana Bediuzeman Seîdê Kurdî kiriye ew e ku zexta li ser wî berdewam zêde bûye û vê zextê jî di mesela navên li gora deman derketine pêş de rola xwe lîstiye.

Baş e ew qet behsa van Seîdan dike, heger erê di kîjan wateyê de ?

“Belê Seîdê Kurdî bi xwe jî di hinek berhemên xwe de behsa van hersê Seîdan dike. Belê ew di wateya bi îsabetbûyîn, balixbûna rûhî û mentehîbûna ilmî de bikar tîne”.

Ev ne ji bo wê ye ku bêje ku di dîtinên wî de li ser kurdan û welatê jê tê guhertinên bingehîn çêbûne. Mebest balixbûna fikrî, rûhî û kûrayîya di herdû ilmên olî û pozîtîv de ye.

Wek nimûne “Seîdê Nû” ji bo Bediuzeman û ji awira wî qonaxa helî berhemdar e, qonaxa temamkirina Rîsaleyên Nûrê ye. Vê li gora xwe wek îşareteke balixbûnê dibîne.

Silêman Çevîk jî di vê derbarê de mîna Rohat difikire, ew jî beşbeşkirin û jihevqetandineke wiha, sêperçekirina jiyanekê bêkêr û nerast binav dike:

Li Kurdistanê dawa wî çi be, wextê koçberî Rojava bû jî dîsa dawa wî ew bû….Çawa wextê li Wanê hiş û aqilê wî li ser Medreset ul Zehra bû û tişteke din nedifikirî, piştî koçberiyê jî tim digot „Eywax ! dawa min „.. Piştî sirgûnî Barlayê bû jî heta wefata xwe li ser wê dawê bû. Seîdê Nû dûmayîka Seîdê Kevin bû.

Bi bahweriya me jî parçekirin û navbirkirina jiyana kesekî mîna Bediuzeman Seîdê Kurdî bi vî rengê kategorîk, mekanîk û bi taybetî di çarçeweya sênavên yek yê din înkar û tesfiye dike, yek li yê berî xwe nabane, xwe jê dişo û xwe bêrî dike , pêşkêşkirineke wiha ku Seîdê Kurdî ji esil, welat, etnîsîte û giş diyardeyên wî yên neteweyî, zimanî û kulturî, ji reh û rîşeyên wî dibire, ne li xêra zelaliyê ye û ne jî lêkolînekê ilmîtir dike.

Tê zanîn ku Kurd û Nûrsî navên neteweyî ne û xwediyê nirxeke sembolîk in. Demekê jî di belgeyên dadgeha Efyonê de ji bo ku ew asosyasyona ku peyvên Kurdî û Nûrsî ku mefhûmên Kurd û Kurdistan tînin bîra mirov ji holê rakin "Said okur" bikaranîne. "Belê wî qet nexwest vê peyva bi Tirkî bikarbîne"

" Van nirxên sembolîk, bandêreke kûr li kesayetiya Seîdê Kurdî kiribûn ku şopên kûr di rih û mêjiyê wî de hiştibûn ku xwedî erkên fermî berdewam hewil dane wî ji van mesajên "seperatîst" û " cihêyîxwaz" dûr bigrin. (Rohat )32.

**Zaroktî û çêbûna karekTeraqî.**

Her meqale, lêkolîn û berhemeke biyografîk, jînenîgariyane kêm zêde riya xwe, kurt yan dirêj bi zaroktiya kesayetiya mijara dabaşê ye dixe.

Ji ber ku her mezinê mijara gotinê rojekê zarok bûye, zarok jî mezinê sibe û zaroktî jî rêwîtiya gavên ewil e, ketina rê ye.

Her meznatî bi zaroktiyekê dest pê dike û rehên xwe ji zaroktiyekê digre. Em jî em dê hewil bidin wêneyekî zaroktiya Seîdê Kurdî darêşin.

Zaroktiya Bediuzeman Seîdê Kurdî, ji temenekî biçûk û pêde bi giranî ne bi dê û bav û ne di nav bira û xwuşkan, belê di hucreyên mizgeftan de, li ser riyan salên xwe dubhêre, dispêre hev.

Zaroktiya wî wek zaroktiyeke neguncaw, gelek caran bi pevçûn û xirecir, *nemilayim, nesernerm û nemutîh*, rewşliberçavnegir û nakeve qalibên perwerdeya demê, li serê xwerabûyî, * ho kiriye û ho xwariye*, ji gotina ya di dilê xwe de pêve bi ya kesekî din nake, netirs û bêhesab, bi ser van gişan de jî meydanxwên, qaqebgoxwaz û mînetqebûlnekir, çavtêr û xwedî bahwerî û îradeyeke gelekî li pêşiya temenê xwe, cihê meraqê, cihê rêzdariyê tê teswîr kirin .

Zarokek netebit û gerok, lê ewqas jî jîr û zekî, zaroktiyeke wiha bi van xislet û dirûvan, dûr ji alîkarî û ewlekariya mal û malbatê, ne di hêmbêza dê û bav de, dûr ji gundê çavên xwe lê vekirine, nemikun e li ser salên piştre nexwedî bandêr bin, rengên xwe nedin wan û nebin movik û avdeyên karekterê temenê ev zarok tê de balix bibe, mezin bibe û bistewe

Seîdê piştre dibe Bediuzeman, di di nav şertên zaroktiyeke wiha de mezin dibe û piştre di coxrafyake fireh de li Kurdistan, Tirkiye, Trakya û Balkanan, Rojhilata Navîn, Efrîka Bakur, Asya Navîn digere, bi sedan alim û siyasetmedar nas dike, dikeve Şerê Cîhanî, birîndar dibe dikeve destê Rûsan û piştre di ser hejmarek welatên mîna Polonya, Elmanya û Awusturya re vedigere Stenbolê û hê piştretir ji aliyê rejîmê Kemalîstî û çend core deshelatdar re dikeve pêxêra hev, 35 salan ji welatê xwe tê qetandin, jiyana salên nav 1876 an û 1960 î  dibe hedefa giş deshelatdarên tên û diçin bi giş damarên xwe yên serekî wek tov û meyil di vî Seîdî de ketine rê û giş bahoz û bagerên jiyana salên meznatiyê bi destpêka xwe vedigerin şop û bûyerên vê zaroktiyê.

Dema ji bo xwendinê ji mal derdikeve temenê wî li dora 9 salan e, li gund û mizgeftên der û dor wek mizgefta Taxê, li Nûrşînê, li Hîzanê, li Arwasê, li Şîrwanê li ba birayê xwe Evdila, seydayên mîna Mele Emîn, Mîr Elî, Mele Fethulah, Mele Eli Soran û Hwd. dixwîne û dawî jî şehadenameya xwe li Beyazidê digre.

Di van salên destpêkê de medrese, mizgeft û cihên xwendina xwe zû dughere, cihekî bi dilekî xwe nabîne, li dereke hez jê bike û wî bikşîne, hulfa wî cezb bike rast naye. Dibe ku têkiliya vê neseknê û netebtiyê bi temenê wî yê biçûk û hewlên çewsandina ji aliyê feqe û şagirtên mestir re jî hebe.

Di nav van cîhguhertin û meh û salên bi xirecir de çend salên wî dubhurin û dema berê xwe dide Cizîra Botan êdî temenê wî li gora hinek dîtinan 15- 16 salî ye.

**Malbata Seîdê Kurdî:**

Navê bav Mîrze û yê dayikê jî Nûrê ye. Malbat, mîna malbatên Cegerxwîn, Yilmaz Guney û Abdulah Ocalan ne ji malbatên navdar û naskirî ye, malbatek ji hezarên malbatan e. Heger Seîdê Kurdî derneketa ji vê malbatê ne mikun bû ku rojekê bibûya behs û gotin jî, ewçendî ji rêzê ye.

Belê dema gotin li ser kesekî wiha xwedîşop û bandêr mîna Seîdê Kurdî ye, bivê nevê dê û bavên wî jî êdî derdikevin ast û sewiyeke din, êdî ji nav rêz û sefên hezar û dehezaran derdikevin û dibin ji kesên naskirina wan, navên wan, jiyan û debara wan bi serê xwe jî dibe beş û sernivîsek.

**Xewna Seîdê sîpe û erkekî ne li gora temen û taqeta wî.**

Li dora sala 1892 an û di temenekî 15/16 salî de li gora hatiye gotin û bûye xwediyê qebûleke neguhêrbar di timamê biyografiyan de, Şêx Evdilqadirê Geylanî şevekê tê xewna Seîdê Kurdî û jê re dibêje ku ew pêwiste here Cizîrê û reîsê Eşîreta Mîran Mistefa Paşa ku di heman demê de fermandarekî Alayên Hemîdiye ye jî vexwîne hîdayetê û terikandina zilma li xelkê dike.

Li ser vê xewnê berê xwe dide Cizîrê, Paşayê Hemîdiyan dibîne. ji bo bicîhanîna erkên xwe bi cesareteke ne xercê herkesî ye tevdigere û di encamê de bi bedêla sirgûnkirin û derxistina ji Cizîrê jî be sefera wî çi li ser Paşayê xedar be û çi jî di nav alimên Cizîrê de be bêbandêr namîne, şopên xwe dihêle.

**Ji Cizîrê ber bi Mêrdînê :**

Ji Cizîrê bi hevalekî xwe bi navê Mele Salih re berê xwe di ser beriya Nisêbînê re dide Mêrdînê, piştî hinek nelibariyên birê de û hin serêşên bi cerdevanan re, xwe dighîne Mêrdînê.

Di demkurta li Mêrdînê de Seîdê xort bi ramanên azadîxwaz, yên mîna yên Namik Kemal, Cemaledîn Efganî re têkiliya wî çêdibe, ev têkilî û naskirina bi taybetî bi du telebeyên Efganî û Sinûsî re dibe çelq û pêleke nû di jiyana wî de, bala wî diçe ser siyasetê, ser pirsgirêkên wek rewşa welat û împeretoriyê, pirsgirêkên cîhana îslamî û Hwd.

Salên piştre Seîdê Kurdî di bîranînên xwe de van têkilî û ramanan di peyvên * wek ferîşteyeke bedew* de binav bike.

Li aliyê din Mêrdîn, jê re dibe derfetek da ku xwe di hinek guftûgo û raberzînên cihê ji yên feqeyên di hucran de biceribîne. Herwiha dibe keys û fersendek da ku di nav van ceribandinan de kêmanî û lewaziyên xwe, aliyên xwe yên gerek bêne bi pêşxistin tap û tesbît bike, bi yekalîbûna xwe bihese û xwe li gora hewcedariyên demê, bi agehdarî û pêzanînên serdemî bar bike, darêşe.

Li Mêrdînê jî zêde nasekine, nikare bimîne û ji aliyê Miteserifê bajêr di ber cendirmeyan de berê wî didin Bedlîsê.

Ev jî dibe sirgûna duhem di tmenekî wiha biçûk û hê başbalixnebûyî de.

**Salên li Bedlîsê**

Salên li vir jî bi bûyer û serpêhatiyan dagirtî ne, roj û hefteyên wî bi ber û bêrdarî tên û diçin û şêniyên bajêr bi hatina xwe, bi bûna xwe li vir dihesîne, wek hergav balê dikşîne ser xwe û di nav gel de, di hucreyên feqe û şagirtan de, di nav şêx û aliman de dibe pizika ser zimanan.

Li vir hezkirin û şeydatiya xwendin û dîrasetkirinê jî çendqat dibe, Quranê ji ber dike, Sembolîk be jî derseke dawî ji Şêx Mihemed Kufrewî digre û di vê navê de beşek girîng ji zeman û dema xwe ji bo xwendin û lêkolînkirina ilmê fenî û misbet terxan dike.

Rabûn û rûniştina wî, nîqaşên dikeve wan, bersivên wî û serwextiyeke ne li gora temenê wî, li pêş salên wî, bala xwendayên bajêr, kesên mîna walî û giregirên xwedîgotin jî dikşîne. Ev jî jê re deriyê kitêbxaneya Qonaxa Walî vedike ku têra xwe dewlemend e û ji awira dabaş û naverokên xwe çendcore û cihê ye.

Li Bedlîsê Omer Paşa Walî ye,

Walî di nav xelkê de wek kesekî bi edalet tê naskirin. Tê gotin ku ne li gora meqam û dewlemendiya mirovan, cihê wan yên di civakê de belê li gora qanûnan erkên xwe tîne cîh, bi ihtîmal mirovekî bi eslê xwe Ernewît e.

Çawa Bediuzeman û walî hev naskirine bi xwe jî di encama bûyereke ne ji rêzê de tê pê. Rojên Seîdê Kurdî li Bedlîsê ye,

xeber tê ku walî û çend hevalên xwe eraqê vedixwin. Seîdê Kurdî diçe ba wan, ayetekê li ser nebaşiyên alkolê dixwîne wan îkaz û hişyar dike. Herkes li bendeye ku walî bersiveke tund bide, belê na, ew bi aramî radibe, terka maseya alkolê dike û ji wur dûr dikeve.

Bi dû vê bûyerê de Walî du polisên xwe dişîne dû Seîdê Kurdî, dema dikeve oda walî, walî ji ber radibe û bi rêzdarî pêşwaziya wî dike, bi vî awayî di nav wan de dostayetiyek çêdibe. Di hin biyografyayên Bediuzeman Seîdê Kurdî de gotinên Walî Omer Sebrî Paşa wiha derbas dibin:

*Herkes mamosteyekî wan heye tu jî ji niha û pêde mamsoteyê min î * (Tarihçe-i Hayat sh.39)"

Paşe, Bediuzeman dibe mala xwe, ewil wek mêvan piştre ji bo demeke dirêj jê re odeyekê terxan dike û dibêje * êdî di vê odê de li ser ilmê xwe kar bik*. Li gora dîtinekê jî ev helwestê walî di esil û esasê xwe de dibe kontirolkirin û rehînekirina Bediuzeman Seîdê Kurdî. ( Hafiz Ehmed Turhalli, ji sohbeta li Komela Dortmundê) Seîdê Kurdî jî li vir xwe bi temamî dide ilim û xwendinê.

**Qonaxa bi dû Bedlîsê de Wan :**

Di nav çend salên li Bedlîsê de Seîdê Kurdî êdî ev demeke bi navê Bedîûzeman ango şareza û jîrê serdemê, nav û dengek jê re çêbûye, ji aliyê alim û zanayên Wanê tê vexwendin û li ser daxwazeke di asteke wiha bilind de derbasî Wanê bûye, sal 1897 e.

Di jiyana Bediuzeman Seîdê Kurdî de Wan û salên dirêj li Wanê dibe deriyekî çendalî ber bi cîhan û navendên cihê, dibin salên têkiliyeke nêzîk bi burokratên dewletê û ol û kulturên cihê re. Bi giregirên bajêr re û di asta serekî de bi walî re, bi erkanên dewletê re hevdîtinan çêdike û di xelekên sohbetan de cîh digre.

Çend tiştan dike li vir. Ya yekê êdî ew ne şagirt û feqe, belê dersdar e, ilmê komkiriye dixe pratîk û jiyanê û di ber re jî li nav eşîran digere, wan hişyar û rohnîdar dike. Mirov dikare bêje ku salên li vir bi aliyekî xwe jî dibin salên irşadê.

Têkiliyên bi dewletê re ku di temenekî zû de dest pêkirine, li Cizîr, Mêrdîn û Bedlîsê ketine rê li Wanê derdikevin asteke din û ev jî dibe pira nav burokrasiya li Kurdistanê û ya helî jor heta

bi Stenbola paytext, heta bi Siltan Evdilhemîd û diranên Itîhad û Teraqî, kesên mîna Enwer Paşa.

Dema 20 ê meha Sibatê sala1898 an Tayina Tahir Paşa ji Mûsilê radibe Wanê Bediuzemanê ku berî wî li wur bicîh bûye ne bênakokî û ne bêdilmayîn be jî wê bibin du dostên heta bi heta. Ev jî 8 salên heta bi sala 1906 an û salên piştre heta bi mirina Tahir Paşa dewam dikin.

Tahir Paşa sala 1849 an li herêmeke kosmopolît wek Işkodra hatiye dinyayê, ji xeynî Osmanî bi zimanên Sirbî û Ernewûdî jî zane. Bi eslê xwe ji medresê tê û ev jî sebebeke ku meraqa wî beramber ilim zêde ye û hulfa wî çûye ser Bediuzeman Seîdê Kurdî.

Dibe ku rola Ernawutiyê jî hebe li vir, rola ku bi xwe ne Tirk belê ji miletekî din e, Wê bi ihtîmaleke mezin têkiliya hevaltiya di nav Bediuzeman û Mehmet Akif Ersoy de jî heta bi vê dostayetiya di nav Tahir Paşayê Ernewît û Bediuzemanê Kurd de jî hebe.

Kitêbxana Tahir Paşa yek ji mestirîn û navdartirîn kitêbxaneyên herêmê ye. Tê de kitêbên li Ewropa hatine çapkirin jî di nav de bi çend zimanan kitêb hene, Di sohbet û nîqaşên qonaxa walî de van kitêban rola xwe dilîst û Bediuzemanê bûye kurmikê kitêban ev kitêbxane bêj hema daqurtandibû.

Qonaxa Tahir Paşa mîna heyamekê li Yewnana kevin di zemanê Perîkles û xanima wî Aspasiya de, sedsalên piştre di xelekên akademîk û salonên bajarên mîna Parîsê de, cihê sohbetên ilmî ye, nîqaşên li vir germ û gurr in, dabaşên sohbetan zêde ne, bi qasî navçe û xalên olî digrin ber xwe ewçendî jî li der û dora ilmên pozîtîv, rojane, felsefî û aktûel in jî.

Di van nîqaşan de Bediuzeman bi nisbet beşdarên sohbetê çendî li pêş bû, çendî serwext û serdest bû bi her sohbeta dihat û diçû re baştir dihate dîtin û dihate pejirandin.

Serwextî û degeliya wî di matematîkê de bênîqaş bû, giş problem di zihnê xwe de jihev derdixistin û kesên li dora xwe ecêbmayî dihiştin. Ji xwendina zêde, konsantirasyona sift demekê nexweş dikeve, mêjyê wî diwest e û tê gotin ku li dora sê salan xwe dûr digre ji van nîqaşan.

Ya ku bala Bediuzeman Seîdê Kurdî dadgerîne ser kitêbên musbet û ilmî jî Tahir Paşa û ev kitêbxane ye.

Tahir Paşa mirovekî xwedînîşan û xwedîxelat e, li ba Siltan Evdilhemîd xwedîqedir û qîmet e, bahweriya Siltan pê xwurt e, jê piştrast û dilniya ye. Herwiha mirovekî çeknas û kone ye, berî pirr kesan hêza Bediuzeman keşif kiriye, dibîne ku kesekî ne ji rêzê ye, xistiye serê xwe wê Bediuzeman Seîdê Kurdî bişîne Stenbolê û van gotinên li telê Bediuzeman Seîdê Kurdî dikevin dibêje :

Raste di nîqaş û minazereyan de serwextî û serdestiya te diyar e, gotin jê re navê. Belê ji bîra nek ku bajarê Wanê ne giş dinya ye. Li dinyayê bajarekî mîna Stenbolê jî heye. Bajarê cihê alim û zanayên mîna hûtan, mîna deryan û avên bê binî.

Raste tu zanayên Kurdistanê bêdeng dihêlî. Lê gava tu herî Stenbolê, tu li hemberê wan cewrên hûtan, (masiyên mezin) tê wiha mîna di vê ava biçûk de nikaribî avjeniyê bikî. Tu zora alimên Şerqê dibî, belê tê bikaribî wiha ji Hûtên Stenbolê re jî meydanê bixwînî ?

Heger raste tu ewçendî bi xwe bahwerî kerem bik her Stenbolê da em jî bibînin ka wezin û giraniya te, bejin û qama te çend e.

Ev gotin heta tu bêjî bes li telê Bediuzeman dikeve, jê re dibe tehn û niçek, dibe derd, kul û meraqek, ew êdî ji bo çûna Stenbolê biryara xwe dide.

Berî têkeve rê Tahir Paşa ji bo Bediuzeman Seîdê Kurdî bide seraya Osmanî, nameyekê ji Siltan Evdilhemîd re dinîvisîne, di namê de pesnê Bediuzemanê Kurdî dide, alimekî çilo û çawa, çendî mentehî ye, çendî navdar û naskiriye li Kurdistanê dadrêşe û wî bi rê dike Stenbolê.

**Li Stenbolê .**

Bediuzeman namê dixe bêrîka xwe û berê xwe dide Stenbolê. Êdî ji bo wî mesele ji mesela kesekî çendî alim e û çendî na derdikeve, ji bo wî ku evîndarekî çiya û avûbaya welatê xwe ye, dibe mesela ast û sewiya ilim li Kurdistanê.

Li Stenbolê li Fatihê, li Meydana Malta li Xana Şekerci bicîh dibe. Xan bi nav xan e, belê di esas û bingehê xwe de qûlûb û navendeke nîqaşan e, tirîbûn û pilatformeke rûberûbûna dîtin û fikran e.

Ji her aliyên împeretoriya ne serî û ne binî heye, rewşenbîr û entelektuel li vir dicivin, ekol û meylên civakî, felsefî, wêjeyî û herşaxî li vir em jî hene dibêjin, siberoja cîhana îslamî, serdestî

û degeliya rojava nîqaş dikin, kesên jixwerazî, jixwe û zanebûna xwe piştrast li vir qetabên xwe li hev dixin, xwe diceribînin, xwe li mêzên û qentareke mestir ku vê carê ya împeretoriyê ye dixin.

Bediuzeman Seîdê Kurdî bi xwe bahwer e. Li ser deriyê oda xwe îbareyeke wiha dide nivîsandin:

li vir bersiva her pirsê tê dayin, belê pirs nayin kirin".

Rewşenbîrên Osmanî qesda dîtina wî dikin û dimînin heyran û heşmetkarên wî. (Eşref Edip, Tarihçe-i hayat, s. 21-32. , Ronî 36)

Her kesê dikete sohbet û civata wî, dibû şahid û çavdêreke minazereyên wî di bin bandêra wî de, zeka wî û hêza wî ya analîzê de dima û ji derdorên xwe re bi pesin û rêzdarî behsa wî dikir.

Di minazereyekê de ku di nav wî û Şêxekî Ezhera Misrê de derbas dibe pirs û bersiveke wiha çêdibe. Şêx Bahid Efendî dipirse:

-Tu ji bo Ewropa û împeretoriya Osmanî çi difikirî ?
-Ewropa bi dewleteke îslamî bi du canan e û wê
-Rojekê ev zarok çêbibe, Osmanî jî bi Ewropiyan bi ducanan e*
- Bi vî ciwanî re minazere nabe, ez jî wek wî difikirim, belê ev şiklê formûlekirinê incex Bediuzeman bike* 56

Bedîûzeman ji roja gihişte Stenbolê û pêde li himberê alimên Stenbolê siyasiyên wê demê û Siltan xwediyê seknek cihê bû, sekna wî ne ji seknên naskirî bû.

Ew bi her awayî ne mîna kesên din bû, bi xweserî û cihyîyekeke din berçav dibû. Di têkilî û dayin û stendinên xwe de bi alimên Stenbolê re ne dişibiya alimên klasîk.

Bi helwest û sekna xwe, bi lixwekirin û kincên xwe, di qada herdû ilman de hem di ya olî û hem jî di ya misbet de, bi serdestî û serwextiya xwe di nav demeke kin de xwe da qebûlkirin.

Berî bê paytextê împeretoriyê wî xwe li mêzêna Kurdistanê kiribû û di vî alî de ne carekê bi dehan car di îmtîhan û minazereyên medrese, bajar û qonaxên corecor re bi serketin derbas bûbû, niha jî dor hatibû da ku xwe li vî bajarê çend

parzemîn jê dihatin birêve birin û navenda xelîfetî û şêxilîslaman bû xwe îspat bike.

Di nav çend mehan de ev jî kiribû. Nav û dengê wî bi kenalên corecor li giş bajêr bela bûbû û helbet di serî de jî gihiştibû seraya Siltan .

Bediuzemanê bi hêza xwe, wezin û giraniya xwe dizanîbû, ji bandêra xwe bixeber bû, êdî keys û fersend ji bo wî hatibû da ku nameya Tahir Paşa bighîne Siltanê Îslamê û projeya di serê xwe de, projeya serdemê, pêşkêşî meqamên helî bilind bike û bi bersiv û encameke bi dilê xwe vegere Kurdistan û vê projeyê têxe jiyanê .

Serlêdana ji bo vê projeyê, di rojnama 'Şark û Kurdistan* de bi sernivîsa "Kurd dîsa muhtac in" hatiye weşandin.

Di vê serlêdanê de Bediuzeman Seîdê Kurdî li Kurdistanê vekirina sê medreseyên Kurdî dixwaze û di daxwaznameya xwe de ji ber çi ev xwendegeh pêwist in bi awayekî têr û tesel şîrove dike.

Ya Siltan Evdilhemîd jî li bende û di pey de ne ev e. Ew ji bo navçeyên Rojhilat, Kurdistanê û bi giştî kurdan bi xwe ve girêbide, li dijê daxwaz û xwestekên meşrûtîxwaz û azadîxwaz bikar bîne, di tenişta Alayên Hemîdiye û di perela van yekîneyan de kenaleke manewî bîne pê û li ser esaseke wiha jî li hatina Bediuzeman Seîdê Kurdî wek fersendekê dinere.

Belê dema hayê wî ji rabûn û rûniştina Bediuzemanê Kurd, daxwaz û xwestekên wî çêdibe, dema pê dihese ku meaş nagre, guhê wî ne li ser pere, bertîl û meqamên dewletê ye, xwe naspêre staukoya modeyî û serdest, gelekî nerehet dibe, jê re paxav û mitale çêdibin.

Li vir du stratejî û du proje hebûn: Ev jî ya Bediuzeman û Seîdê Kurdî û ya Siltan Evdilhemîdê Duhem bûn.

Van herdû stratejiyan hev nedigirtin, dûrî hev û bervajên hev bûn. Wek du damarên dijber îro jî ev herdû stratejî di siyaseta Erdogan û Fethulah Gulen de li aliyekî û di ya rewşenbîrên li der û dora Tevgerarizgaxwazî de li aliyê din, bi hev re di nav şer de ne.

Bediuzeman Seîdê Kurdî bi riya van xwendegehan ku di bin navê Medresetul Zehra de ketiye dîrokê de dixwest ku li Kurdistanê sîstemekî perwerdê ava bike, ronesanseke

rohnîdariyane biger bixe, di riya vî sîstemê sêzimanî ango Kurdî, Tirkî û Erebî re bingehê bihevrebûn û jiyaneke çendmiletî, jiyaneke konfederal û li xêra giş çandên li herêmê ava bike ku bi aliyekî xwe îro jî di rojevê de ye.

Ev pilan û proje ne li gora Siltan û deshelatdarên dewletê bûn, li aliyê din reformxwazî, guhertinxwazî û azdîxwaziya Bediuzeman jî ji awira burokrat û birêvebirên serdest, şêtayetî, jiserxweçûyîn û zêdegavî bû, cihê wî şêtxane, tîmarxane û zîndan bû.

## Salên Meşrûtiyet û Komarê: 1908-1922

Rojên Seîdê Kurdî girtî û di zîndanê de ye, Stenbol dikele. Nîqaşên li ser Meşrûtiyet û azadiyê di asta helî germ û helî fireh de ne .

Piştî ku serbest dibe bi sê rojan 23 ê Tîrmehê 1908 an Meşrûtiyet îlan dibe.

Di roja sêhemîn ya Meşrûtiyetê de li Siltan Ehmedê di mitîngê de li ser huriyetê diaxive.

Piştre bi girêgirên Itîhat û Teraqî re diçe Selanîkê û li wur li meydana bajêr axaftina xwe ya navdar dike ku tê de dibêje ku mefhûmên Meşrûtiyet û azadiyê bi îslamiyetê re ne di nav nakokiyan de ne, guncaw in pêşkêş dike.

Jiyana wî li Stenbolê gelek bi liv û bizav e, di cihê xwe de nasekine, dibe endamê komelan, ji rojnameyan re gotaran dinîvisîne, dikeve konferans û civînan, li komên nêzîkî xwe şîretan dike.

Rojekê li Şanoya Ferah konfernaseke sernivîsarê rojnameya mizan Murat Beg heye. Di dema konferansa de, Itîhadî û teraqîyî tevlîheviyekê çêdikin û biryara xwe dane wê li semînardar bidin

Seîdê Kurdî ku ew jî li wur e, di nav kesên amade de ye, dibîne ku wê bûyerên nebaş biqewimin hema ji cihê xwe dipeke, derdikeve ser kursiyê xwe û ji beşdaran re dibêje ku rê bidin bila xatîb axaftina xwe bike û ji azadiya ramanê re rêzdar bin. Bi vî awayî heyecana bilindbûye û tu nemaye bi ser ve here aram dike û konferans bê bûyer bidawî dibe.

Bûyereke din: Hemalên li Stenbolê li dijê Meşrûtiyetê hatine sorkirin, li her aliyê Stenbolê hejmareke mezin in. Bediuzeman Seîdê Kurdî dema dibîne ku hemalên Kurd wê bêne lîskê, li giş qehwexaneyên ku hemalên kurd li wan dicivin digere, ji bo meşrûtiyetê dixaxive û berê hêrsa wan dide dewleta Awusturya ku Bosna Hersek dagîrkiriye.

Kategoriyeke din ku ji Meşrûtiyetê nerehet û bi şikin alimên li der û dora medreseyan û xwendevanên van medreseyan in. Li gora bahweriya wan jî Meşrûtiyet û azadî, destûra nû ku behsa wê dibe li dijê îslamê ne.

Bediuzeman Seîdê Kurdî bêj hema di giş rojnameyên wê demê de meqaleyan dinîvisîne, meşrûtiyetê diparêze û bi referensên ji her çar mezhebên îslamî xwendevanan Îkna dike ku di nav Meşrûtiyet û îslamê de tu nakokî nîn in.

Ji bo dijberiya beramber Meşrûtiyetê û hevalbendiya Siltan jî ji her aliyê Kurdistanê re, ji serokeşîr û giregirên welat re telgirafan dişîne.

Di van telegirafan de mesela ku sîstemekî destûrî û meşrûtiyane bi îslamê re ne nakok e dihate destnîşankirin. Xwedînifûzên li Kurdistanê ku ev telgiraf dighiştin destên wan rehet dibûn û helwestê xwe dughertin.

Ev kultura şandina Telgirafan û gera li Kurdistanê piştre Mistefa Kemal ji Bediuzeman Seîdê Kurdî wek mîras girt, bikar anî û bi xwe kongreyên bajarên Sêwas û Erzeromê li dar xistin.

**Bûyera 31 ê Adarê**

13 Nîsana 1909 an bûyera ku li gora salnameya rûmî jê re bûyera 31 ê Adarê hatiye gotin li Stenbolê teqiya.

Di sêhemîn roja vê tevlîhevî û kaosê de Bediuzeman Seîdê Kurdî bangeke ku xîtabî eskeran dikir di rojnameyan de weşand û di roja çaremîn de çû Nezareta Herbiyê xîtabî eskerên di nav serîrakirinê de kir, ew vexwendin bidawîkirina isyanê.

Serhildana ku 11 rojan dewam kir bi *Artêşa Hereket Ordusu* ku di bin fermandariya Mehmûd Şewket Paşa de bû û ji Selanîkê hat, raperîn perçiqand û rewşa Awarte îlan kir. Pêşengên serhildanê di dadgeha *Divan-ý Harb-i Örfî'de* ( Dadgeha rewşa Awarte ) hatin îdam kirin.

Bediuzemanê ku berdewam bi dirêjaya van 11 rojan ji bo aramkirina rewşê nedisekinî, diaxivî û rola wî erênî û li aliyê meşrûtiyetê bû, bi behaneya ku ew jî ketiye nav bûyeran girtin û li ber Dadgeha Rewşa Awarte de bi îdamê ew darizandin.

Di encama parastineke îknakir de hate berat kirin. Bi saya vê parastina bi ser û ber, pê re gelek kesên din jî ji îdamê rizgar bûn.

Salên piştre ev parastina xwe di bin navê "Iki Mekteb-i Musibetin Şahadetnamesi veya Divan-i Harb-i Örfî" de weşand.

**Vegera Kurdistanê û çûna Şamê:**

Piştî derketina ji zîndanê û serbestberdana xwe Bediuzeman Seîdê Kurdî ji Stenbolê derket di ser Inebolu re bi riya deryayê çû Trabzonê, ji wur derbasî Batûmê bû û di ser guzergaha Tiflîsê re xwe gihande Wanê, sal despêka 1910 an bû.

Çend mehekî bi kar û xebatên Medreseya Horhorê re xwe mijûl kir. Piştre li herêmên çolemêrg, Bedlîs, Mûş, Amed û Rihayê geriya, eşîr ziyaret kirin. Li ser Meşrûtiyet û azadiyê bersiva pirsên xelkê da, bi xelkê re sohbet kir, kete nav têkilî û diyalogeke sift û rûberû, germa germa û di cîh de.

Ji wan re behsa bingehên îslamê yên Meşrûtiyet û şêwrê kir û hewil da wan îkna bike da ku ji nihmetên Meşrûtiyetê kelk werbigrin. Wek carên berê jî dikir piştre encamên vê gera xwe û pirs û bersivên di encama vê gerê û diyaloga bi gel re derketin meydanê, bi navê "Münazarat" çapkir û da weşandin.

Bediuzeman Seîdê Kurdî mehên zivistanê di ser Bedlîs, Amed, Urfa, Dîlok, Kilîs û Helebê re li ser vexwendina alimên navdar berê xwe dide Şamê.

Li vir xutbeya dengdayî ku bi navê bajêr tê zanîn li camiya Emewiye pêşkêş kir. Di vê xutbê de li ser pirsgirêkên siyasî, aborî û civakî yên cîhana îslamî û riyên çareseriya wan sekinî û piştre bi navê "Hutbe-i Şamiye" ew jî çapkir.

**Medresetulzehra: projeya tim di bala Bediuzeman de:**

Bediuzeman ji Şamê venegeriya Kurdistanê, ji bo projeya xwe têxe jiyanê careke din berê xwe da Stenbolê ba Siltan Reşadê ku ev salek bû ketibû şûna Siltan Evdilhemîd.

Ev sefer di ser Bêrûdê re pêk hat. L Stenbolê bi Siltan Reşad re wek niwênerê Rojhilat kete pîrozbahiyên salvegera derketina ser textê siltantiyê.

Di nav sefera Rûmelî de cihê xwe girt. Ewil bi kafîla Siltan re çûn Selanîkê û piştre paytextê Senceqa Kosova Uskupê.

Li wur bingehên zanîngeha Uskupê avêtin. Belê ne bi gelekî piştî vê seferê Şerê Balkanan dest pê kir. Ji ber vê, xebatên avakirina zanîngeha Uskupê sekinîn.

**Şerê Cîhanê yê Yekem projeya li ber çêbûnê sabote dike:**

Bediuzeman ev wek derfetekê girte dest û ji Siltan Reşad re *madem xebatên avakirina zanîngeha Uskupê sekinîne wî çaxî em bi pereyên ji bo wê hatibûn terxankirin li Rojhilat zanîngeheke wiha vekin ku gelekî hewcedarî heye pê. *

Ev pêşniyaz ji aliyê hikûmetê hate pejirandin. Bediuzeman ji bo ku vê biryarê rojek berî roja din bîne cîh berê xwe da Wanê.

Di mehên havîna 1913 an de bi beşdariya waliyê Wanê Tahir Paşa û hejmarek personelên fermî li peravên Gola Wanê li Artemitê cihê Medresê hate tesbîtkirin û xebatên avakirina medresê dest pê kirin.

Şensê neçê vê carê jî Şerê Cîhanê yê Yekemîn dest pê kir. Proje careke din li paş ket û bêencam ma.

Seîdê Kurdî jî bi şagirtên xwe re *Teşkilata Milîsî ya Rojhilat* damezrand û bi dilxwazî di eniya Wan-Bedlîsê de li dijê Rûsan kete şer.

Di nav şer de, di bêhnik û demên perçên şerapnalan dibariyan de not digirtin û wek gelek nûçegihanên Tevgera Rizgarîxwazî yên îro nivîsandin nedisekinand. Berhema bi navê *Işaratü'l-I'caz * Ji notên di şer de hatiye pê.

Di eniya Bedlîsê de gelek şagirtên wî şehîd ketin. Pê re bi tenê çar şagirtên wî mabûn. Di şevreşekê de dora wan tê rapêçan û di nav hewla şikenandina çembera dagîrker de dema xwe di ser benekê re davêje lingên wî dişkin. Bi birîndarî li dora 30 seetan di nav avê de dimîne û dawî teslîmê Rûsan dibe.

Ewil wî dibin Wanê, bi dû de di ser Culfa, Tiflis, Klogrif re davêjin Kosturma. Li Kosturma bi efseran re li kempekê dimîne. Çendî ji dest tê li gora şertan xwebihev dixe û bi awayê helî mikun dema xwe dinirxîne.

Kesên li kempê giş efser in ku bi salan di nav şer de mabûn. Bediuzeman dersê dide efseran. Rojekê fermandarê Artêşa Kafkasya yê Rûs Grandük Nikolaviç tê kempê, di nav gera li kempê de di ber Bediuzeman Seîdê Kurdî re derbas dibe, herçendî Bediuzeman wî nas dike jî ji ber wî ranabe.

General vê wek heqaretekê pêşwazî dike û fermana îdamkirina Bediuzeman dide, piştre fermanê bi şûnde dikşîne. Sebebên ranebûna Bediuzeman di gotinên mîna * ez alimekî îslamê me, ji bo ez îmana xwe û rûmeta îslamiyetê biparêzim ji ber te ranebûm* qebûl dike.

Piştî salan dema ev bûyer di rojnameyekê de di nav bîranînên efserekî de dikeve weşanê, Bediuzeman Seîdê Kurdî nûçeyê piştrast dike.

**Salên li kempê, Şoreşa Bolşevîkî û reva ji Rûsya :**

Bediuzeman li Kosturma li mizgefteke Tataran bi kefalet wehzan dike û dersan dide.

Li vê mizgefta li peravên Volga hem îmamtiyê dike û hem jî sohbetên li ser îmanê li dar dixe. Li ser rewşa xwe, salên bi bûyer ku li pey xwe hiştine dirame, kûr dibe, dikeve xewlê û çendalî xwe di ber çavan re derbas dike.

Li gora hinan guhertina ji Seîdê Kevin ber bi yê nû de heta van rojên fikirkirina kûr diçe.

Payîza 1917 an li Rûsya Şoreş dibe, jiyan û sîstemê heye serobinî hev dibe û rejîmê Çarî hildiweşe

Di nav vê qerembol û kaosa şoreşê de Bediuzeman firar dike, ji Kosturma xwe dighîne Petersbûrgê û bi dû wê de jî derbasî Varşova û Viyena dibe. Bi belgeyeke ku ji aliyê meqamên Elman hatiye amadekirin di ser Sofya re tê Stenbolê. Ev jî dibe bidawîbûna sirgûneke li dora 2 sal û nîvan.

Dema 25 ê Hezîrana 1918 an dighe Stenbolê bi germî û hezkirin tê pêşwazîkirin. Hin rojname û bi taybetî ya Tanîn vê vegera welat ji manşetê dide.

**Endametiya di *Dârülhikmeti'l-Islamiye* de**

Xwedîgotinên ku ji qehremaniyên Bediuzeman Seîdê Kurdî agehdar in û hayê wan ji serwextiya wî ya ilmî heye, ji bo bibe endamê “Dârülhikmeti'l-Islamiye"ye roleke handar dilîzin.

Şêxulîslam Musa Kâzim Efendi li ser pêşniyazên têne kirin sertifîka Mahrecê dide Bediuzemanê Kurd. Ev rutbeya ku jê re "Mahreç Mevleviyeti* jî dihate gotin li ser axa Osmanî dihate wateya rutbeya helî mezin piştî ya Sermideris.

Beduzeman demekê li Qesra Yusuf Izzettin Paşa bicîh dibe, livir hem bêhna xwe vedide û hem jî di ber re dinîvisîne.

Tefsîra Quranê *Işaratu'l-I'caz* ku di dema şer de li eniya Kafkasan, fermandarê hêzên dilxwaz bû dabû nivîsandin dide çapkirin

Çend berhemên ji vê demê li jêr hatine rêzkirin:

1. Noqte: Di derbara îspatkirinên îmanê de ,
2. Sünuhat: Tefsîrên ayet û hedîsên corecor
3. Şuaat: Pêxemberiya Hz. Mihemed îspat dike.
4. Rumuz : mucîzeyên Quranê şîrove dike.
5. Tulûat: Berhemeke li ser dabaşên civakî ye.
6. Katre : li ser îspata tewhîdê ango yekeriya Xwedê ye.
7. Habbe: wecîzeyên xweser in li ser dersên exlaqî û manewî.
8. Zerre û Şemme: name û buroşûr.
9. Lemeat: nivîsandin û belakirin.

Bediuzeman bi meaşê ji Darulhikmet digirt ji bo hewcedariyên xwe beşek dida aliyekî, belê bi yê mayî jî pirtûkên xwe çap dikirin û bi belaş bela dikirin. Carcaran jî bi destûra Darulhikmet li cîhên mîna Çamlica û Girê Yuşa li Stenbolê bêhna xwe vedikir.

Siyaseta li Stenbolê jî têra xwe ew westandibû. Di nav qolincên guhertin û tekamuleke nû de bû, derdikete Girê Yuşa, di nav ramanên xwe de xerq dibû û li ser têkiliyên xwe bi dinyayê re kûr dibû, ev têkilî di ber çavan re derbas dikirin.

Di vê dema ku Beduzeman Seîdê Kurdî di nav qolincên bicîhhiştina *Seîdê Kevin* û ber bi yê nû de dikete rê, dewleta Osmanî jî li ber ketinê bû.

Rojên tayina Bediuzeman derket Darulhikmet Mitareka Mondorosê jî hate îmzekirin.

Dewletên di şer de serketî 13/10 1918 an bi keştiyên xwe ketin Bendera Haydar Paşa. 16 ê Adarê, sala 1920 an eskerê Ingilîz kete Stenbolê û bi lez paytext dagîrkir, ji bo vê dagîrkeriyê Ingilîstan piştgiriya xwe fireh dikir.

Hevalbendên Ingilîzan di nav nivîskarên mixalif de, mirovên alim, dersdar û ji nav siyasetmedaran gelek kesên hevalbendên Ingilîzan hebûn.

Heta van kesan di bin navê "Ingiliz Muhipler Cemiyeti" de wek saziyeke hevalbendên Ingilîz jî avakiribûn.

Serokê Fexrî yê vê rêxistinê jî Şêxulîslam Mistefa Sebri bû. Hevalbendên Ingilîzan hêzeke xwurt bûn. Bediuzeman li himberê vê rêxistinê bû û ji bo bandêra Ingilîzan di nav aliman de, bandêra di vî alî de çêbûye teng bike û gel hişyar bike, bi navê *Hutuvat-i Sitte* berhemek weşand. Li ser vê xwe berda bin erdê, berdewam cihê xwe guhert, li çapxaneyan ev broşur zêde kir û li her dera îmkana wî gihiştiyê bela kir, gihande girseyên gel .

## Alternatîva Şêxilîslam:

Şêxilîslam Li dijê *Kuwayî Miliye* û tevgera di bin serokayaetiya Mistefa Kemal de jî bi handayin û zexta hinek dormedoran fetwe derxist û ev tevgera li Enedolê navno kir.

Bediuzeman li dijê vê fetwayê jî derket, ew pûç kir. Di nivîs û gotarên xwe de Şerê Rizgariyê wek cîhad û Kuwayîmiliyeyî jî wek micadhîdan îlan kirin, piştgiriya têkoşîna li Enedolê kir.

Di demekê de ku ev giş dibûn, diqewimîn li Enqera Meclîsa Netewî ku hatibû damezrandin xebat û têkoşîna Bediuzeman Seîdê Kurdî ji nêzîk de û bi baldarî dişopand û bi awayekî teqdîrane pêşwazî dikir.

Mistefa Kemal û hevalên xwe bi telgirafên şîfrewî Bediuzeman seîdê Kurdî sê caran vexwendin Enqera. Belê bersiva wî ji van telgirafan re wiha bû berdewam: "Ez li cihê bi talûke dixwazim têkoşîna xwe bikim. Têkoşîna ne di sengeran de belê li pey sengeran bi karekterê min re li hev nake. Bi nisbet Enedolê ev der bi talûketir e."*

Dawî li ser daxwaz û israra dostên kevin kesên wek waliyê kevin yê Wanê Tehsin Beg sala 1922 an di meha Mijdarê de Bediuzeman Seîdê Kurdî çû Enqera.

## Çend mehên li Enqera:

Bediuzeman Seîdê Kurdî bi merasimeke fermî ji aliyê Meclîsa Tirk hate pêşwazîkirin. Êdî ew li meclîsê ye, xebatên wê ji nêz de dişopîne û di nav re jî bi parlamenteran re dabaş û

pirsgirêkên welat nîqaş dike, dîtinên wan digre, yên xwe ji wan re dibêje. Paxav û mitaleyên xwe bîbîr dixe, bala wan dikşîne ser damar û rehên civakî, çandî û pêwistiya bi jibîranekirina stûn û qozîkevirên bineretî, çendnetewiyetiya welat, dînamîkên manewî û nîzameke dadmendane.

Li meclîsê berhemên xwe yên mîna “Hubab” û “Zeylü'l-Hubab* bela dike, projeya Medresulzehra nîqaş dike, parlamenteran li ser vê projeyê, rola wê, çawa dikare bibe xerca di nav gelên li Rojhilata Navîn û herêmê de, bêsekin wan agehdar dike û ji bo qebûla projeya xwe bêrawestan dixebite.

Belê hewa Meclîsê, bername û siyaseta rejîmê nû gelekî dûr e ji raman û dîtinên Bediuzeman Seîdê Kurdî. Rastî û realîteyên dîrokî, sîstemekî Kurdan jî bigre hundurê xwe, mafê kurdan û perwerdeya bi zimanê Kurdî paşguh neke, di destûr û yasayên xwe de misoger bike, bibe gaveke xurt ber bi jianeke di nav wekhevî û bihevrebûneke çendzimanî û çendgelî de, ne di bala vê birêveberiya nû de ye. Bervaja bêhn û pêjna dixwiye mirov bi xwe dihesîne, tirkîtiyeke nîjadperest e, meylên despot û milîtarîst in, projeyên homojenkirin û tirkandineke temam in. Mekanîzme û çerxeke bitalûke, asimîlexwaz û mêjiyekî red û înkarê, sekûlarîzasyoneke yekalî û bi temamî jakoben li dar e, siberoj ne ronak, belê tarî, girîkî û xumam e, ne li xêra gelê Kurd û ne di xizmeta birayetiyê de ye.

Bediuzeman piştgiriya Enqera li dijê dagîrkeriya derve kiribû, hinek hêviyên wî hebûn ji tevgera rizgarîxwazî. Lê du faktoran; yek qetlîama li Koçgîrî û ya duhem jî hevdîtinên veşartî bi Ingilîz û bi Firensiyan re li ba wî dilsariyek jî çêkiribû.

Bediuzemanê bi tecrûbe û xwedî serpêhatî, dûrbîn û şareza dibîne ku bayê vê zihniyetê rabûye û tiştekî bike nemaye, çawa di dema xwe de ji Stenbolê piştî têkoşîna li dijê istîbdada Siltan Evdilhemîd, berê xwe da welatê xwe, vegeriya Wanê, vê carê jî berî ku Evdilhemîdê nû Mistefa Kemal jî mîna deshelatdarê berî xwe tiştekî bîne serê wî, vê carê jî ji paytextê nû, wek yê berî xwe ne li xêra kurdan derket, pişta xwe dayê û vegeriya Kurdistanê.

Naskir ku riya pêşengên rejîmê nû cihê ye, ne riya birayetî û jiyana bi hev re belê riya dîktatoriyeke ne kêmî ya Evdilhemîd, Itîhat û Teraqiyan e û ne mikune bikaribe wan ji vê riyê vegerîne.

Berî Bediuzeman Seîdê Kurdî ji Enqera derkeve di nav hewleke dawî de rêvebirên nû bi şertê ku li Enqera bimîne, mehê 300 lîre meaş, meqamê helî bilind yê Olî, Waiztiya Giştî ya wîlayetên Rojhilat, endamtiya di Şêwirmendiya Olî de ku dirêjayî û dewama Darilhikmet bû û parlamentertî û jiyana di koşkekê de jê re teklîf kirin. Berdevkên Siltan Evdilhemîd jî heman pêşniyaz kiribûn di wextê xwe de.

Belê Seîdê Kurdî çawa diyarî, meqam û meaşên Siltan red kirin, wiha jî pakêta dewleta nû, pakêta rejîmê kemalîstî jî nepejirand û ev bêhurmetî bi pişta destên xwe da aliyekî.

Hewa Enqera ne li gora karekter û sincên wî ye. Nirx û prensîpên wî û yên vê navendê hev nagirin, li hev nabanin, derdê wî ne meqam, şohret, mal û milk e, hişê wî li ser doz û dawên mestir e, ya wî mijûl dike, dide ponijandin ayinde û wêbêya Kurd û Tirkan, nirx û hêjayîyên manewî ne.

Enqera di nav desîse, dek û dolabên xwe de dihêle û li derdora destpêka meha Gulana 1923 an berê xwe dide Wanê.

Helbet kesên dinyaya wan bi awayekî din avabûbû, ji bo wan madiyat û rutbe di ser her tiştî re bûn, tu wate nedidan vî helwestê Bediuzeman Seîdê Kurdî.

Yek ji kesên wihafikir jî biraziyê wî, kurê birayê wî Evdilah, ewladê wî yê manewî Evdirehman Nûrsî ye, ku dibe katibê Meclîsê, li Enqera dimîne, Apê xwe û bavê xwe yê manewî bi tenê dihêle..

Li ser van mehên Bediuzeman Seîdê Kurdî li Meclîsê ye û sebebên qebûlnekirina mana li Enqera, şîrove û dîtin zehf in. Salên dawî çend filîmên ku jiyana Bediuzeman Seîdê Kurdî kirine mijar ji xwe re jî ketin sîneman.

Yek ji van filman ku *Hur Adam*, ango Mirovê Azad e jî behsa van rojên li Meclîsê û diyaloga di nav Bediuzeman û Kemal de dike *. Heçî Bediuzeman bi xwe ye di nivîs û axaftinên salên piştre de dibêje ku ji bo ku ew * Rîsaleyên xwe binîvisîne pêşniyazên Mistefa Kemal nepejirandine û nexwestiye careke din li têkiliyên bi dewletê re vegere *.

Diyar e ne germ e li erkên dewletê, naxwaze van têkiliyan careke din binûve bike, nivîsandina berhemên wî ji bo wî ji meaş û ji meqaman girîngtir e, ew tercîha xwe li aliyê ilim dike, ji dewletê û erkên dewletê dûr dikeve, dixwaze serbest û azad

be û bi vê meqsedê li Wanê derdikeve Çiyayê Erekê, bi çend şagirtên xwe re şikeftekê ji xwe re dike mal û xaniyê jiyanê. Rojên înan dadikeve Mizgefta Nûrşînê.

Du sal di wê navê re derbas dibin nabin, zebaniyên kemalîst davêjin ser şikefta wî. Tank dikevin Wanê, cendirme Çiyayê Erekê dorpêç dikin, gel li dora Bedizûeman Seîdê Kurdî dibe xelek, naxwaze wî teslîm bike. Li gora ku Rohat Alakom ji Muhamed Siddiqî neqil dike di nav gel û Bediuzeman de diyalogeke wiha derbas dibe: *Seyda destûrê bid, em te teslîmê wan nakin, em te derxin derveyî sînor* dibêje. Bediuzeman qebûl nake, derketina derve ne çare ye. Nikarin tiştekî bi min bikin, wê min sirgûnî rojava bikin, belê ez dê heqê xwe heq bikim, Inşeeleh". 63 Rohat ji Muhammed Siddiki neqil dike.

## Careke din sirgûn:

Sal 1925 e, sala raperîna Şêx Seîd e. Dewlet bi hinceta ku Bediuzeman Seîdê Kurdî alîkariyê dide serhildêrên Kurd ji Wanê digre û di ser Trabzon , Stenbol û Sparta re davêje Barla. Seîdê Kurdî tam 8 salan dimîne li Barla û piştre wî li her aliyê Tirkiye digerînin.

Salên li Barla salên zor û dijwar in, xerîb e Bedîûzeman, kesekî nasnake, ji awira temen jî êdî têra xwe navsere û mezin e. Heta berî wî bavêjin vî cihê xewlecî çi dema bêhna wî teng dibû, hewa û atmosfer lê dihate hev, jê re pêsîrtengiyek çêdibû, berê xwe dida welatê xwe, erda bav û kalan, cihê ewle û bahweriyê.

Sirgûna vê carê ne mîna yên berêtir bû, bîst û çar seetan di bin çavdêriyê de bû, coxrafya çûn û hatina wî bisînor û di nav tenêtiyeke tîr û kûr de û bê dost, heval û hogir bû.

Rejîmê Kemalîstî bi vê îzolasyon û tecrîda ku bi hinek aliyên xwe şertên Ocalan li Imralî tîne bîra mirov ji sê tiştan li bendeyî yekê yan jî hersêyan bi hev re bû. Ev jî ya teslîmbûn, ya xwekuştin û yan jî aqil û hişê xwe berdan bû.

Di nav salên 1926-1950 an de bi awayekî bênavber Bediuzeman Seîdê Kurdî hate girtin, di nav zîndanên bajar û herêmên Tirkiye ew birin û anîn, 10- 15 caran hate jehirdayîn, bi her core bêhurmetiyê re rûberû ma û di 10 salên piştre ber bi dawiya temen de heta sala wefata xwe, sala 1960 an jî rojekê negot xwezî bi îro.

Dewletê ew kezebreşî kir, dinya lê kire zilindar û tara bêjingê. Çar aliyên wî kirin ajan. Ji bo yeka wî nebe dudo negot guneh e, şerm e, negot ev mirov di ber me de kete şer, birîndar bû, bi salan li deverên mîna Sibîrya dîl ma, di dema Şerê Rizgariya Neteweyî de bi dil û can li dijê dagîrkeriya Ingilîz, Firensî û her hêzeke din nivîsî, li meydanan axivî û roja namûsê ye got, tim biratî û bihevreyî xwest.

Bediuzeman Seîdê Kurdî bi xwe tiştên deshelatdarên Tirk, kemalîst anîne serê wî bi xwe wiha dadrêşe, em hinekî jî guh bidin gotinên wî xwe bi xwe:

Li ber Dîwanî Herban mehmela caniyan bi min re kirin. Gelo çawa li min dinerin „ min mîna kesekî bêxem û ji xwe re ku bi tenê ji bo azadkirina nefsa xwe kar dike dinerin.

Di temenê xwe yê 80 ê salî de nizanim zewqên dinyayê çi ne, ji zewqên dinyayê tiştekî nasnakim. Giş temenê min di meydanên herbê de, di zîndanên esaretê de, yan jî di zîndanên welat de, li ber dadgehên welat de çû.

Eziyet û êşa min nedîtibe nema, li pêşberî Dadgehên Herbî mehmela caniyan hate dîtin bi min re, mîna serseriyekî bajar bi bajar ez li sirgûnan gerandim, bi heqaretên corecor re hatim himber hev, rûberû mam, roj hat ku hezar caran ji jiyanê zêdetir min mirina xwe xwest.( Ronî 53)

## Salên li Barla

Di heyşt sal û nîvên ku li Barla ye hewil dide roj û şevên xwe bi nivîsandinê dagire. Şertên nû, çepera ji ajan û polîsên xwiya û nexwiya li dora wî mecal û îmkana mijûlahiyeke din nadin.

Ji çaran sisyê nivîsandinên piştre di bin navê Rîsaleyên Nûrê de hatine naskirin li vî mekanê sirgûnê dinîvisîne. Kitêbên bi navên „Sozler", „Mektubat" û; Lemalar" ber û berhemên van salan in.

Bediuzeman bi salan mirovekî/e kurd nabîne, gotineke bi kurdî nabhîze û di nav çend çemberên dijber û nefesçikên de li riyeke jiyanê, mana li ser piyan û destbernedana ji kesayetî, nasname û ramanên xwe digere.

Dijwarî zêde ne, li qirikê ne, bi ser hebûna ewqas nelibarî de cardî bahweriyên xwe diparêze, ji bo nekeve depresyonan, di nav aramiyeke pêxemberane û sebreke Eyûbî de, bi tena serê xwe, bê heval û hogir, li cîhekî nenas, di nav mirovên bişik û

goman de, dibe yek ji mestirîn kelehên berxwedanê di dîroka sirgûnan de.

### Sirgûna di nav sirgûnê de Sala 1934 an.

Sala 1934 an Bediuzeman Seîdê Kurdî ji Barla radikin Sparta, li wur wî digrin dibin Eskişehirê, derdixin ber dadgehê, 11 mehan di zîndana Eskişerhîrê de şikence dikin û şîrê heftrojî di pozên wî re derdixin. Piştre jî wî davêjin aliyê Derya Reş bajarê Kastamoniyê.

Bediuzeman 8 salan jî li Kastamonuyê dispêre hev. Li her cihê dimîne, ne bi tenê bi rabûn û rûniştina xwe, ,bi dîtin û metaneta xwe, belê bi girêdana xwe ya bi temamî cihê jî dibe dabaşa kurtepirst, meraq û baldariyan.

Kinc û lixwekirina wî ya Kurdistanî, şaşik û cubê wî jî ne li gora qanûn û fermanên Kemalîzmê ne, mîna coreyek protesto û neketina qalibê çanda îdeolojiya fermî dixwiyin û ev jî dibe zêdebûna ser kezebê, zêdebûn û beloqtiyeke birêvebirên demê hêrs dike.

Tê gotin ku carekê waliyê Enqera Nevzat Tandgan dixwaze bi Bediuzeman re hev bibîne, belê şertekî wî heye, şert jî ew e ku divê Bediuzeman kinc û şaşika xwe deyne.

Ji bo Beduzeman ev şert ne yê bazarkirinê ye, mîna heqaretekê ye, bersiva wî bihêrs e, kurt û teqez e: *Ev şaşik incex bi vî serî re derdikeve.* Li gora tê gotin sala 1946 an walî xwe bi demaçê dikuje

Bi dû sirgûnên li Eneqera û Çankiri, dadgeha Denizlî tê, ji wur jî wî dişînin Emirdaxê. Sala 1948 an vê carê bi hejmarek şagirtên xwe re ji aliyê dadgeha Afyonê têne cezakirin. Salên piştre piştî 20 mehan cezayê wî û hevalên wî diqede wî cardî li Emirdaxê vedigerînin.

Nerîna Bediuzeman li zîndanê û felsefeya wî ji bo zîndanan jî hêjayê bibîranînê ye: *Zîndan medresa Yusufiye ye*. Hz Yusuf wek zîndaniyê yekem binav dike.

### Serdema Partiya Demokrat (1950-1960)

Gulana 1950 î dema  Partiya Menderes û Celal Bayar hate ser kar û heta Tebaxa 1953 an Bediuzeman Seîdê Kurdî li Emirdaxê bû.

Di serdema vê partî û hikûmeta vê partiyê de jî Bediuzeman Seîdê Kurdî ji serêş û hejên deshelatdarên berê davêtin nav piyên wî, rizgar nebû, nûçeyên bêesil û bêbingeh ku li dijê wî dihatin weşandin kêm nebûn, ji bo giş partî û aliyên dihatin û diçûn ew kurdekî mixalifê sîstem bû, çu caran dewletê bahwerî pê neanî û lê ewle nebû, tim jê bi şik û goman bû. Dadgehên li dijê wî dewam dikirin.

Sala 1951 ê ji ber ku şefqe nedixist serê xwe, şaşika xwe danetanî û ji ber hinek meseleyên din li Emirdaxê ew derxistibûn ber dadgehê.

Ji ber berhema wî ya bi navê * Ji bo Ciwanan Rêber* dadgeha Stenbolê ew 22 ê meha Çile sala 1952 an de da anîn.

Di rûniştineke piştre de sibata bi dû de heman salê cara duhem derxistin ber dadgehê. Salon qelebalix û mişt bû, di dawiya celsê de di nav çepik û tezahuratên beşdaran de Bediuzeman Seîdê Kurdî derket derve, vegeriya Emirdaxê.

Tebaxa 1953 an ji ber dozeke din vê carê dadgeha Sparta bela xwe tê da, ev bûbe dadgeha dawî jî belê çavdêriya li ser wî û taqîbata bi dû de heta sala mirina wî ku sala 1960 î ye jî nesekinî.

**Rêwîtiya dawî û vegera li Kurdistanê:**

35 salên li sirgûnan û şertên zêdeyî taqeta însên li aliyekî û li aliyê din temenê 80 sal derbaskirî têra xwe Bediuzeman westandibûn.

19 ê Adara 1960 î ew êdî giran nexweş bû, ew serwextê rewşa xwe û rojên xwe yên hejmartî bû, nedixwest li erda sirgûnê çavên xwe bigre, bi çi awayî dibe bila bibe dixwest rojên mayî li ser axa welatê xwe, di nav gel û hezkiriyên xwe de temam bike.

Di nav berxwedan û israreke dawî de xwe gihande bajarê Urfa û wek kesekî bighe miradê xwe ev gotin ji devê wî derketin: *Di roja Newrozê de ez gihiştim erda xwe. Cihê min evder e* .( H. Ahmet Turhalli Ozgur Gundem 11.12.2011)

Piştî 2 rojan 23 ê Adarê wefat dike. Roja rakirina cenaze girseyeke mezin beşdar dibe, hazir dibe.

Dema dimre giş malê wî çend lîre ne. Ji xwe ev gotina wî navdar e:

*"Mirovê rewşenbîr divê giş malê xwe bikaribe di buxçikekê de bicîh bike."*

Dema çû ser dilovaniya xwe bi rastî jî giş mal û milkê wî buxçikek jî tunebû.

Havîna 1994 an em gurûbek heyştkesî bi navê YRWK- Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan- li Şamê çûbûn serdana serokê neteweyî birêz Ocalan. Di dema dersdayînê de gotin hate ser rewşenbîran û xislet û dirûvên rewşenbîrtiyê. Min jî di nav diyalogê de ev gotina Bediuzeman Seîdê Kurdî bibîr xist. Li ser vê Birêz Ocalan bersiveke wiha da: yê min bêrîkên min jî tunene.

**Kustah kî ye ?**

Piştî kodetaya Gulana 1960 î çend mehan piştî mirina Bediuzeman çûnta leşkerî cenazê wî ji Gora li Urfa derdixe û davêje cîhekî nenas, piştî dimre jî wî rehet nahêle û ev jî dibe sirgûna piştî mirinê.

Sebebên vê hene. Sebebên di siyasetên deshelatdar û birêvebirên Tirk de bûne zihniyeteke qert, bûne damar û meyleke kurdnasnekir, geneke kinêsvemrêner, ji jor ber bi jêr de ku heta tu bêjî bes fireh qar bûye, şax û per vedane û heta bi cîhekî xwurt civaka Tirk û her koma tirkandî jî rapêçaye, ji wîjdan û her xisleteke însanî ku mirov bikaribe di nav peyva mirwetê de bicîh bike dawerivandiye, hişk û ziwa kiriye, wergerandiye kevirên arpeşk.

Sebeba vê tecawiza di bedena mirovekî mirî de, derxistina ji gora wî û ji awira raya giştî avêtina nav nexwiyayîyekê ew e ku bila rojekê kes riya xwe pê nexe, neçe serdana wî, fatîheyekê lê nexwîne. Tirsa ji bedeneke mirî ew bû ku xwediyê bedenê wê ji bo gelê kurd, ji bo şagirt û telebên wî û her kesê hez jê dikir bibûya ziyaretgehek. Hedef ew bû ku têkiliya wî ya manewî bi temamî bi girseyên gel re bibirîn, wî noqî nav jibîrabûneke heta bi heta bikin.

Îca tu ji kîjan alî û awirê lê binerî biner, ev tu dixwazî olî yan jî bila sekulerî be, coreyeke kufrî, mizawirî û gunehkariyek e, nerewayî û neheqiyeke mezin e.

Lewra ji wê xwezatir tune ku xwediyên kesê mirî û gelê ew kes mensûbê wî ye zanibin miriyê wan li ku ye û pêwiste ev jî ne bi

tenê Kurdan belê gerek Tirkan jî têkilidar bike, lewra meseleyeke însanî ye.

Ev selahiyeta bê sînor ku dewleta Tirk dide xwe û bikar tîne û dema ev dewlet dixwaze, wiha mafên mirovan dixe bin piyan gerek qebûl nebe, dewletek nikare xwedî ewçend seahiyetên bêsînor û bêdawî be.

Bediuzeman Seîdê Kurdî ev dewlet bi dirêjaya temen û bi biha û bedêla bisedan ezmûnên xwe baş nas dikir, çend e û çawa ye, çendî bêperwa, sînornasnekir, jiserxweçûyî, texî û baxî ye, çendî qedirnenas, bêwefa û bêsedaqet e, bi gotineke kurdan çendî *nan û ava wê li ser çogên wê ye* bi her movik û her avdeya xwe ji her kesî kûrtir nas dikir.

Her qonax ji qonaxa jiyan û temenê Bediuzeman Seîdê Kurdî ji karekterê hikûmet û deshelatdarên dewleta Tirk re û xezeb û rika wan beramber rewşenbîr û zanayên Kurd tije belge û şahdebûn e.

Serwext û çeknasê vî karekter û vê gena xwedênenas Bediuzeman Seîdê Kurdî, di rojên xwe yên dawî de nexwest li xerîbistanê, li şûn û wareke ku ne bi dil û riza xwe lê bicîh bûbû serê xwe deyne, here ser dilovaniya xwe. Bi vê mebest û ramanê bi israr û bi nehênî, bi ser nexweşiya xwe ya giran de xwe gihande bajarê Urfa, cih û warê pêxemberan ku ev jî dihat wateya bicîhhatina yek ji bingehtirîn wesyetên wî.

Bediuzeman Seîdê Kurdî gorek dixwest û ev jî li Kurdistanê, ne li cîheke din, goreke binav û nîşan, xwiya û diyar û ji awira raya giştî, raya gelê Kurd naskirî, vekirî ji serdan, fatîhe û binûvekirina têkiliyan re.

Belê tu li Fethulah Gulen binerî Bediuzeman Seîdê Kurdî nexwestiye ku kes gora wî zanibe û wiha gotiye: *Bila gora min nenas be, bila kes nizanibe* !

Xedêgiravî ev wasyeta Bediuzeman e.

Ne ev bi tenê yeke din jî heye : *pirskirina li gora ustad kustahtî ye* dibêje Fethulah Gulen.

Bediuzeman ev wesiyet li kê, li ku û kengî kiriye li tu deran di tu belge û wesîqeyan de tune, cihê derketin û gotinê, afrandin û bilaşûgewdbûnê bin serê Gulen Xoce ye.

Li aliyekî ew daxwaza sift û tîr, bêhedan, bênavcî û bênîqaş ji bo xwegihandina welatê bav û kalan û li aliyê din ev derewa ku * bila kes nizanibe gora min li ku ye* çendî li hev dikin, çendî mikun in.

Îca divê careke din pirsa *kî kustah e ?* bê pirsîn: Gelo gelê li gor û qebra Bediuzeman Seîdê Kurdî dipirse yan Fethulah Gulen ?

Kurdên li gorên Şêx Seîd, Seyid Riza û bi dehhezaran gorên faîlên wan ne diyar yên doh û yên îro dipirsin yan Fethulah Gulen kustah e ?

Bêdudilî û yekser divê bê gotin ku kustah ne gel, ne Kurd, ne xizim û merevên winda û gornediyaran, belê Fethulah Gulen bi xwe û ne keseke din e.

Gelê Kurd û xizmên Bediuzeman Seîdê Kurdî pêwiste ji dû dewletê venegerin û dewlet ne bi tenê divê cihê Bediuzeman Seîdê Kurdî ji raya giştî re bêje, belê herwiha pêwiste ne carekê bi sedan car lêborîna xwe jî, ewil ji gelê Kurd û piştre ji her mirovê ji miriyan re bihurmet re bixwaze.

**Dawî .**

Li gora di bîra me de maye sala 1983 an li Iraqê xebat û lêkolînek hatiye kirin ku tê de behsa 506 alimên Kurd ku ji îslamê re xizmeta kirine heye.

Bediuzeman Seîdê Kurdî jî ku ji vê hejmarê ye û di serê lîstê de tê, gerek bi têr û tijeyî bê naskirin, li ser ramanên wî, jiyan û qonaxên jiyana wî hewcedarî bi lêkolînên berfireh û kûr heye. Xizmetên wî yên di destpêka sedsalê de ji bo pêşketina tegerarizgarxwazî ya kurdî, bi taybetî berhemên wî, Rîsale û kuliyatên wî pêwiste bên dîraset kirin.

Cihê wî buhuşt be.

**Têbiînî:**

Tiştên ez ji bo Bediuzeman Seîdê Kurdî bêjim ne ev bi tenê ne. Adara li pêşiya me wê di ser wefata wî re 53 sal derbas bibin. Bi hêviya ku em dê dîtinên xwe li ser her aliyê wî di pirtûkeke bi serûbertir de formûle bikim, xwendinxweş.

Hagen
Kanûna 2012´an

## Hevpeyvîn

**Medenî Ferho**

***Pirs 1:*** *Em xwe baş nasnakin, ya qet, ya jî kêm û nîvrê nas dikin. Navê Seîdê Kurdî, Seîdê Nûrsî, yek ji wan navan e ku di serê lîsteya navên navdar de cîh digre, ev bêşik e. Belê em kurd çendî wî nas dikin bişik û bigoman e.*

*Mebesta me ji vê hevpeyvînê ew e ku em zatekî mezin, kesayetiyeke xwe, Bedîuzemanê Kurd bi alîkariya kesên xwedîgotin baştir nas bikin.*

*Nivîskar Cemalettin Canli, „Bo ku Seîdê Nûrsî bête fêmkirin, divê Kurdistana sedsala 19´emîn bête fêmkirin. Divê hewldanên terîqên wê demê bêne fêmkirin. „(NETKURD, 2010-09-25) dibêje. Gelo ev şert e, hûn çendî bi vê dîtinê re ne?*

**Bersiv 1:** Komarek Hovanger, tenê dikare bibe çavkaniya kiryarên hovane. Lewma bersiva vê pirsê gelekî zor e. Ji ber ku, di dîroka Komara Tirkiyê de, kesên mîna Bedîûzeman, yan jî Seîdê Kurdî, di 'Bihuşta lanetkirî' de dîl hatine girtin. Ev siyaseta taybet ya Îtihat û Teraqî ye û îro jî di rengekî hişktir û dijwartir de tê meşandin. Wek toreyekê ye, ev zihniyet, belgeyan ji holê radike, vedişêre û bablîsoka gotinên neweyî, yanî derew hildidêre. Tiştekî bi belge nabêjin, lê gotinan digerînin, didine gotin û wan kesên hedef digirin di "Bihuşta Lenetkîrî" de dîl digirin.

Seîdê Nursî, Seîdê Kurdî, Bedîûzeman, Ustad, Mamoste, Mîrzayê dilsozan jî yek ji van kesan e. Mîratzedeyên vê îdeolojiya hişk û dijwar, Kovarek Hovangeh ava kirine. Tê zanîn ku, yek murşîd, şêx, terîqet, mîrzayê bawermendiyê ji nava Tirkan derneketiye. Teva Kurd in, faris in. Murşîdên Kurd, ji "agirî suzan ne reviya ne", lê gelek ji wan teslîm bûne û ketine xizmeta ideolojiya fermî. Îdeolojiya fermî ya dewleta Tirk jî, dest avêtine murşîdên kurd, gotinên wan, nirxandinên wan guhertine û li gorî xwe bikaranîne.

Seîdê Kurdî, di jiyana xwe ya tejî têkoşîn de, yek kultur, yek gel ne kiriye hedefa xwe, ne parastiye û ji bo yek gelî têkoşîn nekiriye. Ji ber ku, bi hiş û ramanekî kûr û fereh, bi

hişmendiyeke pirr alî û bêsînor haraket kiriye. Misilmantî, yan jî îslamiyet wek sîwana her gelî, her nifşî dîtiye û wisa bikar jî aniye. Tucaran gelê Kurd înkar nekiriye, wajî wê, zimanê Kurd, kultura Kurd dibin sîwana misilmantiyê de parastiye. Hebûna zimanê Kurdî, erebî û Tirkî, di cîhana Osmanî de û di Komara Tirkiyê de, parastiye.

Du mînakên balkêş hene: Yek di dema bersiv daye Şêx Seîd û gotiye, "hişmendiya min û gotinên min, ew doza ku cenabê we li pey diçe wê bîne cih" e. Ya din jî, di nîqaşa "taybetmendî, kesayetî û xweparêzî" de diyar e.

Ji ber ku ev axaftina Mîrzayê baweriyê, wek "Tarîx-î Hayat" tê binavkirin û hişmendiya wî ya parastina kulturên cûda, nifşên cûda destnîşan dike. Li ser nîqaşa mekanê kesayetî, qutbê baweriyê Seîdê Kurdî wiha dibêje; "Divê ku em fêrî jiyana hevreyî bibin." Gelo pêdiviya şîrove kirina van gotinan heye?

Ev gotinên Mîrzayê baweriyê didine xuyakirin ku, "xizmet-î Nurîye, malê Tirkîtiyê, malê Erebîtiyê nîne. Nijadperestî red kiriye. Seîdî Kurdî, yek ji qurbanê hişmendiya nijadperestiya kujerî ye. Eger em dêhnê xwe bidin kiryarên Tirkan ya li hemberî Seîdê Kurd, ne tenê "Rîsaleyî Nûr" guhertine, hişmendî, kesayetî, bawerî û dilsoziya wî ya mezin, di "Bihuşta lanetkirî" de xwestine bikujin.

> ***Pirs 2:*** *Mîna tê zanîn seydayê giranbiha bi dirêjayiya temenê xwe hejmarek nav bikaranîne wek Seîdê Kurdî, Seîdê Nûrsî, Said Mirza Efendi û hwd. gelek caran jî bi navê Bediûzeman behsa wî dibe. Em dixwazin li ser van navan dîtinên we bigrin û bizanin têkiliya navên bi kar anîne û demê çendî bi hev re heye?*

**Bersiv 2:** Alîgir û dilsozên li pey Bedîûzeman, dema ku navê "bedîî" bikar tînin, mûrşîdiya Seîdê Kurdî jî, bi awayê rastî û maqul qebûl dikin. Ji ber ku "bedîî", delalî, paqijî, ronahiya her kesî û lehengê dilsoziya mînak ya her kesî ye. Ev nav, ji aliyê mûrşîdekî Kurd ve layiqî wî hatiye dîtin. Bi vê mebestê Seîdê Kurdî wek ku tê gotin, ne propagendîstê gelê Tirk, ne yê gelê Ereb e, û tucaran Kurdîtiya xwe jî red ne kiriye. Ji navê Seîdê Kurdî û Seîdê Nûrsî jî bextewar û serbilind e. Dema murşîd digihêjin "fena-fellah" yan jî digihêjin "murşîdiya bedîî" kohn û binyata bi dilsozî yad dikin. Ev xislet di tevahiya mûrşîdên olî yên Kurd de heye. Weysel Qaranî, bi gotinên cenabê Muhamed

serxoş nebûye û dilsoziya xwe terk nekiriye, wek Kurdekî jî maye.

Di heyama Seîdê Kurdî de, tevger û hewldanên netewiyetê zêde ne. Di nava sinorên Emperetoriya Osmanî de, gelên cûda li dora îdeolojiya netewiyeta xwe rêxistiniyên xwe pêkanîne. Kurd jî di heman çarçovê de xwe rêxistinî dikin. Serokê Cemiyeta Tealî ya Kurd li Stembolê ehfadê Şêx Ubeydullah e û serkeşekî terîqata Neqşîbendiyan e.

Dîse, kurên Şêx Ubeydullah Seyyit Mehmet, Seyyit Abdullah û nebiyê Şêx Ubeydullah Seyyit Tahir di heman rêxistinê de serokatî û rêvebiriyê dikin. Tê zanîn ku, Cemiyeta Tealî ya Kurd, çekdariyê naparêze. Seîdî Kurdî jî, di vî fikrî de ye. Û bi gotina wî, dema "Seîdê Kevin" ku heta 45 saliya wî dewam dike; siyasetê wek çekê serketinê bikar tîne. Ev tê wateya ku Seîdê Kurdî, ligel misilmantî, murşîdî û bedîî'tiya xwe, şervan e, şerê serketinê jî di siyasetê de diparêze. Dîtina wî ya "siyaset çek e" terk nekiriye.

Lê, Seîdê Kurdî, xisleta xwe ya evîndariya ligel mirovan jî (komunîst ne di nav de) heta dawiyê parastiye..

Hinek kes û derdor, sê demên wî "Seîdê kevin", "Seîdê Nû" û "Seîdê Sêyemîn", şaş şîrove dikin, yan jî li gorî armanca xwe ya siyasî dinirxînin. Ev, xiyaneta li hemberî Bedîî'tiya Seîdê Kurdî ye. Ji ber ku Seîdê Kurdî, xwe pêş dixe, lê dil û hestê wî di her dem û heyaman de weke hev in.

Ji ber ku Seîdê kevin bi Kurdîtiyê re zêde têkildar e, hinek "akl-i selîmên taze", dixwazin, her du demên Seîdê Kurdî wajî bikin. Lê ne wisa ye. Ji ber ku Pirtûka Şêx Abdulqadirê Gêylanî, ku kurdîtiyê dike bingeha jiyana xwe, lê misilmantiyê jî evîndariya Xweda di qada herî bilind de diparêze, wek mîlada "Seîdê Nû" bi nav dike. Ji ber ku, pirtûka Abdulkadir Geylanî ya bi navê "Futuhul-ul Gayb", di mûrşîdiya wî de dibe qonaxa duyemîn ya "fen-î fellah" û "îlhamê".

Akl-i selîmên taze, berê Seîdê Kurdî didine nijadarestiyê, yan jî berê wî didine xiyaneta bi gelê Kurd re, ev gunehkariya li hemberî Bedîûzemanê Kurdî ye.

Di gera li Kurdîstan û cîhanê de, piştî têkiliya bi civak û aliman re, navên cûda lê têne kirin. Her gera wî, her têkiliya wî dibe sedema navekî nû. Ev tê wateya kûratiya têgihiştin, zanistiya wî. Navên wî ji detspêkê heta dawî jî, li gorî lîteretura Zimanê

Kurdî û kultura kurdî ne; Mele Seîd, Mele Seîdê Meşhur, Seîdê Nursî, Seîdê Kurdî û dawî jî Bedîûzeman.

Eger em li seyra navên wî binêrin, bi giştî seyra perwerdehiya di medreseyên Kurdî de xuya dibe. Piştre, ku di pirtûkxaneyên rayedarên wê demê de rastî zanista feylesofiya cîhanê dibe, hiş û ramanê wî tê guhertin. Hingî fikrê Zanîngehê di serê wî de peyde dibe. Fêm dike ku çavkaniyên zanist û hişmendiya pêşketî zanist in, Medresa nikarin bibin bersiva demê. Dîsa jî, navên wî yên li gorî lîteretûra hiyerarşiya ola Îslama Kurdî, nayên guhertin .

Baş tê zanîn ku di perwerdehiya zarokên li medreseyên Kurdîstanê de, gera li herêman dixwaze û wek pêdiviyek bingehîn ya gihiştina "îlmanî" ye. Ev ger hinekî lêgerîna li zanistê ye. Ji ber ku her medrese, li gorî hêza murşîdê xwe, xwedî hêz e. Di destpêka gundê Taxê û feqetiya li ber destê Mele Mihamed Emîn û piştre lêgerîna Seîdê Kurdî, ya zanista felsefîk, di vê çarçovê de pêş dikeve.

Di vê demê de, zimanê Kurdî bi tîpên erebî jî bikartîne. Mixabin, ew belge hîna derneketina holê.

Seîdê Kurdî wek evîndarê fêrbûna zanistê ye û ne tenê li Medreseyan, qista cem Meleyên Meşhur, yên weke Mele Fethullah, weke Şêx Mehmet Celali dike. Her çûna Seîdê Nursî ya li van cihên ji hev cûda, di navbera 3 meh û salekê de têne guhertin. Her ger, her serdan û mana li wargehekî cûda, tiştekî cûda, zanist û tecrûbeyeke cûda didiyê. Di encama lêgerîn û komkirin û têgihiştina zanista kûr û fereh de, Mele Fetullah, navê Mele Seîd diguhere û navê Bedîûzeman lê dike. Bedîî, yanî ronahiya demê, dilxweşî, delaliya demê.

Medrese, her dem bûne çavkaniya kurdîtî, parastina kultur û afirgeriya berhemên edebiyata Kurdî. Bûne xwedî kirina netewparêziya Kurdî..

Ev navê ku wek lehengî, ronahî, bedewî û delaliya zanista ola îslamî, ku Mele Fetullah li Seîdê Kurdî dike, dibe sedema êrîşên li dijî wî. Ev dijberî di paşerojan de dibe, "baxçeyê lanetkîrî."

Lê balkêş e, dema mirov jiyana  Seîdê Kurdî dixwîne, jiyana Ibnî Sîna tê bîra mirov. Tenê cûdatiyek heye; Seîdê Kurdî ji desthilatdaran nareve. Lê Ibn-î Sîna, bi gotina Ibn-î Haldun, her dem ji "agir-î sûzan" reviya ye. Ibn-î Haldun jî heman

lewaziyê nîşan dide. Her çiqasî pîşeyê van zanistan ji hev cûda be jî, destîniya wan ya ligel desthiladaran mîna hev e.

Helbet ev cihê nîqaşê ye ku, were pirsîn: Gelo pêwist e, zanist weke Ibnî Sîna, weke Ibn-î Haldun ji "agir-î sûzan" birevin; yan weke Seîdê Kurdî têkoşînê bikin.

> ***Pirs 3:*** *Dîroknasên jiyana Seîdê Kurdî, dibêjin ku wî qet ji kesekî pirs nekirine û di nîqaş û minazereyên di nav wî û aliman de tim serdest bûye.*
>
> *Heta tê gotin ku dema di salên Meşrûtiyeta II. de, pêlakê li otêleke Stenbolê maye û li ser deriyê xwe jî ev îbare nivîsandiye:*
>
> *"Li vir pirs nayên kirin, bersiva pirsan tê dayin". Ev çendî rast û çendî rîwayet in, şîroveya we?*

**Bersiv 3:** Me di pirsa berî vê de wateya "Bedîî" bi kurtî be jî anî ziman. Sedema ku navê Bedîûzeman lê hatiye kirin, me bi hevokekê şîrove kir. Navê "Mîrê Dilsozan"jî tê wateya ku ew dide û rêzantiyê dikê ye. Lê rêzantî û dayina wî, di radeya "DA, HU-DA, MAZ-DA"î de ye. Ev gotin teva têgihîştina fena-fellah ya vekirina "dergehê al-î Hûda" ye û ji "agir-î sûzan" natirse.

Seîdê Kurdî, di dema ku daxwaza wî ya vekirina zanîngeha Medresetul-Zehra, û dersdana bi zimanê Kurdî, Osmanî û Erebî nayê erêkirin, ji Bab-i Alî dixeyide û dûr dikeve. Li odeyekê ji ya Xana Şekercî bi cih dibe û li devê deriyê xwe, qotina "Li vir bersiva her cûre pirsan tê dayin, her mişkûl têne halkirin, lê pirs nayên kirin" dimivîsîne. Li gorî Risaleyî Nûr (risale 41ê) ev gotin rast e. Li gorî min, Seîdê Kurdî, xwestiye ku hêza xwe ya zanistî û "têgihîştina mûrşîdî" şanî desthilatdarên demê bide. Ji ber ku daxwaza sazkirina zanîngehê, bi telkîna Şêx-ul Îslam û ulemayên wê demê, ji aliyê Abdulhemîd ve tê redkirin. Lewma, ji Bab-î Alî dûr dikeve û li odeya Xana Şekercî bi cih dibe. Hewqasî dagirtî û bi hêrsa siyasî û mûrşîdî dagirtiye ku, bi tenê jî be, xwe wek hêzeke li dijî Abdulhemîd dibîne.

Seîdî Nursî, Bedîûzeman, yan jî Seîdî Kurdî, wek şêxekî, wek murşîdekî teslîmî demê û desthilatdaran nabe. Di dema daxwaznameya sazkariya Zanîngehê de, bi cil û bergên Kurdî, serbenda kulavî û xencera di ber piştê de diçe Bab-î Alî. Ev jî bersiva her cûre gotinên derbarê Bedîûzeman de ye.

Di hewldan û tevgera Seîdî Kurdî de, di çûna Selanîkê de jî, tê xuyakirin ku ew biqasî murşîdiya xwe ya olî, mirovekî siyasî ye jî. Lê tucaran Tirkîtî, weke "aîdiyeta" di ser Kurdî re nedîtiye û nijadek serdestî nijada din nekiriye.

> ***Pirs 4:*** *Aliyekî din yê Seîdê Kurdî ku mirov li ba piraniya alimên olî yên welatê me û gelê Rojhilata Navîn nabîne ew e ku di ber pirtûkên olî re gelek pirtûkên zanyarî jî xwendine, ev pirtûk çi bûn, çawa pêyde dikirin û kengê bi giranî xwendine, hûn dikarin xwendevanên me serwext bikin?*

**Bersiv 4:** Aliyê mûrşîdê mezin, Seîdê Kurdî, di daxwaza sazkirina zanîngeha Medresetul-Zehra de (Rîsale-î Nur 47) xuya dike. Du aliyên bingehîn yê vê armancê hene. Yek; Bedîuzaman dixwaze li Kurdîstanê û li welatê xwe xizmeta kulturî bike. Du; Seîdê Kurdî, dixwaze li xaka ku "îrfan jê girtiye û navê bedîî jê re layik hatiye dîtin" xizmetê bike û zanista ol û fenê, kultura rojava û rojhilat bi hev re bela bike. (Tê zanîn ku Seîdê Kurdî di Cemiyet-î Muderişîn û Cemiyeta Kurd Neşr-î Maarîf de jî cih digire.)

Seîdê Nursî, piştî ku bi payeberziya BEDÎÎ tê xelatgîrkirin bi demekê, li ser daxwaza Waliyê Wanê Hesen Paşa têkildarî "rîcalê dewletê" dibe. Piştî Hesen Paşa Tahîr Paşa dibe waliyê Wanê. Tahîr Paşa xwedî kutupxaneyeke dewlemend e. Bedîîûzeman, yekemîn car li pirtûkxaneya Tahîr Paşa têkildarî zanista fen dibe û fizîk, kimya, cografya, astronomî û felsefê dixwîne. Bîrdoza Kopernîk gelekî bala wî dikişîne.

Seîdê Kurdî, piştî redkirina Zanîngeha li Wanê, ji bo têkoşîna li dijî Abdulhemîd diçe Selanîkê, yanî bajarê ku weke navenda kultura wê demê tê zanîn. Ev jî dibe sedema ku asoyên bîr û baweriya wî berfirehtir bibin.

Bi vê mebestê, li wir, ji bo zanîngeha li Wanê jî kete nava tevgereke mezin.

Mirov dikare bêje ku di gihîştin û fêrbûna mirovan de, "Bihuşt û dojeh", "guneh û xêr" tenê ne bes in. Pêdiviya her mirovî bi zanistên pozîtîf heye û bi delîlên ku mirov bidin bawer kirin jî heye. Ev hişmendiya mezin bûye sedema ku Mehmed Akîf bêje; " Viktor Hugo, Shekspeare, Dekart, di edebiyat û felsefê de dikarin bibin şagirtê Bedîûzeman."

Min li jor jî got, Seîdê Kurdî, nirxekî giranbiha dide rêxistinîbûnê. Ji ber ku di têkildariya entelektuelî û fîlozofiya Ewropa de dibîne ku, rêxistinîbûn û karên kolektîfî bingeha serketinê ye. Bi vê mebestê di nava rêxisitnan de cih digire. Seîdê Kurdî, di nava Cemîyeta Kurdîstan Teali û Kurt Neşriyatê de cih digire. Sala wê jî giring e 1918. Ev salên dawî ya şerê yekemîn yê cîhanê ye, rojên Peymana Mondorosê ye. Rapora Hêzên hewayê yên Ingilîzan ku li Baxdatê tê nivîsandin, dibêje ku Seîdê Kurdî, di nava Cemaeta Kurd Tealî de cih digire û Kurdan li dijî Tirkan teşwîkî têkoşîna serxwebûnê dike. (Risaleyî Nûr 64). Dîse di rêxisitna Fikra-î Muhemmediyê de, di rêxistina Darul-Hîmet-ûl Îslamiye de jî cih digire. (Rîsale-î Nûr 64)

> ***Pirs 5:*** *Xisleteke din hêza jiberkirinê ye, hinek behsa 90 cildên jiberkirî dikin, tiştekî wiha mimkûn e, ev çendî efsanekirin û çendî rast e?*

**Bersiv 5:** Na, ne efsane ye û ne jî dûrî aqilan e. Me di jiyana xwe de jî gelek mirovên wiha ku di zarokatiya xwe de, bi hêzeke balkêş û kozmîk qur'an ezber kirine dîtine. Xelata mezin ku tenê ji bo kesên di gihiştina 'fenafellah' de, di heyamên taybet de derdikevin holê dikarin bidest bixin. Ev paye xelata mezin e. Payeya "BEDÎÎ" ji xelata Nobelê bi gelekî mezintir e û li gorî xisletên taybet yên Mele Seîd hatiye dayin. Piştî vê payeyê navê Mele Sêîd nema hatiye bikaranîn.

Di heman çarçovê de, payeya "Kurdî" paydariya temsîliya gelê Kurd e û xelateke mezin e. Ji sedema Kurdîtiya wî jê re layik hatiye dîtin.

Seîdê Kurdî, di pêvajoya xwendina xwe û çûna medresyan de jî dide xuyakirin ku zanebûna gelek seyda, mele, murşîdan têra wî nake. Dawî, Mele Fetullah li hemberî hiş û ramanê Seîdê Kurdî bêmecal dimîne û bi cesareteke mezin payeyea BEDÎÎ didiye û bi navê Bedîûzeman bangî wî dike. Ji aliyê her kesî ve jî (Tirk jî di nav de) tê qebûlkirin.

Wek mînak: Seîdê Kurdî di jiyana xwe de yek carê, xutbê dixwîne. Lê ev xutbeya ku di sala 1911´an de, li Şamê di Mizgefta Emewî dide, cemaet ji axaftinên wî hêbet digire. Piştre ew xutbeya wî, dibin navê "Xutbeya Emewiye" de dibê pirtûk

> ***Pirs 6:*** *Dema çûye ba Siltan Evdilhemîd ji bo vekirina zanîngehekê mîna El Ezhera li Misrê, dibêjin ku di nav*

*daxwazên wî de xwendina dersên pozîtîv li dibistanan jî hebûye, da ku rê li teesubê bigre. Encamên vê hevdîtinê çawa bûn di vê derbarê de şîroveyên we?*

**Bersiv 6:** Min bersiva vê pirsê, di bersivên berî niha de da û Seîdê Kurdî di Rûsale-î Nûr 47 de, behsa vê mijarê dike. Ji ber ku, di pêşniyaznameya xwe de, gotiye ku ew ê zanistiya şerq û xerbê, olî û fenî, dersên cografya, fizîk, kimye, felsefê û hwd bide. Seîdê Kurdî ligel guhertinan e û pêşketin û nûjeniyan destek dike. Dema ku Meşrûtiyeta Duyem'în (1908) hate îlankirin, qesta Stembolê dike û di rojnameya Volkan de dest bi nivîsan dike.

Gotinên wî ku dibêje. "Min di destpêka Meşrûtiyetê de ji 50-60 eşîrên Kurd re telgraf şandin û min bang li wan kir ku li azadiya xwe xwedî derbikevin. Min ew xafil nehiştin, şiyar kirin. Ji ber ku min ne gotiye, ya min çi, min kujerî nekiriye. Encama vê şiyarkirina min, ez dame mahkemê."

Gelo ev ne bese ku îdeolojiya fermî ya Tirk, Seîdê Kurdî wek Kurdekî bibîne û tecrîd bike?

***Pirs 7:** Diyaloga di navbera Seîdê Kurdî û serokê dadgehê de li Stenbolê bi serê xwe hêjayê lêkolînekê ye. Gelo ev diyaloga temam û pirs û bersivên dualî, hene, pêyde dibin li derekê?*

**Bersiv 7:** Baş tê zanîn ku belgeyên di arşîvên Osmaniyan de, wek mîrateyek "nehîbê" ketin destê Komarê û weke "sirrê sedsalê" têne veşartin.

Dîsa em teva dizanin ku, axaftin, not, nivîs û pirtûkên Seîdê Kurdî, peşî hatine veşartin, hatine qedexekirin, piştre hatine guhertin. Ev guhertin jî di çaçoveya Tirkîtiya Spî û Bîrdoza Îslama Tirkî de pêk hatine. Teva derew in û li dijî hişmendî û hewngiriya Seîdê Kurdî ne.

Tê zanîn ku Seîdê Kurdî, di Dîwanî Harb-î Orfî de, (13 Nîsan 1909) parastina xwe de, 11 xalan derdixe pêş. Di xala yekemîn de, têkilî û qewêtiya wî ya bi eşîrên Kurd re ye. Xala sêyemîn jî, ew e ku dibêje, "20 hezar hemşehriyên min li Stembolê hene û min guhertina hemdemî (Meşrûtiyet) telkînî wan kiriye. Dijminê me cehalet, zarûret û ihtîlaf e, min jî li dijî wan sê dijminan şer kir." Gelo îdeolojiya fermî, bi gotinan mahkum nabe? Seîdê Kurdî di heman parastinê de, dibêje, "şerîet li dijî îstîbdadê ye û bi navê şerîetê min meşrûtiyet, bi

çepikan himbêz kir.” Ev jî, rastiya ku nijadperestiyê, kevneperestiyê red dike û mahkum dike, derdixe pêş.

Guman dikim ku ev çend gotinên derbarê îrşada Seîdê Kurdî de, ritil û qopana mêjiyê wî destnîşan dikin.

> ***Pirs 8:*** *Têkiliya wî bi hinek rewşenbîrên Kurd, yên Tirk mîna Mehmet Akif Ersoy, rêxistina Itihat û Teraki jî aliyekî din yê jînenîgariya wî ye, di vê derbarê de, ango di derbarê têkiliyên bi alim û zanayên gelên din yên di bin destên Împeretoriya Osmanî de hûn dê karibin çi bibêjin?*

**Bersiv 8:** Bi yek hevokê jî mirov dikare cûdatiya Seîdê Kurdî û Mehmet Akîf Ersoy bîne ziman; Seîdê Kurdî nifşek (gel) di ser nifşekî din re ne dîtiye û navê “Mihemed”, “îslam”, “Qur’an” wek malê her gelî dîtiye. Lê Mehmed Akîf Ersoy, mîna di Merşa Neteweyî ya Tirk de “stêrika gelê Tirk û serdestiya Tirkîtiyê” diparêze, ev nirxê pîroz winda kiriye. Ev taybetmendiya her Tirkî ye. Lê ya balkêş ew e ku, îdeolojiya fermî ya Tirk, her dem li gel zanist, murşîd û navdarekî Kurd, ku mohra xwe li demê dabe û nikaribin bikin Tirk, Tirkekî diber re radikin.

Mijara duyemîn ya cûdatiya Seîdê Kurdî û Mehmed Akîf; ewe ku; Seîdê Kurdî, têkoşîna li dijî zordestiyê dibin her cûre hoy û mercan de meşandiye. Lê Mehmed Akîf, ji “agir-î suzan” reviyaye û ji bo demekê ketiye nava ketumiyê û “înzîwa” demdirêj de razaye.

Wek mînak; li ser navê Seîdî Kurdî dibêjin; wî (Seîdê Kurdî), ji Şêx Seîd re gotiye, gelê Tirk bi milyonan welî mezin kirine û xizmeta îslamiyetê kirine.” Ev ne rast e. Ji ber ku: Gelo Seîdê Kurdî, ku bi payeberziya mûrşîdî û BEDÎÎ, hatiye xelatgîrkirin, nizane ku ji nava Tirkan yek welî (ji bilî Bektaşî Welî) bi tenê derneketiye? Bi vê mebestê, gotinên Tirkan, lêkolînên Tirkan mîna nivîsên prof. û mamostayên zanîngehên Tirk, lêkolînên prof. ên Tirk ne rats in. Ji ber ku zanîngeh çavkaniyên xwedîkirina nijadparestiya Tirkîtiyê ne û aşê hêrtin, tunekirin û inkara, rastiya gelên din e. Lewma bîrdozên wan ji %89, ne muteber in. Mînakên wê hene ku, prof.ên Tirk pirtûkên zanistên Ewropiyan tercume kirina û wek bîrdoza xwe pêşkêş kirine. (Yek ji va Prof. Dr. Ihsan Dogramaci, yê din jî Prof. Dr Turhan Feyzioglu) ye.

Mehmed Akif Ersoy, zêde zêde pesindariya Bedîûzeman dide. Seîdê Kurdî, weke mamostayê Viktor Hugo, Shekspeare,

Dekart bi nav dike. Seîdê Kurdî weke mirovê di teorî û pratîkê de “mirovê xas û xwedî xisletên taybet bi nav dike.

Baş tê zanîn ku di dema Osmaniyan de, pêdivî bi “tefekkûrê” nîne, ulema jî li gorî Qur’anê tevgeriyane û tiştekî ji xwe nedane civakê, nedane olê îslamî jî. Hişmendî û hêza Osmaniyan “futuhat” e û banga “haydîn em biçin Sêva Sor” e. Lê kesên weke Mewlana, Şemsiyê Tebrîzî, (em dikarin bêjin Hallacê Mensur) weke Seîdê Kurdî, ev hişmendî erê nekirine. Lê teva jî ne Tirk in. Di derya zanistê de avjenî kirine. Mewlana bi desthilatdariyê re hemraman bûye, Şemsî ji “agir-î sûzan” reviya ye, Seîdê Kurdî li dijî desthilatdariyan têkoşîn kiriye.

> ***Pirs 9:*** *Herwiha tê gotin ku pêşniyazek ji bo kurdistaneke serbixwe ji aliyê Serokê Kurt Teali Cemiyeti`yê Seyid Abdulqadir jî hatiye jê re û bersiva wî jî red kiriye. Wek sebeb jî misilmantiya gelê tirk daye xuyakirin, bingehê vê?*

**Bersiv 9:** Bersiva vê pirsê di bersivên berî vê de hatiye dayin.

Tenê dixwazim bêjim ku Seîdê Kurdî serkêş e, lehengê ku ji bilî xwe pê de tu serkêş û lehengan qebûl nakê ye. Ji hiş û ramanê xwe hewqasî ewle ye ku tenêya serê xwe, xwe wek artêşekê, wek saziyeke têkoşer dibîne.

Di têkiliyên bi Cemiyeta Kurd Tealî re jî ev xisleta Seîdê Kurdî ya Kurdperwerî derdikevê pêş. Balkêş e ku nebiyên Şêx Ubeydullah gelekî lewaz dibîne. Bersiva wî nadin, bersiva pêvajoyê nadin û li hemberî pêşketinên demê lewaz dimînin, ji wan dûr dikeve.

Di têkiliyên bi Mustafa Kemal re jî heman tişt xuya dikin. Berî komarê û piştî komarê, gelek pêşniyaz jê re hatine kirin, lê teva red kirine. Di sala 1923´an de, pêşniyazên Mustafa Kemal, di heman çaçrovê de red dike û diçe Wanê. Lê divê neyê zanîn ku çûna wî ya Wanê, ne reva ji ”atêş-î suzan” e. Di sala 1925´an de jî, di serîhildana Şêx Seîd de, destîniya wî diguhere û bi ber şek û pekên komarê dikeve û heya sax e jî, ji surgun û girtinan xelas nabe.

Destîniya wî ya di dema Wahdettîn de, di ya Îtîhat Teraqî de, di ya Mustafa Kemal, Îsmet Înonu û Menderes de naye guhertin. Sedem jî Kurdbûna wî û dilsoziya ligel ola Îslamî ye.

> ***Pirs 10:*** *Têkiliya Seîdê Kurdî bi bûyera 31´ê Adarê sala 1909´an re, em dizanin ku girêdayê vê bûyerê hatiye*

*dadgehkirin û cezakirin, ev têkilî çendî rast e? Li gora dîtinekê, Seîdê Kurdiyê di nav siyasetê de piştî vê cezaxwarinê êdî bi temamî xwe dide aliyê ol-dîn û destên xwe ji dinyayê dikşîne, rastî û nerastiya wê?*

**Bersiv 10:** Gotina ku dibêjin "destên xwe ji siyasetê kişandiye û xwe daye olê", ne rast e. Piştî ku Bedîûzeman, li Wanê bi kutupxaneya Walî Tahîr Paşa de, bi cîhana zanista rojava re rastî hev tê, du tişt kirin armanca xwe; zanista îslamî û zanista rojava bîne ba hev û bi hev re, yan jî di nava hev de bidê nifşên nû. Belkî jî sentezen, bîrdozên nû jî afirandiba ne, yan jî di planên wî de tiştekî wiha hebû, lê derbarê vê mijarê de tu belge di destên me de nînin. Dîse jî, her helwdana wî weke xelekên hevûdin temam dikin in. Duyemîn armanc jî, siyasetê, weke alavê gihiştina hedefê bijartiye û wek çek jî dinirxîne. Ji ber ku "fena-fellah" û felsefeya rojava, dema bi zanistên weke fizîk, kimya, cografya û astronomî re werê cem hev, siyaset wê bibe dergehê Bihuşta cîhana wî. Ji bo vê jî, di rojnameya şoreşgera wê demê "Volqan" de gotar nivîsî ne. Ev jî dide xuya kirin ku Seîdê Kurdî ne derwêşek e.

Ji bo gihiştina vê Bihuşta cîhanê, heta jiyana xwe ya dawî jî tevgerek bi têkoşîn kiriye. Nêzîkî siyasetmedaran bûye û mîna Ibn-î Haldun û Tebrîzî ji "agir-î sûzan" nereviyaye, mîna Mewlana bi detshialdariyê re hemram nebûye. Lê dema ku dît, "agir-î suzan" wê ziyanê bide hişmendiya wî, bide dora wî, dûr ketiye.

Di dûrketina xwe de jî, derwêştî qebûl nekiriye û vala ranwestiyaye, hêza pênûsê, hêza gotinê bikar aniye. (Di sala 1910´an de çûna Wanê û têkiliya bi eşîrên Kurd re, dîsa di sala 1915-1916´an de wek nefereki cih girtina di şerê li dijî Rûsan de; dîsa, di sala 1943´an de, bi 126 xwendekarên xwe re darizandina wî, ji xala "têkbirin û guhertina rejîmê dikarin bibin mînak.) Eger hêza pênûsa wî, hêza gotina wî, desthilatdar ne tirsandibana, di "înzîwa li Çiyayê Ereka Wanê" de, hêrsa desthilatdariya Enqerê ne dikişande ser xwe.

***Pirs 11:*** *Pirsek me jî bila li ser endametiya Seîdê Kurdî, li ser endametiya wî di rêxistina "Teşkilat-i Mahsusa"de be, çi ye ev teşkîlat û rol û cihê Seîdê Kurdî di vê saziyê de, kengî bû endam û endametiya rêxistineke wiha dihate wateyeke çawa?*

**Bersiv 11:** Dive ku em pêşî zanibin "Teşkîlat-î Mahsûsa" çiye û çi kar dikir?

Teşkîlat-î Mahsusae, rêxistinek sîxurî ye û bi fermana Enwer Paşa, yanî serokê Îtîhat û Teraqî, xwediyê îdeolojiya Tirkîtiya Spî hatiye damezrandin. Navenda wê li Stembolê ye û ji çar odeyan pêk tê. 1. Baskê Rumelî, 2. Baskê Qafqazê, 3. Afrîka û Trablus, 4. Wilayetî Şerqiye... Armanca vê saziya sîxurî, dibin navê misilmantiyê de parastin û zêdekirina nifşê Tirk e. Îdeolojiya wê, Yenîçerîtî ye. Yanî dewşirmekirina gelan e.

Di pêvajoya têkçûna Osmaniyan de, salên 1900´î û pê de, Enwer Paşa wek Napolyonekî Tirk derkete pêş û kete nava lêgerînên xelaskirina emperetoriyê. Ji bo ku di cîhana misilman de alîgirên xwe zêde bike, herî zêde ola misilmantiyê bikaranî û xala sereke ya Teşkîlat-î Mahsusa, "propagende û ajîtasyon" bû. Ji ber ku temsîliya misilmantiyê Osmaniyan dikir û navenda cîhana Misilman jî Stembol bû. Xelîfeyê cîhana Îslamî, li wir bû û hêza desthilatdar ku wek mertalê li pêşiya rojavayiyan jî Al-î Osmanî, li vir bû.

Di heyameke ku netewiyet xurt dibûn de, burjuwazî desthilatdar e û hêdî hêdî ber bi kapîtalîzma ku mekîne dibin navenda kêşa aboriyê, Al-î Osmanî kete nava hejandineke parçebûnê. Ew şaristaniya cîhanî, di aliyê cografî û siyasî de têk diçe û wargehên stratejîk winda dike. Almanan, ji bo ku li hemberî Ingilîz û Frensiyan karibin koloniyan bidestbixin, bi riya Osmaniyan berê xwe dane Qafqaz û Mezopotamyayê. Xetên Trênê jî di nav de, desteka aborî dane Osmaniyan û kesên weke Enwer Paşa destek kirin. Bêguman Rûsya jî, bi riya Ermeniyan dixwest li Serhedê pêşiya Almanya bigire.

Bi destek û stratejiya Almanan, dibin fermandariya Enwer Paşa de Teşkîlat-î Mahsûsa hate damezrandin. Dema ku em li serokên baskên vê rêxistinê dinêrin, teva mirovên ku li herêma xwe navdar in, xwedî bandor in. Di heyameke ku mîrîtî, axatî û begîtî, yanî feodalî serdest de, hêza duyemîn şêx, mele û oldarên weke Seîdê Kurdî ne.

Guman tê de nîne ku, Seîdê Kurdî, bi armanca parastina misilmantiyê ketiye nava Teşkîlat-î Mahsûsa. Bi vê mebestê li dijî Rusan jî şer kiriye. Di nava heman çaçrovê de, di nava eşîrên Kurdan de geriya ye û axiviye. Lê armanca Seîdê Kurdî, ya gera nava eşîrên Kurdan, tenê bi parstina Xanedaniya Osmaniyan nayê nirxandin.

Hinekî din kûr e.

Ez mîna Nurî Dêrsîmî nabêjim ku armanca Teşkîlat-î Mahsusa tenê qirkirina neteweyên ne Tirk e. Bê çawa Enwer Paşa dibin emrê Almanan da kar dikir, Teşkîlat-î Mahsusa jî dibin emrê Almanan de bû û bi stratejiya parastina menfaetên Almanan kar dikir. Ola Îslamî qilifê veşartina teşkîlatê bû. Fetwa ku tê gotin li ser daxwaza Almanan hatiye belakirin jî mînaka vê çendê ye. Aliyê din ku tê gotin, biqasî Osmaniyan gunehkariya Almanan di qirkirina Ermeniyan de heye jî, ev e.

Piştî têkçûna Almanan, Enwer Paşa û Al-î Osmanî li Balqan û herêmên din, Teşkîlat-i Mahsûsa têk diçe, Îttîhat û Teraqî ku îdeolojiya Tirkîtiya Spî ava dikin, tê damezrandin. Seîdê Kurdî jî, ji vê yekê qebûl nake û ji Îttîhat û Te rekî vediqete.

Ev qilifê veşartinê hewqasî bi hêz bû ku, kesên weke Bedîûzeman jî xapandin û bikaranîn. Dibe ku Bedîûzeman bi zanebûn, lê weke karanîna vê hêzê kete nava teşkîlatê. Ev jî aliyekî din yê ku veşartî maye ye.

> ***Pirs 12:*** *Têkiliya Seîdê Kurdî û Enwer Paşa jî tê zanîn. Ev têkilî çawa bû? Tê îdîakirin ku "Teşkilat-i Mahsusa"ji bo cîhadê fetwa belakirine. Seîdê Kurdî bi xwe ev fetwa heta bi Bakurê Efrîka birine û bi dû re hatiye Wanê, li ser daxwaza Enwer Paşa, ji sala 1915´an û pêde wek fermandarekî Teşkilat-i Mahsûsa ketiye Şerê yekemîn yê Cîhanê. Çi ne, belge û wesîqeyên di vê derbarê de?*

**Bersiv 12:** Rast e, têkiliya Bedîûzeman û Enwer Paşa gelekî xurt e. Lê biqasî pêdiviya Seîdê Kurdî bi Enwer Paşa heye, pêdiviya Enwer Paşa jî bi Seîdê Kurdî heye. Ji ber ku Enwer Paşa dixwaze bibe Napolyonê cîhana îslamî. Lê Şeyhulîslam ligel Padîşah e, ûlemayên demê jî, ji xeta Şeyhulîslam, sadrazam û Xelîfe+Padîşah dernakevin. Ulemayekî, ku di mertebeya "fena-fellah" de xwe daye qebûlkirin û weke "Bedîûzeman" tê binavkirin, ji bo Enwer Paşa, zirx û mertalekî zêrîn e.

Ji bo karibe otorîteya xwe ya siaysî bide xuyakirin û fermanên xwe bi ulema, şeyh-ul îslam bidê qebûlkirin, Seîdê Kurdî li Çamlica di koşkekê de bi cih dike. Ev aliyek e. Aliyê din jî ew e ku, Seîdê Kurdî wek "Bedîî"yekî, li dijî parçekirina cîhana îslamî dikevê nava "cehd"ê. Ev cehda wî, giha asta ku li dijî Rûsan şer jî bike (1915) û dîlbikeve. Ev bawerî û îtîqada wî ya îslamî ye.

Ji ber ku di xwesteka wî ya avakirina zaningeha bi navê Medrestû'z Zehra de, zanistiya îslamî, bi zanistên rojava re sentez bike û reformeke bingehîn di cîhana Îslamî de bikê ye.

Me pêşte jî got, Osmanî tenê "Qur'an"ê esas digirin û cih nadin pêşketina zanistan û ulameyan. Seîdê Kurdî, dibîne ku Zanîngeha Misirê, weke derguşa zanistiyên ola îslamî tê qebûl kirin, lê bersivê nadê demê û li hemberî rojava nabe bersiv. Mirovekî weke Enwer Paşa, ku xwe wek şoreşger û cîhanşûmûlê cîhana îslamî dide naskirin û hêza Almanan digire pey xwe, ji bo Seîdê Kurdî wek stargehekî û pêpelîka gihiştina armancê xuya dike.

> ***Pirs 13:*** *Di salên Şerê Cîhanê yê Yekem de di eniya li dijî Rûsan de Seîdê Kurdî û çend hevalên xwe bi birîndarî dikevin destên Rûsan û demekê li Sibirya dimînin. Kengê dîl dikeve, li ser salên li Sibirya û derbasbûna van salan, Seîdê Kurdî bi xwe tiştek gotiye, nivîsiye, yan jî kesekî din tiştek gotiye?*
>
> *Vegera ji Sibîrya çawa biliyaye, hatiye pê û piştî hatiye Stenbolê çi kiriye, bi çi daketiye û heta sala vedigere Kurdistanê çi kiriye*

**Bersiv 13:** Mixabin derbarê vê mijarê de agahiyên rast di destên me de nînin. Lêkolînerên ku heta niha derbarê Seîdê Kurdî de lêkolîn kirine jî, di vê mijarê de bêçare mane. Lê em dikarin bêjin ku Bedîûzeman, ji haraket û tevgera rêxistinî û çalekî, yan jî di têkoşînan de, her dem bi şagirtên xwe re haraket kiriye. Wek mirovekî pêşeng, ji aliyekî ve hiş û ramanê xwe, têgihiştina xwe bi kar aniye, ji aliyê din ve ketiye nava hewldanên têkiliyan.

Seîdê Kurdî ne-hîletê komunîstan e û dijberiya xwe di her nivîsa xwe de, di her axaftina xwe de vekirî aniye ziman. Ew pêşengekî, "bedîî",yê ola islamî ye û di xizmeta îslamî de kar dike. Lê tucaran, îslamiyet ne kiriye bin ala miletekî. Tirkan çiqasî tahrîfat kiribin û bikaranîbin jî, ew gotinên ku dibêje; "lîsan-î erebî wacib, Kurdî caîz, Turkî lazim bikin" mînaka vê ye. Ji bilî wê, helwest û helwdana wî ya sazkariya zaningehê û perwerdehiya bi zimanê Kurdî, Tirkî û Erebî, vê dîtina me piştrast dike. Bi vê mebestê em dikarin bêjin ku Bedîûzeman bi şagirtên xwe re, li dijî hêzên Rusya şer kiriye û bi birîndarî dîl keitne. Sedema ku, behsa wan hevalên xwe nake jî ev e.

Şagirtî di dereca duyemîn, sêyemîn de û alimek bi zahmet behsa şagirtên xwe bike.

Ji cihekî weke Sibirya rev û gihiştina welat ne hêsan e. Ji ber ku rêbuwarî tenê bi trênê mimkûn e û kontrola di trênan de, pirr zor e. Lewma pirsên weke revê li gorî me ne rast e. Yan serbest hatine berdan, yan jî di nava tevlîhevî û qîrûteşqeleya Şoreşa October de derfetên revê û vegerê dîtine. Di vî alî de tu lêkolîn ne hatine kirin. Pirsa ku Bedîûzeman çima behsa vê mijarê ne kiriye jî giring e.

Gelo belgeyên ku behsa wê kirine, hatin windakirin an nînin.

Aliyekî din: Li dijî hêzên Rusya, gelek eşîrên kurdan û entelektuelên kurdan jî şer kirine. Ev jî dide xuyakirin ku, êrîşa hêzên Rusya weke dagirkeriya xaka Kurdîstanê hatiye dîtin. Mînaka vê jî, Zinar Silopî û Ekrem Kedrî Paşa ne.

> ***Pirs 14:*** *Vegera ji Sibîrya çawa biliyaye, hatiye pê û piştî hatiye Stenbolê çi kiriye, bi çi daketiye û heta sala vedigere Kurdistanê çi kiriye*

**Bersiv 14**: Bêguman, dîlketina Seîdî Kurdî li Rusya bandorek mezin, li hiş û ramanê wî jî kiriye. Baş tê zanîn ku Şoreşa October bandor li gelek kesên dîlgirtî kiriye. Ji ber ku azadiya gelan û wekheviya gelan diparêze. Piştî Şoreşa Frensa guhertina herî mezin û giring ya mirovahiyê ev şoreş e. Ji bo gelên bindest û pêşeng û zanayên gelan çavkaniyeke zanistî û pratîkî ye. Bedîûzeman mikur neyê jî, dibin bandora Şoreşa October de maye. Ji ber ku bi gotina wî û ya lêkolîneran "Seîdê kevin" welatperwer e û mîna paşnavê xwe haraket dike, di rêxistinên Kurd de cih digire, dinivîse û wek pêşengekî "murşîd"ê Kurd, li Stembolê têkoşîna vekirina dibistanên li tevahiya Kurdîstanê dike. Lê Seîdê nû jî, di vê çarçovê de dikare werê nirxanidn.

Îro jî bandora Seîdê Kurdî, li ser nûrciyan heye. Nûrcî, beşekî gelekî hindik riya "murşîd" bi kar tînin. Ev beş jî, pirranî li Kurdîstanê ne û dûrî siyastê dimînin.

Bi hêsanî dikarim bêjim ku Fetul-munkîr vekirina dibistanên li cîhanê, ji projeya Seîdê Kurdî ya vekirina dibistanên li Kurdîstanê standiye.

Seîdê Kurdî, di aliyê baweriya sazîbûn û hêza dewletî de gelek fêde ji Şoreşa October dîtiye, lê derfetên bikaranînê nedîtine. Ji

bo vê jî xwestiye hêza desthildaran bigire pey xwe û li Kurdîstanê pêşketineke zanist û xwendekaran sazkar bike. Lê hewldan û karûxebatên wî fêde nedane, sar dibe, mur şikandî dibe û bi xeyd û dilekî şikestî ji Stembolê dûr dikeve û diçe Wanê.

Ev salên ”inzîwayê” ne.

> ***Pirs 15:*** *Di hinek çavkaniyan de behsa hin nameyên di navbera Seîdê Kurdî û hin rewşenbîrên Kurd de dibe ku ew jî dibin wek hinek agehdarî ji bo dîtinên Seîdê Kurdî li ser doz û dawên kurdan û pirsgirêkên neteweyê Kurd.*
>
> *Wek nimûne nameya Mevlanazade Rifat Beg li ser avakirina dewleteke kurdî ya serbixwe û bersiva Seîdê Kurdî jê re ku li gora hinek angaştan wiha ye: "Rifat Beg ne avakirina Kurdistanekê, belê em Împeretoriya Osmanî zindû bikin. Tu vê qebûl bikî ez amade me di riya wê de canê xwe bidim”. Diyalogeke wiha derbas bûye di navbera van herdû kesayetiyên kurd de, çendî haya we jê heye?*

**Bersiv 15:** Ya rastî ev mijar bala min jî dikişîne. Helbet fêm kirina vê rastiyê ne hêsa ye.

Mirovekî weke ”murşîd”ê ola îslamî, ”bedîî”yê alimên ola îslamî, derbarê propagendeya Tirkan de, bi awayekî cûda biaxive; qencî û sûdewariya Kurdan ya ji bo ola îslamî û cîhana îslamî nebîne, ne normal e. Hiş, hewn û têghihiştina min ranagire. Berî her tiştî, gelê Kurd bêhtir ji Tirkan qencî bi cîhana islamî û ola îslamî kiriye û xwîna gelên misilman nerijandine. Gelo mimkûn e ku mirovekî weke Seîdê Kurdî vê rastiyê nizanibe. Nabe... Yek; Yawuz Sultan Selîm, Mekkih û Medîne dagir kir, ji Stembolê heta bi Mekkih û Medinê, kelih û bajarên misilmanan wêran kirin û kesên berxwedan kirin jî, kuştin, talan kirin. Li Mekkih û Medîne jî gelek kuştin kir û talangerî kir. Cube, îşlik, şimik, destnivîsên olî, qur’an, por û muwên riha Cenabê Mihemed wek ”rehîbê” desteser kirin û anîne Stembolê û hîna jî li Saraya Topkapiyê ne. Dema ku xutbe li Mekkihê li ser navê xwe da xwendin, mele ji bo Yawuz Selîm got, ”sahib-ul harameyn”, Yawuz rondikên timsahan barandin û got; ”na, haşaa, ez xadum-ul hurameyn im”, cubê xelifetiyê jî li xwe dike û ji şûrê wî jî, xwîna ”ehl-î beyt” diniqutî.

Tirk dibêjin, Cenabê Mihemed gotiye, ”fermandarê Costantinepolîsê bistîne, çi fermandarekî hêja û delal e, eskerê

ku bi wî fermandarî re biçe dagirkeriya Costantinepolîsê, çi eskerekî delal û cengawer e." Gelek kesên Kurd jî vê derewê erê dikin. Lê kes nayîne bîra xwe ku Qudus, ligel cîhana îslamî, ji Stembolê pîroztir e û di destê kafiran de ye. Lê Cenabê Muhemmed, ji bo fermandarê ku Qudusê bistîne û eskerên fermandarê ku Qudusê ji destê kafiran xelas bike tiştekî wiha nabêje. Tê zanîn fermandarê ku Qudus ji destê kafiran standiye û radestî cîhana Îslamî kiriye, Selahaddînê Eyyûbî ye. Selahaddîn hemberî ku Qiralê cîhana îslamî ye, cubbeyê Xelîfetiyê li kesekî "ehl-î beyt" dike. Dîse, Eba Muslim-î Xoresanî, nakokiya navbera xilafeta ola Îslamî radike û cubeyê xelifetiyê li xwe nake, li mirovekî "ehl-î beyt" dike. Çima, ji ber ku Kurd û "murşîd"ên Kurd, ku pêşengiya ola îslamî dikin, pêdiviyek wiha nabînin, dilsozên Xweda û pêxember in. Lewma Seîdê Kurdî gotineke pesindariya ji bo qenciya Tirkan ya ola îslamî nabêje. Ez bawer nakim.

Îdeolojiyên fermî her dem olan jî, dîrokê jî, hest û nirxan jî bikar tînin û dikine amurê siyaseta xwe. Dîsa jî em dibînin ku Seîdê Kurdî, bawerî bi hêza rêxistinî û dewletî aniye, nêzîkî Sultan jî, nêzîkî Îttihadiyan jî bûye, lê piştî rûdêna wan ya nijadperestî dîtiye û nas kiriye ji wan dûr dikeve.

> ***Pirs 16:*** *Herwiha tê gotin ku pêşniyazek ji bo kurdistaneke serbixwe ji aliyê Serokê Kurt Teali Cemiyeti`yê Seyid Abdulqadir jî hatiye jê re û bersiva wî jî red kiriye. Wek sebeb jî misilmantiya gelê tirk daye xuyakirin, bingehê vê?*

**Bersiv 16:** Eger em li rastiyê binêrin, Seyid Abdulqadir jî, ne mirovekî pêşeng û serokekî neteweyî ku karibe rehetî û aramiya xwe xerab bikê ye. Eger ew, weke serokekî li Stembolê rûne û doza Kurdîstana serbixwe bike, Seîdî Kurdî baweriyê pê nayine. Kalikê Seyid Abdulqadir, Şêx Ubeydullah li tevahiya Kurdîstanê, herêm bi herêm geriya ye û bi axa, beg, mîr û paşayên Kurdîstanê teva re hevdîtin pêk anîne. Bi vê hewldana xwe ya netewparêzî, dikevê nava "cehd"eke yekîtiya neteweyî. Lê nebiyê wî Seyid Abdulqadir li Stembolê hêviyên xwe digihîne hêzên Ewropî. Bedîûzeman jî baweriyê bi wî hişmendiyê nayine.

Min sedemên jor, ji bo vê baweriyê anîne ziman. Car din dubare dikim, Seîdê Kurdî ne mirovekî nezan e, ne mirovekî ku li gorî hestên xwe, li gorî hiş û ramanê xwe yê Kurd û murşîdê ola îslamî tevdigere. Mandetiya Wahdettin jî, ya Îtihatî jî, ya

Ingilîzan erê nekiriye. Lewma ne mimkûn e ku ew û Seyid Abdulqadîr li hev bikin.

Seîdê Kurdî, bêhtir ji Seyid Abdulqadir li Kurdîstanê ye û di nava gel de kar dike.

Seyîd Abdulqadîr, biqasî Seîdê Kurdî ne têkildarê Kurdîstanê û gelê Kurd e.

> ***Pirs 17:*** *Diyaloga di navbera Mistefa Kemal û Seîdê Kurdî de jî mîna tê zanîn xaleke dabaşê ye. Sala dawî bû mijara filîmekî bi navê "Hur Adam " jî.*
>
> *Tê gotin ku Seîdê Kurdî fetwa li dijê "Kuvva-i Milliye"yê jî red kiriye û ev jî bûye sebeb ku Mistefa Kemal wî vexwîne Enqerayê.*
>
> *Sal 1922 ye, li wir li gora hinek gotinan, Mistefa Kemal bi merasim pêşwaziya wî dide kirin. Seîdê Kurdî li paytextê nû beyanameke 10 xalî pêşkêşî meclîsê dike. Çi bûn ev xal û piştre çima navbera wî û Mistefa Kemal xerab bû?*

**Bersiv 17:** Helbet, di navbera 2 hiş û ramanê Seîdê Kurdî û Mustafa Kemal de hene û ev cûdatî biqasî çiyan mezin in û biqasî geliyan jî kûr in.

Mustafa Kemal eniyek e, Seîdê Kurdî eniyek e.

Dîsa jî em hinek rastiyan bêjin:

Mustafa Kemal dema ku diçe Erzeromê, Kazim Karabekir, berî wî diçe wir û ji aliyê Ingilîzan ve hatiye şandin. Mustafa Kemal û Kazim Karabekîr têne hemberî hev. Hêzên îstîxbarata Bab-i Alî û burokrasiya Erzeromê destê Kazim Karabekir digirin û li gundên Erzeromê jî, li dijî Milîtanên Ermenî û hêzên Rûsyayê, wek qorucuyên îro, hêza GIZÎRan sazkar dikin.

Mustafa Kemal têkiliyê bi kesên weke Dermanbeyzade Cewat û hwd (Ji Stembolê reviyaye û hatiye welatê xwe Ezeromê) û beg û axayên Kurdan re dideyne. Alîgirên Kazim Karabekir, riya Mustafa Kemal û cih girtina di Kongreya Erzeromê de digirin. Mustafa Kemal bi saya Kurdan û îstîfakirina Derwîş Efendîzade Ahmed dibe delege û tevlî Kongra Erzeromê dibe.

Di wê demê de Cibranli Xalit Beg û hevalên xwe, rêxistina AZADÎ li Erzeromê sazkar dikin.

Dîsa jî ez nabêjim, ku di pêvajoya şerê neteweyî de tevahiya Kurdan li dijî Mustafa Kemal e. Li Meletê jî, dema ku Mîr

Celadet û Yuzbaşi Noel bi rê dikevin, ne Mustafa Kemal, Kazim Karabekir, ne Waliyê Meletê, generealê fermandarê Orduya Meletê fermana girtinê derdixin.

Kuway-i Milliye, hêzên gel in û wek komên têkoşer derdikevin holê. Yekemîn car di 19´ê Çileyê 1918´an de li Dortyolê li dijî Frensizan şer dikin. Navê wan jî ne Kuwayî Milliye ye. Piştî ku Mustafa Kemal tê Enqerê (27 Çile 1919) û ji bo van hêzan baş bi kar bîne û ji yek navendê rêve bibe, navê Kuwayî Milliye bikartîne. Li Dilokê jî, ne bi navê Kuwayî Milliye li dijî Fransiyan şer tê kirin. Piştî Mustafa Kemal dest avête van hêzên cur be cur, demeke dirêj derbas dibe, ew hêz jî wek nijdevan û bi taktîkên gerila li dijî hêzên Rojava bi kar anîn. Kesên weke Yalçin Kuçuk û dewşirmeyên din, ji bo ku xwe Tirkê baş bidin naskirin, dîrokî wajî dikin.

Wek mînak; Yalçin Kuçuk digot, "di dema ku Mustafa Kemal li Erzeromê, kalikê min zêr didane Kuwayi Milliye." Ev ne rast e, hingî Kuwayî Milliye nîne.

Seîdê Kurdî, mîna kesên weke Fetul-munkîr hêza fetwan di xwe de nabîne. Ji ber ku dana fetwayan, ji aliyê şeyh-ul îslam ve, ji aliyê şêx û ulemayên fermî ve têne dayin. Muftî jî nikarin fetwan bidin. Kesên weke Seîdê Kurdî, çiqasî "murşîd" bin jî nikarin fetwan bidin.

Mustafa Kemal miroveki pirr şareza, zîrek e û ji bo armanca xwe, dikare Seîdê Kurdî, bi dilsozî pêşwazî bike. Mustafa Kemal di destpêkê cilên Kurdî jî li xwe kirine. Lê dive ku em ji bîr nekin, her du kes "du aliyên miknatîsê ne, du hiş û ramanên cûda ne, du mêjiyên cûda û du baweriyên cûda ne. Lê mijara fetwe-dayin û nedanê, spekulasyona li dijî Seîdê Kurdî ne. Ev gotin û propogande tava di çarçoveya îdeolojiya dewletê de têne kirin. Di navbera Kurdan de dilxelênekê çêdikin.

Mesele tê gotin: Pirojeya perwerdehiya bi zimanê Tirkî, Kurdî û Erebî, di dibistana Kurdîstanê de, di destpêka Komara Tirkiyê de jî, Mustafa Kemal, Ismet Inonu jî di nav de, ji aliyê 167 parlamenteran ve hatiye izmekirin, lê ne ketiye pratîkê. Ev yek...

Mirovekî weke Bedîûzeman tucaran şewqê li serê xwe nake, dema cilên neteweyî li xwe bike jî wê weke dînekî lê binerin. Ev parçeyek ji şerê psîkolojîk e, di her demjiyanê de li dijî pêşengên gelê Kurd, ev hişmendî hatiye bikaranîn.

***Pirs 18:** Sala piştre ango 1923´an diçe Wanê û bi çend telebên xwe re beşek ji zemanê xwe di şikeftekê de derbas dike, ev telebên wî kî bûn, çend salên berî dewlet wî di ser Stenbolê re î Burdurê, beldeya Barla bike, çawa derbas kirin, çi kir di wan salan de?*

**Bersiv 18:** Vegera Bedîûzeman ya Wanê di sala 1923´an de jî, gotinên min yên li jor rast derdixin. Ligel Mustafa Kemal ne maye, piştre jî kefareta wê dide. Û î, Barlayê tê kirin. Di dema Osmaniyan de jî, di dema Komara Tirkiyê de jî, Kurdan ku bûne, teva ji ber netewparêziya xwe hatine kirin. Helbet kesên li dijî rejîmê jî hatine kirin, lê "qiyam" yan jî, "tehcîr" ji bo parçekirina rêxistiniya gelê Kurd, lê kirina kesên weke Seîdî Kurdî ji sedema lehengî û pêşengiyê ye. Ji ber ku Komara Tirkiyê ji pêşeng û lehengên weke Seîdê Kurdî ditirse.

Piştî kirina Seîdê Kurdî û derdorê salekê Xalid Begê Cibirî, di sala 1924´an de, li Qamûşanê tê girtin. Helbet dive em hinekî girtina Xalit Begê Cibirî jî lêkolîn bikin. Gelo dema girtina Cibirî hevalên wî çima bi hawara wî neçûn? Gelo Xalit Begê Cibirî biqasî Şêx Seîd di nava êrîş û hevalbendên xwe de ne bi hêz bû? Hêza eskerên ku Cibirî girtin û hêza ku çû devê deriya Şêx Seîd jî biqasî hev in. Gelo çima Şêx Seîd teslîm nebû, lê Cibirî teslîm bû? Mînaka Cemîlê Çeto jî heman tişt e. Dixwazim bêjim ku, dîroka Kurdîstanê û cografya Kurdîstanê pêr, doh û îro têkildarî hev e. Dive dinava hev de werê lêkolînkirin. Dîroka Kurdan, dîroka Kurdîstanê parçe parçe tê lêkolînkirin, hingî valahî derdikevin holê û dîrok valahiyan qebûl nake.

Bedîûzeman, di şikefta Wanê de, dikevê "înzîva"yê, ev jî wî digihîne qonaxa "fenî fellah", yan jî "şems-î îslamiyet"ê. Guman tê de nîne ku kesên li dora wî jî, şagirtên wî ne.

***Pirs 19:** Helwestê wî beramber Şoreşa Şêx Seîd û sipekulasyonên di vê derbarê de? Li gora hin kesan em bêjin, nivîskarê îslamî Huseyin Okçu, Seîdê Kurdî di kitêbeke xwe de, bi navê „Şûalar" de rutbe û paya şehadetê daye Şêx Seîd. Belê ev beş di çapên nû de hatiye derxsitin.*

*Hin kes jî behsa nameyên di navbera Seîdê Kurdî û Şêx Seîd de hatine û çûne dikin. Lê kesên ku vê napejirînin û eslê nameyên bi vî rengê tune dibêjin jî hene. Rastî û nerstiya vê?*

**Bersiv 19:** Guman dikim ku ev pirsa herî giring e. Ji ber ku derbarê rêxistina Azadî de jî, derbarê Serîhildana Şêx Seîd de jî lêkolînên ciddî, kûr û berfireh ne hatine kirin. Wek mînak, di sala 1996´an de ez ê Burdurê kirim, li gundekî ji yê Tefennî, rastî kesên li Amedê, li dijî Şêx Seîd şer kiribûn hatim. Vekirî gotin, "cilên Kurdan li me kirin û di bin pêşengiya fermandaran de em ketin kolanên Amedê û me dikan û mal talan kirin, destdirêjî li keç û jinan kir." Van kesên ku kiryarên salên serîhildana Şêx Seîd mikur hatin, poşmaniya xwe jî dianîne ziman û digotin; "gotin me Kurd ne misilman in, gawur in, lê dema em diketin malan, me qur'an didît." Guman dikim ku ev mikur hatin, hinek tiştan eşkere dike. Bi vê mebestê, dibêjim, lêkolînên parçe parçe valahiyan derdixin holê. Dema valahî kete navberê, spekulasyon jî zêde dibin.

Dîrok valahiyan qebûl nake. Ji ber ku qewastinên dîrokê, rastiyê dikuje û rê li ber spekulasyonan vedike. Binêrin, dîroka fermî ya dewletên mîna Tirkiyê sosret in û cemawer dike zarokên dêlegurê. Dêlegur, nifşekî kûçikan e, îdeolojiya li ser bingeha bextreşî werê avakirin, mirovan dike rewşeke wiha sosret.

Di mijara têkiliya Seîdê Kurdî û Şêx Seîd de jî mirov dikare heman tiştî bibêje.

Divê neyê jibîrkirin; Seîdê Kurdî, ji sedema têkiliya bi serîhildana Şêx Seîd re, î Burdurê hatiye kirin.

> ***Pirs 20:*** *Tê zanîn piraniya berhemên xwe li Barla nîvisandine. Heger em li ser esasê qonaxa berî Barla û piştî Barla çavekî bavêjin berhemên wî berî bê Barla çi hebûn û piştî Barla çi nivîsî, çend nimûne, çend nav?*

**Bersiv 20:** Êdî diyar bûye ku salên Wanê, ji bo Seîdê Kurdî, salên stewihandina mêjî ye û bihêzkirin û rêkûpêkiya hewngiriya wî ye. Piştî ku nûçeya derbarê Wezîrê Koloniyên Ingilîz Gladstone, ku pêşniyaza jiholêrakirina Qur'anê dixwîne, giringiya belge û nivîsan fêm dike. "Murşîd"ê ola îslamî, fêm dike ku bi tenê xwendina Qur'anê, zemtkirina demê û şaristaniyê ne mimkûn e, pêdivî hê bi zanistê heye. Dibîne ku medrese bi tenê têra vê dabaşê nakin. Ji ber vê jî, dikevê nava hewldanan, ji liyekî ve dinivîse, ji aliyê din ve projeyên zêdekirina mirovên zana, pîspor û têgihiştî dike.

Ji bedêla medresê zanîngehê di serê xwe de plan dike.

Beri Meşrutiyeta 2. 1908´an diçe Stembolê û di rojnameya Derwîş Vahdatîn ”Volkan” de dinivîse. Di heman demê de, di nava sazkarên ”Firqeya Îttîhad-î Muhemmediye” de cih digire. Êdî Seîdê Kurdî siyasî ye û heta temenê xwe yê dawî jî siyasî dimîne. Di wê demê de, rojnameya Volkan, pêşketî ye û pêşengiya guhertinan dike. Ji sedema Darbeya 31´ê Adarê, Seîdî Nursî bi xwediyê rojnameya Volkan, Derwîş Wahdetî re tê girtin. Derwîş Wahdetî bi 16 hevalên xwe re tê dardekirin, Lê Seîdê Kurdî serbest tê berdan. Seîdê Kurdî, dîsa di rojnameya Serbestî de dinivîse.

Seîdê Kurdî, ji sedema exlakê çapemeniyê û gotinên ne di rêde, xwediyê Volkan, Derwîş Vahdetî bi van gotinan şiyar dike: ”Edîb, pêwist e bi edeb bin. Pêwiste bi edeba îslamî terbiye bibin. Destûrnameya çapemeniyê jî, di vijdanê mirov de be, ji hişîyetê dûr bike û bi terbiya olî muşahhas bike.” (1) Ev jî, helwesta wî ya demokrat destnîşan dike.

Bedîûzemanê siyasî, êdî bêyî nivîsandinê debor nake, diçe Şamê lê, di mizgefta herî mezin ya Emewî de, xutbê dixwîne. (piştre, ev xutbeya wî, dibin navê Hutbe-î Şamiye” de wek pirtûk tê weşandin. Piştî vê pirtûkê berhemên ”Münâzarat” ve “Muhakemât” jî têne çapkirin. Êdî di cîhana îslamî de mirovekî weke Îbn-î Haldûn derketiye holê. Îbn-î Haldûn, mamostayê zanîngehê ye, lê Seîdê Kurdî, ji derfetên zanîngehê mahrûm e. Mixabin şagirtên Bedîûzeman jî, ne mîna, şagirtên Îbn-î Haldûn in û aliyê wî yê civaknasî, dîrokzanî, sosyolojîk û siyasî nabînin. Tenê ji bo bihêzkirina îdeolojiya fermî ya “Bîrdoza Îslama Tirkîtî” derdixine pêş. Îbn-î Haldûn, nêzîkbûna detshidlariyan weke “kurb-i sultan/atêş-î sûzan” dibîne û ji desthilatdaran direve. Lê Seîdî Kurdî wajî Îbn-î Haldûn bi ser desthilatdaran de diçe.

Projeya vekirina Medreset-ul Zehra jî (47) di nav de, nivîsên di rojnameyan û xutbeyên wî teva berî kirina Burdurê ne. Vêca, ya herî giring ew e ku ji bo perwerdehiya zanîngeha ku li Wanê veke, lêgerînên wî yên pirtûkan hene. Bêguman di nava lêgerînan de destnivîsên wî jî hene, Ji sedema ku lêkolînên berfireh û kûr nîne, ew destnivîs jî winda ne. Mebesta min ji valahiyên dîrokê, spekulasyon derdixe holê ye. Seîdê Kurdî, modernîzasyona Osmaniyan û di nava vê modernîzasyonê de çareseriya pirsgirêka Kurd jî dixwaze. Pirsgirêka di navbera wî û Wahdettîn de, di navbera wî û Mustafa Kemal, Îsmet Înonu de, di navbera wî û Demokrat Partî de, ne ol e, pirsgirêka Kurd

e. Sedema dibin çavan de girtin û kirin û windakirina gora wî jî, pirsgirêka Kurd e.

> ***Pirs 21:*** *Sebeb çi ye ku teqrîben piştî 10 salên li ê dewlet bi xurtî berê xwe dide Seîdê Kurdî û gelek ji telebên wî digre, bi 120 şagirtên xwe re wan dişînin zîndana Eskişehirê?*

**Bersiv 21:** Sedem, pirsgirêka Kurd e.

Ji ber ku Seîdê Kurdî wek hişmendiyekê, wek sîstemekê, wek lehengekî fehman (hewngîriya têgihiştî) hatiye qebûl kirin û di cîhana îslamî de jî wek, ″murşîd″ hatiye qebûl kirin. Guman dikim bersiva vê pirsê me di çend hevokên berê de hatiye dayin.

> ***Pirs 22:*** *Li gora tê gotin di van dadgehên Eskişehirê de wek repûblîkanekî, ango wek komargêrekî oldar, hevalbendekî Cumhûriyetê xwe parastiye. Ji bo vê çi dikare bê gotin? Oldarê komarparêz di çi wateyê de bi kar aniye Seîdê Kurdî?*

**Bersiv 22:** Seîdê Kurdî li Eskîşehîrê bi hinceta ″îxaneta welat″, bi 16 şagirtên xwe re, tê dadgehkirin. Îxaneta Seîdê Kudî ew e ku, îslamiyet û kesayetiya xwe, hiş û hewngîriya xwe nekiriye bin xizmeta ideolojiya fermî, ye. Yanî îdeolojiya Tirkîtiyê, bi rengê olê ne xemilandiye û nebûye diranekî ji çerxa îdeolojiya nijadperestiya Tirkîtiyê. Hewn û hişmendiya Seîdê Kurdî, eger bi nav nekiribe jî, ″Komarek Demokrat e″, ji ber ku zimanê azad û civaka demokrat, di bin projeya zanîngeh û dibistanan de dide. Balkêş e, Fetul-munkîr, ew bîrdoza Seîdê Kurdî dibin ″Bîrdoza Îslama Tirk″ de kiriye mer'iyetê û bi riya dibistanan li çar aliyên cîhanê, nijadperestiya Tirkîtiyê dimeşîne.

Seîdê Kurdî, li dadgehên Eskîşehîrê jî, bi hişemendî û hewngîriya, komareke demokratîk haraket kiriye. Lê, mîna merovekî pirr zana û jîr, xwe ji cezakirinê xelas kiriye. Siyaset kiriye. Yanî gotina Kurdîstanê, gotina azadî û mafê Kurdan bikar neaniye, lê daxwaz kiriye.

Wek encam; pêwist e mirov pêşî dewleta Tirk û Tirkiyeyê nas bike.

Dewletek, pêşî dewlet piştre gel hatiye çêkirin. Yanî dewleta Tirkiyê ne li ser bingeha gel û netewekê hatiye damezrandin. Lê wek netew-dewlet û çêkirina gelê Tirk hatiye damezrandin. Gelek netew dibin sîwana emperetoriya Osmanî de, di nava

hunandinek olî de û bi hêza QUR'ANê, û li gorî demê, lê bi şûrê dewşirmeyan hatiye zeptûrept kirin. Aliyê îdarî jî, hiyerarşiyek feodalî heye. Pirr zimanî heye, pirr kulturî heye û navendî ademiyet jî, rengê her neteweyê di xwe de radigire. Zimanekî li derî neteweyî, edebiyat dîwana ji mîrateyên gelên cûda, ji çend zimanan, ji çend kulturan, muzîka berhevkirî û bi dengê cure cure amûrên gelên cûda heye. Îttîhat û Teraqî jî bû dojeha vê mîrateya ku dema wê derbasbûye. Di encamê de kulturek çete û kontra hat afirandin. Ev zihniyet bû destpêka komkujî û fermanan. Li ser vê mîrateyê, Komara Tirkiyê hat damezrandin. Piştî damezrandina Komarê, pêvajoya ATA, piştre ŞEF, piştre îdeolojiya SERF ya nijadperestiyê dest pêkir. Piştî 3-4 qirkirinên mezin ku etnîsyenên di nava sinorên Tirkiyê de hatine paqij kirin û asimilasyoneke, bi kiryarên ŞARK ISLAHAT, ISTIKLAL MAHKEMELERI, MECBURÎ ÎSKAN, KANUNA DERSIMÊ, KANUNA ANTAKYA, ŞANA ISMET, QANÇOR û Kanuna Ceza ya Musolînî ku 46 caran hatibe guhertin jî, hîna serdestiya TIRKîtiyê diparêze, dîse jî qolincên, yek netew, yek ziman, yek kultur berdewam dikin.

Li dewletek wiha, her dem tirsa hundir û derve tê xwedîkirin. Ev tirs, ji destpêkê heta îro heye. Ev hebûna Tirsê bûye sedema ku "Pirtûka Sor" her hebe û bibe bingeha wesayeta eskerî. Eskerî jî navê zorê û tirsê ye. Lewma Mustafa Kemal jî, Ismet Inonu jî, Partiya Demokrat jî, ji Seîdê Kurdî bi tirs in. Tirs, du alî xuya bike jî, di bingeha xwe de yek e. Ji bo ku pirsgirêka Kurd, pirranî piştî Serihildana Agirî û "gora betonî", siyaseta fermî ya dewletê "navê Kurd, sembolên kurdî, navên kurdî" ji ferhenga Tirkî derxistin. Lê bi saya mirovên weke Seîdê Kurdî, ev sembol her dem di mêjiyê cemawer de dihate neqişkirin. (wek mînak, Musa Anter jî, di heman çarçovê de ye). Ev jî navêtirsê û tevzînokên qolinca rêvebirên dewletê ne. Baş tê zanîn, dewleta Tirkiyê ne ji parlamento, ji navenda MÎTê û ji Serfermandariya Artêşa Tirk tê îdare kirin. "Pirtûkên Sor" jî bingeha vê demokrasiya ku eslê xwe de, rejîmek totalîter û otokratîk e.

Bi vê mebestê, lêkolînerên ku li ser mijarên mirovên weke Bedîûzeman radiwestin, pêwist e pêşî dewleta Tirk nas bikin, piştre belgeyên eslî û di arşîvên dewletê de derbixin holê. Tenê nûçe û pirtûkên bi destê nivîskarên Tirk hatine amade kirin ne bes e. Ji ber ku Rîsale-î Nur (ev nav jî çêkiriye) jî ji % 60 hatine guhertin. Eger temsîliya Bedîûzeman Fetul-munkîrê ku yek ji

kesê gora wî winda kiribe, be, ew kesê ku gotina ”Tirkbûna min desturê nade, ku ez biçim ber destê wî” bi kar anîbe, mirov nikare li nivîsên wan û pirtûkên wan ewle bibe.

Mijara şagirt û mirîdên Tirkên Bedîûzeman, bila gumanan ji mirov re çênekin. Ji ber ku, parlamentoya Enqereyê, bûrokrasiya dewletê, wezaret di nav de, perwerdehî, kultura Cagologlu, medya û rastmalî aliyek e, gelê Tirk aliyek e. Gelê Tirk biqasî gelên din yên li Tirkiyê dîlgirtî ye. Lewma di her demê de, mirîdên şêx û murşîdên Kurd ji Tirkan çêbûne. (Wek mînak: Mirîdê Şêx Qasimê Zîla, yê Tirk jî hebûn) Ji ber ku gelê Tirk yek mirovê ”murşîd” (ji bilî Bektaşî Welî) dernexistiye. Ev nirxê giranbiha para wan ne ketiye.

Lewma, dewlet, burokrasî, MÎT, Serfermandariya Artêşê teva dijminê Seîdê Kurdî bûn.

Ez têkiliyên rêvebirên Tirk teva di vê çaçrovê de dinirxînim.

Dêhnê xwe bidin jiyana Seîdê Kurdî, di dema desthilatdariya Demokrat Partî de, bêhtir ji dema desthilatdariya yek partiyê tê girtin û kirin. Sedema wê ne têkiliya bi Komarê û desthilatdariyê re ye; Sedem yek: Di dema desthilatdariya yek partiyê de serê gelê Kurd hatiye perçiqandin, tirs ji Seîdê Kurdî nemaye, tenê tê şopandin û dibin çavan de tê girtin. Kanunên taybet (me li jor hejmartin) jî di mer’iyetê de ne. Du: Di dema desthilatdariya Demokrat Partî de, hinekî bêhnferehî heye, serbestî û azadî çêbûye, xwendekarên Kurd zêde bûne û nûwek-nişûkek bê jî bayê azadî û demokrasî biziviye. Lê tirsa ji Seîdê Kurdî zêdetir bûye û serê Seîdê Kurdî bêhtir ji demên berê (ji sedema kurdbûna wî) ketiye belayê. a wî û 126 şagirtên wî ya Denîzlî mînaka vê ye.  Ji xwe Denîzlî, Burdur, Çanakale, cihên kirina Kurdan e.

## GOTAR

Yusuf Serhat FAİK

### BEDÎÛZEMAN SEÎDÊ KURDÎ

Di Medreseyên Kurdan da gelek alîm, helbestvan, nivîskar, welatperest perwerde bûne. Yek ji wan navên naskirî û giranbiha Mele Seîdê Kurdî ye. Mezintiya Mele Seîdê Kurdî li cihanê jî hatiye naskirin. Wek mînak, Profesor Yehezkel Landau´ê cihû ji bona Mele Seîdê Kurdî usa dibêje "Seîde Nûrsî(Kurdî) nivîskarekî wurşedar(muhteşem) e. Bi peyvên xwe wêneyan çêdike. Mêjiyên mirovan ji xewê hîşyar dike û di eyni demê de di mejiyên mirovan de çalekiyan pêk tîne.

Wek hunermend, çirokvanekî baş e, rêveberekî civakî ye û mamoste ye.

Di heman demê da pir bawermend e. Îlmê hemdemî û doktirîna hîkmetê ya sedsalan sentez dike. Nûrsî, herdu qad tevî hev kiriye, ji bersiva pirsgirêkan ra lêgerîn pêk aniye. Metodeke bi sîstem çekiriye".

(Hevpeyvina Nuriye Akman bi Yehezkel Landau re, rojname Zaman 1 Mijdar 2004)

Ez dikanim mînakan zêdê bikim. Lêkolîneran li ser doktrîna Seîdê Kurdî gelek lekolîn çêkirine.

Pesna wî dane. Lê em Kurd nirxên ku ji nav Kurdan derketine, hê nas nakin û wan nanirxînin.

Bi dîtina min ev yek jî pirsgirêke me ya civakî ye.

Mele Seîdê Kurdî sala H:1293/M:1873´an da li gundê Nûrsê, Nahiyeya Siparitê, Navçeya Hîzanê ku giredayî Bedlîsê ye, ji dayîk bûye. Malbata wî ji hêla Cizîrê hatiye gundê Nûrsê.

Navê diya wi Nûriye hanim e. Nûriye hanim dibêje "Min bê destnimêj şîr nedaye Seîd.".Bavê wi Sofi Mîrze'ye. Sofi Mîrze, dema ku heywanên xwe ji çêrê dianî gund, devên wan girêdida ku bila çêre û gihayên biyaniyan nexwin. Heft zarokên Sofî Mîrza û Nûriye xanimê çêbûne. Sê keç û çar kur. Navê kuran; Mele Abdullah, Mele Seîd, Mele Abdulmecîd û Mele Mihemed. Navên keçên wan Duriye, Xanim û Mircan e.

Bedîûzeman heta 9 Saliya xwe li cem birayê xwe Mele Abdullah perwerde bûye. Piştî 9 salan ji Nûrsê derketiye çûye medreseya Nawendî ya navdar ku Tekeya Kurdistanê ya navdar dihat hesibandin, ya li gundê Taxê.

Li Taxê di Medreseya M. M. Emîn da pir namîne, vedigere Nûrsê û perwerdeya xwe li cem birayê xwe berdevam dike. Demekê şûnda diçe gundê Pirmizê cem Şêxê Xizanê. Li wir jî bi şagirtê wê medreseyê re jî li hev nake, bi wan ra şer dike. Derdikeve ber Şêx û je re dibêje:"Ji şagirtên xwe ra bêje, dema ku bi min ra şer dikin, bila çar kes neyên ser min. Bila dudo, dudo verin ser min.". Şêx jê ra dibeje: "Tu şagirtê min î, kes nikane bi te ra şer bike." Rojekê bi birayê xwe yê mezin, Mele Ebdullah ra nîqaş dike. Şêx M. Emin wê demê ji medreseya Seyda Abdullah da dersê distîne. Ji Mele Sêid ra dibêje" Tu çima ji bin emrê birayê xwe derdikevi?".Seyda bersivê dide û dibeje: " Efendiyê min, ez jî, tu jî li vir şagirt in, tu nikanî müdaxaleyê min bikî!" Li ser vê bûyerê, wê derê jî terk dike û diçe Norşînê.

Di dema ku li medreseyê perwerdeyê dibîne, tu carê ji kesî ne zekat xwastiye û ne jî, ji kesekî zekat girtiye.

Li medreseyên Kurdistanê şagirt li nav malan digerin û ji bo xwe xwarinê tov dikin. Ji vê yekê re bi kurmancî "Ratib" tê gotin. M. Seîd tu car neçûye malan û Ratib negirtiye. Di şagirtiya xwe da şevekê xewnekê dibîne: "Di xewnê de, Qiyamet rabûye û heşir hatiye lidarxistin. Berê her tiştî dixwaze pêxember(s.a.v) bibîne. Diçe ser Pira Sîratê, destê wî maçî dike. ji Hz. Mihemed (s.a.v) ra dibeje: "Ya Resûlê Xwedê, ji min ra dua bike, da ku ez îlim bibînim." Peygamber jê ra dibêje: "Ger tu ji umeta min sualan pirs nekî, wê ji te re îlim were dayîn." Li ser vê xewna xwe, xwe ji bona îlim diwestîne. Piştî vê xwevnê, hema diçe Kariyeya Arvasî, li wê derê Seydayê xwe M. Emin dibîne. Dema ku Mele M. Emin dersê dide zarokan, ew îtiraz dike û ji Seydayê xwe ra dibêje: "Şiroveya te ya li ser vê meselê şaş e." Seyda M. Emin dengê xwe nake. Piştî vê bûyerê her dema ku wî ders dida, Meleyê Meşhûr dihat bîra wî.

Paşê M. Meşhûr diçe Muksê(Bahçesaray) cem Mîr Huseyîn Welî. Dema ku li wê derê dimîne, carinan diçe Bazîdê(D.Beyazit) li wir ji Şêx Mihemed Celaledîn dersê distîne. Dema ku li Bazîdê dimîne, pir caran diçe gora Mele Ehmedê Xanî ziyaret dike û bi şev di gora wî de radizê.

Li gor dîtina hin kesan dibêjin, M. Seîd ruhiyeta xwe ya neteweyî, li Bazidê ji xwendina pirtûkên M. Ehmedê Xani, yên wek Mem û Zin, Nûbara biçûkan girtiye. Ez ji usa bawer dikim ku Seyda dema ku di gora M. Ehmedê Xanî de raketiye u pirtûkên wî xwendine, ruhê welatpereziyê li wê dêrê girtiye.

Li Bazîdê pirtûka “Mele Cami”dixwîne û pirtûkên din jî dixwîne û icazetê(diploma) distine.

Sê mehan şûn da vedigere Norsê. Mele Ebdullah je çi dipirse, bersiva pirsa xwe digre. Dema ku M. Seîd je ra dibêje: “Min îsal 80 pirtûk xwendine.” M. Ebdullah matmayî dimîne. Deriyê odeyê digre û ji M. Seîd dersê distîne. Gel jê dipirse, dibêje tu çima usa diki? Ji gel ra dibêje; “ez derî digrim ku nazar neyê ser wî.”

Mihemed Sidîk Şêxanzade di pirtûka xwe da dibêje: “Dema ku min li îlahiyatê dixwend, profesorekî kemalîst hebû, paşnavê wî Kasapoglu bû. Endamê “Karê Diyaneta Bilind” bû. wî behsa biranîneke xwe kir û usa got: “Sal 1926 e. Li Medreseya Ezherê min perwerdeya xwe dikir, Ez hatim welatê xwe Burdurê. Li wir behsa Meleyekî Kurd dikirin. Pir li min zor hat, hestên min ên neteweyî nepixîn. Li cem min helbesteke bi ´erebi hebû. Bê hereket bû û nivîsandina wê tevlihev bû. Xwendina helbestê jî pir zor bû. Min got; ´ez ê herim, vê helbestê bidimê, bila bixwîne.´ Ez jî tevî, me hemûyan ew helbest şaş dixwend. Çûm cem, min dixwest ez wî Meleyî di nav gel da şermezar bikim. Helbest rûpelek bû. Min helbest dayê, û got: „Ji kerema xwe re tu dikanî vê helbestê bixwînî?‟

"Helbest girt, bê deng dixwend. Min dixwest ku ew bi deng bixwîne û şaşiyan bike ku ez forsa wî bişkînim. Ji min ra got ecele meke! Demakê şûn da kaxiz da min û ji min ra got: ”Ka tu teqîb bike, tu dikanî xetayekî min bibînî?” Dest bi xwendina helbestê kir. Helbest bi ezbere xwend. Ti xetayek jî nekir. Devê min vekirî ma. Risaleya xwe ya bi navê ”İşaretü’l İcaz” da min. Min bir, li mal ew xwend. Çi tefsîr, çi mana! Matmayî mam”.

Profesorê ku Kemalist usa metha Seyda dike. (Mihemed Sidîq Şeyhanzade Nurculuğun Tarihçesi Tenvir yayinlari Stanbol rûpel:36).

Dîsa şevekê di xwevna xwe da Şêx A. Qadir Geylanî dibîne. A. Qadir Geylani jê ra dibêje; ”Reîsê eşîra Mîran Mistefa heye. Li

gel zulmê dike. Nimej nake. Here wî bibîne û wî îqaz bike. Eger neyê rê, wî bikuje."

Radibe diçe ba eşîra Mîran. Mistefa Beg ne li wê derê bûye. Di konê wî de rûdinê û li benda wî dimîne. Dema ku Mistefa beg tê her kes ji ber radibe ser xwe. M. Seîd di ciyê xwe da rûniştî bûye û lingê wî jî li ser hev du bûne. Mistefa Beg aciz dibe. Pirs dike û dibêje; „ev ê ku ji ber min ranebû, lingê xwe avêtiye ser hev û rûdine, kiye?" Ev çi kes e? Jê ra dibejin "Meleyê Meşhûr Seîd e". Mistefa Beg pirs dibe;"tu çima hati vê derê?" M. Seit dibêje: "Ez hatim te hîşyar bikim ku tu li gel zilmê nekî û nimêja xwe bikî. Tu xwe rast nekî ez ê te bukijim!". Li ser vê gotinê Mistefa Beg dibêje: "Bi vî şûrê xwe yê zengî tu yê min bikuji?" Melê Meşhûr dibeje: "Na, ne bi şûr, bi destê xwe." Mistefa dîsa dibêje: "Li Cizîrê alimên min pir in, ger tu wan ziq biki, ez ê daxwaza te bînim cî, ger tu van ziq nekî, ez ê te bavêjim vê avê!"

Mistefa alimên xwe kom dike. M. Seîd ji van ra dibêje, ez pirsan ji we napirsim. Ez li benda pirsên we me. Alimên Cizîrê çil pirsan jê dikin. Bersiva hemû pirsan dide. Piştre ji aliman ra dibêje; "min mexsûs bersiva pirseke we şaş da. Bersiva vê pirsê ev e:" Alimên Cizîrê matmayî dimînin û dibêjin: "nika li hember me tu biserkeftî." Ji wê û şûn da Mistefa li ser gelê xwe zilmê nake. (a.g.e.37-38).

Di jiyanê de çar prensîbên M. Seîdê Kurdî hebûn:

Ti car ji kesekî zekat û diyarî negirtiye

Ji uleman pirs nedipirsîne. Digot; "ez ji îlmê uleman şûbhe nakim. Ku şûpheya wan heye, ew dikanin ji min pirsan bipirsin.

Şagirtên ku li cem wî perverde dibûn, ti carê ratib û zekat nedigirtin. Hemû pêdiwiyên şagirtan wî didît.

Her dem rewşa wî sade bû. Çavê wî li malê dinê nebû. Biçûba ku derê, her tim di destê wî da bareke sivik hebû. Minak; dema ku 23 Adara 1960´î de li Rihayê çûbû rihmetê, terekeya wî di zembîleke qamîş de şalikek(secadeyek), misînek, du destmal, du gore, du derpê, du fanîle, di bêrika fîstanê wi da, di nav paçekî de 7,5 TL derketibû. ( Musa Anter Hatiratim Stanbol rûpel:79

ÇEND NAVÊN Wİ HEBÛN: Kurd bû, Kurdistanî bû, ji bo vê pêşi jê ra digotin "Mele Seîdê Kurdî". Dema ku ew avêtibûn

Timarxanê (ku xwestibû li Kurdîstanê “Medresetül Zehra” vebike. Ji bona vê digotin dîn bûye, li hemberî îradê hatiye) di parastina xwe ya Divanî Harbî Orfî de, li tîmarxanê bi toxtoran ra peyiviye û di Peyivandina bi Wezirê Hundirîn Nazif Paşa’re, navê xwe wek Mele Seîdê Kurdî dabû nivisandin. Heta 1935´an navê wî wek “Mele Seîdê Kurdî” dihat bikaranin.

Li Kurdistanê navê Melê Meşhûr lê hatibû kirin. Di daxwaznameya xwe ya ji bona vekirina “Medresetül Zehra" da jî, ev nav bi kar aniye.

Pir caran jê ra digotin, Seîd Îbn-î Mîrza. Mîrza navê bavê wî bû.Yanê Lavê Mîrza Seîd. Di 24´ê Heziran 1934´an da, li Parlamentoya Tirkiyê “Zagona Paşnavan” derket, li gorî vê zagonê Kurd u Kurdistan wek paşnav hatibûn qedexekirin. Mele Seîdê Kurdî li Kurdîstanê, li wilayeta Bêdlisê, qeza Xîzanê, li Gundê Nûrsê hatibû dinê. Ji 1934´an şûn ve di nivîsên xwe da nasnavê “Nûrsi” bi kar aniye.

Dewleta Tirk jî, paşnavê wî bi Tirki kiribû “Okur.” Lê M. Seîdê Kurdî ev paşnav ti carê bi kar neaniye.

Şagirtên wi jê ra digotin; Bedîûzaman. Carna jî Bedîûzaman Seîdê Nûrsî bi kar aninê.

YEKEMÎN GEŞTA WÎ, STANBOL:

Mele Seîdê Kurdî di sala 1894´an da diçe Wanê. Li wê derê 15 salan dimîne. Dema ku ew li Wanê bû, tayina Tahir Paşa wek walî derdikeve Wanê. Tahir Paşa wî digre qesra xwe. Berê jî xwendina wî ya îlmê fenê hebû. Li Qesra Tahir Paşa di wê qadê de pêşvetir diçe. Projeya wî ya heri bilind “MEDRESETÜ-Z ZEHRA” li wê derê tê gihîştin. Li gor dîtina wî: “Nûra mêjî fen û şaristanî ye. Ronahiya wîjdanî îlmê olî ye." Bi giredana van herduyan, heqîqet derdikeve holê, hîmeta şagirtan difire. Ger ew herdu ji hev biqetin, ya yekemîn înkar û guman, ya duyemîn taasub u kevneperestî çêdibe.”

Bi vê fikr û ramanê diçe Stanbole. (Sal 1907 e), li navbera Fatih û Çarşembê di Şekercî Xanê da odeyekê kirê dike. Li ser deriyê odeyê levhakê dide daliqandin. Li ser levhayê usa tê nivisandin ”li vir tişt nayê pirsîn, lê bersiva her tiştî tê dayin.” Her roj bi sedan kes diçin cem, jê pirsan dipirsin. Ne tenê pirsên li ser olê, li ser kîmya, matematik, filozofî, mentiq, huqûq û hwd. Serokê Mahkemeya Bilind Şakir Berk jî, diçe cem. Li ser huqûqa îslamî çi dipirse, bersiva xwe digire. Wê

demê rojnameya Îqdam usa dinivîsîne: ”Li afaka Stanbolê ji Şerqê (Kurdîstan) zekayeke agirpare derket”.

Li ser van nûçeyan M. Seîdê Kurdî vedixwînin Saraya Yildizê. Dema ku bersivê dide vexwendinê û diçe Saraya Yildizê, Mabeynciyê Sultan Hemîd tê, li hember wî li ser lingan disekine û bêyî ku cihekî rûniştinê şani bide, jê re dibêje: “Ev fermana Sultan Hemid e. İcab dike ku tu derhal biziviri Kurdîstanê”.

Li ser vê gotinê, diçe, li ser palgeheke vala rûdine û lingê xwe daveje ser hevdu û bersiva Mabeyincî (özel kalem müdürü ya iro) dide: ”Ez ji bona ku fikir û ramanê xwe bînim cî, hatime vê derê, beşer nikanin min ji vir derxînin”. Sê saetan dipeyîve û dibeje: ”Şerî´et dibêje bi lingê xwe pêlî mûriyan jî nekin, ez çava huqûqa ben-î beşer(huqûqa Kurdan) ihmal bikim? Li ser van peyvan midûrê qelema taybet, bi M. Sêid ra heta ber derî refaqet dike, jê ra ihtiram dike. Daxwaznameya bi xwe ra anîbû ku bide Sultan Hemid, teslîmî midurê(gerînende) qelema taybet dike(Mabeyincibaşi).

Ev arznameya ku bi navê ”Kurd dîsa muhtac in” di 19´ê Mijdara 1908´an de, di rojnameya“Şerq î Kurdîstan” hêjmar: 1´ê da hatiye veşandin. Melê Meşhûr di arznameya xwe da bi kurtasî usa dibêje;

“Di nav miletê Osmanî da, ku unsureke girîng e, ahvalê gelê Kurdistanê ji hêla hükümetê ve zelal e, lê belê ez dixwazim li ser xizmeta perwerdeyî çend tiştan bînim zimên. Li Kurdistanê hukumetê ji bona perwerdeyê dibistan vekirine. Mixabin ji van dibistanan tenê yên ku zimanê wan tirkî ye, jê istifade dikin. Zarokên Kurdan yên zimanê tirkî nizanin ji vê derfetê mahrum in. Ev yek jî keşmekêşî, vahşetî û şemateyê tîne rojevê. Ew ên ku berê di bin mahiyeta Kurdan de bûn, nika ev pêş vê çûne û ji Kurdan istifade dikin. Ev yek jî însanê hamiyetperwer dide fikirandin.”

Çareserkirina vê meselê ev e: Divê li sê herêmên Kurdîstanê sê medrese werin vekirin. Ji van herêman yek hêrema eşira Ertûşî Qilaban (Beytülşebab), yek herêma Mutki-Belkan(Baykan)-Sason, ya din jî herêma Sîpkan û Heyderan û li Wanê. Di her medresê da divê 50 şagirt werin perwerdekirin û zarokên Kurd divê ji aliyê mamostayên Kurd ve bi Zimanê Kurdî werin perwerdekirin”.

M. Seîdê Kurdî perwerdeya bi Zimanê Kurdî 102 sal berê ji Osmaniyan talep kiriyê. Ji ber wê Sultan Hemid, M. Seîdê Kurdî davêje timarxaneyê.

Rojnameya Stanbol vê bûyerê di nav rûpelên xwe da dide veşandin. Xeber tê, muameleya ku bi M. Seîd hatiye kirin, dê li Kurdîstanê bibe sedema kiyamê. Li ser van nûçeyan heyetekê ava dikin û dişînin timarxaneya "Toptaşiyê" ku M. Seîd muayene bikin, ka hişê wî di cî da ye an na! Di nav heyetê de çar doxtor hene. Yek Tirk, yek Cihû, yek Rûm u yek jî Ermenî ye. Dema ku dixwazin bi M. Sêid ra bipeyîvin, M. Seîd ji heyetê ra dibêje; "gelî toxtoran! Hûn guhdarî bikin! Ez ê ji we re bêjim. Ji bona dîntiya xwe ez ê delîlên nû bidim we. Bêyî ku tiştekî pirs bikim, ez ê bersivê bidim we. Hûn bixwazin gotina dînekî entîka guhdarî bikin. Ez muayeneya xwe wek muhakeme dixwazim. Bila wîjdanê we jî bibe hakem. Ez nikanim dersa tipê bidim we. Eger ji bona teşhîsa nexweşiyê, nexweş bibe alîkar, divê hûn wan çar niqtan bigrin ber çavên xwe.

Ya yekemîn: Ez li çiyayên Kurdîstanê mezin bûme. Ehvalê min ê qebe qebûl bikin. Min bi qepanê Kurdîstan bidin wezandin, ne bi qepanê Stanbolê. Ger hûn usa bikin lazim e ku hûn piraniya Kurdan bavêjin timarxaneyê. Sedama vê ev e, li Kurdistanê exlaqê ku di rewacê da ye cesaret, îzet-î nefîs, girêdayiya bi olê, yekbûna dil û ziman e. Di medeniyetê da nezaket adet e, ji bona wan şalus(dalkavukluk, keşmeri) e

Ya duyemîn: Ev kirasê min exlaq û ehwalê min ji gel ra cuda ye. Ez nikanim bêjim, "ji min ra çi." Dibe ku bêjim misilman im, di ciheta îslamî da memûrê manewî me, xwe vazîfedar dibînim. Tiştê ku ji milet, devlet û olê ra havildar e, difikrim.

Ya seyêmîn: Bila îstîsna di her demê da insanên neasayi hatine. Gel di despêkê da ji wan ra gotiye „dîn" in û bi tiştên beredayî ra îştîgal dikin. Pişt ra jî, ji wan ra gotine, çi qas însanên baş bûn. Pesna wan dane. Nakokiyên ku di navbera niqteya yekemîn û duyemîn da hene, bûne îmayê delîl û îsnata ji bo dinbûna min. Dibêjin "dîvane" ye. Lewra bersivê dide her meseleya mişkûl. Delilên usa tînin ji bo dîntiya min.

Ya çaremin: Ez însanekî bêhnteng im(Asabi me), bi taybet însanekî wek min bêhnteng lazim e ku telaş û qehr bibe. Bahusûs însanê ku wek min 15 salan hûriyet-î şeriye di mejiyê xwe da bifikre û di dema înqîlaba mezin da xwe di nav xeterê

da bibînê û temaşe neke, çawa bêhnteng û kehr nabe. Wezirê hundirîn ji min bêtir dîn e. Ji min bêtir qehr dibe.

Ger şalusti(geşmerî), nizimbûn, wek pisîngan lavarikirin, tercihkirina menfeeta şexsî, ji menfeeta gel biaqiltî were pejirandin, şahid bin, ez ji vê biaqilbûnê istifa dikim. Ez bi dînbûn û mertebeya masûniyeta xwe iftihar dikim.“

M. Seîdê Kurdî piştî van çar niqteyên ku tîne ziman, wiha dibêje: „Heyeta we ez guhdarî kirim. Biborînin, dibe ku di gotinên min da kelîmeyên ku li we xweş neyên û madê we hezim neke, hebin. Ji ber ku ew peyv di dema dîntiya min da hatine gotin. Wê demê li derdora min tenê divarên tîmarxanê hebûn. Lewre Kurdeki tirkî nizane, cahil û wahş, yanê azad, gelo dikane xwe evqas ifade bike.“

Veselam: (Min bi kurti ifadeya wî nivîsand. Xwendavan dikanin pirtûka M. Seîdê Kurdî -Dîvan-î Harb-î Orfi İki Mekteb-î Musibetin Şehadetnamesi- Tenvir Neşriyat bixwînin)

Heyeta ku M. Seîdê Kurdî guhdarî dike, di rapora xwe da dibêje; ”ger di M. Seîdê Kurdî da dîntî hebe, di dinê da kes biaqil nîne”.

Li ser vê raporê Seyda ji tîmarxaneyê derdikeve. Saltanata Osmaniyan wî davêjin girtîgeha “Toptaşiyê”(Ku İsmail Beşikçi sala 1970-71´ê da li wê derê mabû). Di Girtigeha Toptaşiyê da Wezirê Hundirîn Şefik Paşa diçe ziyareta wî, di mawêna wan da guftigohêke usa derbaz dibe;

Nazire Zaptiye(Hundurîn) got: "Sultan Hemîd ji te re silav şand û li te 1000 kuruş maaş giredaye. Maaşê te di demeke nezîk de wê bibê 20-30 lira.“

Min got; "ez parsekê maaş nînim. Hezar lira jî be, nikanim qebûl bikim. Ez ji bona xwe nehatime, ji bona miletê xwe hatime. Tişta ku hûn dixwazin bidin min, ruşwet e, heqê sikutê ye."

Nazir got: "Tu îradê red dikî. İrade red nabe."

Min got: "Red dikim. Ta ku Padîşah bixeyîde, bangî min bike, ez ji rastiyê, bêjim."

Nazir got: "Dawiya vî tiştî dê wahim bibe."

Min got: "Ger verim dardakirin jî, ez ê di dilê miletê xwe de bijîm."

Dema ku ez hatim Stanbolê, min jiyana xwe wek ruşwet anî. Hûn çi dikin, bikin. Ez vê yêkê cidî dibejim, ez maaş qebûl nakim.”

Nazir got: "Projeya te ya perverdeya li Kurdistanê di rojeva heyeta vezîran da ye.”

Min got: "Gelo çima hûn ji bo maaşê min ewqas lezgîn in, lê çima perverdeyê paşva dixin.”

Vezîr kehirî.

Min got: ”Ez bi azadî jiyame. Ez li meydana azadiya mutlak, li ser çiyayê Kurdîstanê mezin bûme. Qehirandin li min tesîr nake, xwe nevestîne. Min koçber bikin. Çi Fizanê, çi Yemen. Hûn ji pinedozê xelas dibin.”

Vezir got: "Ev tê çi maneyê?"

Min got: "Milet ew qas feryat û fîxan dike, we li ser wan pelê cigara kevin raxistiye. Herkes di bin kevnan da wek miriyan dinale. Ez ecemî bûm, bi ser ketim. Neketim bin van kevinan. Wek kiyafeta min exlaqê min jî giran bû. Carekê li Mabeyn hat çirandin, li Şîşliyê di maleke Ermeniyan da hat çirandin, ketim Şekerci Hanê, li wê derê hat çirandin. Ketim timarxanê, ketim girtigehê. Welhasil hûn nikanin ewqas min pinedoze bikin.

Dema ku ez li Kurdîstanê bûm, min hûn gelekî baş dizanibûn. Di van ehwalan da ez bi sira we hesiyam. Bi taybetî tîmarxaneyê ev tişt anîn ber çavên min. Ez ji we ra spaz dikim. Di ehwalê niyeta xerab da ez bi niyeta baş difikirîm.“

Bedîûzeman Mele Seîdê Kurdî

Dema ku Seîdê Kurdî ji girtîgaha Toptaşiyê derdikeve, di nav Gelê Kurd û rewşenbîrên Kurd da digere. Di wê demê da li Stanbolê 40 hezar hemal hebûne. Şertên ku ewtê da pir xirab bûne. Dersê dide wan. Dixwaze wan ji xewê hîşyar bike. Li hêla din bi rewşenbirên Kurdan ra dikeve tekiliyê. Cemiyeta Tealiya Kurd hatiyê honandin. Serokê wê lave Şêx Ubeydullahê Şemzinanî Seyid A. Kadir e.

Qismên nivîskarên Tirkan û Kurdan dibêjin, M. Seîd di nav vê civakê da cî girtiye. Belgeyeke usa di destê me da tuneye. Lê bêlê Mele Seîdê Kurdî tev bi Xelîl Xeyaliyê Bedlîsî û Şagirtê wî Hemzeyê Mûkusî ra di Cemiyeta Tealiya Maarifê Kurdistan da cih girtiye û ketiye nav endamên komîta rêveberiyê. Nivisên wî

di Rojnamayên wek “Civaka Teali û Terekkiya Kurd”, Volkan, Şark û Kurdîstan û rojnameyên din da jî hatine weşandin

Di nivîsa xwe ye bi navê “Şiretên Bedîûzeman Mele Seîde Kurdî” da usa gazî Gelê Kurd dike: “Ey gelê Kurd, di îtîfaqê de quwet, di îtîhadê de heyat, di biratiyî da se’adet, di hukumetê de selamet heye. Îtîhada şerût muhabeta qewî dê we ji belayê xelas bike. Qenc guhên xwe bidinê, ez ê Tiştekê ji we ra bejim: „Hûn bizanin ku sê sehwerên me hene, muhafeza xwe ji me dixwazin.“

Yek İslamiyet e, ku bi hezaran şehidan bi xwîna xwe bihayê wê dane. Ya duduyan; insaniyeta xwe nîşanî yên din bidin. Ya sisêyan milliyeta me ye. Divê em bi karê xwe, bi hifza milliyeta xwe ruhê wan di qebrên wan da şad bikin. Pişti wê, sê dijminê me hene ku me xerab dikin. Yek feqirtî ye. Çil hezar hemalên li Stanbolê delîlên vê yekê ne. Ya duduyan; cehalet û bêxwendinî ye. Ji hezarî yekê me nikare “rojnamê” bixwîne. Ev jî delîlê vê yekê ye. Ya sisêyan; dijminî û îxtilafa di nav bera me da ye. Ev yek hêza me wenda dike û me musteheqê terbiyê dike, hukumet jî ji bêînsafiya xwe li me zulmê dike. Eger hûn vê seh bikin, bizanin çara me ew e, em ê van sê şûrên elmas bigrin destê xwe, ta ku em her sê cewherên xwe ji destên wan derxînin û têkin destê xwe. Bi şûrê edalet, me’arif û xwendinê, zilma her sê dijminên xwe ji ser xwe rakin. Ya dudiyan îtîfaq û muhabeta mîlî ye, Ya sisiyan divê mirov bi vîna xwe karê xwe bike, mina sefîlan ji qudreta bîyaniyan hêvi neke, pişta xwe bi kesî girê mede. Wesiyeta min a paşîn, xwendin, xwendin, xwendin û bidestêhevgirtin, bidestêhevgirtin, bidestêhevgirtin e.“

(Rojnameya Civaka Kürt teavün u Teraqî Stanbol 22 Mijdar 1908 Mele Seîd)

Mele Seîdê Kurdî bi Sultan Ebdülhemid re kinê girêdide. Dema ku Sultan Ebdülhemid ew şandibû timarxaneyê û li wê derê işkence lê kiribûn, îzet-î nefsa wî hatibû şkandin. Piştî ji girtigeha “Toptaşiyê” tê berdan, bi yên ku li hemberî Sultan Hemid bûn û digotin; “em heq û azadiyê dixazin”, ango bi Îtîhat Terekkiyê ra ket têkiliyê. Bi vana ra xebitîbû. Telgraf dişandin Kurdîstanê û digot, pişgiriyê bidin Meşrûtiyetê. Di 24´ê Tirmehê da Sultan Hemid mecbûr ma ku Meşrûtiyeta 2. îlan bike. Pişti îlankirina Meşrûtiyeta 2. li Selanîkê bi tevlibûna 50 partî û civakê miting û şahiya pîrozbahiya Meşrûtiyeta 2. hat

lidarxistin. Bi navê civaka "İttihadi Mihemediye" Mele Seîd dipeyive. Dema ku ew dipeyive, kürsiyên din hemû vala dibin, tên Seîde Kurdî guhdari dikin. Ji nav guhdarên wî da endamên Îtîhat-Terekkiyê İsmet İnönü u Celal Bayar jî hene. Di sala 1949´an da, dema ku li Afyonê tê dadgehkirin usa dibeje; "Divê ez nimêj bikim" heyeta dagehê dibeje; "tu nikani li vê derê nimêj bikî. Vira dadgeh e". Ew dibêje; "bêparestina huqûqa nimejê tu meseleyeke min nîne. Ji bona vê yekê ez li vir im. Ger min bixwasta, ez li vir nedibûm." Hêyeta dadgehê pirs dike; "te yê çi bikira?" M. Seîd bi xwinsarî dibêje: "Piştî îlankirina azadîyê (Meşrûtiyeta 2.), dema ku min li Selanîkê xîtap dikir, Erkanê dewleta îro hemû li wê derê bûn. M. Kemalê xwest min bike devsa Şêx Sûnîsî, waîzê gelerî yê şarqê, endamtiya parlamentoyê û serokatiya diyanetê teklîfî min kir, lê min qebûl nekir. Min bigota erê, îro ez li vir nedibûm." Hêyet li cihê xwe rûdine. Seyda seceda xwe radixe û nimeja xwe dike." (Dîroka Nurcîtiyê Mihemed Siddik Şeyhanzade rûpel:58-59)

Piştî peyivandina Selanikê tekiliya xwe bi Îtîhat Terrakiyê re xurt dike. Wan ji nêzîk ve nas dike.

Jê pirs dikin, dibejin; "tu çima ji wan veqetiyayî?" Ew dibêje; ez ji wan veneqetiyam, ew ji min veqetiyan. Ez di rêya rast da dimeşiyam, ew hatin cem min. Piştra hin kes bûn fasiq, hin kes bûn mürted(zivirîn, hin kes bûn tawanbar(sûcdar) ji min veqetiyan. Ez di riya rast da hê dimeşim".

Piştî îlankirina Meşrûtiyeta 2 yemin hilbijartin tê çêkirin. Du partî dikevin hilbijartinê: Îtîhat-Teraqî û Firkaya Ahrar (li Pişta vê partiyê Prens Sebahetin hebû). Îtîhat-Teraqî hilbijartinê qezenç dike. Piştî îqtîdarê Îtîhat-Teraqî riya xwe ya nijatperestî derxist hole. Hemû Civak û rojnameyên Kurdî yek bi yek hatin girtin. Osmanî dema ku ji Evrupayê hat avêtin, tirsa wan a herî mezin, wendakirina Anatoliyê derket hole. Îtîhat –Teraqî xwest kêmneteweyên di naw xwe da asîmile bike. Dema ku ev yek nebû, wan li hember van neteweyan jenosît pêk anî. Planên xwe di dema Şerê Cihanê yê 1 emîn da hedî hedî anîn cih. M. Seîdê Kurdî polîtîkaya wan a qirêj fêm kir û tekiliya xwe ji wan qut kir.

Disa wê demê em M. Seîdê Kurdî ne tenê di nav Civaka Mearrifa Terekkiya Kurd da dibînin, ketiye nav "Îtîhadî Muhemedî" jî. Endamê wê yê 8 mîn e. Di vekirina " Îtîhadî

Muhemedî” da bi deh hezaran însan li Ayasofyayê kom dibin. M. Seîdê Kurdî li wê derê axaftinekê dike. Rojnameya fermî ya “ Îtîhadî Muhemedî” bi navê “Volkan” derdikeve. M. Seîd di vê rojnameyê da nivîsên xwe dide çapkirin. Meşrûtiyet hatiyê îlankirin. Levra gel ji polîtîkayên Îtîhatçiyan keyf xoş nîne. Di 31´ê Adara 1325´an(9´ê Nîsana 1909´an) da, li ser kuştina rojnamevan Hasan Fehmi, ya bi destê Îtîhatçiyan çalakiyek dest pê dike. Şagirtê Medresan û çend yekîneyên askeriyê serî hildidin. Sûbay, memûr û endamên Îtîhatçiyan tên kuştin. Rojnamexaneyên wan tên hilvişandin. Li ser vê çalekiyê di bin fermandariyê Mahmut Şevket Paşa(serokê kurmayê wê M. Kemal bû) da “Arteşa Brûsk“ ji Selanîkê tê Stanbolê û serhildanê têk dibe. Rêwebiriya awerte tê îlankirin. Mele Seîd jî digirin. Di despêkê da 16 kes tên daliqandin. M. Seîd di wê mahkemeyê da jî xwe dûr û dirêj diparêze. Di Parestina xwe da usa dibêjê;

„Ey zabitan ”Mirovekî merd tenezzülî cînayetan nake. Ger bi cînayetan were tawanbarkirin jî, ji cezakirinê natirse. Ger ez bêsebep verim dardakirin, du qat sevaba şehadetiyê qezenc dikim. Di hepsê da bimînim, ew der ciyê herî rehet e. Mirina bi mazlumiyet, ji jiyana zalimî bixêrtir e. Nika ez verim ser cînayeta min a ku hatiye hesibandin.

Cînayeta min a yekemîn: Sala borî di destpeka îlankirina Meşrûtiyetê da bi vasitayê serokvezir e. Min ji Gelê Kurd ra 50-60 telgraf kişand. Di navoroka wan da min got; Meşrûtiyet û Qanûna bingehîn ku we bihîstiye, emrê adaletê û karê şeriatê ye, wê muhafeze bikin. Çim ku meşrûtiyet saadeta me ye.

Ji îstîbdatê me zulmeke mezin dîtiye. Bersiva wan telgrafan xoş hat. Lewra min Kurd bi teqezî tembih kirin. Min negot, ji min ra çi. Min cînayet pêk anî.

Cînayeta duyamîn: Li Beyazit, Fatih. Ayasofya û Sileymaniyê min gel ji hêla meşrûtiyetê da hişyar kir. Ji wan ra îzahet kir. Min cînayet pêk anî.

Cînayeta sêyemîn: Li Stanbolê 20 hezar Kurd hene. Hemal in, gafil û saf in, tirsiyam ku wan îxfal bikin û qewmê Kurd lekedar bikin. Ji bona vê di nav wan da geriyam, min meşrûtiyet bi wan da famkirin. Min got; îstîbdat zulm û zordarî ye. Meşrûtiyet adalet û şerîet e. Padîşah çi wextê di riya pêxember (sav) de bimeşe, em ê jî ji wî ra îtaat bikin. Zilimkar Padîşah jî be, haydut e.

Dijminê me cehalet, zarûret û îxtîlaf e, li hember wan em ê bi huner, marîfet î îtîfaqê têbikoşin. Bi Ermeniyan ra, ku me pêşve dixin û hişyar dikin, em ê destê xwe bidin hev û du. Di husumetê de xerabî heye. Dema me ji bo husumetê tune. Em ê tevlî kar û barê hukumetê nebin. Lewra em hîkmeta hukumetê nizanin. Hemalan li hemberê Avustiryayê (ez hemû Evropayê boykot dikim) boykot dikirin, wê demê heyecan û keşmekêşiya wan bi nasîhatên min vegeriya çalekiya biaqil. Li hemberê Padîşah tekiliya wan min zivirand. Li hemberê Avustiryayê ez bûm sebebê boykota aborî. Min cînayet pêk anî.

Cînayeta çaremîn: Ez Kurdeki ji rêzê(adi) me. Min vazîfeya uleman girt ser mile xwe. Min cînayet kir.

Cînayeta pencemîn: Rojnamevan du qiyase ne, muteber û veşanên bêhaysiyet û şeref, heqaret li exlaqê îslamî kirin. Ez Kurdekî cahil û bedewî me, nivîskarê rind dipeyîvin, lêbelê tiştên şaş û bixeta di nivisên wan da hene, li hemberê wan min nivîsî. Min cînayet pêk anî.

Cînayeta şeşemîn: Çend caran di kombûnan da min dît ku însan dikevin heyecanê. Tirsiyam ku gel dahîlî siyasetê bibe, asayişê îhlal bike. Min heyecanên wan bi zimanê xweşikê şagirtên Kurdan, teskîn kirin. Min cînayet çêkir.

Cînayeta heftemîn: Min bihîst ku "İtîhadî Mihemediye" hatiye avakirin. Navekî pir giranbiha û fireh bû, ez tirsiyam ev nav dê şaş were bikaranîn. Ji bo vê ez ketim nav wan ku ew nav şaş neyê xebitandin. Ez mirovekî ji rêzê me, min vazîfeya Ayan û Meclîsa Mebûsan girt ser xwe. Min cînayet pêk anî.

Cînayeta heştemîn: Min bihîst ku esker ketine nav siyasetê. Esker dibin endamên hinek civatan. Hadîseya Yenîçeriyan hat bîra min. Ez ketim telaşê. Min nivîsand û got; di nav civatan da ya herî pîroz cemiyeta askeran e, Ji nefer heta seresker dahîlî wan in. Ez şagirtekî ji rêzê me, min müdaxeleyî karê uleman kir. Min cînayet pêk anî.

Cînayeta nehemîn: Min çalekiya 31´ê Adarê ji dur va sê-çar deqîqan temaşe kir. Ji bo olê min tenê daxwaziyek bihîst. Heft renk bi sur'at verese zivirandin, wek sipî tê dîtin, xwesteka meseleya olê ji hezaran yek bû, kelîmey-î şerîat tenê hat dîtin. Min fêm kir, kar xerab e, itaat xerab e, nasîhat bêtesîr e.

Usa nebûya, wek her demê ji bona vemirandina vî agirî min ê müdaxele bikira. Levra gel pir bû, Kurdên me xafil û saf dil

bûn. Kariyerekî min hebû. Çûm min mêraniya wan û hîsiyata wan mist dan.

Ez im ku min bi xwe serî li tîmarxanê da. Min negot ”ev tişt ji min ra çi, bila însanê baqil van tiştan bifikrin.” Ji bona vê min cînayet pek aniye.

Cînayeta dehemîn: Ji bona leşkeran roja înê ez tevî uleman çûm Nezareta Herbiyê. Bi kelîmeyên müesîr min asker anîn itaatê. Ew qas alimên girîng hebûn, min vazîfeya wan girt ser xwe. Min cînayet pêk anî

Cînayeta yanzdemîn: Min li Kurdistanê hal û perîşaniya Kurdan didît. Min fêm kir ku saadeta Kurdan, bi îlmê fenî yê nû yê ku beşeriyetê ew aniye meydanê, ye. Kaniya vî îlmê fenî jî hê nehatiye xerabkirin, ulema û medrese bû. Ji ber ku îradeya Kurdan di destê uleman de bû. Bi vê sebebê ez hatim Dersaadetê(Stanbol). Min dixwest, ez xwe bigihînim Sultanê ku îro ji ser textê xwe da ketiye(Sultan Hemid).

Sultan xwest ku fikr û ramanên min bi maaş û heq-î sikut bistine, min red kir. Navê miletê xwe(Kurd) min qilêr nekir. Min aqilê xwe feda kir, azadiya xwe feda nekir. Min serê xwe li ber wî netewand.

Salek û nîv e, li wir ji bona belavkirina perwerdeya bi Zimanê Kurdî dixebitim. Hemû Stanbol vê dizane. Ez kure hemallekî me, di destê min da ew qas derfet hebû, min xwe ji kurê hemaltiyê dernexist.

Min çiyayên bilind ên Kurdîstanê ji bona miletê xwe terk kirin, ji bo milet ketim tîmarxaneyê, girtigehê û di dewra Meşrûtiyetê da dîsa ketim girtîgehê û bin îşkencê, min cînayet pêk anî.

Em Kurd in. Tên xapandin, lewra, ji bona jiyanekê em derewan nakin. Çim ku em dizanin reya rast terkkirina hîlan e.“

Parastina Seyda Sêid usa devam dike.(Min kurtasiya vê parastinê nivisand. Kesê ku bixaze temamê parestinê bixwîne, dikane DİVAN-E HARB-İ ÖRFİ-İKİ MEKTEB-İ MUSİBETİN ŞEHADETNAMESİ Bedîûzeman Seîde Kurdî(Nûrsî) bixwîne. Tenvir neşriyet Stanbol).

Ev parêzname çar saetan devam dike. Piştra dadgehê tevî M. Seîdê Kurdî sed û panzdeh bersûçên endamên “İtîhadî Mihemedî” tên berdan. Ji heyetê ra spaz nekirine û qîriyane; “Ji bona zaliman bila bijî Cehennem”. Ji dadgehê derketinê û tev bi

cemeet çûne mizgefta Sultan Ehmedê, di riya mizgeftê da dîsa qîriyane " ji bona zaliman bila bijî Cehennem".

Xatirxwestina ji Stanbol: Berî ku Stanbolê terk bike, Xatirxwestinekê dinivîsîne;

"Ey Stanbola mezin! Min biratî û wekhevî di dewra îstîbdatê de tenê li tîmarxanê, di dewra Meşrûtiyetê de tenê li girtigehê te dît. Bi xatirê te, jinapîr a bi porê xwe yê spî kincên bûkanî li xwe dike. Ez ji te bêzar bûme. Tu wek hingivê bi jar î. Tu wek insanekî vahşî yê ku kincê medeniyetê li xwe kiriye, yî.

Di sifetê te yê derveyî de çi qas medeniyet heye, di hal û hereketên te da jî, ew qas nifaq, sefahat, qerez heye. Tu ew qas wahşî yî, wek dinê. Ez jî poşman bûm ku hatime dinê. Ez çi qas te bi bîr tînim, ew qas kelîmeyên durûtiyê tên bîra min.

Lê belê, eger medeniyet ev qas êrişa heysiyetşikandinê be, îftîra, nîfaqçekirinê be û fikrê întîqamê be, însafê be, bi gotinên derew û şaş insanxapandinê be, jê ra dibêjin qesra seadetê. Lê di nav vê qesrê de hêlînên mar û dûpişkan hene. Ez wan çiyayên bilind ên Kurdîstanê ku meydana azadiya mutlaq in, ji wan konên bedewî û wehşetan çêtir dibînim. Belê, min li vir fikrên azad, gotinên azad, hûsn û niyet û dilên bi huzûr ên mîna li çiyayê Kurdîstanê hukim dikin nedit. Bi qasî ku ez dizanim, nivîskar biedeb bin. Rojnamevan milet terbiye dikin. Nika ez qala çend nivîskarên bêedep, rojnamevanên biqerez veşanan dikin, dikim. Ger edep ev be, rayagiştî ew qas tevlihevî be, şahit bin, ez di nav van da nînim. Û li serê çiyayê bilind ê Kurdîstanê "Başîd"(nave çiyayê ku li Wanê) tiştên ku li dinê hene, minak roj, hiv, stêrk û daran ji rojnameyan çêtir digirim.".(Divan-a Harb-i Örfi Tenvir neşriyat Rûpel:28-29 )

M. Seîdê Kurdî dîsa daviya risaleya xwe ye "Divan-i Harb-i Örfi" da Gelê Kurdra usa hitap dike; Ez hatime, (ger ez li vir ji miletê xwe re çend tiştan nebejim li gora min, ev rojev kêm dimine)

Ey di dema cengaveriya Asûriyan û Keldaniyan da, leşkerên peşengî şêrên Kurdan! Ji xew rabin. Pênç sed sal e, hûn radikevin. Ger hûn ranebin, di sahrayê wahşetê da, dê wahşet û xeflet we bifetisîne. Çawa Atom hevdû dikşînin, hûn jî bi hevdû ve bizeliqin, hêzeke neteweyî û gelemperî çêkin. komeke mezin ji Kurdan wek top bizivrînin. Hem ji çawa çiyayê Sîphan û Agirî yên azad, rabûn ser lingên xwe. Ger hûn di bin nefs û esareta qûlan da bimînin, midaxeleyî heqê kesê din nekin, pişta

xwe bidin şeriata azadî. Miletê wek we gafil û parçebûyî di newala maziya kûr da diqire "

Di êrişkirina li hember cehalet û feqirtiyê, bi fen, hiner û şerê çekdarî herin! Pêşve herin. Arş!”

Tişta ku jê ra dibejin “rastî”, di bin van de tebeqeya veşarti û hepis mane, tebeqeya zilmê ji holê rakirin e.

Bi peyamnera heqî ji we ra dibêjim: ”Di derûniya we da qebîliyeta we ku bi destê Xwuda hatiye çandin, zimanê we ye, quweta xwe derxin holê, di kûrahiya miletê we da ev taybetiyên ku hene, bi ava îlmê bidin avdan. Ger hûn usa nekin, hûn ê, bêav bimînin û hişk bibin.

Hem ji navê wî neteweyê ku di newala dema berê da, di her sahrayê da, di çiyayê dema tê da xwediyê aqil, kahramanên wek Selahedînê Eyûbî û Ristemê Zal di bin eyni konan da rûdinin. Fikra netewayî her kesê ku bi haysiyet û şeref, xwe şerefyar dike, ji wan ra bi fermaneke mîsoger ferman dide; ta ku her yek bi vê neteweya mezin ra bibin neynika jiyanê, parezgerê saadeta wan û di nav neteweyan da bibin minakek.

Wek îro ne tenê bi şexsê xwe, weke neteweyekî hûn ê mezin bibin. Bi mezinbûnê armanc, alîkarî jî mezin dibe û bi şînbûna neteweyî axlaq jî digihîje û mezin dibe.

Sedemên keşmekêşiya ku berê di navbera we da hebû, ji ber wesfên axatiyê yên bi serê xwe dihat. Di we de xwepesendî hebû. Nika jî divê hûn vê yêkê vegerînin ramana pêşveçûyînê, teşebûsa şexsî û ramana azadî. Dikanim bejim, hemberî medreseya biyaniyan a bêdeng, di medreseya we ya bişemate da vasfa parlamentoyê heye.

Pivana qedera însan ziman e. Suretê însan, bi rûpelê ziman kifşe dibe. Ziman dayîka xwezayê ye, bêje bêdawet tê mêjûyê mirov. Danistandin tenê bê mane dimîne, ji bona wê di mêjî da girîftbûn çênabe. Eger ziman têkevê warê perwerdeyiyê, wek nexşên li ser kevir daîm dimîn.

Yê ku bi qiyafeta zimanê milî xûya dike, çi dibêje bila bibêje, xweş tê dîtin. Ha ji we ra mînakeke hamiyeta mîlî şanî didim. Ew jî Xelîl Xeyaliyê Mutkî ye. Wek her şaxê hemiyeta mîlî, di şaxê ziman da jî xelata yekemîn girtiye. Çim ku bi çêkirina hîmê rêzana elfabe û gramera zimanê me, hebûna manewiyata rindî, qêret û fedakarî derxistiye holê. Ew rastiya ku cevherê

usa ji nav madena Kurdîstanê derketiye, îstîkbala me ronahi kike (Divan-i Harb-i Örfi rûpel:59-61)

Mele Seîdê Kurdî vedigere Kurdîstanê: Piştî du mehan şûn da ku ji aliyê Dadgeha Örfi İdarê ve tahliye dibe, Melê Kurdî vedigere welatê xwe Kurdîstanê. Li gor mercên wê demê bi keştiyê li ser Batumê re diçe Wanê. Di nav gel da digere. Pirsgirêkên wan guhdarî dike. Ji wan sualan pirs dike. Bersivên wan digre. Di sala 1911´an da, di ser Rihayê re diçe Şamê. Di Mizgefta Emewiyê da xutbê dixwîne. Nezikî deh hezar însan Bedîûzeman guhdarî dike. Ew xutbeya wî bi navê ″Xutbe-î Şamiye” hatiye çapkirin. Piştra ji Şamê di ser Beyrût-İzmirê re tê Stanbolê.

Sultan Reşat dema ku Rûmeliyê ziyaret dike, M. Seîd jî wek delegeyê Kurdistanê dawet dike. Bi hev ra diçin Rûmeliyê. Di avêtina hîmê Zaningeha(unîwersiteya) Kosovayê da li cem Sultan Reşat e. Derfetê dibîne û qala projeya “Medresetul Zehra” dike. Ji Sultan Reşat ra dibêje ev zaningeh nikanê devam bike. Di nêzîk da şerê Balkanan dedikeve û Balkan ji destê Osmaniyan derdikeve. Ji Sultan Reşat ra dibêje; "ev pere ji bona çêkirina Medresetul Zehrayê ehventir e. Sultan Reşatî îqna dike, ji bona “Medresetül Zehra” 150 hezar zêr ji bûtçeyê tê tehsîskirin. Hezar zêrî ji bona avêtina hîmê Medreset û Zehra didin Melê Meşhûr.

Mele Seîd tê Wanê, hîmê medreseyê davejê. Piştra Şerê Balkanan derdikeve. Piştî şerê Balkananan di sala 1914´an de Şerê Cihanê yê Yekemîn derdikeve. Projeya Medreset û Zehra tê kefilandin.

Di sala 1913´an da li çiyayê Erekê da, di înziwayê da ye. Dibêje; dema ku li Wanê di şikeftê da, ez di înziwayê da bûm, alimên derdorê hatin cem min. Gotin; "di vê hukumata Osmanî da bêdînî zêde bûye. Were bi me ra be, em li hemberî wan qiyam bikin." Min got: "bêdîniyê ew kes çêdikin. Werin em wan îqaz û îrşad bikin.“

Ji bo wan tiştan arteşa Osmaniyan mesûl nîne. Werin dev ji vê fikrê berdin." Guhdariya min nekirin. Çûn, hadiseya Bedlîsê dest pê kir. Salekê şûnda ew artêş ket şerê cihanê, penc mîlyon şehid da.”

Tiştên ku M. Seîdê Kurdî bahs dike, berê serhildana Bedlîsê serokê serhildanê Mele Selîm çûbû cem. Jê ra gotibû; "were em

bi hev ra li hemberî zilma Osmaniyan derkevin. Mele Seîd tevlî wan ne bûbû. (Min li ser gorbihuşt Mele Selim efendî û serhildana Bedlîsê ya 1914´an du makale di kuncikê xwe yê Y. Özgür Politikayê da nivîsîn. Kesekê/a bixwaze, dikane Yeni Özgür Politika di mêjûyên 18.09.2007 û 25.09.2007´an bixwîne). Bersiva ku Mele Seîd daye Mele Selim, piştî M. Seîd çûye ser dilovaniya xwe, bi dev û nivîsên Nurcuyên sexte hatiye guharandin. Ev sexhte misilman dibêjin; "di sala 1925´an da dema ku gorbuhişt Şêx Seîd dest bi Serhildanê kiriyê, M. Seîd jê ra name nivîsandiye, gotiye; "vê Arteşê (Arteşa TC) sed hezar evliya perwerde kiriye. Li dij Artêşa nebiyan şûr nayê kişandin". Wan sahtekaran, ev tişt di "tarihçe-i hayat"´ê da nivîsandine, di destê wan da tu delîl nîne. Ji ber xwe davêjin.

Di sala 1914´an da Şerê cihanê yê Yekemîn derdikeve. Devleta Osmaniyan di bin rêveberiya Îtîhat Terekkiyê de li cem Elmanyayê cih digre. Li hemberî devletên Îtîlaf (Engilistan, Fransa, İtalya û Rusya) di pênc eniyan da dikevê şerê.

Ji van pênç eniyan yek jî, eniya Kafkasyayê ye. Di sala 1916´an da artêşa Rûs bi piştgiriya mîlîtanên Partiya Taşnax tên Bedlîsê. M. Seîd di wê demê de, di Selefê Siwarên Kurd da serleşker e. Tevî şagirtên xwe dikevin şerê. Ji lingê xwe birîndar dibe û dîl dikeve destê leşkerên Rûsan. Li cem wî Ebdurrahim Zapsû (xezûrê Apê Mûsa û kalikê Cüneyt Zapsû) jî dîl dikeve. Wan dişînin Sibîryayê. Li wê derê du sal û nîvê tevî 90 zabitên Elmanan di kampa Kosturmayê de dimîne. Rojekê biraziyê/xwarze Çar Nikola serfermandarê giştî yê Rûsyayê Nikola Nikolaviç tê kampê. Ji bilî M. Seîd herkes ji ber wî radibe.

Ev yek bala Nikola dikşine. Tê cem wî, jê dipirse; "te ez nas nekirim, ez kime?" M. Seîd dibêje; "belê, min tu nas kirî, tu serfermandarê artêşa giştî ya Rûsyaye. Braziyê/Xwarzê Çar Nikola yî."

"Madem tu min nas dikî, tu çima ji ber min ranebûyî?" M. Seîd dibêje: "Ez alimekî İslamê me, li hemberî înkarkêran ranabim, dema ez rabim, li ola xwe heqaretê dikim." M. Seîd didin dadgeha arteşê. Ji îdama wî ra biryarê didin. Mangayek leşker tê cihê xwe digre ku biryara dadgehê bîne cih. Nikola jî temaşe dike. Nikola tê nezikî wî jê dipirse; "gotinên te yên daviyê hene an na?".Bedîûzeman dibeje; "ez dixwazim destnimêjê bigrim û

nimeja xwe bikim.” Radibe, destnimêja xwe digre û nimeja xwe dike. Nikola li wir jê ra dibêje; “min baveriya xwe anî ku tu ji bona baweriya xwe ji ber min ranebûyî.” Seyda efû dike. (Nurculuğun Tarihçesi Mihamed Siddik Şeyxanzade weşanen Tenvir Stanbol S:151-152)

M. Seîd du meh û nîvan piştî vê hadîsê ji kampa Kosturma fîrar dike. Di Petersburg û Varşovayê re tê Berlinê. Li gora Mihemmed Siddik Şeyhanzade diçe Swîsrê, li wir li ser sîstema kantonên Swîsrê lekolînan dike ku çava çar netew û çar ziman bi hev ra dijîn.

Dema ku vedigere Stanbolê rojnameya Îqdam usa manşêt davêje; ”M. Seîdê Kurdî di Şerê Cihana Yekemîn da wek serleşkerê Alayiya Selêfên Kurd fedekarî kiriye û dîl ketibû destê Rûsan, ji Kampa Kostumarê di ser Elmanyayê ra îro hatiyê Stanbolê.” Wê demê li Stanbolê tevliheviyeke mezin heyê. Stanbol di bin îşgala Îngilîzan da ye. Li hemberê Îngilîzan beyannameyekê derdixîne. Îngilîz ferman didin ku; ”li ku derê rast were, bikujin”. Li Enqereyê xebata meclîsa nuh heye. Bangî wî dikin. Xeberê dişinîe Enqereyê, dibêje, ez nayêm. Di ciyê rehet da herkes dikane kar bike. Ez ê li vir kar bikim. Zinar Silopi(Kadrî Cemîl Paşa) dibêje; "M. Seîdê Kurdî jî bûye endamê Civaka Kurd Tealiyê. Ger ew îdia hê zelal nebûyê.

Li Stanbolê pirtûka xwe ya İşaretül İcaz werdigerine Erebi. Ew pirtûka wî di destpêkê da bi zimanê Kurdî hatibû nivisandin.

Di sala 1922´yan da diçe Enqereyê. Li gara trênê heyetek tê pêşiya wî, wî dibin Meclisê. Li Meclisê ji aliyê dostê wî Tahsin bey, mebûsê Diyarbekirê û Bedlîsê tê ezimandin. Ji bona xêrhatina wî peşniyaz tê kirin. Di Meclisê da dipeyive. Deh peşniyazê xwe peşkeş dike û li mebûsan belav dike. Li ser peyivandina wî M. Kemal dikeve telaşê. Celal Bayar dişîne cem. Dema ku Celal Bayar diçe cem, Seyda destnimêjê digire.

C. Bayar jê ra dibêje, “M. Kemal bang te dike. Dibê ew mirovekî pir biaqil e.” Ji Bayar ra dibeje; “ka were tu jî destnimêjê bigre, em nimeja xwe bikin, piştra em herin cem Kemal.” Bayar tereddüt dike. Seyda jê ra dibeje; ”Galip Hoca(Di İtithat Terakiyê de navê Bayar Galip Hoca ye) tu çima nimêj nakî? Te dev ji nimêjê berdaye?” Nimeja xwe dike û diçin cem Kemal. Kemal je ra dibêje; ”me tu vexwendî vira ku em ji fikrê te îstîfade bikin. Tu hatiyî li vir bahsa nimêj, şeriatê dikî. Dubendiyê dikî navbera me.” Bedîûzeman bersivê dide Kemal;

” Kemal Kemal, li Piştî imanê heqîqeta mezin nimejê.”.Li wê derê di navbera van da gelek münakaşe hatiye kirin. Dema ku li cem M. Kemal rûdine, dîsa wek mînaka li bin konê Mistefa Axa û ziyareta saraya Osmaniyan, lingê xwe davêjê ser hev û du û usa dipeyive. Dengê xwe jî bilind dike. Piştî 85 salan ev mesele ronahî bû. M. Kemal xwastiye wî nerm bike. Jê ra Mebusatî û vaaztiya gelerî ya Kurdîstanê teklif dike. M. Seîd van teklîfan red dikê. Dema ku li Enqerê dimîne dîsa ji bona Medresetûl Zehra dixebitê. Dixwaze fînansmana wê peyda bike.

M. Kemal heta 1922-23´an M. Seîd li Enqere dide sekinandin. Naxwaze ev ji bin kontrola wî derkeve.

Du caran bi wasiteya Tahsin Begê dostê wî waliyê Wanê yê berê jê ra şifrê dişîne, Mele vedixwîne Enqereyê. Dibêje bila were Enqereyê, ez ê ji bona çapkirina Rîsale-î Hutuveti Sîteyê xelatê bidim wî. Diçe. Waîztiya Kurdistanê, sê sed wereqe meaş û di diyanetê da peywir pêşniyar dikin. qebûl nake. Di sala 1923´an da diçe Wanê, li çiyayê Erek(Ermenî dibêjin Varak)ê li ser ava Zernabat di şikeftekê da xwe dikşiîne înzîvayê. Li wê derê biryarê dide ku hewlên xwe li ser “meseleya îtîqatê" û lekolînên îlmî kûrtir bike û bi zimanekî nerm ifade bike. Devra “Seîdê Nuh” dest pêdike.

NİJADPERESTÊN TIRKAN SEÎDÊ KURDÎ ÇAWA DIBÎNIN:

Nijadperestên Tirkan Seîdê Kurdî ku ji bona Îslamê ewqas xwêdan daye, di dewra Osmanî û di destpêka Çalekiya Anatoliyê(1919-1923)´an ya Tirkan da nexwestiye ew xirabiyê bibînin, dîsa jî Seîdê Kurdî wek dijminê Tirkan dibînin. Di Kovarên nijadperestên faşîst da, wî wek dijminê Tirkan şanî didin. Yên wek Ozan Ruhsatioglu´yê Ûlkû Ocaxi-MHP´yî ji bona wî dibêje; “Saîdê Nûrsî yê ku qaşo xwe sazgerê hareketa îslamî dibîne, divê em biçin li bingeha wî binêrin, mirovekî çawa ye, ji miletê Tirk ra izah bikin. Kurd Seîd di risaleya xwe da ji bo me wiha dibêje; “Tirk, ji neslê Yecûc û Mecûc in. Ew mexlûq dê dinê xirab bikin, wek Özbek,Tatar û Kirgiz jî ji cinsê Tirkan in.” û cinsê me wek “eqwam-î wahşî”/qewmê dirinde tarîf dike”.

(Ronî Alasor Fettullah Gûlen û rastiya Seîdê Kurdî Ararat News-Publishing rûpel.66)

“Seîdê Nûrsî dema ku di 1327(1909)´an da tê Stanbolê di rîsaleya xwe ya “Divan-i Örfi İki Mekteb-i musibetin şehadetnamesi” ku li Wezîr Xanê weşangeha “İkbal-Milet” da

hatiye çapkirin, da bi vekiri Kurdayetiyê dike. Dixwaze Kurdan ji xewê rakê û di vexwendina doza Kurdayetiyê da yekîtiya xwe pêk bînin.(Kovara Orkun, Turan, Türk Gücü, Milis, İmge û Ötüken (Ronî Alasor a.g.e.rûpel:67)

Gerîlayê asê Seîd, weke mason û komunîst bi xeter e: Mustafa Sabriyê ku sîxuriya Sultan Ebdülhemid kiriye, li pirtûkxaneya wî mêze kiriye, di sala 1869´an da li Tokatê hatiye dinê, "Şeyhülislam, nîjadperest û îslamparêzê Osmanî", (nijandperestî û îslamî çava bi hev ra dibin, nizanim. Ev ne îslamê kemalîst îslamê SB´yê ye) di pirtûka xwe ya bi navê "Kürt Said'in Mezhebi Hakkinda Reddiye-Rediyeya di derhqê meshebê Saîkê Kurd de" da usa dibêje; "Ji Wî gerîlayê asê Seîd ê ku reda welatê min ê ku ez hesreta wî dikişinim, min di riya wî da umreke derbas kiriye, dike û ji ola min ra dijminatiyê dike, ihtara min a daviyê ye. Ez tînim bîra wan ên ku di tamara wan da xwîna tirkîtiyê heye û ji her misilmanî ra dibêjim; ev mirov wek mason û komûnîstan tehlûkeyeke mezin e. Eselamûn aleykum we rihmetullahî we berekatûhû(Tuhfetul Reddiya Ala Mezhaba Saiydil Kurdîyye rûpel:13-14. Li Dinyayê û Tirkiyê Siyasal İslam - Abdullah Manaz)

REWŞWNBÎR Û REXISTINÊN KURDAN MELE SEÎDÊ KURDÎ ÇAWA DIBÎNIN:

Mele Seîdê Kurdî him li dinê, him li Kurdistanê û him jî li Tirkiyê tê naskirin. Li ser wî, li dinê gelek lekolînvanan lêkolîn çêkirine. Di nav wan da em dikanin navê çend kesan bidin. Wek Prof. Gothard Jaschke(Bedîûzeman Seîdê Kurdî: Die Welt der İslam), Prof Paul Dumont(Disciples the light: The Nurju Movement in Turkay), Ursula Spuler Nurculuk: Die Bewegung des "Bedîûzeman" Said Nûrsî in der moderner Türkei), Prof Anna Masala(Bedîûzeman Said Nûrsî, di universitan Gli da gelek li Rom). Ne tenê vana, lêkolînên gelek akademîsyen û lêkolînvanan li ser Mele hene. Makeleyên meşhûr nivîsandine, di sempozyuman da gotar û belavokên xwe pêşkêş kirine. Bi kurtasî, M. Seîd ne tenê di nav Kurdan da, Melê Meşhur li cihanê jî meşhûr e.

Gelek rewşenbîrê Kurdan li ser Mele Seîd pirtûk nivîsandine, makale nivîsandine û lêkolîn kirine, di pirtûkên xwe da pesnê wî dane. Gelek rewşenbîrên Kurdan jî di bin tesîra Kemalîzmê û çepîtiyê da mane, Mele Seîdê Kurdî di şert û mercên dema wî da nenirxandine, lê her tim rexne lê kirine.

Li dora M. Seîdê Kurdî Hemza yê Mûkûsî, Xelîl Xeyalî yê Motkî, Ebdurrehman Zapsu yê Colemergî, Ehmed Ramîzê Liceyî hene.

Hemzayê Mûkûsî di Tarihçe-î Hayat da li ser jiyana wî nivîsandiye (Tarihçe-î Hayat-Weşanên Tenvîr-Stenbol-Rûpel. 38-43)

Ehmed Ramizê Liceyî li ser wî makaleyek bi navê "Îfade-î Naşîr" nivîsandiye. (Divan-Harbi Örfi İki Mekteb-i Musibetin Şehadetnamesi Rûpel: 3-5).

Malmisanij di sala 1991´ê da pirtûkek li ser wî nivîsandiye. Navê pirtûkê "Saide Nûrsî ve Kürt Sorunu" ye.

Lêkolînerekî din Rohat Alakom li ser M. Seîdê Kurdî pirtûkek nivîsandiye. Navê wê bi tirkî "Unutulmuşluğun Bir Öyküsü - Said-i Kurdi" ye.

Li ser M. Seîdê Kurdî pirtûkek, ku di sala 2003´an da ji aliyê Weşanên Tenvir Neşriyat hatiye çapkirin. "Nurculuğun Tarihçesi Medeniyet-i İslamiye-Mihemed Siddik Şeyhanzade).

Di sala 2011´an da nivîskar û rojnamevan Ronî Alasor pirtûkek nû li ser Seyda nivîsandiyê. Navê pirtûka wî "Fettulah Gûlen ve Said-i Nûrsî Gerçeği" yê.

A. Kadir Badilli ku ew jî Kurd e. Ev mirovê gorbihişt Kemal Badilli ye. Dibe ku xwendevan nizanibe.

Kemal Badilli kurdolog e û siyasetmedarekî Kurdan e. Pirtûka wî Gramera Kurdî di sala 1966´an da hat çapkirin. Pirtûka A. Kadir Badilli 3 cild e. Nave pirûka wî "Bedîûzeman Said-i Nûrsî - Mufassal Tarihçe-i Hayat" sala 1990´î da li Stenbolê hatiye çapkirin.

Li ser Melê Meşhûr nivîskareki Kurdan Alewî Metin Aktaş jî romanek nivîsandiye. Jiyan û têkoşîna wî bi zimanekî petî nivîsandiyê. Rexneyên mezin ji hêla Alewiyên Kurdan ve li pirtûka wî hatin kirin. Di rexneyên xwe da dibejin; "çawa dibe, mirovekî Dersimî û Alewî rabe li ser kevneperestekî wek Seîdî Kurdî pirtûkê binivîse!"

Dr. Şivan ji bona Seîdê Kurdî dibêje; "di sala 1935´an da Seîdê Kurdî ku li Îsparta koçber bû, du salan şûnde bi tawanbariya çalakiya Kurdîtiyê û komplo amadekirina li hember hukumeta Enqereyê hat girtin. Seîdê Kurdî li hemberî zordariya Îtîhat Teraqîyê ti carê serê xwe xwar nekiribû. Cesaret, bawerî û

sedaqeta wî ne tenê di nav Kurdan de, di nav hemû gelê Anatoliyayê da bûbû sembola muhalefeta li hember cuntaya Tirkan a nijanperest û faşîst. Piştra li hember dîktatoriya Enqereyê ya nijadperesta-faşîst jî, bi heman bawerî û qeyreta mezin heta dawiya jiyana xwe têkoşîn kiriye û alaya muhalefeta girseyî li erdê nehiştiye." Dr. Şivan Kürt Milet Hareketleri ve Irak'ta Kurdistan İhtilali Stockholm weşanen Apec rûpel:80)

Musa Anter di pirtûka xwe ya bi navê "Hatiratim-Bîranînên Min" da, ji bona Seyda usa dibeje; "Sêîd paşnavê xwe yê Nûrsî ji gundê xwe digire. Çend nav û bernavên Wî hene. Di xortaniya xwe da li Kurdistanê mücahîd bû. Di wê devrê da jê ra digotin "Meleyê Meşhûr-Mele Seîdê Kurdî." Piştra li Stanbol û Şam'ê ji bo qebîliyeta wî jê ra gotin; "Bedîûzeman." Jiyana wî ya bi şeref pir rengîn e. Ji bona vê nezevicî bû.

Mala wî tune bû. Ew zata pirê caran didan dadgehê. Li Stanbolê daweyeke wî hebû. Ji ber vê hatibû Stanbolê. Li mala xezûrê min Ebdurrahîm Zapsu bû mêvan. Bi xezûrê min ra li Rûsyayê dîl mabûn.

Şevkê min ew davetî mala xwe kirin. Gelek alimên Kurdan jî wê şevê bûbûn mêvanên min. Di nav van da sohbeteke kûr û xweşik devam dikir. Min bi çortkî ji Bedîûzeman usa pirsî; "Seydayê min ê muhterem, di zaroktiya xwe da min dibihîst û bi hemû Kurdan sempatik dihat. Navê te Mele Seîdê Kurdî bû. Nika îro her roj Tirk te cî bi cî koçber dikin, di dadgehan da te dixuşikînin, davêjin girtîgehan, lê belê tu jî di nav karên ku Tirkan bibin Cenetê, da yî. Va karê te çi ye? Min fam nekir!"

Peyivandina me hemû bi zimanê Kurdî bû. Hema çavên xwe yên ku ji nav wan îlm û nûr dipekiya, wek projektor dan ser min û pirsî; "Ev kî ye Ebdurehîm?" Xezûrê min got; "Seyda ev xort zavayê min e." Bang kir, ez birim cem xwe û destê xwe avêt stuyê min, ez maç kirim û got; "Kurê min, hê tu zaro yî, tu nizanî ez çi dikim. Bixwîne, îlim hîn bibe!"

Ew bi xwe, esra 19´an û 20´tan da, di nav Kurdan da dehayekî gihîştî bû.

Rewşenbîr, nivîskar, welatperest û sosyalîst polîtîkvanê Kurd Dr. Naci Kutlay di pirtûka xwe ya bi navê "Îtîhat-Teraqî ve Kürtler" da behsa M. Seîd dike û wiha dibêje; "Bedîûzeman şahsiyetkî kevneperst bû." Besmi Nusret Kaygusuz di pirtûka

xwe ya bi navê “Bir Roman Gibi” da dibeje; ”Ew mirov ji hêla Îtîhat-Terrakiyê ve gelekî hatibû deliqandin(pir rû girtibû). Di despêkê da gelek paye dan Seîdê Kurdî û pesnê wî dan. Qaşo dixwastin di meseleya Kurdî da ji wî îstîfade bikin. Ew qîmeta jê re dihat dayîn, wî digot, ev heqê min e. Pir li jor bang dida. Xwe qutb û Mehdiyê wê demê dihesiband.”

(Dr.Naci Kutlay Îtîhat Teraqîve Kürtlerveşanên Vejîn Stockholm Rûpel:63).

Dr. N. Kutlay dîsa dinivîsîne; “di vê dema dawî de, di pirtûkên lêkolîn û bîranînan da hat bîranîn, yan jî, bi bawerkirineke usa anîn ziman ku Saidê Kurdî-Nûrsî di Teşkîlat-î Mahsûsa da xebitiye. Ew teşkîlat bi destê Enver Paşa hatibû damezirandin û di Şerê Cihanê yê Yekemîn da ketibû pir çalekiyan. Lê belê Cemal Kutay ev mesele bi vekirî nivîsand; “Bedîûzeman heta despêka Cumhuriyetê bi tevahî bi devletê ra xebitî. Ez dizanim ku Saîd efendî di Teşkîlat-î Mahsûsa da xebitiye. Ez û Kuşçubaşi Eşref li Bedlîsê, em di mala wî da man. Piştra li Rihayê otêla ku ew tê da dima, min ew ziyaret kir. Ji devê wî min bihîst, wî digot, ez pir salan di nav Teşkîlat-î Mahsûsa’da xebitîme.” (Halil Nebiler Türkiyede Şeriat’in Kisa Tarihi Ütay Yayinlari 1994 Rûpel: 54)

Şagirtên Bedîûzeman di kovara “Yeni Zemin” da Cemal Kutay derevçîn derxistin. Dema ku ji esaretê vedigere,di pasaporta ku di sala 1918´an da dabûnê, li ser bû. Daviya şer bû. Bedîûzeman ji Rûsyayê reviyabû, hatibû Evropayê. Li pasaportê “Hemwelatiyê Osmanliyan” û “selefê siwariya Kurdan” nivîsandibû. ”Seîdê Kurdî dema ku li Tiflîsê hêsîr bû, bi lez 60,- panginotî (1500,- Mark) digihêjîninê. (Wezareta dahîlî Qelema mahsûsa(özel kalem)41-36) (Halil Nebiler Türkiye de Şeriatin Kisa Tarihi rûpel:35) (Nakil ji pirtûka Dr.Naci Kutlay Kürtler Weşanen Peri sahife 140).

Wek Dr. Naci Kutlay nivîsandiye, Bedirxan Beg Cemal Kutay tiştên ku nebûne nivîsandine. Cemal Kutay Kemalistekî mezin e, qaşo diroknas e. Wek Ayşe Hûr dibêje; heqîqet û derevên xwe tevlihev dike û wek dîroka rastîn şanî mirovan dide. Niha em verin ser derewa Cemal Kutay: Dibeje ku ez û Kuşçubaşi Eşref Paşa em bi hev ra çûne cem Bedîûzeman, li Bedlîsê li mala wî bûne mêvan. Berê her tiştî Kuşçubaşi Eşref Paşa ne zabit e. Ji Mekteba Harbê sinifa 4 emîn, ji bona ku tekiliya wî bi Îtîhatçiyan re hebûye, bi emrê Sultan Hemid hatiye avêtin û î

Siûdî Erebistanê kirine. İnsanê ku zabit nebe, nikane bibe Paşa. Her çiqas di nav Selefa Hamidiyê da, Sultan Hemîd payeya Paşatiyê dabe reîsê eşirên Kurdan yên ku di Mekteba Harbiyê da perverde nedîtibûn jî, hal û ehwalê Kuşçubaşi Eşref ne wek wan bû. Piştra M. Seîdê Kurdî di temenê xwe da tenê carekê çûye Rihayê, wê demê jî pir nexweş bû û du rojan şunda jî, çu ser dilavaniya xwe. A sisêyan Cemal Kutay di programa xwe ya di ATV da got; min di jiyana xwe da qet Seîdê Nûrsî nedîtiye. Kutay bi navê "Misilmanê Asr-î Saadet Saîd Nûrsî" pirtûkek li ser Seîdê Kurdî nivîsiye. Ev pirtûk di weşanên Yeni Asya da derketiye. Di pirtûkeda dibêje; li Emirdağê ez çûm cem. 13 rojan li cem mam, min pê re roportaj çêkir. Şagirtên Seyda yên ku wê demê li Emirdağê bûn, dibejin; "ew derewan dike, Kutay qet nehatiye Emirdağê."

Mihemed Sidîk Şeyhanzade bi telefonê jê pirs dike, dibeje; "Mele Seîd nerinên xwe bi nivîskî dabûn TBMM´yê, li wir behsa Kurdîstanê dike. Te çima ew peyv di pirtûka xwe da wek orjînala wê wernegerandiye, te kiriye,-Şerq". Kutay di bersiva xwe da dibeje, min wisa wergarandiye. Weşanên Yeni Asyayê ew bêşerefiya kiriye.

Li ser Teşkîlat-î Mahsûsa Phillipe Stoddart têzeke doktorayê nivîsandiye. Di vê têzê de qet behsa M. Seîd derbaz nabe. Ayşe Hür di nivîsa xwe ya di rojnameya Tarafê da dibêje ku Seîd ti car Ewropa neditiye. Mirovek ev qas rê çawa dikare derbaz bike û bê Stanbolê. Li ser vê Cemal Kutay dibeje; "Li nav karan da kar heye" (işin içinde iş var). (Ayşe Hür Bedüizzaman Said i Nûrsî 28.03.2010 Taraf gaz)

M. Seîdê Kurdî di aliyekî da şer´etçî bû, li aliyê din da jî Kurd bû, nasnameya xwe nas dikir û dixwest Gelê Kurd di perwerdeyê de, di sanayiyê da wek miletên din be. Digot; divê hemû miletên misilman yek bin û di nav van da Kurd jî hebe.

Tuncay Özkan ku niha li Silivriyê di doza Ergenekonê de girtî ye, di pirtûka xwe ya "MİT'in gizli Tarihi" da, di rûpelên 66-67´an da dinivîse; "Seîdê Nûrsî tevlî organizasyona Teşkîlat-î Mahsûsa bûye. Piştra ew wek gelek endamên civakê bi sazûmaniya Cumhuriyetê û serokê hareketa netewiya Tirkiyeyê M. Kemal ra çewt ketiye, hatiye dadgehkirin, koçber bûye.

Seîd Nûrsî an jî Seîdê Kurdî dema Şerê Cihanê yê Yekemîn da li eniya Kafkas û rojhilatê ji dil ketiye nav yekîneya leşkerî ku ev yekîne bi destê Teşkîlat-î Mahsûsa hatiye çêkirin. Bi taybetî di

eniya Kafkasyayê da derbasî serê yekineyeke leşkerî ya Kurdan bûye û li hember Ermeniyan û Rûsan şer kiriye. Ev mirov ku piştra serê hukumeta Enqerê êşandiye, di bin organizasyona Teşkîlat î Mahsûsa da ye. Ji bona vê ew qas serkeftî ye û li eniya Kafkas wek hêsîr ketiye destê Rûsan û ji Rûsyayê hatiye şandin. Di despeka meclîsa yekemîn da jî hatiye vexwendin. Nûrsî wek mîralayê fexrî li ser yekîneya leşkeriya Kurdan tê hasibandin.“

Tuncay Özkan jî wek Cemal Kutay rastiyan nabêje. Min li jor behsa wan tiştan kiribû. Dîsa dubare bikim. Ew yekeniya leşkeriya Kurdan hemû ji şagirtên M. Seîdê Kurdî pêk tên û di medreseya Horhorê da perwerde dibûn. M. Seîd, berî du salan hesabê Şerê Cihanê yê Yekemîn kiriye. Çend kesê ku hatine li cem perwerde bûne, bi duvarê medreseyê va sîleh, şûr dîtine, pirs kirine, çima ev tişt li odê hatine daliqandin. Ev der ciyê îlmê ye, an ciyê şer e, rabûne li vir nemane û çûne. Li ser îxbarê, dewletê avêtiye ser medresê dest dane ser hemû çekan û girtine. Lewra wek Özkan dibeje, ew yekîneya leşkerî ne bi destega dewletê, bi fedakariya feqiyên medreseyê hatiye demazrandin.

Rêxistinên Kurdan, rewşenbirên Kurdan, ji bilî çend îstîsnan, li jiyan û têkoşîna M. Seîd, di çarçoveya ideolojiya fermî de, mêze kirine. Li ser rîsaleyên wî lêkolîn nekirine. Bi pirtûkên nijadperestan, bi pirtûkên Ergenokoniyan, bi pirtûkên nivîskarên çep ku di bin baskên îdeolojiya fermî ya Devleta Tirk de mezin bûne, bi fikr û ramanên wan ew nas kirine. Li hêla din di nav hareketa îslamiya Tirkiyê û aligirên wan da ti car tewga(damara) neteweyî û Kemalîzmê kêm nebûye. Hareketa Îslamiya Tirkan her dem li ba dewletê cihê xwe girtiye. Li cem mazlûman cih negirtiye. Di meseleya Kurdan da nêrîna wê wek ya Kemalizmê bûye. Zulma li ser Filistînê, li ser Iraqê, li ser cihên misilmanên din dîtine, lê ji zilma li ser Kurdan re çav û guhên xwe girtine, zimanê xwe lal kirine. Ew ên dibejin, em di riya Mele Seîdê Kurdî da dimeşin, xwestine nasnameya wî veşêrin. Navê Kurd û Kurdistanê ji nav hemû rîsaleyên wî derxistine.

Du daweyên M. Seîdê Kurdî hebûn. Dawa yekem, wî dixwest hukumeta Îslamiyetê li Rojhilata Navîn hukum bike. Xwesteka wî ya din jî, digot, bila li Kurdistanê Zimane Kurdî li dibistanan bibe zimanê fermî. Bila Medresetûl Zehra li Kurdistanê were vekirin. Di wan medreseyan de mamosteyên Kurdî werin

perwerdekirin. Di hemû dibistanên Kurdistanê da Zimane Kurdî bibe zimanê fermî. Jiyana xwe ya 84 salan ji bona van her du fikr û ramanan xerc kir. Di hemû deman de (dema îstîbdatê, dema meşrutiyetê, dema cumhuriyetê) ji bona fikr û ramana xwe têkoşiyaye. Ew kirin tîmarxaneyê, kirin girtigehê, û koçber kirin, her dem di dadgehan da hat dadgehkirin. Bi tawanbariya daliqandinê hat dadgehkirin. Ti carê ji fikr û ramanên xwe tavîz neda. Digot ”eger daweyên min ên mezin nebûna, ji ber ew qas zûlm û işkenceyê, û koçberiyê û tîmarxaneyê, min ê jiyana xwe bi destê xwe bidawî bikira. Carna ev fikir jî hat mejiyê min. Ger tirsa min ji Xuda nebûya, daweyên min ên mezin nebûna min ê ev tişt bikirana.“ Dema ku çûbû çiyayê Erekê, li wê derê ketibû înzivayê, rojekê ji ser sikeftekê dikeve jer. Dema ku dikeve, li hewa dibêje; ”Ax daweyên min!”.

M. Seîdê Kurdî piştî hareketa netewiya sala 1925´an dîsa dikeve riyan. Jiyana wî ya Koçbertiyê dest pêdike. Di Koçberiyê da ciyê wî yê yekemîn Burdur e. Heşt mehan şûnda ji ciyê wî, wî dizivirînin, dişînin gundê Barlaya Eğrîdira navçeya İspartayê. Bi îfadeya wî Barla ciyê ku rîsaleya wî hatiyê nivîsandin, e.

Çalakiya wî ya Barlayê devletê diqilqilînê. Rojekê davêjin ser cihê wî. Tevî 120 şagirtên xwe tê girtin. (sal 1934) Wî tevî şagirtên wî dixin girtîgahe Eskişehirê. Li wê derê, tevî hemû şagirten xwe bi daxwaza cezayê idamkirinê tên dadgehkirin. Nivisandina rîsaleya nûr li wê derê jî didome. Rîsaleya xwe li ser pelê cigaran dinivişîne, bi qutiya kibrîtê nivîsên xwe derdixîne dervê. Di encamê de mahkeme li wan her yekê salek û nîvê cezayê dibire. Di navbera salên 1936´an û 1944´an de li Kastamonuyê dimîne. Di xaniyekî li hemberê qereqolê de dikin bin çavan.

Zêde kes nikanin têkiliyan pê re deynin. Bi nameyan tekiliyên xwe pêk tîne. Mercên koçberiyê li wê derê gelekî zor e û di bin zordariyê da ye. Li wê derê nameyan dinivîsîne û li dora xwe xelekekê çêdike. Rîsale-î Ayet î Kubra dinivîsîne. Li Kastamonuyê rojekê bi katibê xwe M. Feyzi rîsaleyê dide xwendin. Dinêre ku di rîsaleyê da guhertin hatiye kirin. Pir hêrs dikeve, kêra xwe derdixe û ew peyvên ku hatine guhertin, hemûyan dihewirîne. Gorbuhişt eger îro ji gora xwe rabûya, temaşe bikira, ka rîsaleyên wî û riya wî bi destê “Türk-İslam Senteziyan” çawa hatiye guhertin.

Heşt salan piştî koçberiya wî ya Kastamonuyê, wî koçberî Denizliyê dikin. Şagirtên wî jî dişînin girtigaha Denizliyê .Dema ku wî dibin Denizliyê, di Enqerê re derbaz dibin. Waliyê Enqerê Nevzat Tandoğan wî celb dike meqamê xwe. Melê Meşhûr bi qiyafet û şaşika xwe diçe cem. Tandogan lê heqaret dike, dibeje; ”tu nikanî bi şaşikê xwe werî vî meqamî!”.Destê xwe davêje şaşika wî. Bedîûzeman jê ra dibêje; “Nevzat, tu yê li serê xwe bibînî!.” Di demeke kurt da Nevzat Tandoğan di meqamê xwe da mirî tê dîtin.

Li serê wî derba mermiyê hebû. Digotin, întîxar kiriye. Piştra gotin li ser mesela jinekê lawê Îsmet İnönü, Omer lêxistiye.

Demeke kurt li Denizliyê dimîne. Li wê derê dîsa tevî şagirtên xwe yê Kastamoniyê tê hemberê dadgehê.

Dadgeh gelekî bi zor û tengasî derbaz dibe, gava ku ji girtigeha Denizliyê tahliye dibe, wî dişînin Emirdağa Afyonê. Salên 1946/47 li Emirdağê dema wî ya yekemin e. Li Emirdağê koçberiya wî bi zilim û zor, tadayî, êşkence, tengasî û jahrdayînê derbas dibe. Ajanê ku ji Rûsyayê anîbûn, jahrê amade dike û bekçiyekî dewletê di pencera paş xênî da dikeve mala wî, jahrê dike nav şîva wî. Dema ku şagirtên wî Mustafa Acet û Zübeyîr dikevin malê, dibînin ku M. Seîd xwe li dîwaran dixe û dipirpite. Teştê tijî av dikin û wî tazî dikin, davêjin nav teşê. Niv saetê şûn da ji xew radibe, dibêje; “wexta nimêjê derbaz bûye an na. Jê ra avê tînin, destnimêjê digre. Mistefa û Zübeyîr wî radikin ser piyan. Niyeta xwe tîne, lê belê Fatihe nayê bira wî. Ew dikevin binçengên wî û Zübeyr Fatihayê dixwîne. M. Seîd jî bi wî ra Fatihayê dixwîne û nimeja xwe temam dike. Piştî vê bûyerê Mele Hamidê Çewlîgê diçe ziyareta wî. Dema ku vê bûyerê dibihîze pir xemgîn dibe. Jê ra dibeje; ”tu çima li xwe dîqet naki. Dijminên te pir in”.M. Seîd dibêje; ”Xudayê min, min muhafaza dike, eger dilopeke wê jahrê biketa kevir, kevir dihaliya, dibû qûm.“

1948´an da li girtigaha Afyonê ye. Dîsa ew û şagirten wî bi ceza ye îdamê tawanbar dibin. Di Dadgeha Cezaya Giran da şerek mezin heye, di navbera wî û dadgehê da. Dadgeha Cezaya Giran a Afyonê di daviya dadgehkirinê da du sal ceza didinê. Biryara cezayê li Enqerê, ji aliyê Dadgeha Bilind da tê xerabkirin. Dosya dîsa tê Afyonê. Daxwaziyekê dide serokê dadgehê û dibeje; ”hakim û savciyê berê yên Dadgeha Cezaya Afyonê, di aleyhê min da bêdelîl, bi sebeba kîn û qereza xwe

ceza dan min. Ew biryar bi destê Dadgeha Bilind hatiye xerab kirin. Mahkemeya berê ceza da min û digot; ″Saîd Kurd e.″ Acep li dinê kes biryareke usa dide. Min welatê xwe û miletê xwe terk kiriye û jiyana xwe ji bona miletê İslamê û Tirkên dîndar feda kiriye û ez 28 sal e, îşkence û zilmê dibinim, dîsa min bi biraderên xwe yên Tirk ra samîmiyeta xwe ti car xerab nekiriye, 50 sal e, li hember nijadperestiyê têdikoşim û dibêjim; "Îslamiyeta Mîliye muqabilê her tiştî ye. ″Niha dadgeha Afyonê jî dibêje; "di vî mirovî da tamara Kurdayetiyê heye." Li min cezayê giran biriye. Dadgeha usa helbete divê were mahkûmkirin. Ew însanên ku usa bi destê qanûnê, bêqanûniyê çêdike, em ê zerar û ziyanên xwe li mahkemeya kubra ji wan bixwazin″.

1950´yî da DP tê îqtîdarê. Devra Mîlî Şef û CHP´ê diqede. Efa gelemperî derdikeve. Hemû daweyên wî dikevin. Lê belê tawanbariya wî bi destê dozgerên TC´yê naqede. 1952´an da "Gençlik Risalesi-Rîsaleya Ciwanan" tê çapkirin.

Li ser M. Seîde Kurdî dîsa mahkemeyê vedikin. Lingekî wî li Emirdağê û Îspartayê, lingê wî yê din jî ji bona dadgehe li Stanbolê ye. Piştî sala 1950´î bi ifadeya wî; "Devra Seîde sêyemîn" dest pêdike. Di wê demê da dest bi seyahetên xwe dike. Li bajaran digerê. Bi şexsiyetan re tekiliyê datîne. Di navê de dema ku dixwaze bê Enqereyê, li Gölbaşiyê pêşiyê lê digrin û nahelin bikeve Enqereyê. Polês Ebdulqadir ku di daîreya Îrtîcayê da dixebite, erebaya wî dide sekinandin û nahêlê bikeve Enqereyê. Ji eraba xwe derdikeve jê ra dibêje; "Hey hemnavê Şêx Geylanî, tu çima me didî sekinandin?″ Polês Ebdulqadir matmayi dimîne, di dilê xwe de dibêje; „navê min ji ku dizane?" piştre bersiv dide M. Seîd û dibêje; ″Emrê hukumetê ye, ji destê min tiştek naye. Ez ê li gor emrê hukumetê hereket bikim.″ M. Seîd bersivê didiyê û dibêje; ″Tu hemnave Ebdulqadir Geylanî yî, ez ji bona xatirê zarokên te dizivrim.″

Rojekê li Emirdağê li serê çiyê digere. Li cem wî Şagirtê wî Mustafa heye. Jê ra dibêje; ″rojekê ez bimirim, bila du şegirtên min, min livir bikin gorê.″ Şagirtê wî dibêje; ″tu merivekî navdar î. Çawa xebera kesekî nabe ku tu çûyi ser rihmeta Xwedê.″ Mele dîsa vedigere dibeje; ″belê, belê ciyê gora min ew ê, belli nabe. ″Bi destê xwe hareket dike û dibêje; ″piştî min dê ev(îqtîdar-DP) belav bibe.″

Ji hêlekê li Stanbolê dadgeha wî devam dike, li hêla din jî li Samsûnê li hemberê wî dadgeh tên vekirin. Mafê wî yê seyahatkirinê tên zefandin, dixwastin ku kabiliyeta wî ya çalekiyê biqefilînin.

Bedîûzeman ji bo “Medresetül Zehra” ji Serok Komarê Tirk Celal Bayar ra nameyekê dişîne. Di ciyekî wê nameyê da usa dibeje; ”şêst û penç salî berê min dixwest ku herim El-Ezher û li wê derê dersê bistînim. Lê nebû qismetê min. Bi hîkmeta Xwedê di dilê min da fikreke wiha rû da. Min got; "parzemîna Asyayê ji ya Afrîkayê mezintir e. ji bo vê divê li Asyayê medreseyeke mezintir bê avakirin. Ta ku qewmên İslamê yên wek Erebîstan, Hindîstan, İran, Kafkasya, Türkîstan û Kurdîstan bila bi destê netewetiya menfî xirab nebe.”

Mele Seîd di nameya xwe da behsa Kurdistanê dike, behsa pênç mîlyon Kurdan dike. Damezrandina Medresetül Zehra heta mirine di dilê wî da wek hesreteke mezin maye. Bi vê hesretê jiyana xwe ji dest daye.

Ne tenê piştî çûyîna wî ya rihmetê, dema ku dijiya jî dîsa risaleyên wî, peyivandinên wî hatibûn guherandin. Wek mînak, dema di sala 1952´yan da diçe Stanbolê, rojnamevan-nivîskar Eşref Edip di hevpeyivîna ku bi wî re pêk tîne û di Rojnameya Sebillürreşat da dide weşandin, da Bedîûzeman dibeje; ”min ji bona selameta îmana civakê axîreta xwe feda kir, li ber çavên min ti sewdayê Bihuştê(Cenetê) û tirsa Dojehê(Cehenemê) nîne. Ji bona civakê, ne tenê civaka bîst milyon Tirk, ji bo navê îmana bi sed hezaran civaka İslamê ne tenê Seîd, bila xezar Seîd feda be.” Di vê hevoka wî de, gotina “sed xezaran civaka İslamê” hatiye rakirin û tenê gotina ”ji bona 25 Milyon Tirk ne tenê yek Seîd, bila xezar Seîd feda be” hatiye hiştin. Mînakeke din; Bedîûzeman dema ku li Enqereyê bûye, şagirtê xwe Mehmet Kayalar bangî cem xwe kiriye. Jê ra dibeje: ”were birayê min ê Mehmet, rûne. Min dixwest ku ez îro bi te re bipeyivim.” Mehmet kayalar dibêje; "ez ketim navê min got; ´ez dikanim ji te re sohbeta dawî, wesiyeta dawî ya di pirtûka Emirdag Layîhasî da heye, bixwînim. Gelo ew name rast e, an na.” Li ser vê ji min ra got; ”Birayê Siddik bixwîne, ka ez mêze kim, ji ber xwe wan çi nivisîne”. Dema ku Mehmet Kayalar dest bi xwendinê dike û dixwîne, carna M. Seîd dibêje ”Kezabên çeteyan.” Nameya ku hatibû nivîsandin, lahîka û name nîne. Li ber te min ji şagirtên xwe ra wesiyetnameyek nivîsîbû. Tamamê wê vana ji ber xwe nivîsandine, vana çete ne. Çawa ji

Hz. Eli(r.a.) ra neheqî hatiye kirin, muxalifê min jî, li min iftira û zulmê dikin. Heyvax, heyvax daweyê çawa beravajî dikin, çawa tewişandine, çawa ji kenerê xwe derxistine." Dema ku ev axaftin di navbera Bedîûzeman û M. Kayalar da derbaz dibe, Kayalar jê ra dibeje; "ûstadê min, ev axaftineke dirokî ye, ku tu destûrê bidî, ez ê vê axaftinê bigrim bandê." Li ser vê gotinê Bedîûzeman dibeje; "belê birayê min, ev tişt bi destê şahsiyetên wek we werin qeydkirin ku bila herkes bizanê vana çawa dixebitin, esaleta vê dawaya qutsî çawa xirab dikin. Lê belê li vê dinê ji destên min bifilitin jî, di mahkemeya kubra da nikanin ji destên min bifilitin. Destên min di pesîra wan da ye."

Piştî seyaheta wî ya Enqereyê û Konyayê îqtîdara DP bi wasitaya radyoyê teblîxatê jê ra derdixîne ku vegere ciyê xwe Emirdağê.

Bedîûzeman Seîdê Kurdî nexweş dikeve, fam dike ku jiyana wî dê bidawî bibe. Ji şagirtên xwe ra dibeje; "Erebê amade bikin, ez ê herim welatê xwe". Erebê amade dikin, bi talîmata wî plakaya erebê bi heriyê tê nixûmandin û dikevin rê. Qet li cihekê nasekinin, bilî dema nimêjê. Xwe digihînin Rihayê. Li Rihayê şagirten wî jê ra di Otêla İpek Palasê da cih amade dikin. Wê demê parêzer Faik Bûcax ku pişti 1965´an serokatiya giştî ya TKDP´ yê girtibû ser xwe, di odeya wî da, wî ziyaret dike. Bedîûzeman çavê xwe vedike û bi zimanê xwe dipirse; "Kurê min ez li ku me?" F. Bûcax bi zimanê Kurdî bersivê dide; "Kalo, tu hatiyî welatê xwe Rihayê". Wê demê gelekî keyfxweş dibe û ji Xwedê ra şukur dike. Di radyoya Stanbolê da nûçe tên weşandin ku Seîdê Kurdî li Rihayê ye. Emniyet û mensûbê dewletê tên Otela İpek Palasê dibêjin; "Tu yê vegerî Rojavaya Tirkiye, heri ciyê xwe!" Ew dibêje;"Ez pir nexweşim, nikanim ew qas rê herim."

Rewşê radigihînin Enqereyê. Wezîrê Hundurîn Namik Gedik xeberê dişîne dibêje:"di çi halî de bibe bila bibe, ew ê vegere İspartayê." Emniyet tê emrê N. Gedik jê ra tebliğ dikin. Şagirtên wî û welatparêzên Kurdan li dora otêlê kom dibin, berxwe didin, nahêlin ew bizivire İspartayê. Dema ku talîmata Namik Gedik jê ra dibêjin, radibe ser piyên xwe û dibêje; "Fesuphanallah! Ez ji bona seyahatê nehatime vê derê, ji bona ku ruhê xwe teslîmî Xwedayê xwe bikim, hatime vir.". Berxwedana gel, şagirtên wî û welatparêzên Kurdan hukumeta DP´yê ji biryara wê vedigerîne. Toxtor tê wî muayene dike. Harareta wî her saeta ku derbaz dibe, bilind dibe. Di 23´yê

Adara 1960´î da saet li derdora 03-3.5´an da jiyana xwe ji dest dide û diçe ser dilovaniya xwe û cem Heqê xwe. Di Amadekirina merasima cenazeya wî da F. Bûcax, Kemal Badilli û welatparestên din jî cih digrin. Ji rojavaya Tirkiyê bi deh hezaran şagirtên wî tên. Li Kulliyeya Birahîm Peygamber tê hilanîn(defînkirin). Wek min li jor nivîsandibû, parezer Faiq Bûcax hakimê Dadgeha Sulh Huquqê tîne û terekeya wî tespît dikin. Terekeya wî; di zembîleke qamîş da du destmal, cotek gore, du derpê, du fanîle, fîstanê wî, di nav paçekî de 7,50 TL pere, seçadeyek û misînek derdikeve.

Mele Seîdê Kurdî 34 salan şûnda hat Kurdîstanê. û koçberiya wî ya rojava 34 salan devam kir. Cenazeyê wî li Kurdîstanê hat hilanîn(defnkirin). Le belê dagirkerên Tirk û dijminê Îslamê ji Termê(cenazeya) wî ra tahamûl nakin. Diçin cem birayê wî Abdulmecid Ünlükul, wî digrin, dibin Rihayê. Li wir bi zorê, qaşo bi devê wî daxwaznameyekê pê didin nivîsandin û didin îmzekirin. Di 13´ê Tirmeha 1960´î da cûntaya nijandperest dora Rihayê bi tank u topan digire. destûrê nadin gel derkeve derva. Termê(cenazeya) wî ji gorê derdixin û dibin li ciheke din vedişêrin.

Li ser aqîbeta cenazeya wî du îdîa hene. Yek, dibêjin termê(cenazeya) wî birine avêtinê Behra Spî. İdîayeke din jî dibejin; termê(cenazeya) wî erê dibin Afyonê, piştra jî dibin Ispartayê di nav daristanekê da vedişêrin.

Di ser vê bûyerê re 52 sal derbas bûn, hê ev bûyer zelal nebûyê. Mele Seîdê Kurdî ne tenê di jiyana xwe da, di dawiya çûna xwe ya Heq da jî dîsa bi destê dagirkeran û zordaran hat û koçberkirin. Bi kurtayi, Komara Tirkiyeyê ya Kemalîst çawa termê(cesedê) Şehîd Şêx Seîd û 46 rêhevalên wî, Şehîd Seyid Riza û 6 rêhevalên Wî, Şehîd Xalit Begê Cibrî, Şehîd Yûsûf Ziya Begê Bedlîsî û ev bîst û heşt sal e, ji cenazeyên gerîla ditirse, goristanê wan zelal nînin, ji cesedê Mele Seîdê Kurdî jî tirsiyan û hê cesedê wî ne kifşe ye ku li ku derê hatiye veşartin.

Hevberkiya(Kemperandina) SEÎDÊ KURDİ û Cemeeta Fettullah Gûlen:

Fikr û Ramanê Melê Meşhûr û rîsaleyên wî hem di dema jiyana wî da hem jî piştî çûna wîya ser dilovaniya xwe, bi destên şagirtên wî û bi destên yên ku dibêjîn em şopînerên wî ne hatine guhertin. Ji nav rîsaleyên wî da nêzikî pênç sed cuda cuda navên Kurd u Kurdîstanê hatine derxistin. Çend minakên

vê yekê li jor di nivîsên min da hatine dayîn. Dema ku mirov "Tarihçe-i Hayat" û rîsaleya wî ya bi navê "Divan-i Harb-i Örfi-iki mekteb-Musibetin Şahadetnamesi" di weşanên Tenvir û Weşanên Sözler, Envar û Yeni Asyayê de bîne ber hev kemperandina wan pirtûkan bikin, rastî derdikeve holê. Rîsaleya wî ya bi navê Mûnazarat (Vek reçete-i Kurdîstan) hatiye guhertin. Mehmet Kutlular di rojnameya Vakit da bi Adem Balta ra hevdîtinekê pêk tîne. Di vê hevditinê da îtîraf dike ku navê Kurd û Kurdistanê ji nav rîsaleyên wî bi destên şagirtên wî Zübeyr(Gündüzalp) hatine derxistin. Mele Seîdê Kurdî wek min li jor jî nivîsiye, hevpeyvîna xwe ya bi Mehmet Kayalar da ji ev ên ku di rîsaleyên wî da guhertin çêkirine, ra dibêje ″wan kezzaban, wan çeteyan″. Bedîûzeman di dawiya rîsaleya xwe da ya Hitabên ji Hürriyetê ra(İçtimai Reçeteler 2) di sernivîsa xwe ya „Hatime" da dibeje; ″ger ez ji bona cins(Kurd)ê xwe tiştekî nebêjim, li gora min gotin kêm dimine″ û despêka gotina xwe ya dawî ji cins(Kurd)ê xwe ra dibêje; ″Ey Kurdên di şerên dema Asûriyan û Kiyaniyan da pêşengiya leşkerî kirine! Edî bes e, hûn pênç sed sal e, raketine. Edi rabin, sibe ye. Ger hûn ranebin, meydana wahşet û gafletê wê we talan bike″.Gotina wî derket. Em ji xew dereng rabûn. Wahşet û gafletê em payimal kirin.

Kemalistê wek Cemal Kutay dibêje, Mele Seîdê Kurdî tornê(neviyê) Cengîz e. Çimku navê bavê Wî Mîrza ye. Mîrza navê begên Tirkan e.″ Ev îftîra bê minet e. ji ber ku Mele Seîd Cengîz wek Deçalê sed sala wê demê dibîne.

Disa Kutay ji bona wî dibêje, Melê Meşhûr Seîd di parastina xwe ya dadgeha Denizliyê da dibêje; ″ez Seyîd nînim, Mehdî ji Ehl-î beytê Ali ye ku ji sûlaleya peygamber tê.″.(çavkani: Parastina Rîsale-î Nûr weşanên Tenvir rûpel:144). îftirayên Kemalîstan bê minnet in, lê belê îftirayên Misilmanên ku dibêjin em Misilman in, naye qebûlkirin.

Em nika jî werin ser hevberkiya cemeeta Fetulah Gûlen û ser M. Seîd: Mele Seîd tu car nebûye girêdayiyê desthilatdaran (îqtîdaran). Li ber desthilatdaran serê xwe xwar nekiriye. Ew avêtine tîmarxanê, girtigahan, koçber kirine, jar danê, zor û zulm lê kirine, lê wî serî dananiye. Wî têkoşina xwe li hemberî dewra Îstîbdatê, dewra Meşrûtiyetê, dewra Cumhuriyetê (dema dîkttatoriya M. Kemal, şefê netewi Îsmet Înonû, dewra DP´ê) domandiye. Fetulah Gûlen her dewrê û demê bi desthilatdaran ra îtîfak çêkiriye. Bi Cûntaya 12 Îlonê ya mîlîtarista faşist ra bi

wasiteya Mehmet Kirkinci Xoce têkilî daniye. Di kovara xwe Sizinti´yê da pesnê cûntayê daye.

Gûlen digot ger leşkeran darbe pêk neaniyana, ji miletê Tirk ra ji dilmayînê û giriyan wêdetir tiştek nedima.

Tiştekî matmayî ye, dema ku cûnta hat ser desthilatdariyê, ji hela devletê da li Fetulah Gûlen dihat gerandin. Ne tenê di dewra cûntayê de, di dewra Özal, Demirel, Çiller, Erbakan, 28´ê Sibatê, Anasol, Ecevit û di dewra AKP da têkiliyê wî her dem bi îqtidaran û devletê ra germ bûn. Bi hemu îqtîdaran ra tekiliyên nerm, prensîba Fettullah Gûlen e.

Mele Seîdê Kurdî ti car nasnameya xwe înkar nekiriye. Di risaleyên xwe da li sed ciyî dibêje ez Kurd im. Kurd perweriya wî ne nijadperestî ye. Bedîûzeman hemû misilmanan wek hev dibîne. Ji bo wî ti ferqek di nav van da tune. Dixwaze Tirk be, Ecem, Ereb, Hîndî, Pencabî, Kurd, Afrikayî, Asyayî, çi dibe bila bibe, ferqê di navbera van da nabine. Dibêje; „unsûriyet (neteweperestiya menfi) macûneke ji nijadperestî, durûtiyê, zehmetî û gafletê çêbûye. Seîdê Kurdî neteweperestekî mûspet e, ne menfî ye. Xwestiye ku neteweyîtî jî, ji cehaletiyê derkeve, îlm, fen û zanista olî perwerde bibe, xwe bigihîne mistewa miletê din.

Fetulah di nameya xwe ya bi mebesta 28´ê Sibatê ji Çevik Bir ra şandiye de, wiha dibêje; ”Serleşkerê min ê Heja, di nav arteşa me de wek serleşkerekî mezin hûn jî takdîr dikin ku bajarên Serhedê, bi taybetî yên wek Erzirom, Qers û Erdexan tim û tim bi destê dijminan hatine dagirkirin. Ji bona vê, hestên neteweyî di nav gelê wan bajaran da pir paşve mane. Min zaroktiya xwe li van deran bi eş derbas kir û ez li van deran mezin bûm. Ev der ji nav şerê Cihanê yê Yekem derketiye, ketiye nav şerê azadiyê, piştre di dema Şerê Cihanê yê Duyemîn de ji di bin tehdîta Sowyetan da maye. Di zarokatiya xwe da ez bi hestên xwe yên neteweyî û bi eşqa xizmetkirina welatê xwe hişyar bûm. Bi fermî min di nav diyanetê da, li mizgeft û li ser kursiyan ev hestên xwe anîn ziman. Min di her firsetditînê de xwest ku ez di her ferdekî me da hestên neteweyetiyê yên heyî û hestên xizmeta ji bo welat gurtir bikim.

Min her demê bang li cemeetê kir ku bila zarokên xwe bi îlm û îrfanê bi bidin perverdekirin û paşverûtî di nav me da bûye

sedemên cehalet, feqîrtî û dubendiyê. Divê em vana ji nav miletê me rakin û bi qanûnan yekitiya xwe qewîn bikin.”

Wek wî di nameya xwe da jî nivîsandiye, Fetulah mirovekî neteweperest e. Neteweperestîbûna wî musbet nîne, menfî ye. Dixwaze di bin serokatiya Tirkan da yekîtiya Îslaman pêk bîne û hemû Îslaman bi TC´yê ve girê bide. Jê pirs dikin, dibêjin; „tu çima di xortaniya xwe da neçûyî, te Bedîûzeman nedîtiye?“ Bersiv dide; “Her Erziromî di zikê dayîka xwe de piçkekê neteweperest çêdibe. Ez însanekî neteweperest im, lê nederketina Seîdê Nûrsî ya ji Anatoliyayê, min ji xwe ra kir pirsgirêk. Ji bona vê ez neçûm cem”.(Çavkani Yeni Yüz yil kitapliği seri 9. Nivisa Ömer Polat www.Kurdîslam.org /Bedîûzeman´in amaci. 17.04.2006).

Wek hûn jî, dibînin Fetulah neteweperestekî menfî ye. Ji bona nasnameya M. Seîd neçûye ew nedîtiye. Serkêşiya senteza Tirk-Îslamê îro ew temsîl dike. Damara nijadperestiyê di wî da, ji damara Îslamiyê hîn Zêdetir e.

M. Seîd di rîsaleya xwe ya Sunûhat de nivîsandiye; ”Hişyarbûna fikrê neteweyî yê mûsbet, dibe sedema ku tu ji cins(milet)ê xwe hez bikî, hev du nas bikî û alîkariya hev bikî. Ya menfî jî mirov dibe nijadperestiyê. Ew jî bi xwe înkar û redê tîne û rikdariyê tîne”. Ev îfadeya Bedîûzeman rûye herkesî yê reş derdixîne holê.

Piştî Şerê Cihana Yekemîn, Şerîf Paşa û Bogos Paşa di civîna Parisê da tên cem hev dû. Biryar tên girtin ku di rojhilata Anatoliyayê de dewleteke Ermenistan û Kurdîstan were damezirandin. Seîdê Kurdî û çend kesên din, telgrafê dişînin ku ABD li hemberê vê pîlanê derdikeve. Konsolosa ABD´yê bangî M. Seîd û heyeta ku li Kurdîstanê vedixwîne Konsolosa ABD´yê. Di navbera M. Seîdê Kurdî û konsolosê ABD´yê da nîqaş derdikeve.

Konsolosa ABD´yê jê ra dibêje, dê neticeya vê yekê xerab bibe. M. Seîd bersiva wî dide: ”Hê xwîna penç sed hezar Kurdî ziwa nebûye. (Xwîna mîlyonek Ermenî jî ziwa nebûbû-S. B.). Bihevrabûna me û Ermeniyan pêk nayê. Kurdistan misilman e û divê azad û serbixwe bimîne. Tehdîda we ji me ra fayde nake, ya we ji bona me tehdît nabe. Hûn nikanin herin serê çiyayên Kurdîstanê.“

Wê demê Gemiyên ABD´yê nikanibûn derkevin serê çiyayên Kurdîstanê, lê mixabin Heronên ABD´yê li ser ezmanê Kurdîstanê difirin û îstihbaratê didin TC´yê. (SB).

Her çi qas di axaftina xwe da, ya bi konsolosê ABD´yê yê Stanbolê re, dibeje; “hê xwîna penç sed hezar Kurdan ziwa nebûye” jî, lê di Şerê Cihanê yê Yekemîn da li hemberî mîlîtanên Taşnaxan şer kiribe û di wî şerî da dîl jî ketibe, dîsa dema şer da ji kesên dora xwe ra, li ser cîranê xwe yê Ermenî wisa dibêje; ”îstibdat û dîktatorî sedemên neyartiyê bûn, û mirin. Di dawiya diktatoriyê da bila bîjî dostanî.“

„Ez ji we ra vê bi mîsogerî dibêjim, seadet û selameta welat bi dostî û yekîtiya Ermeniyan ve giredayî ye. Lê ne bi awayeke zelîl, bi hêvişandina îzetê, destdirêjkirina aştiyê ye. Him jî ew hîşyar bûne, lê hûn hê di xew da ne. Û him jî ew bi ramana neteweyî bi hêz bûne. Hûn jî di nav dubendiyê de vêga vik û vala ne. Li gora min yên ku şûr lêdixe, derba wî şûrî vedigere zarokên sêwî. Divê şûr di bin destên biaqil da be. Sedemên hevaltiyê hene, çim ku cîran in. Him ew hîşyar bûne, li dinê belav bûne, tovên peşveçûnê kom kirine, ew ê li welatê me biçînin. Me mecbûrî şarezatiyê dikin. İqazkirina peşveçûnê dikin, di me da hestê neteweperestiyê hîşyar dikin. Eger Ermenî ji me ra neyartî kiribin jî, sedemên vê neyartiyê jî ew fermandarên ku nifaq xistine nav me, ew in.”(İçtima-i dersler rûpel:107).

GOTINA DAVİ: Me Kurdan di dirokê da xwedîtî li Kurdên hêja yên ku ji nav me derketine, nekiriye. Me nirxên xwe dernexistine holê. Ji nav me gelek mirovên hêja yên wek M. Seîde Kurdî derketine. Divê em li ser dîrok, wêje, feylezofê xwe yên hêja lêkolînan bikin. Divê em insanê xwe yên heja nas bikin. Vek Rohat Alakom jî dibeje, Seîdê Kurdî çiroka bîrbûnê ye. Em heta iro Seîdê Kurdî bi nivîsên çep, îslamci û Kemalistên Tirkan nas dikin. Em insanê xwe di şert û mercên dema ku tê de jiyanê, nabînin. Belê M. Seîde Kurdî dixwest ku hemû gelên misilman di bin sîwana Komareke Îslamî da cih bigrin. Digot; di bin wî konî da ciyê Kurdan jî hebe. Kurd kanibin di bin vî konî da li zimanê xwe, nasnameya xwe xwedî derkevin. Bi zimanê xwe perwerde bibin. Heq û huqûqên wan di nav ciranên xwe da werin naskirin. Lê hareketa Îslamî di Rojhilata Navîn da nehatiye vê konaxê. Fîlozofê îslamê yê herî mezin Hasan El Benna, di cihanê da problema hemû gelên İslam ditiyê, lê tenê pisgirêka Kurd neditiye. İslamên Tirk pirsgirêka Filîstîniyan

dîtine, pirsgirêka Kurd nedîtine. Dîtina pirsgirêka Kurd em li wê derê bihelin, di Rîsale-î Nûr da çiqas peyvên wek Kurd û Kurdîstanê hene, hemû jê derxistine. Neteweya Kurd ne tenê hedefa hovîtiya mîlîtarizmê ye, hedefa xerabkirina çand û hunerê jî ye. Pirtûk, nivîs, televîzyon û rojnameyên Kurdan jî hedefên dagirkeran in.

Eger em li nirxên xwe xwedî dernekevin, wê dagirker li van nirxan xwedî derkevin. İro ew li M. Seîdê Kurdî xwedi derdikevin. Rîsaleyên wî dejenere dikin û li hember me bi kar tînin. Sibe Exmedê Xanî, Mele Ehmede Cizîrî, Faqiye Teyran, Elî Herîrî jî wê li dij me bi kar bînin. Wê Zaroyên me û neviyên me jî, nirxên ku ji nav me derketine, bi vasiteya dagirkeran nas bikin. Divê em vê çarenûsa neçê, bizivrinin.

Rabin ser xwe perwerde bin, bixwînin, lêkolînan bikin. Li zimanê xwe, li dîroka xwe, wêjeya xwe, degerên xwe xwedi derkevin. Derengmayin zîlet e, koletî ye, mirin e!

Çavkani:

1. Divan-i Harb-i Örfi –Bedîûzeman Said Nûrsî- Tenvir Neşriyat-Stanbol.
2. Tarihçe-i Hayat-Abdurrahman Nûrsî.Müküslü hamza-Tenvir Neşriyat-İStanbol.
3. Hutbe-i Şamiye –Bedîûzeman Said Nûrsî tenvir Neşriyat-İStanbol.
4. Nurculuğun Tarihçesi-Mihemed Siddik Şeyhanzade-Tenvir Neşriyat
5. Said-i Kurdî Bir Unutulmuşluğun hikayesi-Rohat Alakom-Firat yayinevi-İStanbol.
6. Naci Kutlay- Îtîhat-Teraqîve Kürtler vejin yayinlari-Stockholm.
7. 21 yy.Kürtler-Naci Kutlay peri yayinlari-İStanbol.
8. Kürt Milet hareketler ve Irakta Kürt İhtilali-Dr.Şivan Apec yayinlari-Stockholm.
9. Hatiratim-Musa Anter-Doz Yayinlar 1990-İStanbol
10. Fettullah Gûlen ve Said-i Nûrsî Gerçeği-Ronî Alasor-Bruksel.
11. Prof.Dr.Yehezkel Landeu-Nuriye Akman Röportaji-Zaman gazetesi 1.11.2004
12. Bediüzaman’in Amaci Kurdistanmiy di?-Ömer Polat Kurd-İslam.org 17.04.2006

کتێبخانەی هەواڵنامە

## Hevpeyvîn

Mele Şafiî

*Pirs 1: Em xwe baş nasnakin, ya qet, ya jî kêm û nîvê nas dikin. Navê Seîdê Kurdî, Seîdê Nûrsî, yek ji wan navan e ku di serê lîsteya navên navdar de cîh digre, ev bêşik e. Belê em kurd çendî wî nas dikin bişik û bigoman e.*

*Mebesta me ji vê hevpeyvînê ew e ku em zatekî mezin, kesayetiyeke xwe, Bedîûzemanê Kurd bi alîkariya kesên xwedîgotin baştir nas bikin.*

*Nivîskar Cemalettin Canli, „Bo ku Seîdê Nûrsî bête fêmkirin, divê Kurdistana sedsala 19´emîn bête fêmkirin. Divê hewldanên terîqên wê demê bêne fêmkirin. „(NETKURD, 2010-09-25) dibêje. Gelo ev şert e, hun çendî bi vê dîtinê re ne?*

**Bersiv 1:** Seydayê Mele Seîdê Kurdî li bakurê Kurdistanê di nav çiyayên bilind gundê Nursê, li navçeya Hîzana bajarê Bedlîsê di sala 1876´an de (1293´an Hîcrî) ji dayîk bûye. Navê bavê wî Mîrza ye, navê diya wî jî Nûriye ye. Di zaroktiya xwe de her dem bi civaka mezinan re û bi âlimên gund re radibû û rûdinişt. Tiştê ku pê negihîştibûya yan jî nizanibûya, dipirsî û dixwest bizane. Ji bo ku dest bi îlmê erebî bike, di sala 1882´an de diçe gundê Taxê. Li ber destê Mele Mihemmed Efendî û li cem birayê xwe yê mezin Mele Evdullah dest bi xwendin û dersê dike. Seyda li cihekî pir nedisekinî. Ji wir diçe medresa Bedlîsê ya Şêx Muhammed Eminê Bedlisî. Ji vir jî diçe Muksê. Ji wir jî diçe medresa Bazida Agirî li cem Mele Mihemmed Emin dixwine. Ji wir jî diçe Medresa Mihemmed Celalî. Ew di sê mehan de îcazeya xwe distîne û Seyda di nav tevahiya alimên Kurdistanê de û di zemanê kurahiya teriqet û şêxan de ku bixwe jî ne kurê Şêx û Mela bû, bû xwediyê şohreta mezin û navdar. Seyda bû âlimekî muteqî (ji Xwedê ditirsiya). Zû bi nexweşiya Kurd û Kurdistanê hesiya. Li çareseriyekê geriya. Alimekî xwedi îtibar û li cem her kesî jî hûrmeta wî hebû. Ti kes nikare bibêje zekat, fitre û hediye girtiye. Wî ji dewletê jî Maaş nestandiye. Baweriya min ew e ku, ew herdem li cem heq, edalet û rastiyê bûye. Ew şaibeyên ku têne belavkirin, ku ew bi

dewletê re bûye, ne rast e. Lê dibe ku li gorî ez jî pê dizanim, di çend cihan de hatiye xapandin. Lê belê, Seyda jî bi xwe poşman bûye. Bi baweriya min di esra wî de yên mîna Seyda hindik hebûn, an tune bûn. Lazim e, em Kurd bi vî rengî nêzikî Seyda Seîdê Kurdî bibin û xwedî lê derkevin.

Em gotina Nivîskar Birêz Cemalettin dûr nabînin, eger em sedsala ku Seyda tê de jiyaye, tev li ser terîqên wê demê zêdetir lê bikolin, Seyda rastirîn tê nasîn. Lê belê bê vana jî mirov dikare di dîrokê de mîna alîmekî bêemsal û bêhempa bibîne û bizane.

> ***Pirs 2:*** *Mîna tê zanîn Seydayê giranbiha bi dirêjaya temenê xwe hejmarek nav bikaranîne wek Seîdê Kurdî, Seîdê Nûrsî, Said Mirza Efendi û hwd. gelek caran jî bi navê Bediûzeman behsa wî dibe.*
>
> *Li gora hinan Bedîûzeman gotiye "bi navkirina min wek Seîdê Kurdî min nerehet" dike û bervaja hin jî dibêjin ku gotiye na "tu aciziyiya min tune ji vê" gotiye, kîjan rast e gelo ? Em dixwazin li ser van navan dîtinên we bigrin û bizanibin têkiliya navên bikaranîne û demê çendî heye bi hev re?*

**Bersîv 2**: Bi rastî navê Seyda Seîdê Kurdî ye û bi vî navê xwe jî deng daye û hatiye naskirin. Ji aliyê âlimên Kurdistanê de hatiye dîtin ku Seyda di îlm û teqwa xwe de xortekî pir li pêş û ecêb e, lewra navê Bedîûzeman lêkirine. Yanê di zemanê xwe de xerîb û ecêb e. Heta zemanê Ataturk ji terefên Şagirtên wî de ji Seyda xwestine ku em di şuna Seîdê Kurdî de Seîdê Nûrsî binivîsin. Eger em wer nenivîsin, emê ji îdareya dewletê zerar bibînin. Seyda bêxwestin û bêdil qebûl kiriye. Seyda di dawiya pir name û pirtûkên xwe de Seîdê Kurdî nivîsandiye. Cîhê ku bi hêrs ba jî, digot, Bavê Qe-tune Seîdê Kurdî. Ew ên ku dibêjin, ew ji navê Seîdê Kurdî aciz bûye, ew şaş in, lê Seîdê Nûrsî kerhen (bêdil) qebûl kiriye.

> ***Pirs 3:*** *Zaroktî, malbat û gerên Seîdê Kurdî, coxrafya sefer û serdanên wî di zemanê feqetiyê û piştî mentehîbûn û Seydabûna wî de, dibêjin çûye Şamê, Bêyrûdê û hwd. di vê derbarê de tiştên hun ji xwendevanên me re bêjin çine?*

**Bersiv 3:** Di bersiva yekemîn da gera wî ji bo feqîtiyê hatiye zanîn. Piştî mûntehibûnî ji bo serdana xwenga xwe 1911'an da

çûye Şamê. Li Şamê di Mizgefta Emewî da li huzura gelek alimên Kurd û areban û gelek kesan da bi navê Xutba Şamiye xutbe xwendiye, xutba wi jî bi taybet li ser nexweşiya âlema Îslamê (Rojhelata Navin) û çareserkirina wan nexweşiyan bû. Bi taybet li ser biratiya gelan bû. Ew wiha dibêje: „Hûn dizanin Gelê Kurd jî birayê we ye û ji her mafî bêpar maye. Ew ji zerarê tîne.„ Kî bixwaze, dikare „Xutbeya Şamiye" bixwine. Piştra hatiye Beyrûtê, paşê di riya Behrê re çûye Stenbolê. Rojekê ew û Sultan Reşad bi hev re hevaltiyê dikin, diçin Rûmeliyê. Careki din ji Sultan Reşad ji bo Medreseya Zehra alîkarî xwest, soz ji sultan girt, ji ber destpekirina Şerê Cihanê yê Yekemîn ew soz nehat bicihanin. Ji xwe berê ji Sultan Abdulhemîd ji ev tişt daxwaz kiribû, lê mixabin bi dîntiyê sûçdar kiribûn û avêtibûn timarxaneyê, heps û zindanan.

> ***Pirs 4:*** *Dîroknasên jiyana Seîdê Kurdî, dibêjin ku wî qet ji kesekî pirs nekirine û di nîqaş û minazereyên di nav wî û aliman de tim serdest bûye. Heta tê gotin ku dema di salên Meşrûtiyeta II de, pêlakê li otêleke Stenbolê maye û li ser deriyê xwe jî ev îbare nivîsandiye: " li vir pirs nayin kirin bersiva pirsan tê dayin", ev çendî rast û çendî rîwayet in, şîroveya we?*

**Bersiv 4:** Rast e, di niqaş û munazeratan da Seyda ji kesî sual nedikir. Di 1907´an da diçe Stanbolê li herema fatihê, di Xana Şekercî da dibe mêvan, li wir Muhamed Akif u meşhûr muderisê ilmê gramera erebî Ustad Celalî dibine û gelek alim û rewşenbîrên din jî dibine. Di nav çend rojan da her kes pê dihesin ku alimekî meşhûr hatiye. Her kes, çi alim çi ne alim, ji bo muşkilên xwe hal bikin, berê xwe didin otêlê. Seyda li ser derê oda xwe lewheki dinivîse, "li vir ji her pirsê ra bersiv heye, lê belê ji ti kesî pirs nayê kirin." Li Stanbolê alimên mezin ên binav û deng pêdihesin ku alimekî mezin hatiye vir. Ji her kesî Meydan dixwaze, yani ji bo niqaşê hatiye. Temamê wan aliman xwe bi her cure pirsan amede dikin û ji bo munazere û niqaşan tên ba wî. Lê tu kesek serdest nabe û hemû mexlûb dibin. Ji Misre muftiyek bi navê Buxit Mutîî hatibûye Stanbolê. Ulemayê Stanbolê je ra behsa şohreta Mele Seîdê Kurdî dikin, ew jî daxwaza dîtina Seyda dike. Tê cem Seyda û dest bi pirsân dike û dipirse: "Li ser vê huriyeta ku di Dewleta Osmaniyê de heye, ditina te çiye û tu ji bo medeniyeta ku li Ewrupayê heye, çi dibeji?" Seyda di bersiva xwe de wiha dibeje: "Dewleta Osmanî bi medeniyeta Ewrupayê hamile ye. Rojeke dê biwelide.

Ewrupa jî bi islamiyetê hamileye, ew ê ji rojekê biwelide." Muftiyê Misrê dibeje; "ez bi wî ra êdî munazere û nîqaşê nakim, ji ber ku ew alimekî di ser me ra ye."

Disa muderisê Medreseya Fatihê bi navê Hesen Fehmi Başoğlu jî wisa dibêje; "ji aliyê gelek talebe û aliman ve hatiye gotin ku xortekî bi navê Bedîûzeman hatiye Stenbolê, li ser derê odeya xwe nivîsiye; "li vir çiqas pirs hebin, tên bersivandin, lê ti ji kesekî pirs nayê kirin." Ev îdiayeke ne li cih bu. Min daxwaz kir ku vî alimî ziyaret bikim. Min biryar da, wê şevê hin kitêbên di îlahiyatê de tên xwendin, hinekî cihên çetin û bi zehmet in, amade kirin. Rojekê piştre çûm serlêdana wi. Min dest bi sualên xwe kir. Lê wî bi cureyeke ecêb û harîka bersiva min da. Min digot, dema ku min ev pirs ji wan kitêban derdixistin û amade kirin, te digot qey ew jî li cem min bûye. Min êdi dizanibû ku ew alimekî mezin e. Mirov nikare vî îlmî bi xebatê bi dest bixê, ev dayîna Xwedê ye. Dema ez vegeriyam nav şagirtên xwe, min ji wan re got; "ez hetanî niha rastî mirovekî wiha nehatime, yên mîna wî nehatina nav gelan û ez bawer nakim bên jî.

> ***Pirs 5:*** *Aliyekî din yê Seîdê Kurdî ku mirov li ba piraniya alimên olî yên welatê me û gelê Rojhilata Navîn nabîne ew e, ku di ber pirtûkên olî re gelek pirtûkên zanyarî jî xwendine, ev pirtûk çi bûn, çawa pêde dikirin û kengî bi giranî xwendin, hun dikarin xwendevanên me serwext bikin?*

**Bersiv 5**: Belê cudakirinekî mezin di mabeyna Seyda û ulemayên rojhilata navîn da heye, lewra Seydayê Mele Seîdê Kurdi tenê kitabên oli nedixwend, belkî temamê îlmên cuda ji dixwend û hifz dikir. Bi erbabê wan îlman ra daima di niqaş û munazeran da bu.

Seyda di sala 1892´an de diçe Mêrdînê. Zemanekî di mizgefta Mêrdînê da dimîne. Waliyê Mêrdînê dibihîze ku Mele Seîdê meşhûr hatiye Mêrdînê, ditirse, dibê dê ji wî zerar çêbibe, pêwîst e, em wî ji Mêrdînê dûr bixin. Gazî dike bi darêzorê dişîne Bedlîsê. Waliyê Bedlîsê Umer Paşa xeberê digire Seyda hatiye. Gazî dike, dibêjê, ez cihekî ji te ra amede dikim. Seyda ewil qebûl nake, piştî israr û lavakirinê qebûl dike. Seyda li wir nêzi 80 kitêbên ku li ser esas û bingehên olî mutale û hifz dike. Li wir bi walî re her tim di niqaşa îlmê fenî yên wek fizîk, matamatîk û coxrafiyayê de bû. Seyda kêmasiyên xwe didît û

digot; "divê ez van îlman jî bixwinim û mutale bikim. Wan kitêban digre, bi hinek mamostan ra têkiliyê çêdike, ji wan îstîfade dike. Him mutale dike him jî bi wan mamostan ra niqaş dike û paşê diçe Wanê. Bi alîkariya Umer Paşayê waliyê Bedlîsê waliyê Wanê Hesen Paşa jî lê xwedî derdikeve. Paşê jî walî Tahir Paşa cih didiyê, rastî mamosteyên ilmî yê teze tê. Ji wan riyadat, felekiyat, kîmya, fizîk, biyolojî, felsefe, tarix, coxrafya û yên din fêr dibe û istîfade dike. Heta kitêbekê matematîkê amade dike û dinivîsîne, paşê ew kitêb di nav hinek kitêban da hatiye şewitandin.

Şuhreta Seyda zêde dibe û leqeba Bedîûzeman digre, yanî di zemanê xwe da alimekî ecêb û xerîb e.

> ***Pirs 6:*** *Xisleteke din hêza jiberkirinê ye, hinek behsa 90 cildên jiberkirî dikin, tiştekî wiha mimkun e, ev çendî efsanekirin û çendî raste?*

**Bersiv 6:** Seyda pir zekî bûye, di zekaweta xwe da bêemsal bûye. Şubha kesî tune, lê 90 cild kitêb hifz kiriye, nikarim bêjim, lê dikarim bêjim, Seyda metnê 80 kitêbî ezber kiriye. Metin ji ew e: Eger kitêbek ji 100 rûpelî pêk bê, metnê wê kitêbê dibe 10 rûpel. Dibe ku tiştek ji deh rûpelan zêdetir an jî kêmtir jî bibe. Rind nîne, mirov îfrat û tefrît bikin, yanê di derheqê wî da pir zêde medh û pesnên ku eql û mentiq qebûl nake, mirov bikin, ne rast e.

> ***Pirs 7:*** *Dema çûye ba Siltan Evdilhemîd ji bo vekirina zanîngehekê mîna El Ezhera li Misrê, dibêjin ku di nav daxwazên wî de xwendina dersên pozîtîv li dibistanan jî hebûye, da ku rê li teesubê bigre. Encamên vê hevdîtinê çawa bûn, di vê derbarê de şîroveyên **we?***

**Bersiv 7:** Seyda dema diçe ber derê Qesra Yildizê, mubawêynê Sultan Evdilhemîd wî pêşwazî dike. Mubawêynê Sultan dibê fermû; "ka tu kî yî û tu ji bo çi hatiyî?". Seyda dibê; "ez Mele Seîd im, ji Kurdistanê têm. Dixwazim bi Sultan re hevdîtinê pêk bînim. Mubawêyn dibêje; „Hevdîtina bi Sultan re ne mimkûn e." Li ser vê di navbera wan de niqaşekî mezin derbas dibe. Piştî nîqaşê Seyda daxwazên xwe bi nivîskî radigihîne Sultan. Bi kurtî di daxwaznameya xwe de wiha dibê je: „Kurdistan nexweş e, min teşxis kiriye û dermanê wê ev e. Divê mina El Ezhera Misrê li Kurdistanê jî medreseyeke kurdî were vekirin û ew medrese ji zul cenaheyn be, yani him îlmê olî, him jî îlmê

cedide yên wek fizîk, kîmya, riyadat, coxrafiye, hêsab were xwendin.”

Ji bo ku Seyda medreseyeke kurdî li Kurdistanê xwest, ew xwestin ne bi dilê Sultan bu. Sultan di cî da emir kir û got; “wî bavêjin neweşxana dînan.” Ew girtin û avêtin tîmarxaneyê. Heyeteke doxtaran diçe timarxaneyê ku Seyda muayene bikin, ka ew dîn e, an na. Li tîmarhaneyê-doxtor lê tov dibin. Bi wî re dikevin diyalogê. Di encamê de digihîjin biryareke wiha û dibêjin; “Eger ew dîn be, li ser rûyê erdê ti mirovekî baqil jî tune. Ew ne dîn e. Pêwîst e, em wî bişînin Nexweşxana Toptaşiyê, bila li wir were dermankirin.“

Piştre Sultan wezîrê hundirîn dişîne cem Seyda. Wezîr dibêje; “dev ji van daxwazan berde. Sultan 1000 quruş meaş dide te, eger tu vegerî welatê xwe, Sultan meaşê te dê bike 30 paknot. Piştra jî ew ê bike 80.” Seyda dibersivîne; “ez ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî nehatime. Ez ji bo menfeta Gelê Kurd hatime. Ev teklîfa we ji bo sukutê bertil(rişwet) e. Ji bo ku ez gelê Kurd lekedar nekim, îrada Sultan red dikim.” Wezîr bi tehdîd dibeje; “îrada Padişah nayê redkirin. Ew yek ji tere xeterê tîne.” Seyda cewaben; “ez gava hatim, min ruhê xwe da ser destê xwe û hatim. Eger hûn min îdam bikin, ez ê di dilê Gelê Kurd de cih bigrim û hêşin bibim. Ez dibêjim, hûn çi dikin bikin, ez vê pêşniyara we qebûl nakim. lewra ez ji bo berjewendiya Gelê Kurd hatim. Daxwaza min ev e ku ez Gelê Kurd hişyar bikim, wî ji nexweşiya cehaletê û nezaniyê xilas bikim.”Wezîr dibêje; “mearîfê ji bo li Kurdistanê perwerde çêbe, tezkere daye meclîsa mebûsan.” Seyda dibê; ”ev çi qeyde ye, hûn mearîfe texîr dikin, lê ji bo meaş ecele dikin? Berjewendiyên şexsî çawa dikevin pêşiya berjewendiyên umûmî.” Nazir hêrs dikeve. Seyda dibê; “ez li ciyayên Kurdistanê mezin bûme, ez di qada azadiyeke mutleq da mezin bûme, ev hêrsa we bê fayde ye. Eger hûn min nefî bikin, çi Fîzan be, çi Yemen be, razî me. Weselam wek mînaka hîşyarbûnê Seyda wiha gazî dike: “Ey Kurdên şêrên leheng, cengawerên ku di dema Asûrî û Kiyaniyan de her dem li pêş bûne! Bi sed salan e hûn di xew da ne, êdî bese e! Sibe ye, ji xew rabin! An na, dê di qada wehşetê de wehşet û xeflet we xerq bike! (...)

> ***Pirs 8:*** *Diyaloga di navbera Seîdê Kurdî û serokê dadgehê de li Stenbolê bi serê xwe hêjayê lêkolînekê ye. Gelo ev*

*diyaloga temam û pirs û bersivên dualî, hene, pêde dibin li derekê?*

**Bersiv 8:** Hedîse û sebebê 31´ê Mardê bi kurtî ev bû: Her kesî dizanî Cemîyeta Îtîhad û Tereqiyê ji dîn dûr bû. Têkiliya wan bi mason û yahûdiyan ra hebû. Him jî di nav xelkê da bela bûbû, digotin; „Cemiyeta îtîhad û Teraqiyê ev xwîn rijandin, an jî ev qetlîam û kuştin ji aliyê wan ve pêk hatin." Xwediye Rojnameya Serbestî Hesen Fehmi Begê ku li hemberî Cemiyeta Îtîhad û Tereqiyê dinivîsî, li ser Pira Galatayê hat kuştin, qatilê wî nehat dîtin. Dîsa Îsmaîl Paşa hat kuştin. Ev bûyer di nav gel de belabû. Xelkê dixwest ku ew zabitên girtî yên demeke dirêj xizmet kirine, bila werin berdan. Dîsa di nav xelkê de bela bûbû ku Cemiyeta Îtîhad û Tereqiyê Bosna-Hersek û Gîrît firotine. Ji ber van sebeb û hin sebebên veşartî yên din, hadîsa 31´ê Mardê rû da. Bi dûrîşmeya, "bijî şerîat, şerîat dê bê!" Li ser vê bûyerê Leşkerê ku ji Rûmeliyê hat, di 23´yê Nîsanê de serhildêr têk birin, Sultan Hemîdê duyem ji text xistin xwarê û dawî li bûyera 31´ê Mardê hat.

Di 27´ê Nîsana 1909´an de dadgeha leşkeriya Urfî hat destpêkirin. Di encamê da bi qasî panzdeh kes hatin darvekirin. Seyda Seîdê Kurdî jî bi nivîsên wî yên di rojnameya Volkanê de hatibûn nivîsîn û bi tevlîbûna serhildanê tê tawanbarkirin. Dibên te di Rojnameya Volkanê de li dijî Îtîhat û Teraqiyan nivîsiye. Dadger jê dipirse û dibêje; "te jî şeriêt dixwest?" Bi tiliya xwe ya îsaretê yên ku li der bi dar vekirine ray dide û dibêje; "eger te jî şeriêt xwestibe, tu yê jî wekî wan werî bidarvakirin." Seydayê Mele Seîd bi hêrs radibe û dibêje; "belê, ez talîbê şeriêtê me, ji ber wê ye ez her tiştî bi mêzîna şeriêtê diwezînim. Îslam eqîda min û ya miletê min e. Ez li ser devê qebrê me û him aşiqê alema berzexî me. Ez kêf xweş im ku ez bi tev wan ên ku hatinin darvekirin herim axiretê. Hukumeta ku bi aqil herb û mucadele dikir, niha bi temamê jiyanê ra mucadele dike. Bi vî rengî kuştin ji min ra fexr û şeref e. Bi vî rengî dîntî û mirin bila li min pîroz be, li we zaliman jî, cehenem pîroz be." Careke din jê dipirsin, dibêjin; "te jî şerîet xwestiye?" Seyda dibê; "eger hezar ruhên min hebana, ez hazir bûm ku ji bo meseleke seriêtê û heqiqetê min ê temamê ruhên xwe feda bikira, lewra şeriêt dibe sebebê seadet û selametiyê. Edaleta herî baş bi wê tê cih. Ez jî ji bo vê yekê şerietê dixwazim, ne mîna wan ên din, tenê wek silogana şerîetê dixwazin, ez wek wan naxwazim."

Em li vir ji bîr nekin ku Seyda gazî Kurdan dikir, digot; "ey gelê Kurd, yen ku ji îstîbdadê pir zerar dîtine, yek jî Gelê Kurd e. Ji ber vê huriyet an jî meşrûtiyet were, em jê pir faydê dibînin." Lewma Seyda dema tiştekî nû derbiketa, ji gele Kurd ra tawsiye dikir. Heta di wexta meşrutiyetê da ji temamê mezinên Kurdan ra telgirafan dikişîne, tê da dibêje, ger em terefdarê meşrûtiyetê bin, em ê muheqeq jê faydê bibînin. Niyeta Seyda ji bo gelê Kurd pir baş bû. Lê dijminê gelê Kurd zalimekî xedar bû, bi lîstikên xwe yên qirêj gelê Kurd dixapand. Hê jî dixwaze bixapinê. Seyda jî pir caran xapandine û kirine nav şaşiyan. Seyda jî bi xwe îqrar dike, dibê min 11 cineyetên tam, yek ji niv cinayet kiriye, tev dikin yanzdeh û nîv cinayet(11,5). Ji bo wan we ez anîm mahkemeyê. Ew cinayetên ku Seyda hesibandine, divê ew bi serên xwe bibin kitêb.

> ***Pirs 9:*** *Têkiliya wî bi hinek rewşenbîrên mîna Mehmet Akif Ersoy re bi çi nisbetê hebû gelo? Mehmet Akif Ersoy kesayetiyeke navdar, bikarekter û li ser ya xwe ye, bi hinek aliyên xwe ew û Seîdê Kurdî dişibin hev?*

**Bersv 9:** Dema ku Seydayê M. Seîd diçe Stanbolê, li Fatihê di Xana Şekercî de bi cih dibe. Ev xan, wê demê cih û mekanê rewşenbîran bû. Mele Seîd û Mehmet Akîf li wir hev du dibînin û hev du nas dikin. Dibêjin Mehmet Akîf ji Mele Seîd her tim tiştên zor dipirsîn, wî jî bersiva pirsên M. Akîf didan. Her wekî me berê jî gotibû, M. Seîd li ser derê odeya xwe wiha nivîsîbû: "Li vir pirs nayên pirsîn, lê belê bersivên pirsan tên dayin."

Çend hebên ku ji Seyda pirs dipirsîn endamên Dar-ul-Hîkmeta Îslamî bûn. Wek tê zanîn, wê demê Mehmet Akîf, Îsmaîl Heqî, Hemdî Elmali û Şeyxulîslam Mistefa Sebrî hemû bi hev ra endamên Dar-ul-Hîkmetê bûn. Têkiliyên wan bi vî rengî çêbûbûn. Di hinek aliyan de ev kes dişibin hev. Ji van aliyan yek jî şerîet e. Aliyê din jî, li dij êrişên dewletên dereke mutefîk bûn. Bi hev re li dij van dewletên ku Stanbol îşqal kiribûn, fetwayê têkoşînê didan. Wekî din aliyên wan ên hevbeş tunebûn. Ji xwe di zekawet û teqwa xwe de qet yekî xwe negihand Seydayê M. Seîd. Mele Seîd ji gelek fetwayên xwe yên ji bo berjewendiyên dewletê dabûn, poşman bûbû û ew wek cîneyet dihesibandin. Ji ber vê yekê jî dibêje; „Ku min ew fetwa dane, min cînayet bikaraniye." Mele Seîdê Kurdî piştî çend mehan, ji bo ku ratib û meaş negire, ji endametiya Dar-ul-Hîkmetê îstifa kiriye.

Her kes dizane Seyda daîma heq teblix kiriye netirsiyaye. Li mala xwe çi bigota, li cem Sultanên Osmaniyan jî, li cem Ataturk jî ew tişt bêyî ku bitirse, digot. Ne ji bo rizqê xwe, ne jî ji bo meqamekê ti ji kesekî perwa nedikir. Ji ber vê hindê pir meşhûr bû. Ji bo wî ev hedîsa pêxember wek dustur bû: "Cîhada herî qenc, li cem padişahê zalim be jî, gotina rast e." Seyda jî li ku dibû bila biba, gotina rast digot. Ango rastî çi ba, ew digot. Ew exlaqê Seyda yê yekemîn bû. Ez dikarim bêjim, di vê sedsalê de ew bê emsal bû.

Seyda di dadgehê de ji dadger re wiha dibêje; „Eger serên min bi qasî porê min bin û tu her gavê yekî jêbikî, ez ê dîsa terka rastiyê(heqîqetê) nekim." Rihma Xwedê lê be!

> ***Pirs 10:*** *Têkiliya Seîdê Kurdî bi rêxistina Îtîhat û Teraqî re jî aliyekî din yê jînenîgariya wî ye, ev alî jî têra xwe bi nîqaş e, zelalkirinekê dixwaze.*
>
> *Em zanin ku Seîdê Kurdî beşdariya nîqaşên di nav Itîhad û Teraqî de kiriye û girêdayê desentiralîzekirina sîstemê serdemê dîtin û pêşniyzên xwe pêşkêş kirine. Em çavek jî bavêjin van salan wê ne pêwist be?*

**Bersiv 10:** Li gorî min fam kiriye, Seyda li diji Îtîhat-û Teraqiyê bû. Çimkî Seyda di mahkemê da li diji Îtîhat-û Teraqiyê pir sert bûye, ji ber wê hakimê Mahkema Urfî Xurşîd Paşa gazi Seyda Mele Seîd kiriye, jê re gotiye; „te jî şerîet dixwast?" Pişstî ku Seyda bersiv dayê, hatiye beratkirin. Ev yek dibe delîleke bingehîn ku ew li dijî Îtîhat-û Teraqiyê bûye. Lê Seyda tereftarê Meşrûtiyetê jî bûye. Ji rewşenbîr, mele û şêxên Kurdistanê ra pir tewsiye kiriye ku me Kurdan ji îstîbdadê pir zerar dîtiye. Lê ji bo ku Sultan Ebdulhemîd careke din were ser text û Meşrûtiyet zerarê nebîne, hinek tişt kirine. Wek mînak: Seyda di nutqa xwe ya 31´ê Mardê da, di der heqê Îttiata Zabitan da çi pêwîst bûye, gotiye, heta zedetir jî gotiye. Mirov li vir digot qey Seyda li aliyê Itîhat-û teraqiyê ye. Lê Seyda wer bawer kiribû ku bi huriyet û Meşrûtiyetê Kurd dê azad bibin. Ji ber wê nedixwest di mabeyna tabûra asker û zabitan da herb û têkoşîn çêbibe. Di pişt re ji vê yekê jî poşman dibe Seyda, ji bo vê jî dibêje; „min bi karekî wisa cinayet kir,"

> ***Pirs 11:*** *Têkiliya Seîdê Kurdî bi bûyera 31´ê Adarê sala 1909´an re, em zanin ku girêdayê vê bûyerê hatiye dadgehkirin û cezakirin, ev têkilî çendî rast e? Li gora dîtinekê, Seîdê Kurdiyê di nav siyasetê de piştî vê*

*cezaxwarinê êdî bi temamî xwe dide aliyê ol-dîn û destên xwe ji dinyayê dikşîne, rastî û nerastiya wê?*

**Bersiv 11:** Di bersivên derbasbûyî da tê zanîn ku tekiliya wî bi 31´ê Mardê ra tunebûye. Seyda dibê; „min çend saetan li meydana Sultan Ehmedê li bûyerê guhdarî kir. Min dizanî netîce bi tirs e. Him jî min dît, ew askerên ku li hember zabit û generalan derketine, şerîetê û dîn bi kar tînin. Dibêjin em şeriêtê dixwazin, lê gelek zabitên xwe kuştin.“ Seyda li vir mudaxele kiriye. Li ser yekîtî û îtîfaqê sekiniye. Nexwestiye Dewleta Osmaniyan ji hev de bikeve. Heta li ser yekîtiya Kurd û Tirkan ji xebat kiriye, bi şertê ku mafê gelê Kurd were dayîn û li Kurdistanê medreseya bi zimanê kurdi were wekirin û nasnameya Kurd were îtirafkirin. Li gorî dîtina min, ji ber vê yekê Seyda ji siyaseta Osmaniyan û hevalbendiya bi yên wek M. Akîf Ersoy, Îsmaîl Heqî, Hemdî Elmalî û Mistefa Sebrî yên din bê hêvî(umît) dimine, poşman dibe, heta ji hinek fetwa yê xwe yên di lehê Dewleta Osmaniyan da dabû, wek me berê jî gotîbû, cînayet qebûl dike. Di pir kitêbên xwe de dibêje; „ev heqê alikariya min a min ji wan ra kir, ji min re bû bersiva mukafatdayîna heps û zindanan.“

Di vê der barê da wiha gotiye; „ew meyl hezkirina min a ji bo wan, ne li gor emrê Xwedê bû, ji bo wê di encamê de bi dijminane bi min ra muameleyê dikin, bi heps, zîndan û an bersivê didin. Min jî gazinc nekir. Eger min gazinc ji dewletê bikira, wê bigotana tu temamen mîna me nakî, here cezayê bikişîne. Eger min ji qederê gilî û gazincên xwe bikira, wê qederê ji min ra bigota; ´hêy riyakar, te wek min nekir, tu cûyî, te mêyla zalim û kafiran kir, here bi destê wan cezayê xwe bikişine.“ Min zanibû, lewma min êdî giliyê xwe nekir, min „hesbinellahu we ni´îmel wekîl) got û sebir kir.“

Baweriya min ew e ku Seydayekî mîna Seyda dibe ku ketibe nav şasiyan. Lê yekî mina Seyda ku ji Xwedê bitirse(muteqi be), tu ji kesekî natirse, ji kesekî perwa nake. Ji ber vê Seyda him ji dinê xwe tawîz nedaye, him jî ji bo Kurd û Kurdistanê tawîz nedaye. Ne ji Mistefa Ataturk, ne ji Sultan Ebdulhemît, neji ji şêx û axayên Kurdistanê tirsiyaye. Wî li her derê rastî digot.

***Pirs 12:*** *Pirsek me jî bila li ser endametiya Seîdê Kurdî, li ser endametiya wî di rêxistina "Teşkilat-i Mahsusa"de be, çi ye ev teşkîlat û rol û cihê Seîdê Kurdî di vê saziyê de,*

*kengî bû endam û endametiya rêxistineke wiha dihate wateyeke çawa?*

**Bersiv 12:** Bawerî û aqîda Seyda M. Seîdê Kurdî ev bû; li ser her misilman û bawermendan ferz e ku welatê lê dijî, divê biparêze. Di vê bingehê de, di rêxistina Teşkilatî Mahsûsa da, di benda fetwa û teblixê da cih girtiye. Minak; mîna fetwa wan a di der heqê îstîla Îngilîz û Firansizan da. Temamiya gel bi van fetwan ji bo cihadê rakirin ser piyan û dan têkoşînkirin. Dijmin ji welat derxistin. di îstîla Rûsan da Seyda alayiyekê ji feqî û dostên xwe çêkir û bi Rûsan ra ket herbê. Birarziyê wi Ubeyd tevî gelek feqî û dostên wî şehîd ketin. Seyda bi xwe jî birîndar bû, bi dîlî ket destê Rûsan. Ew alayiya her çiqas wî damezirandibe ji, lê di bin desthilatdariya Enwer Paşa da bûye. Ev têkilî, Seyda ji bo Xwedê û biratiya gelên misilman daniye, lê wan ji bo berjewendiyên xwe û dewleta xwe dadanîn. Karên xwe pê didan dîtin û paşê jî diavêtin hepsê. Seyda paşê ji vê têkiliyê poşman bûye û ew têkilî wek cinayet hesibandiye.

Li gor baweriya min, Seyda bi serê xwe tu li cihekî û di teşkîlatekê da cih negirtiye. Dema ku Seyda çûbû Stenbolê, bi alîkariya Mehmet Akif bi gelek alimên din re têkilî danîbû. Pişt re wan Seyda ji nêzîk ve baş nas kirin, îlmê Seyda teqdîr kirin. Ew ji wan meşhûrtir bû, erkanê dewletê jî ew nas kirin. Dewlet an jî erkanên wê dema ku biketa tengasiyê, ji bona berjewendiyên xwe, hemû karên xwe bi wan aliman didan kirin. Bi vî rengî kiribûn wan teşkilatên tarî. Ez dikarim bêjim di dema îstila Riha, Enteb û Meraşê, him jî di îstîla Stanbolê de Seyda ketiye civînan û fetwa daye. Piştre bi tiştan hesiya û hema îstîfa kiriye. Seyda di Darulhîkmeta Îslamî da bûye endam. Ew jî ji bo alîkariya wan hevalên wî yên ku li Stanbolê bi hev re hevaltî kiribûn. Ji xwe pê re ji wir jî îstîfa kiribû.

***Pirs 13:** Têkiliya Seîdê Kurdî û Enwer Paşa jî tê zanîn, ev têkilî çawa bû? tê îdîa kirin ku "Teşkilat-i Mahsusa"ji bo cîhadê fetwa belakirine, Seîdê Kurdî bi xwe ev fetwa heta bi Bakurê Efrîka birine û bi dû re li ser da alayixwaza Enwer Paşa hatiye Wanê , ji sala 1915 an û pêde wek fermandarekî Teşkilat-i Mahsûsa ketiye Şerê yekemîn yê Cîhanî, çi ne belge û wesîqeyên di vê derbarê de?*

**Bersiv 13:** Di bersiva derbasbûyî da ji hat zanîn ku Seyda û Mehmet Akif tevî hinek alimên din ji bo cîhad û fetwayê ketine nav teşkîlat-î Mahsusa. Ev jî ne ji bo xatirê Enwer Paşa bûye,

bel ku baweriya Seyda wisa îcab dikir. Îla ku tu bêjî bi emrê Enwer Paşa çûye, ew şaş e. Çawa ku her kes dizane, Seyda daxwaza Sultan Ebdulhemîd û ya Mistefa Kemal red kiriye, çawa teslîmî Enwer Paşa dibe?

> ***Pirs 14:*** *Di salên Şerê Cîhanî yê Yekem de di eniya li dijê Rûsan de Seîdê Kurdî û çend hevalên xwe bi birîndarî dikevin destên Rûsan û demekê li Sibirya dimînin. Kengî dîl dikeve, kî ne hevalên pêre, li ser salên li Sibirya û derbasbûna van salan, Seîdê Kurdî bi xwe tiştek gotiye, nivîsiye, yan jî kesekî din tiştek gotiye?*

**Bersiv 14:** Seyda tevî hevalekî xwe bi birindarî dikeve destê Rûsan. Wî dibin Sibiryayê, bajarê Kosturmayê. Seyda dibêje: „rojekê min ders dida zabit û hevalên xwe. Fermanderekî bi navê Nîkolavîc ji bo teftêşê hat. Ez ji ber ranebûm. Pirsî, got; ´qey te ez nas nekirim!´ Min got; ´belê, min tu naskirî. Tu felankesî. Lê ola(dînê) min destûrê nade ku ez ji ber te rabim.´ Çend rojan qedexe kir, nehîşt em dersê çêkin. Piştra carekî din serbest kirin. Li gor ez fermandarekî Kurd dujminê Qazaxan û esîrê Rûsan bûm, dîsa jî ez ji muxabereya dersê dernexistim. Me odeyek kir mescîd, min li wir îmamti dikir. Mixabin ew dewleta ku me alîkarî jê re dikir, qaşo him welatê me yek bû, him qaşo ola(dînê) me yek bû, wan munafikan di 3 mehan da tengasî û ezabên dan min, van kafirên Rûsan di 3 salan da neda min. Tê zanîn ku munafiqên me ji kafirên xelkê esedtir in."

Welhasil Seyda ji vê alîkariyê poşman dibe û dibê hezkirina wan, meyla wan ne meşrû bûye, yani riza Xwedê tê da tunebûye. Lewra bûye sebebê dujminatiyê. Bi destê wan ezab dan min, ez jî pê razî dibim.

> ***Pirs 15:*** *Vegera ji Sibîrya çawa biliyaye, hatiye pê û piştî hatiye Stenbolê çi kiriye, bi çi daketiye û heta sala vedigere Kurdistanê çi kiriye, çend salan li Stenbol maye û sala vegeriyaye Wanê kîjan e?*

**Bersiv 15:** Seyda dibêje; "mizgefteke Tataran hebû, ez car caran diçûm wê mizgeftê. Yek şevan jî li wir dimam. Rûsan qet negotin tu çima li wir dimînî û nayê. Ev yek bû sebeb ku ez pîlana firariya xwe çêbikim. Min xwe bi xwe digot; ´ez bi zimanê rûsî nizanim. Ez ê vê riya dirêj çawa bi dawî bikim?´ Lewra ew rê bi lingan, riya salekê didomîne. Pêwîst e, ez ji vê esîrtiyê xilas bim. Min xwe spart înayet û fedl û quweta Xwedê.

min ya Ellah got, bi tev cil û bergê xwe, min dest bi sefera firarî kir. Bi cureyeke ecêb ku ez ji di heyretê da mam. Ez bi riya Almanya, Warsowa, Wiyana gihiştim Stanbolê. Bi rengekî acêb û kirametwarî ez ji esîrtiyê xilas bûm. Bi wasita ku ez di Darulhîkmeta Îslamiyê da endam bûm, telîfa kitêban ji min ra rihet bû, min dest bi telîfa kitêba bi navê ´xutuwat-î sitte´kir. Min di vê kitiba xwe da bi zimanekî sert êrişî Îngilizan dikir û Îngilîz di 1920´î da heta Stanbolê hatibûn û îstîla kiribûn. min ev yek qebûl nedikir, min bi îlmî mucadele kir."

Ji 76 mufti, 33 alimên meşhûr yek jî, Seydayê M. Seîdê Kurdî bû. Fetwa derdixistin, belav dikirin. Fetwayên wan quwet û cesaret dida gel. Li hember dijminan di her aliyî da têkoşîn û cihad hat kirin û bi ser ketin.

Di wê demê de dît ku waye Dewleta Osmaniya têkdiçe û ji hev da dikeve, êdi venagere rewşa berê. Pêwistî bi yekitiya Kurdan heye. Kurd tenê dikarin bi yekîtiyê bibin xwediyê maf û zimanê xwe. Bi vê hêviyê vegeriya Wanê ku bi alim, şêx û reîsên eşîran ra hevdîtinan pêk bîne ku gelê Kurd bila ne ji dinê xwe, ne jî ji mafên xwe yên neteweyî bêpar bimînin.

> ***Pirs 16:*** *Di hinek çavkaniyan de behsa hin nameyên di nav Seîdê Kurdî û hin rewşenbîrên Kurd de dibe ku ew jî dibin wek hinek agehdarî ji bo dîtinên Seîdê Kurdî li ser doz û dawên kurdan û pirsgirêkên neteweyê Kurd.*
>
> *Wek nimûne nameya Mevlanazade Rifat Beg li ser avakirina dewleteke kurdî ya serbixwe û bersiva Seîdê Kurdî jê re ku li gora hinek angaştan wiha ye: "Rifat Beg ne avakirina Kurdistanekê, belê em împeretoriya Osmanî zindû bikin. Tu vê qebûl bikî ez amade me, di riya wê de canê xwe bidim". Diyalogeke wiha derbas bûye di nav van herdû kesayetiyên kurd de, çendî hayê we heye jê?*

**Bersiv 16:** Di navbera Seîdê Kurdî û rewşenbirên Kurdan de têkilî çêbûne. Pir caran jî bi xwe di Kurdistanê da geriyaye, rewşenbîr û malmezinên Kurdan ziyaret kirine. Heta hatiye Gimgimê(Vartoyê) mala Xalid Begê Cibirî, ji wir derbasi Erziromê bûye. Tişta ku pêwîst bûye ji Kurdan ra gotiye. Wek mînak di zemanê Huriyet û Meşrûtiyetê de, ji Kurdan re gotiye; "li hember Huriyet û Meşrûtiyetê dernekevin. Me ji îstîbdadê pir zerar ditiye. Em Kurd in. Çi tiştên baş derkevin, fayda Kurdan tê de heye. Çima hûn qebûl nakin?"

Ew nameya ku ji Rifat Begê re hatiye şandin, li gorî gotinê, hinek rewşenbîrên Kûrd dema ku dibînin Dewleta Osmaniyan berbi rûxandinê ve diçe, dibêjin firsetek ji me ra çêbûye, em Kurd jî yekîtiya xwe pêk bînin, em jî mîna gelên dinyayê bibin xwedî maf û sitatû. Ji bo wê dibên, em nameyekê ji Seîdê Kûrdî ra bişînin. Seyda hem Kurd e, hem jî bi nav û deng e. Xudan nûfûz e. Name digihîje destê Seyda. Dibêjin, Seyda gotiye; "ji avakirina dewleteke Kurd re na, lê ji bo avakirina Dewleta Osmanî û teqviyeya wê ez amede me. Ez dikarim serê xwe bikim (dehiye)qurban."

Ev gişt ne rast in. Ew tehrifat in. Dîsa behsa nameya ji Mele Selimê zaza û Şêx Seîd ra jî, gişt derew in, ne rast in. Min ji 70´yi zidetir di risaleyê de cihên ku hatine xirakirin û tehrifkirin dîtine. Seyda gazî Kurdan kiriye, gotiye; "em Kurd tên xapandin, lê em kesekî naxapînin."

Min ji kurê Şêx Seîd Şêx Elîriza bihîst, digot; "ez û Silahedînê bêrayê min, em di dema ê de çûn ziyareta Seyda. Rabû em hemêz kirin û got; ´înşallah ez ê heyfa birayê xwe Şêx Seîd bigirim.´" Şêx Elîriza wiha didomand; "Seyda pir bawer kiribû ku heyfa Şêx Seîd bi risalan tê girtin. "Disa di nav Seyda û Kor Husên Paşa da jî, bi zindî bi şahîdbûna feqiyê wî Mele Hebîb çêbûye, pir şaş û iftira ye. Dibêjîn, Seyda gotiye; hûn bi kê ra herb dikin? Osmaniyan 600 salî ji Îslamê ra reîsî û mezinatî kirine. Li hember wan şûr nayê bikaranîn. Hûn dibin sebeb ku bira birayên xwe bikujin. Ez di vê yekê da tunim."

Ev gotin mimkûn nîne. Îftira ye, Mele Hebîb şahîdî dida digot; "Seyda ji Kor Husên Paşa ra got; ´hûn dereng man, Şêx Seîd hat girtin. Diviyabû hûn zû rabûbana." Divê gelê Kurd bawer bike ku yekî mîna Seyda van gotinan nabêje. Min bi xwe bi qasî 70 cihên ku bi taybet di der heqê Kurd, Kurdistan û Ermeniyan da hatine nivisandin, paşê tehrif bûne û hatine guhertin, tespit kirine.

> ***Pirs 17:*** *Herwiha tê gotin ku pêşniyazek ji bo kurdistaneke serbixwe ji aliyê Serokê Kurt Teali Cemiyeti Seyid Abdulqadir jî hatiye jê re û bersiva wî jî red kiriye, wek sebeb jî misilmantiya gelê Tirk daye xwiyakirin, bingehê vê?*

**Bersiv17:** Ji aliyê serokê Komela Tealiya Kurd ji bo avakirina Kurdistaneke serbixwe ji Seydayê Mele Seîd alikari hatiye xwestin, lê Seyda ew daxwazî red kiriye. Ev hemû tişt ji

nusxeyên rîsaleyên wî hatine tehrîf kirin. Bila rewşenbîrên Gelê Kurd bi van gotinên ku hatine serûbinkirin, bawer nekin. Seyda tevlî vê daxwaziyê nebûye, lê temamen red jî nekiriye. Beriya her tistî baweriya Seyda li ser umetê bûye. Xwestiye ku umet di bin alaya îslamê de bibe yek dewleteke mezin. Terefdarê dewletên biçûk ên cuda cuda nebûye û di nav bera dewletan de hudûd qebûl nedikir, lê wi dixwest di nav van sînoran de her kes xwediyê mafên xwe yên neteweyî bin. Ango wî digot; „li gor felsefa îslamê çi maf û heqê ku ji bo Ereb, Tirk û gelên din hebe, ew maf û heq divê ji bo Kurdan jî hebe.“ Ji ber vê hindê, ji bo ku Kurd bigihêjin temamiya mafên xwe xebitiye û ji bêr vê jî ketiye heps û zîndanan û gora wi jî ne diyar e. Hê kes nizane gora wî li ku derê ye.

Li gor baweriya Îslamê, Kurd, Ereb, Tirk, Faris û gelên din ango çiqas bawermnd hene gişt birayên hev in. Ev biratiya me xirab nekiriye. Şêx Seîd ji dibêje; „Biratî me xerab nekir, biratiya di navbera Tirk û Kurdan de, Tirkan xerab kir, ew bend wan qetand. Pêwîst e, em ji hev cuda bibin.“

Ez bawer dikim Seydayê Mele Seîd jî wer bawer dike. Lewra eqîda umetvaniyê di Îslamê da heye. Lê Dewleta Tirkan li dijî Îslamê dewlet ava kirine. Di baweriya Seyda da Ataturk sufyan e. Di dema cumhuriyetê da meclîs tê avakirin. Ataturk gazi Seyda jî dike. Seyda dihere meclîsê, li meclisê hevalên wi yên ku nimêjê dikin, pir dibin. Ataturk gazî Seyda dike, jê re wiha dibêje; „me gazî te kir, me got tu alimekî mezin î, em ji îlmê te faydê bibînin. Me negot tu werî, nifaqê bikî nav me û dujminatiyê bikî.“ Seyda wiha dibersivîne: „Paşa, paşa nimêj bike. Yên ku nimêj nakin xayîn in. Hukmê xayinan jî merdut e.„

> ***Pirs 18:*** *Diyaloga di nav Mistefa Kemal û Seîdê Kurdî de jî mîna tê zanîn xaleke dabaşê ye, sala dawî bû mijara filîmekî bi navê "Hur Adam " jî.*
>
> *Tê gotin ku Seîdê Kurdî fetwa li dijê "Kuvva-i Milliye"jî red kiriye û ev jî bûye sebeb ku Mistefa kemal wi vexwuni enqeri.*
>
> *Sal 1922 ye, li wir li gora hinek gotinan, Mistefa Kemal bi merasim pêşwaziya wî dide kirin. Seîdê Kurdî li paytextê nû beyanameke 10 xalî pêşkêşî meclîsê dike, çi bûn ev xal û piştre çima nav wî Mistefa Kemal xerab bû?*

**Bersiv 18:** Seydayê M. Seîdê Kûrdî li dij dewletên Anatoliya îşgal kiribûn, yên wek Îngilîz, Firansa û Rûsan der dikeve û şer dike. Di şer de birîndar dibe û dikeve destê Rûsan. Nêzî 3 salan li Rûsyayê dimîne. Li aliyê din bi îlmê xwe jî meşhûr bû. Bi alîkariya Mehmet Akîf, Şêyxulîslam Mistefa Sebrî û çend hevalên wî yên din di Dar-ul Hîkmeta Îslamî da bûbû endam. Van hemû bûyeran şohreta Seyda zedetir bela kiribû. Ji ber vê yekê Mistefa Kemal ew vexwend Enqereyê ku ji fikr û ilmê wî sûdê werbigire. Seyda di 1922´an de hat Enqereyê. Bi merasim pêşwazî kirin. Seyda di meclîsê da xitabî mebûsan kir. Bi ayetê kerîm „eyûhel mebûsîne li yevmil êzîm" dest bi axaftina xwe kir. Di axaftinê de pêşniyara ji 10 xalên balkêş pêkhatî, dike:

Divê ev meclîs, Meşrûtiyeta li ser wateya mişewre û edaletê û jiyaneke bi rûmet esas bigire.

Divê perwerdeya îslamî, tekye û mekteb bibin yek, cudabûnên fikr û meşreban werin rakirin.

Divê dewleteke girêdayî îlmê, bê tesîskirin.

Di medresan da qaîde û mesaiya gelemperî were tetbik kirin ku huner u pêşveçûn çalaktir bin.

Gerek hûn waîz û xetîban ji alimên pisbor pêk bînin.

Divê pêşketina madî û manewî bi hev re bin, an na ne dewlet neji din li ser lingan dimîne. Dijminê pêşvemayînê nezanî, xizanî û dubendî ye. Ji bo vê jî divê bi navê Îslamê yekîtî pêk were.

Eger Padîsah xelîfe be, divê pêxamber wek rehber qebûl bike.

Di olê da zor û zept tune. Di rêberiya Hz. Mihemed da divê li gelên ne Misilman zulim neyê kirin, hemû mafên wan were dayîn û parastin.

Li Kurdistanê anîna perwerdeya nûjen tek çareserî ye. Divê li Kurdistanê li sê cihan zanîngeh were vekirin.

Encama van hemû xalan ev e; divê hûn berê xwe bidin olê û nimêj bikin.

Li ser telkîna Seyda 60 mebûs tevî Kazim Karabekir dest bi nimêjê dikin. Li ser vê Mistefa Kemal ev gotinên xwe yên meşhûr ên ku me berê jî gotibûn, anî zimên: „Me gazî te kir, me got tu alimekî mezin î, em ji îlmê te faydê bibînin. Me negot tu werî, nifaqê bikî nav me û dujminatiyê bikî."

Li ser vê Seyda Enqereyê terk dike û diçe Wanê.

> ***Pirs 19:*** *Sala piştre ango 1923´an diçe Wanê û bi çend telebên xwe re beşek ji zemanê xwe di şikeftekê de derbas dike, ev telebên wî kî bûn, çend salên berî dewlet wî di ser Stenbolê re sirgûnî Burdurê, beldeya Barla bike, çawa derbas kirin, çi kir di wan salan de?*

**Bersiv 19:** Seyda dît ku dewleta Enqereyê li gor dilê wî nameşe. Dest bi zulmê kiriye, heta tehemûlî kitêvên olî û şîîran nake, bi dujminatiyekî sînsî êrişî ser rûmeta ol û mîlî û ûnsûran dike, pêrîşantiya rewşa misilmanan û înkara mafên gelan dibîne. Gelekî mehzûn dibe, di 1923´da tê Wanê, ew û tevî çend telebeyên xwe ku yek ji wan Mele Hebîb bû, tere ser çiyayê Erakê. Li wir di şikeftê da dibê; „ez ê dest bi nivîsa kitêvan bikim û dersan bidim, divê ez ê ji vir û şûn va bi riya îlmê olî gelê xwe hişyar bikim, îbadet û dua bikim, ez ê temamen ji siyasetê dûr bikevim." Seyda digihêje baweriyeke wisa ku bi wê siyasetê gelê Rojhilata Navîn bi taybet gelê Kurd bigihêje mafê xwe yê olî û neteweyî.

Piştî ku Seyda bêhevî dibe, him ji siyasetê dûr dikeve, him jî dixwaze ji nav gel derkeve û dûr bisekine. Seyda ji vê beşa jiyana xwe wek „Dema Seîdê Nû" binav dike.

> ***Pirs 20:*** *Helwestê wî beramber Şoreşa Şêx Seîd û sipekulasyonên di vê derbarê de?*
>
> *Li gora hin kesan em bêjin, nivîskarê îslamî Huseyin Okçu Seîdê Kurdî di kitêbeke xwe de, bi navê „ Şûalar" de rutbe û paya şehadetê daye Şêx Seîd, belê ev beş di çapên nû de hatiye derxsitin.*
>
> *Hin kes jî behsa nameyên di nav Seîdê Kurdî û Şêx Seîd de hatine û çûne dikin. Lê kesên ku vê napejirînin û eslê nameyên bi vî rengê tune dibêjin jî hene, rastî û nerstiya vê?*

**Bersiv 20:** Eslê nameya ku Şêx Seîd ji Mele Seîdê Kurdî ra şandiye, di rîsalan da ez rast nehatime. Lê ji aliyê hinek talebê wî yên Tirk da hatiye nivîsandin ku Şêx Seîd nameyek ji Seyda ra şandiye, gotiye ku îştîraqî nav me bike, em bi hev ra li himber Dewlata Enqereyê ji bo destxistina mafên gelê Kurd mucadele bikin. Seyda jî red kiriye û qaşo gotiye; „faydeyek di vê tevgerê da tune, niyeta min tune ku ez bibim sebebê rijandina xwîna bisilmanan."

Ev yek derew e. Lewra Seyda di pir rîsalan da ji Mistefa Kemal ra gotiye; „sufyan e, ne bisilman e. Li hember wî mucadele û cihad ferz e.‟ lê metoda Seyda cuda bû. Daxwaza wî cihada îlmî û siyasî bû. Di şûayan da behsa şehadeta Şêx Seîd hatiye kirin, an na? Belê, her kes dizane ku behsa Kurd, Kurdistan, Ermeniyan, mezin û şehîdên Kurdan temamen ji risalan derxistine û avêtine. Ez jî dizanim Seyda di şûayan da behsa şehadeta Şêx Seîd kiriye, lê niha tune. Min berê jî gotibû. Min şîfahen ji kurê Şêx Seîd Şêx Elî Riza bihîst. Digot; „ez û birayê xwe Şêx Silahedin çûn ziyareta Seyda, rabû em hemêz kirin û got: „Ez ê heyfa birayê xwe Şêx Seîd bigrim. Meraq nekin, him Şehîd e, him jî meqamê wî û cihê wî pir bilind e.‟ Lê di Şûayan da bênav behsa Şehadeta umûmî û isari kiriye.

Gotar

Zeynelabidîn Zinar

## MELE SEÎDÊ KURDÎ

Bêguman yek ji rewşenbîrên Kurd ê Sedsala Bîstan, Mele Seîdê Kurdî ye ku bi gundê xwe Norsê hatiye naskirin. Pirtûka yekem a li ser jiyana Mele Sêîdê Kurdî di 1919´an de, ji aliyê biraziyê wî Mele Evdirehmanê Norsî ve, bi tirkiya Osmanî hatiye nivîsandin. Nivîskarê hêja Osman Resûlan jî ew pirtûk ji tîpên erebî wergerandiye tîpên latênî û zimanê wê jî li gor tirkiya nû sivik kiriye û Weşanxaneya Pîranî, piştre jî Weşanxaneya Nûbiharê ew pirtûk li çapê xistine. Ev çapa ku min wergerandiye Kurdîya kurmancî, ya cara sisiyan e ku ji aliyê weşanxaneya Nûbiharê ve çap bûye. Bi tevayiya xwe pirtûk 96 rûpel e, li ser rûyê wê yê pêşî wêneyekî Mele Seîdê Kurdî jî heye û mezinatiya wê 12,5 x 19,5 e.

Sedemê ku min pirtûk wergerand zimanê kurdî ev e: Piştî 1925´an ku zimanê kurdî ji aliyê komara Tirkiyê ve hatiye qedexekirin, îcar Kurd hemû bi derbekê ji pêşiya xwe, ji ziman û çanda xwe hatin birrîn û her ku çûye, ew tev bêgav mane ku bi tirkî bipeyivin û her bi wî zimanî jî bixwînin. Lê welatparêziya kurdî çendî ku li ber xwe daye û dest bi serhildanan jî kiriye, mixabin ew tev bi sosret hatine rûxandin û Bakûrê Kurdîstanê ji aliyê dijminî ve hatiye wêrankirin. Piştre jî kîjan hikûmeteke Tirk dema hatiye, her wisan li eynî metodê û li eynî rûreşiyê domandiye. Dewletê, piraniya kesên navdar ên wek Mele Seîdê Kurdî jî, li pêşberî mafên Kurd ên rewa kirine mertal û bi şûrê "bisilman"tiyê serê wan jêkirine. Ji ber hindê, li Kurdîstanê demek hat ku piraniya kurdên xwendayên zimanê tirkî, welê têgihan ku bisilmatiyê ew xistine vê rewşa xirab û her ku çûye, li pêşberî kesên wek Mele Seîdê Kurdî bêzîtiya xwe zêde kirine. Ne tenê li pêşberî Mele Seîd, di binê perda komonîzmê de ew dijîtî ji kesên mîna Şêx Seîd, Seyîd Riza û hwd. jî her berdewam dibû.

Îro çendî ku piranî Kurd pê hisiyane, xasma yên li derveyî welêt gelek lêkolîn û lêgerîn kirine û dikin, bi xwe û hovîtiya Komara Tirkiyê êdî rind dizanin jî, lê bi giştî dîsan bawerî rind kame nebûye û li hin deveran hêjî ew rik û zikreşiya ji hovîtiya hovan

ku xwe bi cih kiribû, hin caran şopa xwe nîşan dide.

Belam çendî ku hewce nake ez bi dirêjî li ser Mele Seîdê Kurdî binivîsim, lê ji bo bîranîna xwendevanan û gelek jî kurt çend hevokan li jêrê tînim pêşberî çavên xwedîbînan.

Mele Seîdê Kurdî, di sala 1293 yên Koçê de ku hevberî tarîxa Zayînê dike 1875, li gundê Norsa Hîzanê hatiye dinyayê û di 1960´î de jî di mişêxtiya li bajarê Rihayê (Urfa) de, roja Newrozê çûye ber dilovaniya Xwedê. Piştî binaxkirina laşê wî yê pîroz bi şevekê, dewleta Tirk gora wî vekiriye û tabûta wî bi helîkopterekê biriye û li devereke nepenî veşartiye. Li gorî hin gotinan, tabûtê avêtine Deryaya Sipî.

Gundê Mele Seîdê Kurdî Nors, li wîlayeta Bidlîsê, girêdayê bi nehya Îsbaîrta Hîzanê ve ye. Navê bavê Mele Seîdê Kurdî Mirze û yê diya wî Nûrê bûye. Ew hetanî nehsaliya xwe di malê de, li cem bavê xwe maye. Piştre ji malê derketiye û çûye xwendinê, li Medreseya Taxê xwendiye û di pey de çûye li gundê Pirmizê xwendiye. Ji wir jî çûye li gelek medreseyan geriyaye weke medresa Hîzanê, ya Bidlîsê, ya Norşênê, ya Koxê, ya Şêrwanê, ya Sêrtê, Cizîrê, Mêrdînê û di dawiya dawîn de jî li Bazîdê bûye şagirdê barîgeha mamostê çand û vêjeya Kurdî Ehmedê Xanî û jê feyz û bereketa ol û nijadî wergirtiye.

Ev zemanê xwendina Mele Seîdê Kurdî ya medresê demeke kurt domandiye û wekî din zîrektî û tîjîfehmiya wî ya zêdetirîn, ew gihandine radeya herî berz a di zanist û têbîniyê de. Ji ber hindê jî, Mele Seîdê Kurdî hêj di temenê 15-16 salan de bûye, nasnavê Bedîûzeman (Xerîbê Demê) ji aliyê xelkê ve bo cenabê wî rewa hatiye dîtin.

Îro pirsa sereke ya di gelek mejiyan de, ev e: Ka Mele Seîdê Kurdî ji Kurd û Kurdîstanê re çi kiriye? Bêguman, bersîva vê pirsê di hin waran de zehmet e û gelek jî bi sergêjî ye. Lewra ji bo dana bersiveke wisan, di derbareya cenabê wî de gelek gotinên erênî jî û hewqas yên neyênî jî çêbûne. Îcar ez ê li virê berê xwe bidim belge û berhemên heyî ku li ser Mele Seîdê Kurdî hatine nivîsandin, yan jî ku wî bi devê xwe gotine.

- Mele Seîdê Kurdî, li Wanê pirtûkeke matematîkê bi kurdî nivîsiye. Lê mixabin tê gotin ku ew di şewateyekê de şewitiye.

- Mele Seîdê Kurdî li Mêrdînê hêj di temenê 15-16 salan de bû, dest bi siyaseta kurdî kiriye.

- Gava Mele Seîdê Kurdî ji ber Tahir Paşa yê waliyê Wanê reviyaye û rast çûye Rojhilata Kurdîstanê, li dijê wî komeleyek damezirandiye.

- Dema leşkerên Çar bi ser Bakûrê Kurdîstanê ve hatine, Mele Seîdê Kurdî bûye amirhêzek û di Eniya Pasînê de şer kiriye.

- Mele Seîdê Kurdî digel şagirdên xwe, çûye ji Mûşê duwazdeh top anîne Bidlîsê û li pêşberî leşkerên Rûs şer kiriye.

- Di 1910´an de, gava Mele Seîdê Kurdî çûye Stenbolê, ji paşayê Osmanî Evdilhemîdê Duyemîn daxwaz kiriye ku li Wanê zanîngehek bête avakirin. Lê mixabin rejîma Osmanî ew bi dînîtî navdêr kiriye û ewî avêtine tîmarxaneyê, piştre jî avêtine girtîgehê.

- Di 1911´an de, li Stenbolê gava Mele Seîdê Kurdî avêtine tîmarxaneyê, weha gotiye: “Wextê ku azadî bi dînîtiyê hate gêrrandin, îstibdada jar jî tîmarxane kir xwendegeh.”

- Gava Mele Seîdê Kurdî di girtîgehê de bûye, Çavdêrê Parastinê çûye cem û lê teklîfa 20 lîreyî meaş kiriye. Wî jî gotiyê: “Ez ne parsekê meaş im. Eger hezar lîre be jî, az qebûl nakim. Çimkî ez ne ji bo xwe hatime virê, ji bo miletê xwe hatime... Ev tiştê ku hûn didine min, hem texlîtekî bertîlê ye û para sûsê ye jî.”

- Mele Seîdê Kurdî di gaziyeka xwe de gotiye ku, ew xistine tîmarxaneyê, piştre jî ew xistine girtîgehê û dû re mişêxt kirine. Lê wî tu leke neaniye ser şerefa Kurdan. Û ev jî gotiye: “Gelî Kurdan! Min tîmarxane qebûl kir, lê ji bo ku kurdîtiyê lekedar nekim, min daxwaza Padîşeh û meaş û qenciyên şehane qebûl nekirin.”

- Gava doktorê dînîtiyê hatiye cem Mele Seîdê Kurdî, Mele Kurdî gotiye wî: “Ez li çiyayên Kurdîstanê mezin bûme. Tu vê rewşa min a tund bi pîvana Kurdîstanê bikişîne û bi tereziya Stenbola medenî ya peljen mekêşe.”

- Mele Seîdê Kurdî ji doktorê tîmarxaneyê re gotiye: “Eger lêboktî, şalûztî, nawandina weke ya pisîkan û ji mafên kesayetî re bigorîkirina mafên giştî, li gorî aqil û mentiqê bêne hesibandin, tu bibe şahid ku ez dest ji vî aqilî berdidim û bi dîwanetiyê jî dipesinim...” Û ev jî lê zêde kiriye: “Tiştê xerîb, wergirtina min e. Amaca ku ez vê wergirtinê li xwe dikim û piranetî jî ku jê re ne ahengdar in ev e ku ez, dûrbûna ji amaca

dinyayê, tikaya li banîna di layê wê toreya ku li welatê min dibihure, tersîtiya tewr û rewşa min a ku ji ya kesên din cihê ye, hiskirina tebîbtî û nijadiya min di pêwendiyên derve û hindur de ye ku ez bi vê riyê eşkere dikim.”

Piştî ew axaftina wan ku wisan bi ardarî domandiye, Mele Kurdî vê gotinê jî, ji bo doktorê dewletê nehêvişandiye: "...Li wirê jî çiriya û ez ketim tîmarxaneyê. Niha jî, va ye ez di girtîgehê de di bin çav de me. Bi kurtî; eger daxwaza gotinê bê xwestin, ne hûn êdî dikarin hewqas pînevantî bikin, ne jî ku ez li vê yekê tême lefandin." Li axaftina xwe domandiye: "Hem piştre dema ez li Kurdîstanê bûm jî, hûn min rind dinasîn. Lê ev hawe hemû, rind rûçikê we yê rastîn bi min daye naskirin. Xasma Tîmarxane ku vê binetarê gelekî rind bi min daye bişkaftin. Ez ji bo van hemû bûyerên ku bi serê min ve hatine, bo we spas dikim. Lewra bi rastî diviya ku ez di derheqê we de xirab bifikiriyama, lê ez delal û rind difikirîm." Piştî gelek serpêhatî û teşqeleyên giran, di dawiyê de ew daxwaza Mele Kurdî ya bo vekirina zanîngehekê li Wanê, ji aliyê sazûmana Osmanî ve hatiye pejirandin û Siltan M. Reşadê Pêncemîn jê re 21 zêr hazir kirine. Mele Seîd jî bi lez û bez çûye Wanê û li keviya Golê dest bi avêtina xîmê wê kiriye. Lê mixabin Şerê Cîhanê yê Yekemîn dest pêkiriye û ew xîm nîvco maye, ta roja îro jî her wisan dimîne.

Îcar ez bi umîd im ku wê di rojeke nêz de, ew daxwaza ku bi Mele Seîdê Kurdî re çûye gorê, ji aliyê hemwelatiyên wî xasma şagird û peyrewên wî ve li Wanê bi cih bibe, da ku giyana pîroz di wê gora xwe ya nediyar de bi şadiya xwe bimîne.

Nivîskarê gorbihişt Mele Evdirehman Norsî, di pirtûka xwe de behsa medreseya Mele Seîdê Kurdî ya li Wanê kiriye û weha gotiye: "...Gava hinek diketin medreseya ku Bedîûzeman lê ders dida, bo naskirina wê zehmetî dikişandin ka ew der xwendegeh e, yan jî perwerdegeheka şer e! Xasma, demekurtek berî destpêka Şerê Cîhanê, wî şagirdên xwe fêrî teqandina çekan kiriye û ew ji Şer re amade kirine. Gava Şer dest pê kiriye, digel şagirdên xwe bi lez çûye Eniyê û dest bi şerê gerîlatî kiriye. Bedîûzeman di lihevxistinê de birîndar bûye û hin ji şagirdên wî jî şehîd ketine." Gelek tiştên weha yên din ku di derheqê Mele Seîdê Kurdî de hatine gotin û nivîsandin...

Di salên 1908-1912´an de, gelek nivîsên Mele Seîdê Kurdî li ser Kurd û Kurdîstanê hatine weşandin. Îcar yek ji wan jî

"Kürtçe Bir Yazi"yê (Nivîseke bi Kurdî) de bi zaravayê kurmancî nivîsîye û ji hemwelatiyên xwe re pêşkêş kiriye, ev nivîs di "Kürt Teavün ve Te rekki"yê de li Stenbolê, nimre: 1, (22 Teşrîn-i sani 1324 / 11 Zilka´de 1326 [1908], s. 7) hatiye weşandin. Min jî ew nivîsa balkêş ku sernavê wê bi zimanê tirkî ye, bi awayê hebûna di pirtûka Malmîsanij de, li jêrê nivîsî:

"Lisanimiz Kürtçe: Bedîûzeman

Molla Said-i Kürdî`nin Nesayihi(Nesiheta Mele Seîdê Kurdî)

"Ey gelî Kurdan!

Di îttîfaqê de quwwet, îttîhadê de heya, di biratîyê de se´adet, hukûmetê de selamet heye. Kabika (çok) îttîhadê û şirîta muhebbetê qewî bigrin, da we ji belayê xilas ke. Qenc guhê xwe bidinê, ezê tiştekî ji we ra bibêjim: Hûn bizanin ku sê cewherên me hene, hifza xwe ji me dixwazin.

- Yek Îslamîyet e ku hezar hezar xûna şehîdan e, buhayê wê dane.

- Ê duduwan însaniyet ku lazim e em xwe di nezera xelqê de bi xizmeta ´eqlî, ciwamêranî û însanîyetiya xwe nîşanê dinê bidin.

- Ê sisiyan, millîyeta me ye ku mezîyetê daye me; ê berê ku bi qencîya xwe sax in, em bi karê xwe bi hifza millîyeta xwe, ruhê wandi qebra wan de şad bikin.

Piştî wê, sê dujmunên me hene, me xirab dikin.

- Yek feqîrtî ye. Çilhezar hemalê Îstenbolê delîla wê ye.

- Ê duduwan Cehalet û bêxwendinî ku hezar ji me da yek "qezete" nikarin bixwînin, delîlê wê ye.

- Ê sisiyan: Dijminî û îxtîlaf e ku ev ´edawet quweta me wunda dike, me jî musteheqê terbiyê dike û hukûmet jî ji bêînsafiya xwe zulmê li me dike.

Ku we ew seh kir, bizanin çara me ew e ku sê şûrê elmas bi destên xwe bigrin, ta ku em her sê cewherên xwe ji destên xwe nekin! Her sê dijminê xwe, ser xwe rakin.

- Ewil: Şûrê ´edl û me´arîf û xwendin e.

- Ê duduwan: Îttîfaq û muhebbeta millî ye.

- Ê sisiyan: Însanê bi nefsa xwe şuxla bike û mîna sefîlan ji qudreta xelqê hêvî neke û pişta xwe nede ti wesîyeta.

Paşê xwendin, xwendin, xwendin û destê hev girtin, destê hev girtin, destê hev girtin."

Mele Seîd

Belê çewa ku Mele Seîdê Kurdî gotiye, xwendin û xwendin û xwendin!.. Ji ber hindê bûye ku Mele Seîdê Kurdî her û her dixwest ku zanîngehek li Wanê, şaxekî wê li Bedlîsê û şaxek jî li Diyarbekrê bêne vekirin. Lê dewletê ew li pêşberî vê daxwazê bi dînîtî tawanbar kiriye û tîmarxane û girtîgeh jê re kirine hêwirgeh, mişêxtiyê jî lê kirine kinc...

Bêguman di berhem û pirtûkên Mele Seîdê Kurdî de gelek tehrîfatên mezin hatine kirin û ji wan gelek mînak jî rûqalê mirovatiya çapemeniyê hatine kirin. Dema Tirkan pirtûkên Mele Kurdî ji tîpên erebî wergerandine tîpên latênî û di navbera salên 1960 û 1978´an de çap kirine, hemû li gorî daxwaza nijanperestiya tirkî û li dijê daxwaz û mafên Kurdan hatine tekûzkirin. Îcar ew tehrîfatên ku hatine kirin, wan pirtûkên Xwedayê dilovan ên berî Qur´ana pîroz ku ji pêxemberan re hatibûne hinartin, tînin bîra mirov.

Di hemû pirtûkên Mele Seîdê Kurdî de yên ku wergerandine tîpên latênê, bi giştî bêjeya "Kurd" bi "Hemşerî, himal..." bêjeya "Kurdîstan"ê bi "Rojhilat" û "Rojhilata Anatoliya"yê guhartine. Hevoka "Qewmê Kurd" bi "Qewmên Şerqê" guhartine. Navê "Seîdê Kurdî" bi "Seîdê Nûrsî" bedêl kirine. Paşnavê wî jî ku "Kurdî" bûye, bi "ustad" nivîsîne û bi sedan tehrîfatên wisa yên din...

Di dawiya 1993´an de, dema ev pirtûka hêja ku bi riya kovara Nûbiharê gihaşte destên min, gelekî bala min kişand. Berê jî, min çend caran hin meqale û nivîsên ku li ser Mele Kurdî yên di Çapemeniya Kurdî de ku hatibûne weşandin xwendibûn. Îcar bala min li ser pirtûkê zêde kumişî. Ji ber hindê min xwest ku ez vê wergerînim zimanê kurdî. Û min bi riya Nûbiharê peywendî bi amadekarê pirtûkê kekê hêja Osman Resûlan re danî û min jê xwest ku ew destûr bide, da ez pirtûkê wergerînime zimanê xwedî yê asasîn. Birader Resûlan jî li pêşberî wê dawxaza min gelekî dilşad bûbûye û piştre bi "fax"ê, nameyek di 02 07 1994´an de bo min hinart. Nivîsa nameya wî, piştî pirskirina hal û rewşê û nişandana dilşadbûna wî bo wergerandinê, ev e ku li jêrê ye:

"Bedîûzeman Seîdê Norsî, yek ji kêm şêxsiyetan bû ku ji aliyê

dinya bisilmantî ya hemdem ve hatibû gihandin. Bedîûzeman Seîdê Norsî yê ku ji bo felatkirin û nîşandana rê ji ummeta ku ketibû nava gelşan re, bi koknijada xwe Kurd bû. Vî zanayê giranbiha, berî komarê (ya Tirk) û piştî wê jî, di wan berhemên ku nivîsîbûn de çaxê behskirin pêdiva bûye her navdanka (identitet) xwe eşkere kiriye û kurdbûyîna xwe jî di dadgehan de û li pêşberê raya giştî aniye zimên. Lê mixabin kurdbûyîna wî, ji aliyê hinek şagirdên wî yên Tirk û tirkazbat ve nehatiye semaxkirin; bi parastineke isrardar ew şixulîne ku herwekî kurdbûyîn jê re mîna zulmê çêbûye û ne ji nijada Kurdî ye. Peyvên Kurd û Kurdîstanê yên ku di berhemên wî de bûne, bi awayekî pêlik veşartine û ji navê derxistine. Heta îş gihandin wê radeyê û şixulîne ku ango Bedîûzeman Tirk e.

Necmedîn Şahiner ê ku biografiyaya kronolojiya Seîdê Norsî nivîsîbû, pêşkêştiya vê yekê kiriye. Ji aliyekî ve, ew agahdariyên li ser Kurdan ku Bedîûzeman Seîdê Norsî di berhemên xwe de anîbûne zimên, hemû ji ber çavan veşartine. Ev xasmetî ji mêj ve jî bala min kişandibû.

Hêj Bedîûzeman Seîdê Norsî li jiyanê bû, biraziyê wî Ebdurehman ev berhem nivîsiye. Min, orîjînala vê pirtûka piçûk, di pirtûkxana Silêmaniyê de dît. Îcar ji ber ku yekî ji malbata Norsiyan ev nivîsiye, helbet bihayekî wê yê giranbiha heye. Min vê yekê dizanibû ku ev berhema biyografîya piçûk a kurt, bêguman tenê vebiriya beşek ji jiyana Seîdê Norsî ya dirêj a bi macera ye. Û sedemên ku pirtûkê bo min bîrjiyan dikirin jî hebûn:

Yekemîn, yê ku pirtûk nivîsiye, yekî ji malbatê bû û dema ku nivîsiye jî li ba mamê xwe li Stenbolê dima. Ha ev ji bo dana rastîtiya agahdariyan, girîng e.

Duyemîn, ji aliyê nivîsandina biografiyaya pêşî ya li ser Bedîûzeman Seîdê Norsî ve, piştre jî çi kesên ku binivîsin, bi pêşanî dê van agahdariyên ku di vê biografiyayê de ne, wek çavkanî pêdiviyabû ku bi kar bînin.

Sêyemîn, pêşî şagirdên Nûrê û xwendekarên ku bi Bedîûzemanî ve pêwendîdar dibin, wê di derheqê regeza (neseb) wî de bibin xwediyê agahdariyeke rasterast a xurt.

Ji ber van sedeman û yên di şûfên wan de, her weha ji serê pêşî ve jî bo qezenckirina vê pirtûka piçûk a biografiyaya orîjînal ji şagirdên Nûrê û xwendekarên din re ku çêbûye, ger

hindik be jî ew berpirsyarî ketibû ser min, ez diramim ku min ew bi cih aniye. Bi silav û rêzaniyên min."

Osman Resûlan Navê vê pirtûkê yê bi zimanê Osmanî: "Bediuzzeman`in Tarihçe-i Hayati" bûye. Gava wergerandine tirkiya nû, navê wê kirine: "Bediuzzaman`in Hayati". Min jî gava ew wergerande zimanê kurdî, navê wê danî: "Jiyana Mele Seîdê Kurdî."

## Jiyana Mele Seîdê Kurdî

**Mele Ebdurehman Norsî**

### JIDAYÎKBÛNA MELE SEÎDÊ KURDÎ

Bedîûzeman Seîdê Kurdî, di 1293´an (1875) de, li gundê Norsê yê girêdayê bi nehiya Îsbarîtê ve ku bi qeza Hîzanê, wîlayeta Bidlîsê ve ye, ji diya xwe çêbûye. Kurê şêxsekî bi navê Mîrze ye. Heta nehsaliya xwe, li cem bavê xwe maye. Ewçax kekê wî Mele Ebdulah, di xwendina zanistiyê de bû. Di zarûktiya xwe de jî ew muhakema wî ya di tehsîla zanistiyê de ku bi demekurtekê berfireh bûbû, bo nîşandana radeya feyzdarbûna wî bes bû. Gava kekê wî, her didît ku li gund rêkûpêkbûna Seîdê Piçûk rindtir dibe û nexwendiyê mîna xwenedayan bi hevalên xwe re dilipike, li meziyeta wî sêwiriye û jê re heyran maye. Haşte kekê wî Mele Ebdulah, dîtina wê rewş û tevgera erênî, bi zayîneke jidil a şewqdar, bo destpêkirina xwendina wî biryar daye.

### SALÊN XWENDEKARIYÊ

Mele Seîd serê pêşî ji bo xwendinê çûye “Taxê” yê girêdayê bi nehya xwe ve. Lê wî li wê medreseya ku dersdar Mele Mihemed Emîn îdare dikir, zêde nedomandiye. Çimkî Mele Seîd, ji zikmakî ve bo parastina şanaziya xwe gêravî nîşan dida. Heta di vê mebestê de, bi tewrekî amirane, xwe li gotineke piçûktirînê gotinan jî nedilefand. Ew hawe, mîzaceke wî ya bêvekêşan dihate hesibandin. Ji ber hindê pir neborî, wî bi hevalên medresê re qirên kiriye û bi fermana Mele Mihemed Emîn, dîsa vegeriyaye gundê xwe Norsê.

Ji ber ku medrese li Norsê nebû, di heftiyê de her carê ku kekê wî (Mele Ebdulah) dihate gund, ders jê digirt. Her wisan wî, ew

dersa ku di heftiyekê de ji kekê xwe digirt dixwend û bi dubarekirinê re dibihurî.

Demekê şûnde çûye gundê Pirmiz. Ji wir jî çûye zozanê şêxên Hîzanê. Li wê derê jî, çewa ku li jorê hatiye behskirin, ji ber mana gerdendayîya xwe ji aliyê kesên din ve, li şanaziya xwe danediqurtandiye û bi çar şagirdên hemsaliyên xwe re ketiye naheziyê. Ew çar şagird geh gahî gihane êkdû û wî nerihet kirine. Ji ber hindê wî jî li xwe dananîye ku here ba xwediyê medresa ku navê wê bihurî Hezretî Şêx Seyîd Nûr Mihemed ku zivêriya xwe nîşan bide û gilî bike. Lê rojekê axaftineke weha di navbera wî û Şêx de bihuriye:

Mele Seîd:

- Şêx Efendî. Ji van şagirdên xwe re bêje, gava bi min re qirên dikin, bila her çar nebin yek, bila didu-didu werin min.

Efendî, ji nîşandana mêrxastiya Mele Seîd a bi wê zarûktiyê ve, kêfxweş bûye û gotiye:

- Tu şagirdê min î, kes têkilê te nabe.

Piştî wê gotinê Mele Seîd êdî bi şagirdê Şêx hatiye binavkirin. Piştî demekê ku li wê medresê maye, vêca bi kekê xwe re çûye gundê Norşênê.

Ji ber ku demsal havîn bû, rûniştevanên gund digel şagirdan tev çûne zozanan. Mele Seîd carekê li zozên bi kekê xwe Mele Ebdulah re qirên kiriye. Lê gava dersdarê Medresa Taxê Mele Mihemed Emîn têkilî meselê bûye û gotiye: “Çima tu ji gotina kekê xwe derdikevî?” Wî jî ji ber ku dizaniya ew Medrese ya Hezretî Şêx Evdirehmanê menşûr ê bi nasnavê “Seyda” ye, ji mamosteyê xwe re bi vî hawayî rave kiriye:

- Efendî! Bi hawayê mana di vê tekyayê de, tu jî mîna min şagirdek î. Nexwe li vir mafê te yê mamostetiyê nîne.

Mele Seîd bi şevan, di daristaneke ku her kes newêribû da bi rojan jî tê re biçûna, tê re bihurîye û çûye Norşênê, ji wir jî çûye gundekî bi navê Koxan.

## LI KURDÎSTANÊ SAZGEHA MEDRESÊ

Alimekî ku destûrname wergirtibe, sirf ji bo razîbûna Xwedê, li kîjan gundê ku bixwaze medreseyekê vedike. Eger heyîna dersdarî hebe, ew raxistina medresê û lêçûya ardû jî ji kîsê xwe dike. Lê dema ku taqeta wî ranegire, ji aliyê gundiyan ve tê

kirin. Dersdar çewa ku dersdariya bê heq dike, gundî jî karê xwarina şagirdan digirine ser xwe. Yanî her şagird, xwarina xwe ji maleke gundî tîne. Xwarina şagirdan taybetê nayê hazirkirin, xwarina gundiyan her dem çi be, her ew xwarin sêdan didine wan jî. Yan jî raste rest xwarin ji aliyê xwediyê medresê ve tê dayîn. Rewşa danê bi çi rengî be bila bibe, bi kurdî ji wê xwarina ku didin şagirdan re "Ratib" tê gotin.

Di salê de carekê, şagird diçin gundên cîran û ji xwe re zekat kom dikin. Ew bi wê zekata komkirî, bo xwe perê kincan derdixin.

Mele Seîd di salên feqîtiya xwe de, tu carî bo komkirina zekatê neçûye gundan û ne jî bo anîna ratiban çûye. Lewra di dîtina Mele Seîd de, anîna ratiban, herwekî mîna stûxwarkirin û destvekirina li pêşberê hinekan be, giran hatiyet. Ji ber vê hindê bûye ku wî pêwîstiya girtina zekatê nedidît. Hevalên Mele Seîd gava diçûne komkirina zekatê, hinek gundî ji nelixwedanîna wî re diltepîn dibûn û di nava xwe de hinek alîkarî dicivandin, wek lêçû, zêdetirê ji zekata ku hevalên wî kom dikirin, wek diyarî didanê. Lê ji bo ku mineta kesî nekeve serê, wî ew pere bi xwe re nedihiştin û didane kekê xwe Mele Ebdulah.

## XWEŞBÊJIYEK

Piştî ku wî ew pereyên ku gundiyan wek diyarî dabûnê, dane kekê xwe, henekekî weha di navbera herduyan de çêbûye:

Bedîûzeman:*

- Bi wan pereyên ku min dane te, tivingekê ji min re bikirre.

Mele Ebdulah:

- Na, çênabe.

Bedîûzeman:

- Nexwe rovelekê (demançeya bangor) bikirre.

Mele Ebdulah:

- Ew jî çênabe.

Bedîûzeman:

- Madem çênabe, nexwe xencerekê bikirre.

Mele Ebdulah:

- Ew jî çênabe. Ez ê ji te re tenê hinek tirî bikirrim û vê gelşê bi şîranî girêbidim.

* Di teksta bi zimanê tirkî de nasnavê Mele Seîdê Kurdî "Bedîûzzaman" nivîsiye. Lê ewçax wî hêj Kurdî nasnav wernegirtibû -nm.

**DERBASKIRINA JIXWEÇÛNÊ**

Mele Seîd piştî ku demekê li vê medreseyê jî maye, bi tena serê xwe ketiye rê û çûye Sêrtê. Di wê navê de ji ber êrîşa xwînê ya li mejî, jixweçûneke kurt bihurandiye. Û feqiyên hevalên wî ew rakirine û birine ba Şêx Ebdulqeharê xelîfe yê Hezretî Şêx Ebdurehman. Wê demê wî ew rewşa ku tê de bû, weha gotiye: Ez, herwekî Hezretî Seyda yê ku wefat kiriye, dibîne.

Seyda (Ebdulqehar):

- Seîd, were vir, ez ê te xweş bikim.

Mele Seîd xwe bi xwe ramiyaye: "Ez ku derkevim devereke bilind, dê bifirim û bigehime Hezretî Seyda." Ji wir rabûye xwe ji destên hevalên xwe filitandiye û çûye. Di rê de li goristanekê rast hatiye. Hevalên ku li dû wî çavnêr bûne, ew ji paş ve girtine. (Mele Seîd guman kiriye ku mirî vejinîne û pê girtine). Pêre pêre dest avêtiye xencerê: Mirîno! Min berdin, ez ê we bikujim.

Feqiyan Mele Seîd hemêz kiriye û ew birine ba Hezretî Şêx Ebdulqehar. Mele Seîd ji Hezretî Şêx re gotiye:

- Eger tu min xweş dikî bike, eger nakî, nexwe ev çi ye ku ji te re dibêjin şêx!?

Mele Seîd gava di mêrdewanê re derketiye ser bên, xwîn ji bêvila wî hatiye û pêre pêre bo wî bûye sedemê leşsaxiyê.

Ji wir rabûye û çûye qezaya Xeydayê ya ku bi warê "Şêxên Mezin" tê zanîn. Li wir jî bi hevalê xwe Mele Mihemed Efendî re qirên kiriye. Gava Mele Mihemed xencerê kişandiye, bivirek li ber çavên wî (Mele Seîd-nm) ketiye û dest avêtiyê. Herdu li qirênê sîqal bûne. Feqiyek ji serê xwe birîndar bûye û ketiye erdê. Piştî qirênê, Mele Seîd îcar dest ji jiyana medresê berdaye û şûnde vegeriyaye çûye mala xwe. Gotiye bavê xwe:

- Heta ku ez mezin nebim, êdî ez naçim xwendinê. Lewra feqî hemû, ji min mezintir in. Heta ku biriya min bi wan ve neyê, ez

ê li malê bimînim.

Ew hetanî bihara wê zivistanê, li mala xwe maye.

## XEWNEK

Di wê navê de Mele Seîd xewneke weha dîtiye: "Qiyamet daketibû, kaînat (dinya digel tiştên xwe -nm) ji nû ve vejîn bûbû." Di wê demê de ew ramiyaye ku dê çewan Hezretî Pêxemberê me ziyaret bike. Piştre çûna ber serê Pira Sîratê hatiye bîra wî ku here li wir bisekine. Lewra her kes tê û di wir re dibihure û xwe bi xwe gotiye: “Ez ê li wir rawestim.” Rabûye bi lez çûye û yeko yeko pêxember hemû ziyaret kirine. Gava wî Hezretî Pêxemberê me jî ziyaret kiriye, ewçax ji xewa xwe şiyar bûye.

Feyza ku ji wê xewnê girtiye, lê ruhniyeke mezin a bo xwendina zanînê geş bûye. Ji bavê xwe dîsa destûr xwestiye ku dest bi xwendinê bike. Bi wê desîseyê ew çûye gundê Arwasê. Li wir, Mele Mihemed Emîn ê menşûrê bi dersdariyê li xwe dananiye ku dersa Mele Seîd bide û şîret li feqiyekî xwe kiriye ku dersa wî bide. Ew yek jî, mîna zixtekê li şanaziya Mele Seîd ketiye.

Rojekê gava ku Mele Mihemed Emînê Menşûr li mezgeftê dersa şagirdekî xwe daye, Mele Seîd li pêşberê wî derketiye û lê bervêdan (îtîraz-nm) kiriye, gotiye: "Ne wisan e!"

Piştî wê livakê, Şêx xwestiye bîne bîrê ku wî li xwe dananiye qenim dersa wî jî bide.

Mele Seîd demekê li wir jî maye û piştre çûye Medresa Mîr Hesen Welî ya girêdayê bi Miksê ve. Li wir ew tê gihaye ku hogiriya Medresê, ji şagirdên nûdestpêkirî re tune. Wî li wir, bi wê hisa şanaziya ku xwe pê nîşan dabû, kêm nedaye nîşandan. Û di asasê xwe de pêdiviya xwendina heft pirtûkên rêzê terikandiye û daye xuyakirin ku pirtûka heştan dixwîne. Bo çend rojan ji wir ew, çendî ku çûye bajarokê Westanê jî, lê ji bo baguhartinê çend meh li wir maye. Piştre ew bi yekî bi navê Mele Mihemed re çûye Bazîdê. Haşte destpêka xwendina wî ya asasî, piştî vê demê dest pê kiriye.

## DESTPÊKA XWENDINA ASASÎ

Destpêka xwendina Mele Seîd a paqija sererast, li qeza Bazîdê ya girêdayê bi wîlayeta Erzeromê ve, li cem Hezretî Mihemedê Celalî çêbûye. Di wê navê de tenê xwendina wî ya bi sê mehan

xerîb e ku li Kurdîstanê, li gorî tewrê bikaranîna Xwendina Rêzê ta bi pirtûka herî dawîn ya piştî Mele Camî, ku ew pirtûk hemû xelas kirine.

Di wê rêveçênê de ji her pirtûkê ancax dersek-didu, zêdetir deh ders xwendine û ew li paş hiştiye, bi serkeftî dest bi yeke din kiriye. Ew rewşa ku wî dest bi pirtûkan kiriye û bê ku dawî lê bîne vêca dest bi yeke din kiriye, li xweşa dersdarê wî Şêx Mihemedê Celalî neçûye. Rojekê gava wî ew sedemê kirina bi wî hawayî ji Mele Seîd pirsîye, weha bersîv dayê:

- Biriya min nagîje xwendin û têgihandina hewqas pirtûk. Lê ev pirtûk her yekê wan nola sindoqeke gewheran e û mifta wan jî bi te re ye. Îcar ez ji te hêvî dikim ku tu, tenê ew tiştên di wan de ne, bo min diyar bikî, ka çi ne. Ango pêşî ez têbigehim ka ev pirtûk behsa çi dikin, piştre jî ez ê bişixulim û li gor çîka xwe bi dest xînim.

Amaca asasî di vir de; ew peydakiroxtî û nûtîtiya ku ji zikmakî ve bi Mele Seîd re hebû, li hawayên xwendina medresê biçespîne û nûtîtiyeke şaqizdar daxîne holê, da hewqasî zeman bi xwendina şerh û haşiyan re wenda nebe. Bikaranîna wê tewrê, bi hawayekî normal, diviya ku di bîst salan de xwendina bo fêrbûna zanînên pirtexlît bibûna. Lê ew bi demeke sêmehane fêr bûye û wan pirtûkên Xwendina Rêzê hemû bi dawî anîne.

Li ser wê yekê, dersdarên wî gava bi pirsên “ka gêrofentiya te bo kîjan şaxê zanistiyê zêdetir destdayî ye?” ku dihatin pêşber, weha bersîv dida:

"Birastî ez van zanistiyan ji êkdu cuda nakim. Ez yan hemuyan dizanim, yan hîç yekê jî nizanim!"

Mele Seîd kîjan pirtûka ku digirt destên xwe, ji bo têgiştinê zehmetî nedikişand. Wî xwe bi xwe, di bîst û çar saetan de, dused û bîst rûpel ji pirtûkên weke Cem´ul-Cewami´ê, Şerh-ul Mewaqifê û Îbn-ul Hecerê dixwendin û têdigiha. Îcar wî her zemanê xwe hemû bi wî hawayî dinirxand. Ew bi radeyeke wisan nixroyê zanistiyê bûbû, ku bala wî ji dinyaya derve hatibû birrîn. Çaxê pirsa girêdayê bi kîjan şaxê zanistiyê ve ku jê dihate pirsîn, bê ku bilitime pêre pêre bersîv dida.

## KURTAWIREK LI JIYANA WÎ YA WÊ DEMÊ

Ewil: Mele Seîd ketiye pîşeya zanyarên Îşraqîyyûnan, li pêşberî

hemû zewqan derketiye û dest bi parêzê kiriye. Bêwekû zanyarên Îşraqîyûnan hêdî-hêdî liviyane û ew fêrî wê parêzê kirine. Mele Seîd jî bê ku laşê xwe bibanîne, hema ji nişka ve ketiye parêzê. Lê laşê wî ew ranegirtiye û qels bûye. Di sê rojan de bi pariyek nan didebirî. Berî her tiştî Mele Seîd bi wê pêgirtinê ve, bi kirina weke zanyarên Îşraqiyyûnan ku li dîtina "ramana parêztiyê, suxra belavkirinê ye" her û her dişixulî.

Ya diduyan: Ew li gorî Îmamê Xezalî ji layê Tesewufê ve ku di Îhyaul ´Ulûmê de gotiye: "Ji tiştê gumanbar birevin, tiştê negumanbar bikin" (Hedîsa, Tirmizî ed.), xwe li wê tewrê hesikandiye û demekê dev ji nan jî berdaye, tenê debara xwe bi giyayê kiriye.

Ya sêyemîn: Ew pir hindik dipeyivî.

Gorgeha mîrkurrê helbestvanê Kurdan a Hezretî Ehmedê Xanî ku bi rojê jî daketina nava wê bi tirs e, Mele Seîd xwe têwerandiye û carinan bi şevê jî di wir de maye. Ha ji ber wê yekê bû ku xelkê di biwara wî de digot: "Ew bi bereketa Ehmedê Xanî têrbar bûye" ku hetanî ew hawe li kerametên wî jî bar dikirin.

Mele Seîd di wê demê de hêj sêzdeh, çardeh salî bû. Wî, di wê riya ku dabû pêşiya xwe de dudilî dikir, ka xişê rastiyê û ya dîtina zanistvanan dike yanena. Ji ber hindê wî biryar dabû ku serdana zanayên bijare yên Kurdan bike û ji bo ku gumana xwe jî berteref bihêle, bipîrozbahî dersek-didu jî li cem wan bixwîne.

Mele Seîd destûr ji dersdarê xwe xwestiye ku seriyekî bide Bexdadê. Û ketiye şûfê derwêşan; postekî avêtiye navmila xwe, bê ku li rê here hema di çiyan û daristanan re bi şevan geredor bûye ku here Bexdadê, lê ji nedî ve hema bi Bidlîsê ve derketiye. Û çûye Tekyaya Şêx Mihemed Emîn Efendî û du rojan ders xwendiye. Şêx ew kincên derwêşan jê avêtine, cubeyekî û şaşekê diyarî danê û jê re pêşniyar kiriye jî ku ew hertim bi wergirtina çîna zanistvanan wergirtî bibe.*

Mele Seîd li pêşberî wê pêşniyarê gotiye:

- Ez ji ber ku hêj negihame temenê kametiyê, ji xwe re qiyafetê dersdarekî hêja nelê dibînim. Ez zarûkek im. Çewa dikarin bibime dersdar?

* Li Kurdîstanê şagird di salên xwendinê de cube û şaşik wernagirin. Ew qiyafet bo kesên destûrnamegirtî

taybetmendiyek e.

Wî, ew pêşniyara desrdarê xwe nepejirandiye; ew cube û şaşika ku dabûnê jî, li kenarekî Mizgeftê hiştine û çûye Şêrwanê cem kekê xwe ku berê wî ew li wêrê hiştibû. Li wir, serê pêşî ku hêj kekê xwe dîtiye, di navbera wan de axaftineke kurt weha bihuriye:

Mele Ebdulah:

- Piştî te, min pirtûka Şerhşemsiyê qedand. Lê niha tu çi dixwînî?

Mele Seîd:

- Min heştê pirtûk xwendin!

Mele Ebdulah:

- Ev çi gotine?

Mele Seîd:

- Li gorî rêbaziya medresê çewa ku min ew pirtûk xwendine, min ew pirtûkên ku nakevin rêzeriya we jî xwendine.

Mele Ebdulah:

- Nexwe ez ê te îmtîhan bikim.

Mele Seîd:

- Ez amade me. Fermo tu çi dipirsî, bipirse!

Mele Ebdulah, birayê xwe îmtîhan kiriye. Têrbûna zanîna wî pesend kiriye û ew Mele Seîdê ku berî heşt-neh mehan şagirdê wî bû, ji xwe re wek dersdarekî pejirandiye û dest pê kiriye ji feqiyên xwe penî ders jê wergirtiye. Lê di wê navê de wî feqiyên xwe pê nehisandiye ku berî çend mehan wî dersa birayê xwe dida, niha jî ew jê ders werdigire.

Rojekê feqiyên Mele Ebdulah di qelîşteka dêrî re dibînin ku ew li ba Mele Seîd ders dixwîne. Bi hawayekî heqdêr şaqiz dibin. Gava jê pirsîne, lê wî feqiyên xwe xapandine û gotiye: "Ji bo çavîn mebe, ez dersa wî didim."

Mele Seîd demekê li ba Mele Ebdulah maye, piştre ji wir çûye Sêrtê. Li wirê çûye Merdesa Mele Fethulah. Mele Fethulah jê pirsiye:

- Par, te Syûtî dixwend, îsal jî tu Mele Camî dixwînî?

Mele Seîd bersîv dayê:

- Erê! Min Cami qedandiye.

Mele Fethulah navê kîjan pirtûka ku pirsiye û ku bersîva “min ew qedandiye” digire, hema şaqiz bûye û piştre weha gotiye:

- Hey dîno. Par, tû dîn bûyî. Ma îsal jî tu dîn î?

Mele Seîd:

- Mirov ji bo ku nefsa xwe li pêşberî kesê din neşikêne*, dibe ku rastiyê binixumîne. Lê mirov li pêşberî dersdarê xwe yê ku ji bavê mirov giranbihatir e, ji rastiya rasterast pêvetir wekî din tu tişt nabêje. Ferman bike! Tu dikarî, min di wan pirtûkên ku te gotin de îmtîhan bikî.

Mele Fethulah ji kîjan pirtûkê pirsiye, Mele Seîd bi rindî bersîva wî daye. Li ser wê yekê Mele Elî Soran ê ku berî salekê dersdarê Mele Seîd bû, gava li wê axaftinê guhdarî dike, dest pê kiriye û li cem Mele Seîd ders xwendiye.

Mele Fethulah gotiye:

- Tu di zîrektiyê de zêdetir nuwaze yî. Gelo niha jiberkirina te çilo ye? Tu çend rêz ji “Meqamatê Herîrîye” ku du caran bixwînî, dikarî jiber bikî?

Mele Seîd rûpelek ji pirtûkê, tenê carek xwendiye û jiber kiriye.

Mele Fethulah gotiyê:

- Birastî, gava zîrektî û tîjîfehmtiya bi rada baştirîn hevcih dibin, rasthatina lê tiştekî kêm e. Lê heta niha min ew xasmetî di du kesan de dîtiye. Yekê di te de, ya din jî di Mele Xalidê Olekî de.

* Bêjeya “neşikêne” di orîjînala tirkî de “kirmak” hatiye nivîsandin. Lê ji naveroka hevokê diyar dibe ku şaş e, diviya ku “kirmamak” bûna.-nm.

## JIBERKIRINA PIRTÛKAN

Mele Seîd di heftiyekê de, bi xwendina saetek-didu ya rojane, pirtûka Cem´ -um Cewami´ê jiber kiriye. Li ser wê yekê Mele Fethulah li ser pirtûka ku navê wê hate gotin ev nivîs nivîsiye ku (Mele Seîd-nm): “Pirtûka Cem´ -um Cewami´ê di heftiyekê de jiber kiriye.”

Ew navûdeng li Sêrtê belav bûye û bi devan ji hev re hatiye

gotin. Mele Fethulah gelekî pesnê Mele Seîd daye û ji zanayên Sêrtê re gotiye:

"Şagirdekî pir gênc hatiye Medereseya me. Min çi jê pirsiye, bêlitimandin bersiv daye. Ez ji vê feraseta wî, ji zanîn û bihnpakiya wî re heyran dimînim!"

## LI MIZGEFTA ŞÊX NEQAŞ GENGAŞEYEKE DIGEL ÇO

Rojekê zanayên Sêrtê li deverekê kom bûne, Mele Seîd vexwendine cem xwe û pirs jê pirsîne. Mele Seîd, bê ku gumanbariyekê bihêle, bersiva pirsên wan daye. Dema wî bersiv dane jî, her li ruyê Mele Fethulah neriye. Gava li ruyê wî neriye, herwekî li pirtûkê binere û bersiv daye. Îcar çaxê zanayên Sêrtê ew tiştê jê dîtine ku Mele Seîd xwediyê hînpakiyeke bilindtirîn e, wî pejirandine û bê hemdê xwe pesnê wî dane. Ew bûyer bi demekurtekê li dormedêr belav bûye. Xelkê îcar bi çavên welîtiyê li Mele Seîd neriye û jê re rêzanî nîşandane.

Lê ew rewş û hes û zikreşî, bo reqabetê qorek şagird û zanyarên di radeya duyemîn de nepixandiye. Ewên ku navdariya Mele Seîd nekêşane, rojekê di navbera xwe de biryareke wisan dane: "Em ê wî -yanî Mele Seîd bo gengeşeya di babetên zanyarî de vexwînin Mizgefta Şêx Neqaş. Eger em wî di gengeşeyê de bindest bikin jixwe rind e, lê eger em serkeftî nebin, em ê derseke rind bi çoyên xwe bidinê." Wan pirtûk û çoyên xwe bi xwe re hildane û çûne li wê Mizgeftê kom bûne, piştre jî Mele Seîd vexwendine wir. Lê Mele Seîd li meselê varqiliye, ji yekî bi emanet xencerekê stendiye û rast çûye Mizgeftê. Gava wî ço bi wan re dîtiye, pirsiye:

- Ez li tiştekî ecêbmayî dimînim; heçîka pirtûk in, ew ji bo gengeşeyê ne. Lê we çima ço bi xwe re hanîne?

Paşepaşê ew gengaşeya zanistî, rûdanê guhartiye ser qirênê. Xelkê Sêrtê gava pê hisiyaye, pir kes hatine wir ku Mele Seîd xilas bikin. Wan, Mele Seîdê ku di dîtina wan de xwediyê giranbihatiyekê bû, ji destên êrîşkaran filitandine û birine wî xistine odeyekê. Lê Mele Seîd, ji bo hiskirina pîşeya xwe bû ku nehêlaye ew feqiyên êrîşkar ên erbabên zanistiyê ku bibin hedefa nezanan. Wî, kuştina xwe ya ji layên êrîşkaran ve jî daye ber çavan û ji odê derketiye, gotiye ku divê nezan têkilî karê alê zanistiyê nebin. Û ji bo berterefkirina wê xirecirê jî, ji şagirdan re weha gotiye:

- Min bikujin, lê siyaneta zanînê biparêzin!

Çendî ku Mele Seîd wê axaftina bêperwa li pêşberî şagirdan kiriye jî, hîç yekî ji nava wan pixav nekiriye ku xencerê lê bikişîne.

Di paşepaşê de ew xirecir çareser bûye. Muteserifê* Sêrtê bi meselê hisiyaye û ji bo parastinê Mele Seîd vexwendiye cem xwe û cendirme hinartine da wan şagirdan mişêxt bikin. Lê wî gotiye cendirmeyan:

* Muteserif, piştî Tenzîmatê, serokê saziyekê bûye ku di navbera qeza û wîlayetan de dima -nm.

- Em şagird in, xwe bi xwe qirên dikin û li hevûdu jî tên. Li ser vê yekê, ez rewa nabînim ku yekî ji derveyê pîşeya me têkilî navabera me bibe û ez nayêm jî. Bi ser ve jî, şaşî ji min çêbûye.

Bi wî hawayî, Mele Seîd cendirmeyan bi şûnde vegerandine. Ew, wê hingê di navbera 15 û 16 salên temen de bû. Lê bi gewdê xwe saxlem û şûş bû û di nava xelkê de bi Seîdê Menşûr hate binavkirin. Li Sêrtê eşkere kiriye ku ew amade ye li pêşberî hemû hevalên xwe yên ku jê re pêkolî dikin. Û vê yekê jî li axaftina xwe zêde kiriye ku, ew dê bersiva her cûre pirs bide, lê ew ji tu kesî pirsekê napirse. Û bîst salan bi wê soza xwe re beste maye*.

* Niha Mele Seîd weha dibêje: "Zihna min perîşan bûye, êdî ez li biryara xwe ya kevn israr dikim."

## JI SÊRTÊ BI BIDLÎSÊ VE

Mele Seîd her çiqasî ku dijberên xwe bindest kiribûn jî, lê ew li Sêrtê êdî bihnteng bûye û li wir hew semax kiriye, dîsa rabûye şûnde çûye Bidlîsê. Wê demê dijatiyek di navbera Şêx Emîn Efendî (yê ku li Bidlîsê bû) û şêxên Hîzanê de hebû. Hin mirîdên xwenenas, di biwara şêxên Hîzanê de partav diavêtin. Gava Mele Seîd ew tişt bihîztine, gotiye ku nebûkarî li bisilmantiyê naxwe û ev cûre duezmanî dibin sedemê têkçûnê. Mirîd çûne giliyê Mele Seîd li ba Şêx Emîn Efendî kirine. Şêx Emîn jî di biwara wî de weha gotiye:

"Ew ji ber ku hêj zarûk e, ne di temenê bervêderiyê de ye."

Ew gotin belav bûye, ta ku gihaye Mele Seîd jî. Ji pêşepêşê ve bû ku Mele Seîd ji gotinên wisan re semax nedikir. Çûye ba Şêx

Emîn û gotiye:

- Berêz, tu min îmtîhan bike. Ez dixwazim bipeyitînim ku ez di temenê bervêderiyê de me.

Şêx Emîn Efendî, li dora pêncî pirsên pirtexlît ên zehmet û cihêawe ji şaxên zanistiyê yên cuda niqandine û ji Mele Seîd pirsîne. Mele Seîd jî bersiva wan hemû pirsan daye û piştre derketiye derve, çûye Mizgefta Qureyşê, dev pê kiriye û wa´z û şîret li xelkê kirine. Li ser wê bûyerê, hinek ji xelkê Bidlîsê xwestine ku bibin alîkarê Şêx Emîn û hinek jî bibin alîkarê Mele Seîd. Lê Walî, bi gumana derketina bûyerekê ku rû nede, Mele Seîd ji wir bi dûr xistiye. Li ser wê yekê, Mele Seîd çûye Şêrwanê.

Ew kesên ku di gengaşeyên zanistiyê de li pêşberî Mele Seîd bindest bûne, bi hebûna hemû biriya xwe şixulîne ku wî di çavên xelkê de kêm bixînin. Wan livakeke Mele Seîd ya herî piçûk jî dikirin babetê lêkolînê. Rojekê îcar ka çewan bûye, ku rojekê Mele Seîd ranebûye nimêja sibehê. Ew kesên ku jê re zikreş bûne, herwekî ji xwe re sermiyanekî mezin dîtibin û li hawîdor belav kirine ku ango Mele Seîd nimêjê terikandiye.

Gava ji Mele Seîd hatiye pirsîn ku çima her kes di derheqê te de wisan dipeyive? Wî gotiye:

- Erê, tiştên bêbinyat, zû li nava xelkê belav nabin. Şaşî ji min çêbûye. Ji ber wê yekê, ez bardarê du tawanan bûme. Yek azarkirina Xwedê ye, ya din jî şermandina xelkê ye. Sedemê vê yekê jî ev e: Terikandina wirdên min in ku min ew bi şevan ji xwe re kiribûne edet. Haşte rihê xelkê ku gihaye vê rastiyê, bi tevayî tênegihaye û navê wê nizaniye. Îcar bi vî hawayê şaş rengdêr dikin.

Gava Mele Seîd li Şêrwanê bûye, yek ji aliyê Sêrtê ve hatiye wir û gotiye wî:

- Wey gelo! Zarûkek hatiye Sêrtê, çendî ku di navbera salên 14 û 15-yan de ye jî, lê di gengaşeyan de zanayan hemû bindest dike. Ez hatime, te vedixwînim, da ku tu werî û wî bêdeng bihêlî.

Mele Seîd wê vexwendinê pejirandiye û ji bo çûna Sêrtê xwe amade kiriye. Herdu ketine rê û bi qederê du saetan çûne, piştre Mele Seîd jê pirsa navê wî meleyê piçûk û ya hinek xeyset û qiyafetê wî kirye. Mêrik gotiye:

- Wele, ez navê wî nizanim. Lê serê pêşî gava ku ew hatiye, di qiyafetê derwêşan de bû û postek jî li navmila wî bûye. Piştre wî xwe xistiye qiyafetê şagirdan û hemû zanayan bêdeng hiştiye.

Mele Seîd gava wê yekê ji mêrik seh kiriye, têgihaye ku ew jê behs dike û ew bûyera berî salekê ya li Sêrtê ku rûdabû bi xwe ye ku hêj nû gihaye gundên hawîdor. Îcar ji wir dîsa bi şûnde vegeriyaye Şêrwanê.

Di wan deman de gava şagirdê Mele Seîd, Mele Cuhûr ku ji aliyê gundiyan ve hate birîndarkirin, Mele Seîd xeyidîye û çû kete hinduruyê gora Xasyayê ya ku li bajarokê Tiloya girêdayê bi Sêrtê ve ye. Di wê gorê de Qamûsa Okyanosa nuwaze (harika) hetanî tîpa “sîn”ê (i ) jiber kiriye. Gava sedemê jiberkirina Qamûsê jê hatiye pirsîn, weha bersiv daye:

- Qamûs, her bêjeyeke ku bi çend maneyan tê, dinivîse. Ez jî bi tersê wê, ketime meraqê da qamûsekê hazir bikim ku ji bo her maneyekê çend bêje têne gotin binivîsim. Ha ev daxwaz e min dehf da ku ez qamûsê jiber bikim.

Çaxê Mele Seîd di Gora Xasyayê de dima, birayê wî yê hinekî jê piçûktir Mihemed jê re xwarin dibir. Wî libên di nava xwarinê de didane mûriyên li hawîdorê Qûbeyê, nanê xwe di nêv ava xwarinê dadikir û dixwar, debara xwe dikir. Gava sedemê wê yekê pirsîne:

- Çima tu wilo dikî?

- Heçîka mûrî, xwediyên jiyana civateke tevayî ne. Ez dibînim ku xebateke derbeder li wan heye û hetanî bivê, ew girêdayê bi karê xwe ve ne. Helbet ez dixwazim wek diyarî alîkariya van komarvaniyan bikim!

Rojekê çend hevalên Mele Seîd ên ji şêxên Tiloyê, xwe bi xwe qirên kirine. Yekî ji wan xwestiye ku Mele Seîd alîkariya bera wî bike. Mele Seîd jî çaxê alîkariya bera qels kiriye, pêrgê peyayekî pir bi hêz bûye. Çendî ku jê pîçûktir bûye jî, wî ew xistiye rewşeke bêlivak. Lê gava herdu beran kevir avêtine êkdu, ew bûye hedefa avêtina kevirên wan, hem hedefa kevirên bera alîgirê xwe û ya kevirên bera din jî. Wisan êşiyaye ku heta mehekê jî gava di nimêjê de diçû sertewanê (rukû´a) zehmetî dikişand. Îcar gava duyemîn car hevalan ew (bo alîkariya qirênê) vexwendine, weha gotiye:

- Qirêna we ne bi xencerê ye, bi keviran e. Ez jî nakevim nava qirêneke wisan!

## FERMANA KU DI XEWÊ DE GIRT

Mele Seîd çaxê li Tiloyê bû, şevekê Şêx Ebdulqadirê Gêlanî di xewna xwe de dîtiye. Hezretî Şêx gotiye wî:

- Mele Seîd! Here ba Mistefa Paşa yê serokê eşîra Mîranê û wî vexwîne ser riya rastiyê; şîret lê bike, da ji zordariya ku ew dike vekişe. Bila nimêja xwe jî bike û vegere ser riya rast. Eger gotina te bi cih neanî, wî bikuje!

Mele Seîd piştî wê xewnê, rabûye xwe bo çûna bi aliyê eşîra Mîranê ve amade kiriye û ji Tiloyê derketiye, çûye ta ku ketiye binê çadira Mistefa Paşa. Gava gihaye wir, Paşa ne hazir bûye û wî hinek bihna xwe berdaye. Bi demekurtekê şûnde Mistefa Paşa ketiye hindur û kesên hazir tev ji ber ve rabûne ser nigan, lê Mele Seîd ji cihê xwe neleqiyaye. Ew rewş bala Paşê kişandiye û ji Fetah Beg ê ku yek ji serdarên (binbaşi-nm) êşîrê bû pirsiye:

- Ev kî ye?

Fetah Beg bersiva wî daye:

- Mele Seîdê Menşûr!

Tu nabêjî Mistefa Paşa pir ji zanyaran bêzî dikir. Bê guman ew tevgera Mele Seîd jî, zêdetir wî çavsor kiriye. Lê wî ew çavsoriya xwe nedaye der û vegeriyaye ser Mele Seîd:

- Bo çi tu hatî vir?

- Ez hatime, te vedixwînime ser riya rast. Tu yan wê zordariya ku tu dikî dê biterikînî û nimêja xwe bikî, yan jî ez ê te bikujim!

Paşa ji wê bersivê kufkufiye û derketiye derve, bîstikekê ji xwe re geriyaye û dîsan şûnde vegeriyaye binê çadirê. Careke din sedemê hatina Mele Seîd jê pirsiye. Mele Seîd jî gotiyê:

- Min ji te re got ku, ez ji wê bonê hatime.

Şûrê Mele Seîd li stûna çadirê daleqandî bûye. Mistefa Paşa îşaret bi aliyê şûr ve kiriye:

- Bi vî şûrê pîsik?

Mele Seîd gotiye:

- Ne şûr dibirre, dest dibirre!

Mistefa Paşa dîsanê derketiye derve û hinekî geriyaye, piştre dîsa vegeriyaye hindur. Vê carê weha gotiye Mele Seîd:

- Li Cizîrê zanayên min hene. Eger tu hemuyan biletînî û wan bindest bikî, ez ê bi gotina te bikim. Eger na, ez te davêjime çêm.

Mele Seîd gotiye:

- Çewa ku bindestkirina hemû zanayan ne perwayê min e, avêtina min a çêm jî ne perwayê te ye. Nexwe gava min bersivine têrbûyî da wan zanayên ku tu dibêjî, ez ê tivingeke Mawîzer ji te bistînim. Ewçax eger tu di sozê xwe de nemînî, da ez te pê bikujim.

Piştî wê axaftina pêrgbûyî, ew rabûne li hespên xwe siwar bûne û çûne Cizîrê. Lê Mistefa Paşa di rê de hîç bi Mele Seîd re nepeyiviye. Gava ew gihane Banê Xanê, Mele Seîd kêlîkê razaye, da westandina xwe bibihurîne. Dema ji xew şiyar bûye, dîtiye ku li hawîdorê wî zana hemû pirtûkên wan di destan de ne û dipên. Piştî kirina xweşbêjeyeke hindik, çay bo mêvanan hatiye pêşkêşkirin. Zanyarên Cizîrê ji ber ku navûdengê Mele Seîd bihîztibûn, zêdetir daketine rewşeke şaqizbûnî û çay ji bîra wan çûye, hemû ketine tavila pirsên ku jê bipirsin. Mele Seîd piştî ku çaya xwe vexwariye, çaya çend kesên li pêşberî xwe jî ku ew pêl bi pêl diponijîn vexwariye.

Mistefa Paşa weha gotiye zanayên xwe:

- Ez nexwendî me. Lê ez wilo têdigehim ku hûn ji niha ve di wê gengaşeya ku bi Mele Seîd re bikin de bindest bûne. Çimkî ez dinerim ku we ji ber sêwrandinê çaya xwe jî jibîr kir. Mele Seîd piştî ku şûşa xwe qedand, du-sê şûşeyên ku li ber we bûn jî vexwarin.

Piştî hinek pêhenekiyan, Mele Seîd ji zanayên ku hazir bûn re gotiye:

- Berêzno. Ez ê suxrevanê we, soz daye xwe ku ez di layê pirsan de ji tu kesî çu pirs napirsim. Lê hûn dikarin pirsên xwe bipirsin.

Zanayên Cizîrê nêzî çil pirsan ji Mele Seîd pirsîne. Mele Seîd jî bersiva wan pirsan hemû daye. Di wê navê de, bê ku ageh ji xwe bimîne, bersiveke şaş jî daye wan. Lê bervêderên wî ji ber şaşmayîna xwe, wê bersivê jî rast dêrane û erêyandine.

Piştî belavbûna civatê, ew pirsa ku şaş bersiv dabû hatiye bîra Mele Seîd û li pey zanayan beziyaye, gotiye:

- Biborin. Min bersiva pirsekê bi şaşî dabû, belê hûn lê varneqilîne.

Mele Seîd ew bersiva ku şaş dabû, sererast kiriye. Li ser wê yekî zanyarên Cizîrê gotiye wî:

- Haşte, niha bi rastî te em bindest kirin û letandin.

Piştre hinek ji wan zaneyan dev pê kirine û li ba Mele Seîd ders xwendine.

Piştî wê gengaşeyê Mistefa Paşa ew sozê ku dabû, bi cih aniye; tivingeke Mawîzer diyarî daye Mele Seîd û ji sozê xwe derneketiye.

Mele Seîd bi nisbet gêrufentiya (qabiliyet) di zanînê de, bi gewdê xwe jî bi îdman û hêzdar bû. Ew zêdetir ji qebgirtinê re şad dibû. Bi hemû şagirdên di medreseyan de qeb digirt. Di qebgirtinê de jî kesî ew bindest nedikir.

Rojekê Mele Seîd bi Mistefa Paşa re derketiye colana hespan. Lê Mistefa Paşa ji qestî bo wî hespekî pir serkêş, xişîm û hîç lênesiwarbûyî dide hazirkirin. Çewa ku hatiye zanîn, wî dekekê li Mele Seîd hazir dikir. Mele Seîdê ku hêj di şazdesaliya xwe de bû, bîstikekê wî hespê serkêş gerandiye û xwestiye ku bibezîne. Hesp, piştî bezeke hindik ji riya normal averê bûye. Mele Seîd bi hemû biriya xwe xwestiye ku hespê serkêş rawestîne, lê serkeftî nebûye. Paşepaşê hesp bi aliyê devera ku zarûk lê dileyîztin ve çûye. Kurê yek ji axayên Cizîrê li ser rê bûye. Gava hesp du simên xwe hildane û li navmila lêwik xistine, lawik tereyî erdê bûye û di binê siman de perpisiye. Gundî liviyane ku lêwik xilas bikin, lê dîtine ku bêlibat e û di rewşa miriyan de ye. Piştre îcar xwestine ku Mele Seîd bikujin. Û suxrevanên Axê gava xencerên xwe lê kişandine, Mele Seîd jî pêre pêre dest avêtiye demaça (rovelve) xwe û gotiye:

- Rawestin! Eger li rastiyê bête nihertin, Xwedê ye yê ku lêwik kuşt. Eger bi nerîna derveyî be, hesp e yê ku wî kuşt. Eger li sedem bête nihertin, Mistefayê Keçel e yê ku wî kuşt. Lewra wî ev hesp dabû min. Niha ez ê bêm li lêwik binerim. Eger miribe, pişre em ê li êkdu bixin.

Mele Seîd ji hespê xwe peya bûye û çûye lêwik hemêz kiriye. Çaxê dîtiye ku livak di lêwik de nîne, wî biriye di ava sar de

niqo kiriye û deraniye. Lêwik çavên xwe vekirine û jê re keniyaye. Li ser wê bûyera ecêb, her kes ketiye heyretê. Piştî wê bûyerê hinekî din jî ew li Cizîrê maye, piştre şagirdê xwe Mele Salih hildaye cem xwe û çûye Biroya ku wargehê Erebên Bedewî bû.

Dema ew li Biroyê bûye, bihîztiye ku Mistefa Paşa dîsan jî mîna berê dest bi zordariyê kiriye. Ji wir çûye ba Mistefa Paşa û şîretên xwe lê dubare kirine, ew tehdît jî kiriye. Ta ku şevekê sêwiriye da wî bikuje û çûye devera ku lê (M.Paşa) raketî bû. Di wê gavê de lawê wî ji xew şiyar bûye û jê pirsiye:

- Tu li çi digerî?

Mele Seîd gotiye:

- Dilê min diçe hejîran, lewra ez hatime vir.

Kurê Mistefa Paşa pêre pêre rabûye û çûye gelek hejîr anîne û danê. Mele Seîd jî ji ber wê yekê ve weha gotiye:

- Vê carê jî bila hejîr di gerewa jiyana wî de bin.

Û dîsanê şûnde vegeriyaye ser ciyê xwe.

Carekê jî di gengaşeyekê de Mistefa Paşa tehdîd kiriye, gotiye:

- Dîsan jî te dest pê kir. Ez ê te bikujim!

Ew çax Mele Seîd ji Mistefa Paşa re peyvên bêrê gotine û nivîsendeyê wî (M.Paşa) ketiye navberê. Paşa li wê bêrêtiyê semax nekiriye û bo kuştina wî (M.Seîd) êrîş kiriye. Lê axeyên Mîran pê girtine. Mele Seîd Mawîzera xwe sererast kiriye û berê wê daye Mistefa Paşa. Tam di wê gavê de Evdilkerîmê kurê Mistefa Paşa gihayê û gotiye:

- Bavê min rafizî ye û li gotina kesî jî nabe guhdar. Ez hêvî dikim niha tu ji vir biferme devereke din.

## MELE SEÎD LI MÊRDÎNÊ YE

Mele Seîd gotina Evdilkerîm (ê kurê Mistefa Paşa) neşikandiye. Ji wir bi tena serê xwe çûye çola Biro ya warê Bedewiyan. Di rê de li mehkûmên Bedewiyan rast hatiye. Li pêşberî rimên Bedewiyan Mele Seîd dest pê kiriye û ew bi Mawîzerê gulebaran kirine. Ji ber wê yekê mehkûm şûnde vekişiyane. Mele Seîd li riya xwe domandiye, lê vê cara duyemîn ew li çeteyekî qerebalix rast hatiye û wî dîl girtine. Mahkûman kiriye ku wî bikujin, di nava wan de yekî ew nasiye û gotiye.

- Min vî zilamî li nêv eşîra Mîran dîtiye. Zatekî menşûr e.

Gava Bedewî (çete) wê gotinê bihîztine, pêre pêre dest ji Mele Seîd berdane û jê lêborîn hêvî kirine, hem jî pêşniyar kirine ku hetanî dawiya rê dê wî biparêzin. Lê wî li şayesteya (şanazî) xwe danequrtadiye û pêşniyara wan dehfepaş kiriye û bi tenê li riya xwe domandiye. Talî ew gihaye Nisêbînê. Çend roj li wir jî maye û piştre hêj çûye Mêrdînê.

Zanayên Mêrdînê pêşî xwestine ku bi Mele Seîd re têkevin qirêna raman û nîqaşan. Lê gava ew serkeftî nebûne, wî ji xwe re weke dersdar (üstad) pejirandine.

Di wan rojan de du derwêş hatibûne Mêrdînê. Yek girêdayê bi Hezretî Cemaledînê Efxanî ve bûye, yê din jî girêdayê bi Rêçika Sunûsî ve bûye. Mele Seîd bi wan re rûqal bûye. Bi saya wan derwêşan wî xwe hem bi pîşeya Cemaledînê Efxanî ve, hem jî bi Rêçika Sunûsî ve girêdaye.

Li Mêrdînê Mele Seîd şevekê bi çek çûye deverekê û di rê de pêrgê nijdeyeke polîs û cendirmeyan bûye. Îcar ew ji bo çeka xwe sêwiriye ku ez birevim wê min bigrin, ya baş ew e hema ez di nava wan re bibihurim, hema sing bi sing li nijdeyê rûqal bûye û raperikîne hevûdu. Devera ku ew lê bûne, çîmengeh bû. Ji ber wê yekê di çaxê qirênê de nigên polîs û cendirmeyan şimitiye û ew serejêr qotlanî bûne. Mele Seîd ji wê fersendê îstîfade kiriye û daketiye nava yek ji kuçeyên navendê, şopa xwe wenda kiriye. Roja din gava wî ew polîs dîtine, bala xwe dayê ku dest û serçavên wan kul û birîn in. Ji polîsan pirsiye ku çi havilê wan e. Polîs, tiştê ku di serê wan re bihurîye gotinê û gotine ku hebe tune be, ew zilam cinek bû. Ango cinên wisa jî hene.

Mele Seîd cara pêşî, gava li Mêrdînê bû, bi siyasetê ve mijûl bûye. Yanî jiyana wî ya siyasî, pêşî li Mêrdînê dest pê kiriye. Îcar ew ji ber destpêkirina siyasetê, bûye serlêdana qehra qaymeqamekî; destên wî kelemçe kirine û ew bi cendirmeyan hinartiye Bidlîsê. Di rê de çaxê nimêjê hatiye û wî ji cendirmeyan xwestiye ku kelemçeya destên wî vekin, lê cendirmeya venekiriye. Ji ber hindê wî ew girêdana hesinî ya destên xwe mîna kevnikekê vekiriye û ramî wan daye. Cendirmeyan ew rewş keramet hesibandine û daketine şaqiziyê. Mele Seîd xwestiye ku tivinga wî bidinê. Cendirme jî bi spartin jê hêvî û pêniyaz kirine:

"Em heta niha parêzgerên te bûn, lê ji vir û şûnde êdî em suxrevanên te ne."

Mele Seîd û cendirme bi wî hawayî hatine hetanî Bidlîsê*.

Çaxê ku Mele Seîd li Bidlîsê bûye, rojekê xeber gihayê ku walî û qefleyek memûr bade vedixwin. Mele Seîd gotiye: “Madem ez mişêxt bûme, vêca li welatekî oldar ê nola Bidlîsê, ku kesên hikûmetê temsîl dikin û rabin vê ziştiyê bikin! Ez napejirînim” û ji bo ku civata wan belav bike dest bi peyandinê kiriye. Pêre demaneçe (rovelver) û xencer hebûne. Di çaxê ku walî û kesên pê re tam dê bade vexwarina, ew ketiye hindurû. Pêşî ji wan re hedîseke pîroz a di biwara badeyê de xwendiye, piştre jî dev bi jimartina sixêfên giran kiriye. Herweha gumana girtina xwe ya bi dibebûna dana îşaretekê ji aliyê walî ve jî, daye ber çavan û demaçê bi destekî xwe girtiye. Bi wî hawayî ramiyaye ku pêre pêre jî dê ew bi kirina livakekê re li wan biteqîne. Lê walî ji ber ku mirovekî semaxkar û pawangêr bûye, hîç dengê xwe dernexistiye. Gava Mele Seîd ji devera bûyerê derketiye, yawerê walî gotiyê:

- Yaho, ev te çi kir! Ew peyvên ku te ji wan re gotin, gerekiya xeniqandina te dikin.

Mele Seîd gotiye:

- Xeniqandin hîç nehatibû hişê min. Bibe nebe tev min hesibandiye ku ez ê mişêxt bibim. Her çi be jî, ji bo ku dijekek bête dehfdan, heke ez bimrim jî, wê çi xisar hebe(?)

Piştî ku Mele Seîd ji wir çûye, bi du saetan şûnde, Walî bi hinartina du polîsan ew xwestiye cem xwe. Mele Seîd pêşî xwestiye ku li polîsan bixe, lê piştre ji wê dîtinê vekişiyaye. Ji ber ku wî, bigorîkirina jiyana xwe, ne ji bo du polîsan, zêdetir ji bo qirênkirina bi Walî re hilbijartibû û raste rest çûye devera ku Walî lê bûye. Gava ketiye hindur, Walî rabûye ser nigan û ber pê ve nêz bûye. Ewçax Mele Seîd guman kiriye ku Walî dê wî bibestîne, hema destê xwe avêtiye demaçê, lê tu nabêjî Walî dixwest ku here destên wî maçî bike. Ji bo daniştinê Walî cih nîşanê Mele Seîd daye, piştre jî gotiye:

- Pîrê her kesî heye. Tu jî pîrê min î û dê li ba min bimînî!

Di wê navê de rojekê Mele Seîd çûye nava leşkeran, da ji nêz ve wan bibîne. Bi wê amacê ew çûye ba leşkerên li devera bi navê Gökmeyanê. Lê gava ew nêzî barîgehê bûye, jê re gotine

ku qedexe ye. Wî herweku hîç nebihîstibe li riya xwe domandiye. Ji ber wê yekê, pênc ji leşkerên ku li wir bûne, raberizîne ser serê Mele Seîd û qirên di nava wan de dest pê kiriye. Mele Seîd her carê du leşker avêtine erdê û vegeriyaye ser yên din û bi wan ve lipikiye. Di wê demê de yekî ji wan xwestiye ku dest bavêje çeka xwe, lê Mele Seîd çek jê stendiye û mîna ço pê li wan xistiye. Piştî ku wan serî bi Mele Seîd re dernexistine, li dora bîst leşkerî ji barîgehê derketine û hatinê. Mele Seîd demeke din jî li ber xwe daye, lê pir hatiye hinciqandin û ketiye erdê. Di wê navê de serleşkerek hatiye û naveroka meselê pirsiye. Leşkeran bersiv dane wî, gotine:

- Efendim, mehkûmek bû hate vir, lê me wî girt û kuşt.

Mele Seîd gava li erdê dirêjkirî bû û ew gotin ji leşkeran bihîztiye, hema rabûye ser nigan û gotiye:

- Leşkerno, derew nekin. Ez welê zû bi zû namirim.

Wê hingê Serleşker Mele Seîd nasiye û ew leşker azar kirine. Lê Mele Seîd li ser wê yekê gotiye (Serleşker):

- Leşkeran azar neke, lewra şaşî ji min çêbûye. Herweha ez mafê xwe li leşkeran helal jî dikim, çimkî min tola xwe ji wan stendiye. Bi rastî, zêdetir, min li wan xistiye. Ji ber ku çi derba min diavêt, li hemuyan belav dibû. Derbên wan jî li min kom dibûn. Ew derbên ku min avêtine, eger li yekî tenê kom bibûna, ji yên wan ên ku li min ketine şê-çar caran zêdetir dibûn. Ha ji ber hindê, ez mafê xwe li wan helal dikim, tenê mafê xwe li mîlazimê (teymen) di nava wan de helal nakim. Çimkî dema wî li min dixist, pê re jî sixêf bi min dikirin.

Piştî wê bûyerê Mele Seîd êdî dest pê kiriye û ji qedexekirinan re zêde rîayet kiriye. Dêmek bo pejirinandina fermanekê, pêwîstî bi siqûmateke wisan heye. Lewra ew siqûmata ku bi ser Mele Seîd ve bihuriye, jê re bûbû derseke sosretî.

## EVÎNA SERBIXWEYÎ

Mele Seîd ji zikmakî ve, jiyana di binê zagoneke kifş de, nedisavêrand û ji sînorkirina livakên xwe hisnedikir; dixwest ku di her tewr û tevgerên xwe de zêdetir azad û serbest bibe. Heta wî mirina xwe jî her bi wî hawayê dixwest. Sînorên di qedexekirinê de, laşê wî diguvişand. Di wê derheqê de weha digot:

“Ji bo banîna min di sînorkirina medeniyetê de, divê ku her

dem bûyerên wisa yên bi şeqûdeq bi serê min ve bihurîbin. Ekene, ez serbestî û rizgariya xwe hîç bi zagonekê sînor nakim.”

Ha ji ber wê yekê bûye ku cara pêşî gava ew hatiye Stenbolê, hewl daye da ji girêdanên ku rizgariya wî bi sînor dikin dûr bibe û hîç demekê jî xemsarî nekiriye.

Mele Seîd gava li Bidlîsê bû, hêj di temenê xwe yê şazdeh, hivdeh salan de bûye. Hingê dihate hesibandin ku hêj ketiye temenê kametiyê. Heta wî temenî, agehiyên ku bi dest xistibûn, bi gêrûfen û ji hisiyatên hinavî (sünuhat) çêdibûn, bi dûvedirêjî pêwîstiya kirina mitaleyê bo xwendina ku kiribû nedidît. Lê piştî wî temenî, êdî hisiyatên hinavî, ger ji ber ketina temenê gihaştî bû, yan jî ji ber têkiliya bi siyasetê ve bû, her çi be jî hêdî hêdî ber bi wendabûnê ve diçûn. Mele Seîd eger ji bo parastina wê devera ku di nava zanayan de vegirtibû be jî, bêgav mabû ku ji nivîsarên zanayên curbicur yek-du nivîs jiber bikirina. Xasma ji bo bipaşvedana guman û erênatiyên ku li misilmantiyê dihatine barkirin, berhemên bi navê “Metali” û “Mewaqif” û bi agehiya teknîkê, li dora çil berhemên cuda yên girêdayê bi xwendina bilind ve, bi awayê hebûna wan jiber kirine. Heta bi xwendina her roj, sê mehan carekê ew pirtûkên ku jiber kiribûn jî dubare kirine.

Mele Seîd du awayên xwe yên hevters hebûne:

Yekemîn: Dizaniya ku asoya ramandinê pir vekirî ye... Ji ber wê yekê, kîjan pirtûka ku wî bigirtina destên xwe, ne mikun bû ku tênegihabûya.

Duyemîn: Demên ku ramandina wî dihate givaştin... Di wan deman de jî, xwendin li dera han bimîne, hiskirina wî bo axaftinê jî çênedibû.

Di salên xortaniyê de sêwirandina Mele Seîd zêdetir vekirî (münkeşif) dibû. Piştî buhartina ji salên bîstî, êdî saetên vekirinê li gorî saetên girtinê (inqibaz) her ku çûne dest bi kêmasiyê dikirin. Piştî vegera wî ji dîlîtiyê jî, ger ji rûyê pêrgbûna bi nerihetiyan re bû ku çawaniya saetên girtinê zêdetirîn bilind bûne.

Piraniya xelkê Kurdîstanê ji ber ku girêdayê bi Mezhebê Şafiî ve ye, Mele Seîd zêdetir pirtûkên şerîetê yên li ser (Mezhebê) Henefî nexwendine. Lê dema ku behs dihate kirin, digote zanayan ku pirtûkên henefî hêsan in. Lê ew babetê ku (di

Mezhebê Henefî de-nm) wî dixwend, pêşî biryara ku "şaş" e dida, dûre hinekî din jî ku dixwend hêj dest bi têgihîştina babetê dikir. Li ser wê yekê digot:

"Heywax! Min li pêşberî kesên girêdayê bi Mezhebê Îmamê Mezin (E´zem) ve peyvine bêrê gotin. Herhal ji ber vê yekê ye jî ev kerameteke Îmamê Mezin e ku di têgihîştina vê pirtûkê de zehmetî kişandim û min şiqama vê şaşiya xwe jî xwar."

Mele Seîd pirtûka "Mîrqat"ê ya ku behsa wê hate kirin, bê ku li cem wî şerh û haşî hebin, têdigihîşt û jiber dikir. Piştre jî gava şerh û haşi bi destên wî diketin, wî ew beyana (açiklama) xwe bi wan re rûqal dikir. Ji bilî sê bêjeyan, di wan hemû babetan de didît ku ew beyanên ku wî kiribûn, rasterast lê çêbûne. Ew hersê bêjeyên gumandar ku hebûne jî, nêzîkê maneya di şerhê de bûne û ji aliyê pejirandina zanayan ve jî rast dihatin dêrandin.

Rojekê yek bi derew gotiye Mele Seîd, ku Hezretî Mihemed Kufrewî yê ji şêxên Bidlîsê, lê nifir kirine. Mele Seîd li ser wê yekê çûye serdana Şêx. Gava Mele Seîd gihaye wir, Hezretî Şêx jê re rêzanî daye nîşandan û heta ji bo teberik jî vê dersê jiber dayê:

Ew dersa ku Mele Seîd li ba Şêxê Kufrewî xwendiye, êdî bûye dersa wî ya herî dawîn.

Mele Seîd carekê di xewna xwe de Şêx Mihemed Kufrewî dîtiye. Hezretî Şêx gotiyê:

- Mele Seîd! Were serdana min, êdî ez diçim!

Li ser wê gotinê Mele Seîd rabûye û çûye serdana Şêx. Lê wê hingê dîtiye ku Şêx firiyaye û çûye, ew jî ji xew şiyar bûye. Û li saeta xwe nerîye ku hêj dem nîvê şevê bû, dîsan raketiye. Çaxê bûye sibe, bihîztiye ku dengê şînê ji mala Hezretî Şêx bilind dibe. Rabûye û raste rest çûye mala Şêx. Gotinê ku Hezretî Şêx saet di heftên (Li dora 24.oo) şevê de çûye dilovaniya Xwedê. Îcar Mele Seîd bi tewrekî ponijdayî şûnde vegeriyaye û hatiye, xwe bi xwe gotiye: "Haşte biwêja xewna min!"

Mele Seîd ji ber ku (destûra-nm) Rêçika Nexşebendî ji şêxên xuyanî yên Kurdîstanê Şêx Seyîd Nûr Mihemed, pîşe û hiskirinê ji Şêx Evdirehmanê Taxî, herweha bi alîkariya wî (Taxî-nm) zanînê (´ilm) ji Hezretî Şêx Fehîm û dersa xwe ya dawîn jî ji

Şêx Mihemed Kufrewî girtibûn, bêqedar ji wan giranbihayan his dikir û bo wan her radiwestiya. Dîsa ji hemû zanayan re hiskirina wî pir hebû, xasma ji Şêx Emîn Efendî re, Mele Fethulah û jixwe li pêşberê Şêx Fethulah Efendî jî hiskirineke wî ya taybetî hebûye.

## PAZDEH SALÊN LI WANÊ

Hewqasa ku zana li Bidlîsê hebûn, lê li Wanê ji zanayên xuyanî zêde kes nebû. Bi wê pêwendiyê li ser vexwendina Hesen Paşa yê Wanî, Mele Seîd çûye Wanê. Di pazdeh salên xwe yên li Wanê de, ji aliyekî ve ders daye xwendin, ji aliyekî ve jî li nava eşîran geriyaye, da wan rêkar (irşad) bike. Wekî din jî zêde-zêde bi walî (Tahir Paşa) û memûrên bajêr re jî hevdîtin kirine û civanên xweşbêjiyê damezirandin.

## NÛTÎTIYA ŞÊWAZEYA PERWERDEKIRINÊ

Mele Seîd têgihaye ku pirtûkên Kelamê, bi şêwazeya (metod) klasîk hatine nivîsandin, êdî li pêşberî mirovên Sedsala Bîstî bi guman û mandela mane û di rewşeke bê bersiv de ne. Bi wê pêwendiyê, wî parastiye ku gereke di medreseyan de ´Ilmê Müsbet jî bête xwendin. Herweha ew gihaye wê baweriyê ku ew êrîşên her têne bisilmantiyê, tenê bi wî hawayî dikarin bêne berterefkirin. Bi wê yekê, di demeke kurt de, qaydeyên sereke yên mîna zanistiyên dîrokê, cografya, matematîk, jeolojî, xweza û felsefe dê bêne bidestxistin. Ev zanistiyên ku behsa wan hate kirin, ne bi awayê dana dersê ji aliyê mamosteyan ve, lê tenê bi encama xebata xwe bi xwe dê bêne zanîn.

Rojekê Mele Seîd, bi mamosteyekî cografiyayê re heta bivê di babeteka xwevayê lêkolînê de, ketiye gengeşê. Lê ew ji ber ku nagihane encamê, ew babet hiştine roja din. Mele Seîd di wan bîst û çar saetan de, pirtûkeke cografyayê ku zêde (mezin) nedihate hesibandin hemû jiber kiriye. Roja din, wî di koşka waliyê gorbihişt Tahir Paşa de, ew mamosteyê cografyayê mat kiriye. Dêmek daxwaza min ev e ku, Mele Seîd di warê cografyayê de, bi demeke kurt a nola bîst û çar saetan, bi hindikî weke mamosteyekî lîseyê, bûye xwediyê zanînê. Rojeke din jî, îcar bi mamosteyekî kimyayê re ketiye gengaşê. Di nava pênc rojan de Kîmyaya Inorganikê fêrbûye û dijberê xwe rind melisandiye.

Haşte ji van hemû beyabantiyan e ku, ji Mele Seîdê Kurdî re nasnavê BEDÎÛZEMAN hatiye dayîn. Ji wê demê û şûnde êdî ew

bi vî nasnavî hatiye binavkirin.

Mele Seîd bo xwe tewrekî xwendinê yê nû afirandibû. Welê ku digel zanistiya bisilmantiyê, zanistiya hemdem a pozîtîf jî bihelîne û rastiyên olî bi zanistiyên pozîtîf hêzdartir bike û bi hawayê saxlemkirinê zêna şagirdan ruhnî bike... Mele Seîd bi vê şêwazeyê ve, xasma giringî jî pir nîşan daye.

## ÇAR SERETAYÊN XWE YÊN TAYBETÎ

Mele Seîd di van çar babetan de, ji zanayên herêma ku lê dijî cuda dibû.

1) Bi tu hawayî negirtina diyariyan ji kesî, wek pere û nepejirandina meaş jî.

2) Ji tu zanayî nepirskirina pirsan.

Mele Seîd bîst û pênc salên xwe, hew bi dana bersivên pirsan re bihurandine. Wî li ser vê babetê weha digot: "Ez zanyartiya zanayan mandela nakim. Bo vê yekê ye ku ez ji wan pirs jî napirsim. Heke yên gumana wan di zanistiya min de hebe, bila bipirsin û ez ê bersiv bidim. Lewra pirskirina pirsan, mafê gumandaran e."

3) Şagirdên ku li cem wî dixwendin, ew ji anîna ratiban û ji girtina zekatê vekişandine. Lewra wî bi xwe xwarin û vexwarina şagirdên xwe amade dikir û sirf wî ji bo razîbûna Xwedê ders didane wan.

4) Mayina hertim bi "mücerred"ê (bêjinîtî-nm) û di dinyayê de nekirina pêwendiyan bi tu tiştî ve...

Heta vê demê jî gava ew çûye ku, wî mal û milkê xwe tev bi destekî xwe bilind kiriye û biriye*.

Çaxê ku Mele Seîd li Wanê bûye, bi walî Tahir Paşa yê gorbihişt re bûye dost. Tahir Paşa qorek pirtûkên çapa Ewrûpayê serobin dikirin û pirsên ku jê diniqandin, ji Mele Seîd dipirsîn. Mele Seîd jî ne ew pirtûk dîtibûn û ne jî xwendibûn. Wî di axaftina bi zimanê Tirkî de jî zehmetî dikişand, ji ber ku nû fêr bûbû. Li ser wî qasî jî, dudiliyeke piçûk nedida nîşandan. Rojekê dema wî ew pirtûk li cem Tahir Paşa dîtine, hingê têgihaye ku ew wan pirsên xwe ji wan pirtûkan derdixîne. Piştre Mele Seîd di demekurtekê de ew pirtûk tev xwendine û naveroka wan têgihaye.

* Yên ku jê (Mele Seîd ) dipirsî:

- Çima tu naxwazî bibî xwediyê tiştekî?

Weha bersiv dida:

- Wê zemanek bê ku her kes xweziya xwe bi rewşa min bîne. Bixwedîbûna mal û milk, zêde min çêjdar nake. Ez, bi çavine wisan li dinyayê dinerim ku tenê mêvanxane ye.

## RAMANA BO UNÎWERSÎTEYEKE LI KURDÎSTANÊ

Ji mêj ve bûye ku bi xemsarî tu girîngî li Kurdîstanê nehatiye dayîn. Mele Seîd bo zanistiyê sêwirîye ku unîwersîteyeke di tayê Camî´-ul Ezhera li Misrê de, bi navê Medresetu`z-Zehra li Kurdîstanê bête vekirin. Ji bo ew wê peyandinê li hevûdu bîne, dest bi xebatê kiriye. Lê çi heye ku, rejîma serbixwe çewa ji peyandina her mirovî re dibe asteng, jê re jî bûye asteng.

Mele Seîd gava li Wanê bûye, demsalên havînên xwe li zozanên Başît, Feraşin û Beytuşebabê dibihurandin. Rojekê gotiye Tahir Paşa ku di meha temûzê de jî qeşem li wan zozanên ku bihurîn heye. Lê Tahir Paşa wê yekê bervêdan kiriye û bi gotina ku di temûzê de qeşem li van deran peyda nabe, miçilge kiriye. Mele Seîd dîsanê di demekê de çaxê ku li zozên bûye, nameyeke weha ji Tahir Paşayî re hinartiye:

“Paşawo! Li serê Başîtê qeşem girtiye (çêbûye-nm). Tiştê ku te nedîtiye, mandela meke. Her tişt, ne li gorî zanîna te ye. Tirhêwbûna (saçmalik) te, li her deverê naşixule... Bi silav.”

Ew nameya Mele Seîd , ya cara pêşî bû ku bi zimanê tirkî nivîsandiye.

Mele Seîd çi dema dibihîzt ku mabeyna du eşîran xirav bûye, pêre pêre diçû wan li hev dianî, şîret li wan dikirin û mabeyna wan xweş dikir. Heta serokê eşîra Giraviyan Şekir Axa û Mistefa Paşa yê serokê eşîra Mîranê ku hikûmat jî bo aştiya wan tengizar dibû, Mele Seîd ew li hev anîne. Piştre li Mistefa Paşa vegeriyaye:

- Hêjî te tobe nekiriye?

Mistefa Paşa gotiyê:

- Seyda. Heke tu çi bêjî, ez êdî ji gotina te dernakevim.

Wê demê Mistefa Paşa xwestiye ku hespekî û hinek dirav diyarî bide Bedîûzemên. Lê Mele Seîd ew dernamî (redd) kirine û gotiyê:

- Te nebihîztiye ku min heta niha jî dirav ji kesî wernegirtine? Xasma, ez ê çewa dirav ji zorkarekî nola te dirav bistînim! Bigumanî ye ku te toba xwe xirav kiriye. Tu bi saxlemî ji virê nagîjitî Cizîrê!

Bi rastî jî demekê şûnde Mele Seîd xeber stendiye ku Mistefa Paşa berî gihandina Cizîrê di rê de hatiye kuştin.

Rojekê piştî gengaşeyeke zanistî ku Mele Seîd û waliyê Wanê Tahir Paşa bi hevûdu re kirine, navbera wan têkçûye. Di nava gengaşê de wî xwestiye ku bi demaçê li Tahir Paşa bixe. Lê kesên hazir ên li civatê, ketine mabeyna wan û ew haş kirine. Mele Seîd rabûye çûye Medresa xwe û ji hindur derneketiye. Di wê demê de piraniya şagirdên wî jî çûbûne malên xwe, tenê çar şagird li cem wî mabûne. Mele Seîd derî radaye û xwe li hindur penihandiye. Yên ku ji derve hatine (leşker yan polîs-nm) bi desîseyekê di vekirina dêrî de serkeftî bûne û ketine hindurû. Mele Seîd du şert pêşkêşê wan kiriye:

1) Min, di Medresa min de negirin. Çimkî rûmet û payedariya Medresê xisar digire. Min, li derve yan gava ez diçim bazarê bigrin.

2) Bi şertê ku çeka min bi min re be, hûn dikarin min mişêxtî devereke din bikin.

Walî Tahir Paşa, ew şertên Mele Seîd pejirandine û wî bi mişêxtî hinartiye Bidlîsê. Lê waliyê Bidlîsê ji ber ku agehdarê bi bûyerê bûye, bi gumana derketina bûyereke din endîşe kiriye û ji wir jî Mele Seîd mişêxtê devereke dîtir kiriye. Lê Mele Seîd çûye Hîzanê û ji wir jî çûye bi aliyê Kopê (Bulanik-nm) ve. Li wê herêmê wî, ji bo xweşbêjiyeke (sohbet) zanyarî li dora sih zanayî (mele) vexwendine civînê. Bi hawayê civandina her roj li gundekî, sih rojan li dû êk, civînên gengaşî tekûz kirine. Di wan civînan de çi pirsên ku hatine pirsîn, bi bersiv kirine.

Piştre jî Mele Seîd çûye qeza Erdîşê. Ji wir jî çûye Îranê û biryar daye ku wê di biwara Tahir Paşa (waliyê Wanê) de komeleyekê dabimezirîne. Lê gava Tahir Paşa ew yek bihîztiye, Mele Seîd vexwendiye (cem xwe-nm). Piştî pirskirina rewş û xatiran, herdu li hev hatine. Piştî wê yekê dîsanê ew li Wanê rûniştiye.

Mele Seîd di matematîkê de xwediyê têgihîştineke derbeder a xazdar bûye. Problemên herî zehmet, di zihna xwe de dipişkaftin. Heta wî demekê di zanyariya Cebirê de pirtûkeke bi kurdî jî nivîsandiye.

Rojekê li ba Tahir Paşa, meseleyeke li ser hisabê (matematîk), bûye babeta gengaşeyê. Kesên ku di wî warî de jêhatî bûne jî, hêj ku wan ew problem nepişkaftine, Mele Seîd ew babet di zihna xwe de pişkaftiye. Gelek caran ku ketiye pêşbaziyan jî, tê de hertim yekemîn derketiye. Carekê jî pirseke wiha jê hatiye kirin:

- Mesela, eger pazdeh bisilman û pazdeh nebisilman li pey êkdu bêne rêzkirin û li wan dapişk çêbibe, dê parvekirineke çewan bête kirin ku pişk her dê li nebisilmanan bikeve?

Mele Seîd  gotiye:

- Bo wan 124 awayên gumandar hene.

Û wê problemê pişkaftiye. Gotiye: "Ez dikarim ji vê müskültirîn (girantirîn!?-nm) jî, bipirsim. Ku her ez wê problemê dikarim li gor awayê bi 2500-î jî çêbikim."

Di nava du saetan de, wî 50 heb bisilman û 50 heb nebisilman bi wî hawayî pişkaftine, ku pişk her li nebisilmanan ketiye. Heya bi şertê hebûna 500 nebisilmanan jî, li ser hawayê gumandariyê, problemeke bi 250 hezarî damezirandiye û wî ew problem nîşanê Tahir Paşa dane. Piştre jî ew problem bi rewşa niviştokeke piçûk (küçük bir rîsale) nivîsiye*.

Pirseke din gava ku jê hatiye kirin, ango: "Fereza eger ruyê dinyayê bi libên genim tije bibe, jimara wan çiqas e?" Wî, di demeke kurt de ew jî pişkaftiye.

bersiva vê pirsa ku "Ji (zemanê) Adem (s.l.) ta vê demê çend 'aşire  ye (dehyeka saniyeyê), (ango bihurîne-nm)?"  Wî, ew bi zêna xwe di nava du saet û nîvê de çareser kiriye.

Careke din jî pirseke wiha jê hatiye pirsîn: "Dilopên barana ku barîne ser ruyê dinyayê, çend heb in?"

* Ew pirtûk, mixabin li Wanê di derketina şewateyekê de hatiye şewitandin.

Bersiva  vê pirsê, Mele Seîd weha gotiye:

- Ne ev, lê di saniyekê de li hemû ruyê dinyayê ku tebeqek bikeve û bi qalindiya çar tiliyan dilop bikevin û deh salan jî ew hawe bidomîne, ez dikarim bê xame bihesibînim.

Û di nava sê saetan de encama wê derxistiye.

Ew hesabên hûr ku Mele Seîd hewqas bi wan ve lipikiye, bi

hawayekî neyênî li zêna wî tîn kirine û nexweşîneke zênî ya wisan ew girtiye ku, bê zerûrî bûna ta sê salan jî bi kesî re nedipeyivî. Heta bi şagirdên xwe re jî zor dipeyivî. Lê piştî sê salan ew nexweşîn vêca bi temamî jê çûye.

## JI KURDÎSTANÊ BI STENBOLÊ VE...

Çewa ku li pêşiyê jî hatiye beshkirin, Mele Seîd xwestiye ku li Kurdîstanê medreseyeke di tayê Dar-ul Funûn`ê de, bi navê "Medresetuz`Zehra" ava bibe. Bo xebata avakirina wê li Wanê, yan li Bidlîsê yan jî li Diyarbekrê, ew rabûye çûye Stenbolê. Berî ku ew here Stenbolê, Tahir Paşa gotiyê:

- Tu, zanayên Kurdîstanê bêdeng dihêlî. Lê gava tu herî Stenbolê, tu li hemberê wan cewrên (masiyên mezin-nm) di wê deryayê de nikarî meydan bixwînî!

Çewa di agahdariyên li pêşî de jî bihuriye ku Mele Seîd ji daberizandinên wisan re hîç semax nedikir. Ha ji ber wê yekê bûye ku dema ew gihaye Stenbolê negihaye, zanayan vexwendiye mûnazerê*. Amaca wî ji vê; nîşandana tîjîfehmiya herêmî ya Kurdîstanê bûye û ta li wan deveran jî ku bala wan bide kişandin û perwerdekirinê têxe awayê firawendinê (yayginlaştirmak). Ekene, Mele Seîd bi tu rengî bo pêşnûmakirina zanyarî dilxweş nedibû.

* Mûnazere: Ji nihêrtinê hatiye. Li gor rîayeta tewr û awayan a di babetekî kifş de, bi riya diyarkirina ramana du aliyan -du kesan- ku gengaşe têne kirin. Yanî kirina pirsan û dana bersiva n -nm.

Mele Seîd gava li Stenbolê bûye, ew bûyerên ku bi serê wî ve hatine, çewa ku wî di berhema xwe ya bi navê "Îki Mekteb-i Musîbetin Şehadetnamesi"yê (Destûrnameya Du Xwendinxaneyên Sqûmatan -nm) de jî eşkere kiriye, wekî din (li vir -nm) nehatiye dubarekirin.

Belam Mele Seîd çewa ku hevalbendê serbestiyê bûye, herweha ew bûye şahid û ji ber wan niheqiyên ku wî bi xwe jî dîtine, hergav dijîtiya Jonturkan kiriye. Di wî warî de bo eşkerekirina dijitiya xwe (li pêşberî Jonturkan-nm) şûnde venekişiyaye û gotiye :

- We dîn arihand, xîreta Xwedê gepiçand û xîlafetê bêrûmet kir. Ez ditirsim ku encama vê yekê, giranbar (vahim) çêbibe.

Di Dadgeha Şerî (Dadgeha Awarteyî) de xweparastina fêriswarî

û berîdana yazdeh û nîv pirsên ji Jonturkan, ji layê her kesî ve tê zanîn.

Gava ew li Stenbolê bûye, ji bo vekirina medreseyekê li Wanê, Bidlîs û Diyarbekrê, çendî ku şixuliye jî, lê çi xebînet ku ew ji girtîxane û tîmarxaneyê pê ve negihaye encamekê. Paşepaşê (ji wir çûye û -nm) di riya Batûmê re dîsa şûnde vegeriya û hatiye Wanê. Di rê de ew li Tiflîsê pêrgî polîsên Rûsan bûye û gotine wî:

- Azadî dê hewe kerker bike.

Mele Seîd jî li pêşberê wan peyvên polîsan, weha bersiv daye:

- Di asasê xwe de azadî dê hewe kerker bike. Ez jî hatime Tiflîsê, da ku li vir medreseya xwe vekim.

Wî ev babet, di pareka (ek-îlawe) pirtûka xwe ya bi navê Dewa-ul Ye`sê (Tedawiya Bêhêviyan-nm) de bi awayekî fireh nivîsiye.

Çaxê gihaye Wanê, li nava eşîran geriyaye û bi dana dersên civakî, medenî û zanistî ve lipikiye. Di vî warî de jî pirtûkeke bi navê “Pirs û bersivên bi Eşîran re” nivîsiye.

Wî, zanayên li wir hemû civandine ba êkdu û diravên xwe yên heyî jî bo wan xerc kirine, da ji bo ol û zanistiyê suxre bêtin kirin. Lê ji ber ku hikûmetê pê re yarmetî nekiribû, peyandina wî nîvco maye.

**BEDÎÛZEMAN LI ŞAMÊ YE**

Her ji bo eynî meselê, vê carê bo çûna Şamê, ji Wanê ketiye rê. Gava ew gihaye Şamê, li ser hete re (îsrar) zanayan, xutbeyekê li Mizgefta Emewiyê xwendiye. Piştre jî wî ew axaftinên xwe bi navê “Xutbetuş`Şamiye” weke pirtûk daye çapkirin.

Li Şamê zêde nemaye. Ji bo pêkanîna Medresetuz- Zehrayê dîsanê şûnde hatiye Stenbolê. Ew, bi pêwendiya gera Paşê, çûye Rûmeliyê. Di rêwîtiya bi tirênê de jî nivişttekê (risale) nivîsiye. Piştre wî ew di paşiya berhema xwe ya bi navê Xutbetuş`Şamiyeyê de bi cih kiriye û ji nû ve daye çapkirin.

Li vegera ji Rûmeliyê, dîsanê Mele Seîd çûye Wanê, medreseyeke nijadî vekiriye û li perwerdekirinê domandiye. Lê ji bo pêdana mengiya xwe ya bo Medresetuz`Zehrayê jî li paş nemaye. Vê carê talih li ruyê wî keniyaye; ji bo vekirina

medreseyeke bi navê Medresetuz`Zehra li Wanê, fermaneke giranbiha ji Padîşeh derketiye. Pêre pêre jî nefîram (seferberî) hatiye eşkerekirin. Lê Mele Seîd ji avêtina asasê wê (Ûnîwersîte-nm) pê ve tiştekî din nekiriye. Piştre Şerê Cîhanî yê Yekem dest pê kiriye. Jixwe wê zivistanê Mele Seîd gelek caran weha digote şagirdên xwe:

-Xwe amade bikin, serxureke mezin û felaketek, raste rest ber bi me ve tê.

## ŞERÊ YEKEMÎN Ê CÎHANÊ

Mele Seîd di Şerê Yekemîn ê Cîhanê de, digel hemû şagirdên xwe, ketiye şer. Wî, vê yekê bo xwe berpirsyariyeke evrar (kutsal) pejirandiye û di Eniya Pasînê de pêrgê siqûmat û felaketên mezin bûye. Çi di Şer de, çi jî di dîlîtiyê de, ew zehmetiyên ku wî dîne û ew sergêjiyên pirtexlît ku kişandine, ji bo ku Şer di biwara me de bi encam bibe, bi şêxsê xwe bûye asteng. Lê wî ji bo nivîsandina van, destûr neda min. Ji ber wê yekê, îcar ez ê bi kurtî û zêdetir bîranînên jiyana wî yên wê demê binivîsim:

Mele Seîd gava ji Pasînê vegeriyabû, rast hate Wanê. Ewçax li Wanê têweratiyek derketibû. Ew bi xwe, têkilê nava wê meselê nebû û weke caran dîsanê çû di Medreseya xwe de danişî.

Mele Seîd hertim bûye parêzvanê bêtawanan. Wî, xasma ji bo vê yekê pir haydarî dikir û timî dibû asteng ji kesên ku xisarê didane zaro û zêrçan re. Di wê navê de mixabin Wan ji destên me derketibû. Piştî wê yekê Mele Seîd digel şagirdên xwe, di Medresê de xwe sitar dikirin. Niyeta wî, ta bi dawiyê jî parastin bû. Lê belê di demeke ku nedihate bawerkirin de, gava ku Walî stûyê xwe ji dijminî re tewand, Mele Seîd jî rabû ji bajêr derket. Di wê navê de, wî ji bo parastina mişêxtiyan, li Wastayê bi dijmin re şer kir. Di wî Şerî de, yek ji hevalên me yê giranbiha û nivîsendeyê dersdarê me yê hêja, Mele Hebîb şehîd ket. Bi vî hawayî Mele Seîd piştî ku mişêxtiyan xilas kiriye, dibihize ku çeteyên Ermeniyan êrîşê nehya Îsparîtê kirine. Mele Seîd vê carê jî çû welatê (war) xwe yê asasî Îsparîtê û wê derê li pêşberî çeteyên Ermenî parastiye. Herweha wî jin û zaruyên Ermeniyan li deverekê civandine û gotiye ku li gor dadeyî û prensîbên bisilmantiyê, dana xisarê li wan ne rewa ye û bila kes têkilê wan mebe. Piştre jî wî ew jin û zarûk hinartine, da ku teslîmê helegurên Ermenî bibin. Helegurên Ermenî bi wê yekê pir kêfxweş bûne û jê re xeber hinartine: Madem hûn têkilê jin

û zaruyên me nabin, em jî her bi wî hawayî têkilê yên we nabin.

Paşepaşê dijmin li dumayika şer di vegirtina Wanê de serkeftî bû. Mele Seîd jî Keleha Wanê bo xwe kir sitargeh û heter kir ku ji wir dê Wanê biparêze. Lê waliyê Wanê Cewdet Paşa gotê ku ev der ji aliyê stratejî ve ne destdayî ye û wî Mele Seîd ji wê ramanê bi şûnde vekişand. Ji wir, Mele Seîd dîsa çûye Westanê û ji wir jî bi Cewdet Paşa re çûye Bidlîsê. Li Bidlîsê nêzî pêncsed zarûkên sêwî yên mişêxtiyan ku li deverekê hatibûne civandin, berpirsyariya xwarina wan daye ser xwe û demekê ha wisan bi wan ve jî lipikiye.

Bi vegirtina Erzeromê re, êdî rojên ku dê Mûş jî bibûna hedefa vegirtina dijminan nêz bûbûn. Ewçax li Mûşê duwazdeh top hebûne. Eger ew top bihatina xilaskirin û bigihana Bidlîsê, dê Bidlîs li pêşberê dijmin hatibûna parastin. Bi tersê wê, Bidlîs jî bi bêgavî dê bihatina valakirin. Bo hindê Mele Seîd digel şagirdên xwe, sêsed peya jî bi xwe re birine û çûye Mûşê. Çendî ku demsal zivistan bû û li erdê berf hebû, di anîna Bidlîsê ya wan duwazdeh topan de serkeftî bûye. Ew, li derveyê Bidlîsê bi dijmin re rûqal bûne û dest bi şer kirine, heta dawîn jî Bidlîsê parastiye.

Mele Seîd, digel şagirdên xwe ketiye nava rêzên ordiyê. Ew, di nava şer de bûye hedefa sê berikên dijmin. Ji wan berikan yek, tam li ser dilê wî ketibû. Lê wî di berîka xwe de qutiya tutûnê û tîrik digerandin. Îcar berikê ew hingavtine û piçûparî kirine, tu xisar jî nedaye wî. Berika diduyan, li xencera wî ya ku li ser parsuyên çepê bûye ketibû. Tenê tenê qevda xencerê qul kiriye û xisar nedayê. Berika sisiyan jî, girmilka wî ya çepê hingavtiye û tê de birîneke sivik vekiribû.

Di wê şeva ku Bidlîs dê bihatina vegirtin de, hinek hevalên wî şehîd ketine. Nigê wî jî şkestiye û ew ketiye nava wê ava ku di nîvê Bidlîsê re dibihure. Dijmin dormedarê wî vegirtiye û tûşbûn her li hawîdor didomandin. Şagirdên wî yên din jî xwe di cihekî nihênî yê di binê pirê de veşartine. Mele Seîd gotiye şagirdên xwe:

- Hevalno, êdî ranewestin, ez heqê xwe li hewe helal dikim. Li xilaskirina xwe binerin!

Lê şagirdên wî ev bersiv dane:

- Em te di vê rewşê de nahêlin û ji vir naçin. Eger em şehîd jî

bikevin, ta bi dawiyê jî em ê di suxra te de bimînin.

Mele Seîd bi wê rewşa birîndarî, tam sih û pênc saetan di nava avê de maye. Piştre yek ji şagirdan, bê ku agehiyawî hebû, çûye îska (qereqol) Rûsan û ew bi meselê agahdar kirine. Îcar Rûsan Mele Seîd di riya Wanê re, bi ser Tîflîsê û Kîlogrîfê ve mişêxtî Kosturmayê kirine. Lê Mele Seîd destûr neda min da ez vê meselê eşkere bikim, ku ew di wan riyan de pêrgê hewqas talûkeyan bûye û bi ser ve siqûmatên giran bihurîne, hetanî ku serbazên Rûsî xwestine wî bikujin û sûseke rewa ya bi xwexeniqandinê jî bidin wî. Ji ber hindê, îcar ez di ser wan meselan re hilqevizîme.

Mele Seîd ji Kosturmayê reviyaye di ser Pêtersburgê re, bi serkeftî xwe gihandiye Warşovayê. Piştre jî di riya Wiyanayê re hatiye Stenbolê. Bi wî hawayî, salên dîlîtiya xwe li paş hiştine...

Îro Mamosteyê hêja, li Stenbolê dimîne. Bê ku agahdariya wî hebû, hatiye vebuhtîkirin ji bo endamtiya Dar-ul Hikmet-ul Îslamîyeyê. Ew li pêşberî wê fermana daxistî, bivê nevê bêgav maye ku wê berpirsyariyê bipejirîne da ku di Dar-ul Hikmetê de lêhûrbûna li ol û zanistiyê bike.

Ez bi van çend rêzên li ser jiyana Mamosteyê hêja ku pêşkêşê xwendevanan dikim, xwe ragirtî bûme bi tiştên çi ji xelkê û çi jî ji zanayan ku ez fêr bûbûm, hem jî bi hawayekî nevayî yê bi şahidbûna xwe ragirtime pênûsê. Lewra, ez ji her awayên nepixandina meselê vekişiyame. Herweha dixwazim vê yekê jî bibêjim ku, ji ber tirsê û bi gumana ku ez pêrgî terefdariyê nebim, di vê navê de min dest ji dana agahdariyên zêde jî berdan.

**PÊVEK**

Min bi kurtî jiyana mamê xwe Seîdê Kurdî yê xwediyê Dîwana Lema´atê, di vê berhemê de nivîsand.

Belan ev berî du sal û nîvê ye ku karmendiya “Dar-ul Hîkmet-ul Îslamîye”yê spartine wî. Mele Seîd carcarna weha digot:

“Ez ê dest ji vî karî berdim. Lê ez dixwazim ku hisabekî bidim xelkê jî.”

Ez, li ser karê mamê xwe yê li Dar-ul Hîkmetê ku hesabdana xelkê çi ye, van çend peyvan dinivîsim.

Berî niha bi du sal û nîvê -ku sal 1334 (1918) bû- bê ku

razîbûna mamê me hebe, wî kirine endamê Dar-ul Hîkmetê. Lê di salên dîlîtiyê de pirî ku ew hatibû perçiqandin, deh mehan bi destûr (izn) hatiye nîşandan û neçûye karê xwe. Heta çend caran xwestiye ku îstîfa jî bike, lê dostên wî jê re bûne asteng. Niha ev salek û nîv e ku wî dest bi îşê xwe kiriye. Ez ji destpêkê ve li jiyandina wî balkêş bûme ku ew ji pêwîstiyên girîng pê ve wekî din lêçû nedikir. Gava jê dihate pirsîn ku, çima tu bi meaş î jî, hewqasa bi destengî didebirî?

Digot:

- Ez, dixwazim ku nola piraniya xelkê bijîm. Ew (xelk) dikarin ancax xwe bi hewqasî rêhazir bikin. Îcar ez naxwazim li gorî çengeke hindikayiyê îsraf bikim.

Wî hergav bi qasî lêçûyê ji meaşê ku ji Dar-ul Hikmetê werdigirt vediqetand, yên din didane min û digot: "Vînakê veşêre."

Min jî, ew diravên ku di salekê de dabûne serhev, bi wê şefqeta mamê xwe ya ku li pêşberê min hebû, bi pesinandina ji dihnnedana wî ya mal û diravan, bê ku ew agahdar bibe tevek xerc kirin. Lê gava ew pê hisiya, got:

- Ev pere ji me re ne helal in, malê xelkê ne. Çima te ew xerc kirin? Madem ku wisan e, ez jî te ji spartetiyê derdixînim û xwe dixim şûna te.

Piştî wê yekê, di mehê de bo min bîst û bo xwe jî pazdeh lîre vediqetandin. Di ser de ew lêçûyên zêde jî ku dikirin, her ji wan pazdeh lîreyên xwe dikir. Dêmek dibû ku jê re mehê deh-duwazdeh lîre diman. Ew diravên ku ji meaşê wî zêde dibûn jî, îcar wî bi xwe didane ser êkdu. Di wê navê de demek bihurî, hin rastiyên ku dihatin dilê wî, dinivîsandin û weke pirtûk didane çapkirin. Ew tev, li dora duwazdeh pirtûkan bûn. Û li dora 700 lîreyî ew diravên ku civandibûn jî, ji bo çapa wan pirtûkên beshbûyî xerc kirin. Ji bilî yek-du pirtûkên piçûk, wekî din ew tev bê pere li xelkê belav kirin.

Dema min digotê ku çima tu pirtûkên xwe nafiroşî?

Digot:

- Ji meaşê ku ez distînim, ji min re tenê xerckirina bi qasî hewceyîya min dirust e. Yê din, malê xelkê ye. Ji ber hindê, ez dîsa li xelkê vedigerînim.

Karê wî yê li Dar-ul Hîkmet-ul Îslamiyeyê, her wisan bi peyandina şêxsî ve çêdibû. Çimkî li wir bo xebata hevkarî hin caran asteng dihatin dîtin. Li gor baweriya min, xwendevan jî pê dizanin ku Mele Seîd kefen xistibû stuyê xwe û mirinê jî dabûbû ber çavan. Wî, li Dar-ul Hîkmetê semaxeke nola hesin dikir û stemkariya biyaniyan nedikir pêwengiya xwe. Ew bi pixavdarî li pêşberê wan fetwayên ku şaş dihatin dayîn derdiket. Çaxê gerûfeneke li pêşberî bisilmantiyê derdiket holê jî, pêre pêre ew dirizand, li serê berhemek dida çapkirin û dibelaviyand. Piştre jî wî ji Anatoliyayê xwestin, lê ew neçû û weha bersiva wê vexwendinê da:

"Ez dixwazim têkoşînê li devera talûke bidim. Kirina têkoşînê li pişt sîperê, li xweşa min naçe. Lewra ez virê, ji Anatoliyayê zêdetir talûke dibînim."

Mele Seîd pirtûkine din li ba xwe peyda nedikirin. Gava jê dihate pirsîn ku çima ew li pirkûkan nanêre? Weha bersiv dida:

"Rûkirina zêna min rasterast her tiştî bi têgihîştina min a ji Qur´anê qîm dike."

Gava wî bo jêderkirinê (neqilkirin) hin meseleyên ku girîng didîtin, dîsa ji berhemên xwe werdigirtin û bê guhartin ew dubare dikirin. Çaxê me jê dipirsî ku:

"Çima eynî babet wisan dubare dikî?"

Digot:

- Rastî nayê vizkirin. Ez, guhartina kincan jî naxwazim.

Me dipirsî:

- Tu, bi rastirîniyên olî yên bilind re hin meseleyên siyasî jî di pirtûkên xwe de bi cih dikî. Sedemê vê yekê çi ye?

Weha bersiv dida:

- Ji bo ku derman bi zarûkekê bidin xwarin, pêşî şekirokekî pê nîşan didin, ta ku zarûk devê xwe veke, piştre jî her bi wî hawayî derman pê didine xwarin. Di roja îro de jî ramana giştî (raya giştî) her mîna zarûkekê devê xwe ji siyasetê re vekiriye û her dipê. Îcar ez ji bo ku pê dermanê rastiyê bidim xwarin, bi bêgavî ye ku tê de behsa siyasetê jî bikim.

Çi mixabin, ew tiştên Mele Seîd dixwestin ku bigotina, bi hawayekî pir kurt û pûxt (öz) digotin. Ji ber hindê, feydetî ne bi giştî çêdibû, ta ku eynî meseleyan di piraniya pirtûkên xwe

de dubare dikirin. Çewa nivîskarên din welê dikin ku mane tê guhartin, wî wêneyekî cihê wernedigirt.

Kêm-zêde piştî mana wî ya bi destûr (izin) bi qederê salek û nîvê, dîsanê wî dest bi karê xwe yê li Dar-ul Hîkmetê kir. Niha jî bi firş (kararli) ew bo çûna devereke din ji xelkê re weha dibêje:

"Ey milet! Li virê hewqase pir asteng hene ku kirina îş jî xêlik zehmet e. Lê ez hewqasî dikarim bikim û mafê xwe li min helal bikin!"

Me jê dipirsî:

- Çima tu hewqas hecinî (sarsilmiş) ye?

Weha digot:

- Ez li tengaviya xwe lefiyam. Lê ew êşên ji felaketên ku hatine serê alema îslamê derketine holê, min herçiqandine. Çi derba ku li alema îslamê dikeve, ez dihisim ku pêşî li dilê min dikeve. Ha ji ber wê yekê ye ku ez hewqasa zû hatime perçiqandin. Lê ez ruhniyekê dibînim, maşarê ew dê wan êşan bide jibîrkirin.

Rastlêhatineke xerîb e ku tarîxa weşandina pirtûka wî ya bi navê “Lema´at” (Tîrêjên brûskê yên şûledar-nm) hîv û stêrk derket. “Necmû edebîn wulîde lî hîlaley remedan” (Ev stêrkeke vêjeyî ye ku di navbera herdu hîvên Remezanê de derketiye). Dîsa yek ji lêrasthatinan e jî ku hîv û stêrk hatine dawiya pirtûkê. Xwezaya wê, serbest hiştiye û ku hîç kêşdar jî çênekiriye, lê pirtûka “Lema’at”ê bi tevayî mînaye kêşa “Sancaq Merşî”yê (Sirûda Derefşê-nm), ku ew babet rastlêhatineke xerîb e. Berî Remezanê bi çend rojan wek nimûne, jê çend rêz nivîsandin û nîşanê dostên xwe dan. Ji dostekî pê ve, yê ku di vî warî de wî têz bike derneket. Lê bi daxwazeke heterdar (israrli) ku ji hinavên wî dihat; bi dîtina hîva serê Remezanê re dest bi nivîsandina pirtûka xwe ya “Lema’at”ê kir û di dawiya Remezanê de jî dîsanê gava ku hîvê dît dawî lê anî. Li ser wê yekê weha digot:

“Kiyê ku her beşên vê pirtûka min a Remezaniye bi balkêşî nexwîne, li têgihîştina maneya wê neşixule û li perîşaniya kite û kêşa wê binere, ez heqê xwe lê helal nakim. Lewra ev pirtûka min sedefekî zişt e, lê di nava wê de gewherekî gewre tê peydakirin.”

Ew di pirtûkên xwe de, pirê caran ku li gorî rewadîtinê peyivîye,

di wê demê de li asîman hîv û stêrk eynî weke Derefşa Îslamê wênedar dibûn. Min got mamê xwe: “Eynî di şûfê rastlêhatina di pirtûkên te de, li ruyê asîman jî her tê dîtin.” Wek bersiv, weha got:

“Ez, tiştê ku dibêjin, jixwe ne rastlêhatin dipejirînim. Di her tiştî de hîkmetek heye. Hem, eger ku rastlêhatin çend caran dubare jî bibe, êdî ji rastlêhatinê derdikeve û dibe hiseke vîndar. Hemû perçeyên kaînatê bi êkdu ve têkildar in û gelek jî maneyên wan têkiliyên tenik hene. Em, ha ji ber ku wan bi hawayekî vekirî nizanin, îcar em wan bi rastlêhatin biwêj (tabir) dikin.”

Haşte ji van hemuyan ev kirînek (“tefe´ul”) derdikeve holê ku alaya “i´la-ya Kelîmetullahî” ya bi hîv û stêrk bilid dibe û me hêvî ji Xwedê heye ku dê şewketa xwe ya berê jî bibîne...

**PESINDAN***

Gewhera bilind a Heqê, safî ji almast in
Li pêşberê gumanan şûrê tûj hat afirandin
Pêplûkên avzêrkirî li asîman kame kirin
Bo hevrazçûnê ye saf nêrdewanke nûranî bû.

Birayê wî yê piçûk Evdilmecid

* Di orîjînala pirtûkê de li şûna bêjeya “pesindan”ê, bêjeya “takriz” e. Îcar di zimanê zanistiya erebî de “teqrîz” bi hin maneyên cihê tê, lê xasma di vêjeyê de bo pesindana nivîsekê yan helbestekê ye.

Li têbiniya orîjînalê, pênc bêjeyên bi zimanê erebî hebûn. Lê ew di wergerandina helbestê ya bi kurdî de rind hatin zanîn, êdî pêdiviya nivîsandina wan nema -nm.

**PESINDAN**

Neba ger mermer mîsala hesin bêjeya temam
Hêza êgir nedikir bo mana kelamê berxwedan

Ji rastiyê çîmengeh rastî ye ev herdem
Ku bûye bihişta bilind ji Qur´anê ew îlham

Ev deryaya rengtexlîtî û pêlên ku tê de
Bayê nerm tê, li dilê birîndar xweş bi melhem

Gulfa wê diçit ta bi asîmanê aqilan
Ewrên mezin tev avadikin ew digel êkan

Qîrdan û brûskvedan e xweşdaniya ewran
Disojin, nahêlin li bingeha dil şaşî û guman

Lew barana tê, neşe û nemê didit çîçekan
Hem rastî ye jî ku ew dane ne bo şîfayê.
Evdirehman Norsî, kurê birayê Mele Seîdê Kurdî

PISPORTÎTIYA ZARÛKEKÎ KURD

Ax! Ey welat! Ey meydana xem û qada xwîndar
Hey, maka ponijdayî ku zarûka xwe wendabû

Bi nefxê efsûn dibim, ey nêrîna bapîran
Giyana min tê teselîkirin, gava te li bîr tînim

Hiskirina mafê te, kametî didit îmanê
Li riya te dana can, temenê hergavî tê

Roja han ji wî tepeyê bi berf zêde dilîsit
Çi rind diçirise mîna almast hem zengîn û serwet

Şevdirêja* xemê bi nûr û ramana te re buhartim
Niha jî li berbeyanê digerim, taristanê buhartim

* Di helbestê de bêjeya "yelda" ku me sînonîma wê di kurdî de "Şevdirêj" nivîsiye, navê şeva herî dirêj a ku di 21-22`ê meha duwanzdeyan de ye -nm.

Ax! Ramana min her hat û bi beza li cem te bû
Lê zivistanê bestime, niha nîne bo min tu mecal

Berî gihanê ez bimrim, bila laşê min ji çiyan re be
Her sibe û êvar, da li bîrê bihna welat hebe

Te zarûkên xwe xwestine, ew tev hazir in
Kiyê ew dihinêrin, çavdêr ew napirsin

Tenê ew bi dubarekirinekê re diqîrin
Bo çêtirdîtinê, tekbîr jî penî ji bîr kirin

Lê belê bihadariya zarûkên te metîn e
Hespê her bihadar û vîndarî emîn e

Bi pêxwasî û tazî jî tevek têne cem te
Li çiyan û di berfê de pirê wan qerisîne

Ji rê derkev ey berfa ku bi axan zû dihelî
Tu jî hilweş, ey firtone! Ey roj yar be tu jî

Ax dadê, delal dadê! Bêje wan zarûkan
Hêjî li holê dajo ev nîfaqa he wisan!

(Mehmûd Nejad)

## Gotar

Günay Aslan

### Ji Kurdî'yê Heya Nûrsi'ye Mele Seîd

Demeke dirêj e, Kurd û Tirk Seîdê Nûrsî nîqaş dikin. Piştî ku Îslamiya Siyasî li Tirkiyeyê serweriya xwe bidest xist, ev nîqaş her çiqas carinan ji bo rûbirûhatina rabirdûyê were rojêvê jî, zêdetirîn armanca bihêzkirina Îslamiya Siyasî di xwe de vedihebîne.

Îslamiya Siyasî, ji pişta Nûrsî cebilxana bibandor û neferên nû dişîne eniya têkoşînê! Ceme´eta Gülen jî, li vir serkêşiyê dike. Yê ku alaya Seîdê Nûrsî jê dewr girtiye û di çarçova armancên xwe yên nijadperestî de bênder kiriye û ger gotin di cihê xwe de be, ´ji nû ve afirandiye´ Fetulah Gulen e.

Ji aliyê Fetulah Gulen ve îstîsmarkirina Seîdê Nûrsî nîvsedsal e, didome. Mînaka vê îstîsmarê ya dawî jî, fîlma bi navê „Mirovê Azad" a ku tê de jiyana Seîdê Nursî tê vegotin, e.

Bi vê fîlmê di eslê xwe de dixwazin Seîdekî din derxînin pêşberî Gelê Kurd. Li vir portreya **mirovekî ewliya, ango portreya oldarekî tirkîparêz û dewletparêz** xêz dikin. Ji xwe ev Seîdê ku ceme´et dixwaze wiha bîbîne û wiha şanî bide, ye. Di eslê xwe de aliyê rasteqîn ê vê yekê jî heye.

Ew Mele Seîdê ku demekê Saîdê Kurdî bû, li gundê Norsa Xîzanê hatiye dinê. Ew Mele Seîdê Norsî ye. Nors, ji gelek Gundên Ermeniyan ên Xîzanê yek e. Wateya wî ya bi ermenî jî „nû" ye. An go tê wateya „Gundê Nû".

Mele Seîd, ev Paşnavê Norsîtiyê wek hemû Kurdan, ji kevneşopiya malbatî, eşiretî û herêmtiyê girtiye. Lê Navê Gundê Norsê di demekê şûn de, nemaze di kuliyata ´Rîsale î Nûr" de wek `Nurs´ hatiye guhertin. ´Gundê Nû´ yê Ermeniyan bi derba qelemekê re bûye ´Gundê Nûrê´

Mele Seîd li ser vexwendina waliyê Wanê, hatiye li Wanê bi cih bûye. Ji bo wî xaniyek û ji bo wazên wî jî mizgeftek(Mizgefta Norşîn) hatiye terxankirin.

Mele Seîdê Meşhûr ê xwedî rewanbêjiya bihêz, qapasîta darazî, jîr û hazircewab, ji bo ´propogandaya şerê pîsîkolojîk ê di navbera Tirkan û Ermeniyan de, hatibû vexwendin. Ji bo şkestina

hêza propoxandeya neteweperst û nemaze papazên Ermeniyan a bi bandor ku di dêrên Ermeniyan de xwe birêxistin dikirin, kêmtirîn be jî, bi armanca gelê bisilman ji vê propoxandayê were dûrxistin, ev erk dabûn Mele Seîd. Û meleyê ciwan ev erka xwe bi layîqî jî anîbû cih.

Xutbeyên wî di demeke kurt de li bajêr rojev afirandin û gel kirin bin bandora xwe. Meleyê ku gelekî mêla wî li ser xwendin û lêkolînan bû, di salên ku ji Hîzanê nû hatibû, de, di mistewayeke dexesî de parast, ev li hemû qadên jiyanê belav kir û di wê demê de xwe wek Mele Seîdê Kurdî da nasîn.

Bi rastiya ku nezanî û parçebûnî dijminê gelê Kurd ên herî mezin in, tevgeriyabû û giringiyeke taybet dabû hîşyarbûn û yekîtiya gel. Ji ber vê hîndê daxwaz kiribû ku zanîngehek bi navê “Zehra“yê li Wanê were damezirandin. Dîsa daxwaz kiribû ku divê hemû Kurd li dor Xelifeyê Îslamê li hev bicivin.

Îtîhat û Teraqiyê jî, çengel avêtibû Seîdê Kurdî yê ku li dij propogandaya Ermeniyan ji aliyê dewletê ve hatibû peywirdarkirin. Ew tevlî kongireya vê rêxistina xwînî ya ku di sala 1908´an de, li Selanîkê hatibû lidarxistin, bûbû û li wir bi wan re yekîtiya çarenûsê pêk anîbû.

Tê îdîakirin ku ew bûye endamê Rêxistina “Teşkîlat-î Mahsûsa“, ya ku tevkujiya Ermaniyan pêk aniye. Ji xwe Selefiya Siwaran a ku bi xwe jî fermandariya wê kiriye, di tevkujiya Ermeniyan de roleke eşkere girtibû ser xwe.

Mele Seîdê ku mêla welatparêziyê tê de hebû, di destpêkê de li gor ramana ku Ermenîstaneke mezin ji aliyê Rûsan ve dê were damezirandin û dê rêberiya Kurdistanê jî bidin destê Ermeniyan, tevgeriyaye, ji ber vê yekê, ji Osmaniyan re bidil xebitiye.

Piştî Osmaniyan, Kemalîstan jî ev ramana, bi gotineke rastirîn ev tirsa bi kar anîn û Kurd dan cem xwe û piştî tûnekirina Ermeniyan, bi pêsîra Kurdan ve zelîqîn. Hatibû gotin ku piştî ´Zo zo´ yan dê dor were ´Lo lo´yan. Wisa jî bû.

Lê Mele Seîd piştî têkçûna Osmaniyan û damezirandina Komarê, piştgiriya Komara nû ya ku dest avêtibû pêsîra „lo lo“yan, jî kir. Di serhildana Şex Seîd de bi awayeke diyar pişgiriya rejîmê kiriye.

Mele Seîdê ku di dema Osmaniyan de bûbû endamê gelek komelên Kurdan, di dema Komarê de li Wanê vekişiya înziwayê, lê Rejîmê dîsa jî ew şand ê.

Mesela Rejima Kemalîstan a bi Mele Seîd re ne meseleyeke neteweyî bû, ji ber ku Mele ev nasnameya xwe êdî avêtibû. Pirsgirêka bingehîn, nebûna komarê a li gor esasên îslamiyê, rakirina Xelîfetiyê û dawîlêanîna Alfabeya erebî bû!

Piştî re bi tevahî xwe dide ser xebatên olî û „Kuliyata Nûr"ê amade dike. Ji xwe di vê demê de wek „Nûrsî" tê bibîranîn.

Mele Seîdê ku wek Seîdê Kurdî dest bi jiyana xwe kir û jiyana xwe wek Seîdê Nûrsî bi dawî kir, bê guman mirovekî oldar î jiyana xwe ji bo Îslamê fedakirî, bi bawer, di vê rê de bi biryar û mirovekî rêzdar bû. Aliyên wî yê herî jar Osmanîtî bû. Wî ji dil bawerdir ku Tirk bi rastî ´Şûrê Îslamê´ne, ji ber vê yekê, bi dil û can piştgiriya Osmaniyan dikir.

Berjewendiyên gelê Kurd jî di vê yekê de didît. Rastiya ku `di Osmanîtiyê de pir lîstîk hene´, nedixwest bibîne. Him ew, him jî piraniya pêşewayên Kurdên birêz ên di qirna wî de, bûn goriyên van qelsiyên xwe.

Osmanî û Komara paşhatiya wê ku Kurdan pir pê bawer dikirin, di aliyê dijminatiyê de ji Rûsan kêmtir neman.

Di eslê xwe de çîroka Mele Seîd îfadeya meqsed diberdemayîna gelek Kurdên saf ên ku di cihê mirov bi gelê xwe û bi hêza gelê xwe bawer bike, de, xwe dispêre dewletên desthilatdar ên dijminê Gelê Kurd û Kurdistanê, zihniyeta wan a tunekirinê û ji wan merhemet û edaletê hêvî dike, ye.

Helbet divê mirov jê îbretê werbigire.

Wergêr: Fevzi Özmen

## Hevpeyvîn

**Ronî Alasor**

***Pirs:*** *Em xwe baş nasnakin, ya qet, ya jî kêm û nîvrê nas dikin. Navê Seîdê Kurdî, Seîdê Nûrsî, yek ji wan navan e ku di serê lîsteya navên navdar de cîh digre, ev bêşik e. Belê em Kurd çendî wî nas dikin bişik û bigoman e.Mebesta me ji vê hevpeyvînê ew e ku em zatekî mezin, kesayetiyeke xwe, Bedîûzemanê Kurd bi alîkariya kesên xwedîgotin baştir nas bikin.*

*Nivîskar Cemalettin Canli, „Bo ku Seîdê Nûrsî bête fêmkirin, divê Kurdîstana sedsala 19emîn bête fêmkirin. Divê hewldanên terîqên wê demê bêne fêmkirin.„ (NETKURD, 2010-09-25) dibêje. Gelo ev şert e, hun çendî bi vê dîtinê re ne ?*

**Ronî Alasor:** Mixabin em Kurd dîroka xwe û nasdarên xwe her dem baş nasnakin, yan ji wek we ani ziman, kêm nas dikin. Tabî gelek sedemên vê yekê hene. Dewletên ku Kurd di bin bandor û zordayiyên wan da dijîn, tu car nehiştin ku gelên Kurdîstanê diroka xwe û nasdarên xwe baş nas bikin. Seîdê Kurdî ji yek ji van navdaran e ku ji bo van sedeman, ne di dema xwe da û ne ji heya roja iroyîn di nav gelê xwe da baş û objektif nehat naskirin.

Heger ku em şertên sedsala 19´emîn bidin ber çavan: Hemû gelên Kurdîstanî, taybetî jî gelê Kurd, di demeke tarî da dijiyaye. Dibistanên zanyarî li Kurdîstanê tunebûn, perwerdeya zanistî ne bi Kurdî û ne jî bi zimanê kolonyalizmê hebû. Gelê Kurd di bin cehaleta şêx-axa û împaratoriya dagirkera Tirkên Osmanî da mehkûmî rûpeleke tarî bû. Vê demê ronakbirên Kurd gelek kêm bûn û gel ji Seîdê Kurdî û dawxaziyên wî ên wê demê baş fam nekir.

***Pirs:*** *Angorî we, ev kêmasî û nenaskirin hê heya roja iroin didome?*

**Ronî Alasor:** Piştî ku rehmetiyê Seîd çû ser dilovaniya xwe, yanî pişti salên 60´î û 70´î dema ku Kurdan hêdî hêdî perwerde bi zimanê kolonyalîzmê dîtin, ev ronakbîrên me yên vê demê perwerde dîtin, ew jî ketin bin bandora Kemalîzmê, an jî îdeolojiya çep (sosyalist). Bi vî awayî ronakbîr û sîyasetmedarên Kurd dûr

û kûr li ser jîyana îslamekî wek Seîdê Kurdî, rewşa wî û sedsala 19´emîn lêkolîneke cîdî nekirin û bi çavê çeptiyê (sosyalizmê) li Seîdê Kurdî nihêrîn. Wek berê nînbe jî, ev şaşitî bi awayeke curbeçur hê didome. Ji ber ku me Seîdê Kurdî wek dîtin u tehrîpkirina Nûrciyên fermî yên ne Kurd, şîrove kir û wisa nas kir. Me nizabinû ku Risaleyên Seîdê Kurdî, gotin û dîtinên wî yên di derheqê Kurdan da, mafên heq û huqûqa Îslamiya Enternasyonal ji alîyên hinek "Nurciya" va hatine tehrîpkirin.

Bes di aliyê din da, bi taybet di van salên dawî da, hinek lêkolîner û bawermendên Kurd ev hemû tehrîbat derxistin holê û dan naskikirin. Îro em dikarin bêjin ku Seîdê Kurdî di nav Kurdan da, di nav gelê xwe da hinek baştir tê naskirin. Lê belê niha tehlikeke din jî heye, hinek grubên ku heya doh dijminatiya Kurdan dikirin û Kurd bi alîkariya dijminên Kurdan dikuştin, îro radibin navê Seîdê Kurdî bi kar tînin û di bin siya wî da, munafiqtiyê, fîtne û fesadiyê dikin. Gerek Kurdên bawermend û nîştiman perwer vê tehlika ha baş bibînin û nehêlin ku ew jehra dijmin li diji Gelê Kurd û Kurdîstaniyan bê bikarhanîn...

**-Peki rastiya Seîdê Kurdî çîye ?**

Rastiya merhûm ev e, wî wek ramanwerekî Kurd û alimekî Îslamê, wek serokekî (hîmdarekî, Ustadekî) yekemîn yê Rêxistina Nûr û wek çalakgerekî siyasetmedar li ser bingeheke Îslamiya înternasyonal kar û xebat dikir. Wî gelê xwe tu carji bîr nekir, mafên Kurdan, wek ziman, çand û wek mafê perwerdetiyê daha 100 sal berê, di destpêka qirna 20´an da dihanî ziman. Ji bo vê yekê ji Siltan Ebdilhemît ra nameyek şandiye. Bedîûzeman di derheqê kar û xebatên xwe da, teybetî ji ber ku maf û huqûqa Kurdan (angorî îslamiyetê) aniye ziman. Ev gotin û dawxaziyên wî yên Kurdî û Kurdayetî ji aliyê nijadperestên Tirkan ve wek dijminatî hat dîtin. Ji ber van dawxaziyên xwe, Seîdê Kurdî yê rehmetî ji rojê û pê ve hetanî roja mirina xwe, gelek êş û tadayî ditin. Piştî hilşandina Împaratoriya Osmaniyan, di dema Kemal Ataturk da jî Seîdê Kurdî bajar û bajar hat sirgûnkirin, kriminalîze bû û ket zîndanan. Gelek manîdar e ku li pêşiya mirina xwe ew vegeriya hat Kurdistanê (Rihayê) û çend roj piştî Newroza sala 1960´î çû ser dilovaniya xwe. Wek tê zanîn, hestiyên wî jî ji gora wî derxistin û hêji diyar nîne ku aqubeta hestiyên wî çawa bûne!?

***Pirs:*** *Mîna tê zanîn Seydayê giranbiha bi dirêjahiya temenê xwe hejmareke nav bi kar anîne, wek Seîdê Kurdî,*

*Seîdê Nûrsî, Said Mirza Efendi û hwd. Gelek caran jî bi navê Bedîûzeman behsa wî dibe. Li gora hinan Bedîûzeman gotiye "bi navkirina min wek Seîdê Kurdî min nerehet" dike û bervaja hin jî dibêjin ku gotiye na "tu aciziya min tune ji vê" gotiye, kîjan rast e, gelo? Em dixwazin li ser van navan dîtinên we bigrin û bizanin têkiliya navên bikaranîne û demê çendî heye bi hev re?*

**Ronî Alasor:** Rast e, Bedîûzeman Seîdê Kurdî gelek nav wek pseudonym (anonym) û wek leqeb bi kar hanîne û bi wan navan hatiye naskirin. Hinek ji wan navan, Seîdê Xwendevan (Said Okur), Said Mirza Efendi, paşê di dema feqîtiya wî da, jê ra Mele Seîd û Seydayê Kurd jî dibêjin. Ji destpêka qirna 20´an heya pêşiya hukmê Kemalîzmê jî gelek caran bi navê Seîdê Kurdî maqale nivîsandine û çalekî kirine. Ji wî ra Saîdê Nûrsî ji hatiye gotin, ji ber ku li gundê Nûrsê (Hizan-Bedlîsê) ji dayîk bûye. Û her wisa heya roja îroyîn wek Bedîûzeman (baştirînê demê) jî tê naskirin.

Wek tê zanîn, merhûm di gelek maqaleyên xwe da navê Seîdê Kurdî bi kar hanîye. Eva gelek eşkere ye û heger nerihetiyeke wî hebûya, çima navê Seîdê Kurdî bi kar bine? Lêkolinvan û bawermendên Kurd wan îdîayan pûç dikin û dibêjin ku tu aciziya Bedîûzeman bi navê wî yê wek Seîdê Kurdî nîne. Li aliyê din gerek em noxteyeke giring jî bidin ber çavan ku hemû gotin û pirtûkên Seîdê Kurdî (ku tê gotin ku bi qasî 6 hezar rûpel Kulliyeta Rîsale-î Nûr (Nameyên ji ronahiyê) nivîsandiye û ev Risaleyên wi ji aliyê kesên ku ne Kurd in, di bin navê "edîtoriyê" û "hêsankirin"ê da hatine tehrîbkirin. Ev yek jî di der heqê gotin û jiyana Seîdê Kurdî da gelek sual u deriyên sûbjektîf vekirî dihêle. Di derheqê Seîdê Kevin û Seîdê Nû de jî hinek sual hene: Di dema Seîdê Kevin da di derheqê nakokiyên civakî, perwerdeyî, olî û etnîkî da çalekiyên wî yên siyasî ji hene, bes wisa tê gotin ku piştî desthilatdariya yek partiya Kemalîst, xwe ji siyasetê "dûr dixe"...

***Pirs:** Zaroktî, malbat û gerên Seîdê Kurdî, coxrafya sefer û serdanên wî di zemanê feqetiyê û piştî mentehîbûn û Seydabûna wî de, dibêjin çûye Şamê, Bêrûdê û hwd. Di vê derbarê de tiştên hun ji xwendevanên me re bêjin çine?*

**Ronî Alasor:** Belê, Seîdê Kurdî dema feqîtiya xwe da li gelek bajar û heremên Kurdîstana Bakur geryaye. Wek Bedlîs, Xîzan, Baxçesaray, Gewaş, Wan, Agirî, Bazîd, Sêrt, Mêrdîn, Cizîra

Botan, Erzirom, Erzingan, Çolemêrg, Amed, Riha u gelek ciyên din... Armanca wî bes ger nîn bû, wî him dixwest Kurdîstanê nas bike, rewşa wê demê bi çavê xwe bibîne û hem jî ew bi xwe were famkirin. Çûyîna wî ya Şamê di sala 1910´an de ye. Tê gotin ku, li ser Amedê, Riha, Suruç, Bîrecîk, Kilîs û Kirixanê diçe Şamê. Dibêjin ku wî Mizgefta Emewî ziyaret kirye û li wir bi navê "Hutbe-î Şamiye", .xutbeyek jî xwendiye.

***Pirs:*** *We got ku Seîdê Kurdî li gelek bajar û heremên Kurdîstana Bakur geriyaye, ji bo ku hem rewşa gel fam bike û him ji ew bi xwe were famkirin. Gelo ew hate famkirin?*

**Ronî Alasor:** Wek me di serî da jî hani ziman, dewra şagirtî, feqîtî û meletiya Seîdê Kurdî, dewra tarî û cehaletê ye. Ew hez dike were famkirin, bes mixabin, xwendin û zanebûna însanên me wê dewrê kêm e, kes wi zef fam nake. Dewr dewra hevbendiya sêgoşeya şêx-axa û împaratoriya dagirker e. Ew sistema sêgoşeyî nahêle ku gel zana be û pêşta here. Ev siyaseta kolonî hê dimeşe...

***Pirs:*** *Pekî gera Seîdê Kurdî li Tirkiyeyê jî heye?*

**Ronî Alasor:** Dema feqîtiya xwe da, dibêjin ku ew çûye hinek bajarên Tirkiya yên wek Gumişxanê û Baybûrdê jî. Stenbol jî yek ji wan bajarên mezin e ku ew çûye wir û ketiye nav kar û çalekiyan. Bes, dîtina wî ya herî mezin a Tirkiyê, ji wî ra bûye zulm, zordarî û zîndan. Ev bajarên ku heya dilovaniya wî jê ra bûne zîndan ev in: Burdur, Barla, Îsparta, Eskîşehîr, Kastamonû, Çankiri, Ankara, Denîzlî, Emîrdax, Afyon û hwd...

***Pirs:*** *Ji bo berhema wî ya bi navê "Münazarat Reçetetül-ekrad" hatiye gotin ku Bedîûzemanê Kurd di vê berhema xwe de ji her berhemeke din zêdetir raste rast xîtabî kurdan kiriye, kengî nivîsiye, çawa?*

**Ronî Alasor:** Wisa tê xuyakirin ku ev nivîs di Rojnama «Kurd Teawûn û Teraqî»´yê de, di sala 1908´da hatiye weşandin. Dibêje: Ey gelê Kurd; di itîfaqê de quwet, di îtihadê de înayet, di biratiyê de seadet û selamet heye. Xwe bi kapikê îtîhadê û şerîta muhubetê qewî bigirin, da ku hûn ji belayê xilas bibin. Qenc guhê xwe bidinê, da ku ez tiştekî ji we re bibêjim: Hûn bizanin ku sê cewherên me yên bi qîmet hene, ku hivza xwe ji me dixwazin:

1- Yek jê İslamiyet e ku bi hezaran xwîna şehîdan bihayên wê dane.

2- Însaniyet e, ku lazim e em xwe di nezera xelqê dinê de bi xizmetekî eqlî cewamiranî wê însaniyeta xwe nîşanî dinê bidin.

3- Mîliyeta me ye, ku meziyet û fezîlet daye me. Bab û kalên me bi van qenciyan jiyane. Divê ku em jî karê xwe û bi hifza miliyeta xwe ruhê wan di qebra wan de şad bikin

Piştî wê sê dijminên me hene ku me tarûmar dikin.

FeqîrtI ye, ku çil hezar hemalê Stenbolê delîla wê ye.

Cehalet û bêxwendinî ye, ku ji hezaran yek ji me rojnaman nikare bixwîne, delîla wê ye.

Dijminî û îxtîlaf e, ku ev edawet û quweta me wenda dike. Me musteheqê terbiyê dike. Hukumet jî, ji bêinsafiya xwe zulmê li me dike. Ku we ev bihîstin, baş bizanin ku çara me ev e: Pêwîst e, em sê şûrên almas bi destê xwe bixin, da ku em her sê cewherên xwe ji destê xwe nekin. Di wê demê de emê her sê dijminên xwe ji ser xwe rakin.

Yek ji wan şûran xwendina edalet û ilmê ye.

Yê duyemîn itîfaq û muhubeta mîliye ye.

Yê sêyemîn ew e ku însan bi nefsa xwe karên xwe bike û mîna sefîlan ji qudreta xelqê hêvî neke. Wê pişta xwe nede kesên biyanî.

Paşê xwendin, xwendin, xwendin û destêhevgirtin, destêhevgirtin, destêhevgirtin

Bi gelemperî û bi kurtî ez dikarim wan tiştan jî bibêjim:

**Di derheqê cehalet û zanîngehan de:**

Seîdê Kurdî, ji bo perwerde, zanebûn û hîşyarbûna Gelê Kurd ced kiriye. Wi digot; dijminê Kurdan bê perwerdeyî ye. Baweriya wi ew bû. Wî digot; ji bo nasnameya Kurd, ji bo yekbûn û azadiya Kurdan divê cehalet rabe. Li dijî cehaletê jî perwerde gelekî pêwîst didît. Heta di Munazaratên xwe de digot ku Kurdistan bi bêperwerdetiyê hatiye kuştin. Bo vê yekê dawxaziya vekirina zaningehên Kurdî dikir. Ew li diji korbawerî(yobazî) û baxnaziyê bû. Behsa zaningehên fen û olî dikir û ev yeka wiha dianî ziman; "ronahiya(tîrêja) aqil, îlmê fenî ye, ronahiya wîjdan jî îlmê olî ye, bi yekîtiya herduyan jî heqîqet/rastî derdikeve holê. Eger her du ji hev werin veqetandin, ji fen û felsefê hîle, înkâr û şik derdikeve holê. Li aliyê din kevneperestî, korbawerî(yobazî), baxnazî pêk tê. "(Münazarat)

Didomîne: „Di vê cihana şareza da, di vê serdema pêşkêtinê û pêşbaziyê da, her çiqas di navbera miletê Kurd û birayên wî de ji bo pêkhatina ahengeke pêşketinê, çend dibistan vebûne jî, lê belê ji ber ku piraniya Kurdan zimanê tirkî nizanin, ji vê perwerdeyê bêpar(mehrûm) dimînin. Ev yek jî dibe sedema paşvemayîna Kurdan û pêrîşanî û aloziyê. Ji mêj ve yên ku ji Kurdan paşvemayîntir bûn, niha ji paşvemayîna Kurdan sûdê werdigirin. Ev yek jî, kesên xwedî qêret û dilgerm diramîne. Ev rewş, di dema pêşiya me de ji sê aliyan ve ji bo Kurdan derbên mezin amade dike. Ev yek jî, cîgerên morovên xwedî nirx diperitîne. Destpêka jinûvevejîna bi perwerdeyê, sedemên mîsogerkirina dahatuya Kurdistanê yên girîngtirîn in. „

„Hûn daxwaziya min a ji bo perwerdeyê nabînin, lê li ser meaşê ku ez naxwazim radiwestin. Gelo ev çi qeyde ye? Gelo hûn berjewendiyên min ên şexsî, di ser perjewendiya milet re dibînin. Ev meaşê ku hûn dixwazin bidin min, bertîl(ruşwet) e. Ev para dengnekirinê ye. Ez parsekê meaş nînim. Ez li serê çiyayên Kurdistanê mezin bûme. Gefên we bê fayde ne. Ez ji bona meaş nehatim vir, ez ji bo miletê xwe hatim. Min ev laşê xwe wek bertîl aniye vir. Hûn çi dikin, bikin! "

Ew di derheqê van zilm û karesatan da, wiha gazî gelê xwe dike: „Gelê Kurdan! Ji bo ku ez Kurdîtiye qilêr nekim, min tîmarxane jî pejirand, lê min daxwaziya Padîşah, meaşê wî û xweşgotinên Sultan nepejirandin."

**Ji bo yekiti û azadiya Kurdan:**

Seîdê Kurdî, cehaleta ku dijmin dabû Kurdan, pirsgirêk û nakokiyên di nav Kurdan da baş dizanîbû. Ji bo vê trajediyê li ser yekîtî û hevgirtina Kurdan û hîşyarbûna Kurdan gelekî disekinî. Di kar û xebatên xwe da, di gotin û gotarên xwe da yekîtî û biratiya Kurdan wek motîvasyon dianî ziman ku Kurd zanatiya welatparêziyê û netewetiyê îdrak bikin.

Wî wiha digot: „Ey miletê Kurd! Hûn baş zanibin ku sê nirxên me yên bibgehîn hene. Ji wan yek ola me ye. Ya din netewetiya me ye û ya din jî mirovatiya me ye. Dij berî van hersê tiştan jî sê dijminên me hene. Yek jê nezanî ye. Ya din xizanî ye. Ya sêyem jî dubendî(îxtîlaf) e. li dijî van dijminan jî sê şûrên me yên elmas hene. Şûrê me yê girîng ê bihêz perwerde ye. Yê duyem huner e û yê sêyem jî yekîtiya neteweyî ye. Wesyeta min a dawîn; xwendin, xwendin, xwendin e.

Di pirtûka xwe ya Münazarat da, bang eşirên Kurda dike: „Gelê Kurdan! Ramana neteweyî ji xwe re têkin rêber, perwerde û mirovatiyê têxin destên xwe. Ji ber ku ramana neteweyî, herkesekî/ê bi qasî neteweyekê nirxdar dike. Mirovê ku ji bo netewêya xwe bixebite û alîkariya wê bike, ji serê xwe tenê neteweyek e. Alîkariya kê tenê ji bo nefs û kesayeta wî/ê be, ew ne mirov e. Ji ber ku mirov di eslê xwe de şareza ye. Wek mirov ew mecbûr e ku ji bo hemzayenda xwe û hemnijada xwe birame. Ji ber ku jiyana wî tenê dikare di saya jiyana civakê de bidome. Takekesên(ferdên) neteweyekê, tenê dikare bi ramana neteweyî wek malbatekê ber bi hev ve werin û bibin yek. Ev yek her takekesekî/ê vê civakê ne tenê bi qasî mirovekî/ê, her yekî/ê bi qasî civakekê mezin û bihêz dike.“

„Ey kurdên şêr ên ku di dema cihangiriya Asûrî û Keyaniyan de xwediyê lêşkerên pêşeng û gernas! Pêncsed sal e, hûn die xew de ne, êdî bes e! Êdî şiyar bin, sibe ye. An na, dê di colistana hovîtiyê(wahştê) de, hovîtî û xeflet we talan bike. Bi şûrê ku jê re netewetî tê gotin û rûniştina gernasên Kurd ên pîtol(dahî) ên wek Ristemê Zal û Selahedînê Eyûbî ya di bin konekî de, temsîl dike, bi ramanâ neteweyîyê her yek ji we divê bila bibin mîna-kên berbiçav. Azadiya ku sedema bextiyariya qewman e, we vedixwîne meclîsa ezmûnê û dixwaze ruşta we û pêdiwînema-yîna we ya bi wesayetê bibîne. Ji bo ezmûnê amade bin! Hebû-na xwe bi yekîtiya xwe şanî bidin. Bi hest û qêrata xwe netewe-yî, raman û wîjdanê xwe yê şexsî, wek dil û eqlê hevpar ê neteweyî şanî bidin. Naxwe dê sifirê bide we û dê dîplaoma azadiyê nede destê we.“

### Kar u xebatên Seîdê Kurdî ji bo saziyên Kurdî

wî ji bo avakirina saziyên neteweyî yên Kurdî hewl daye û wek çalekerekî(aktîvîstekî) ketiye nava van saziyan. Hinek ji van saziyan ev in: Kurdistan Teali Cemiyeti û Kürt Neşri Maarif Cemiyeti. Ew jî yek ji wan damezirenêr(avaker) ên van saziyan e.

Wi wiha digot: „Gelê Kurdan! Ez dibînim ku li ba me kanî nînin. Ji ber vê yekê em aveke bihnok a ku ji dûr ve tê, vedixwin. Wek wisa ye, hewl bidin, bixebitin. Ramana neteweyî têkin vekolîner, perwerde û xûpakiyê(fazîletê) bidin destan. Li van deran borangan raxînin. Bila kaniyeke kemilî di nav me de jî der bibe. Naxwe hûnê her tim wek parsekan bimînin. An jî hûnê ji tiyan bimirin. Parsektî ti carê pere nake. Ku mmirov bibe

parsek, bila bibe parsekê nefsa xwe. Li gor min parsekên merhemetê, an bêmaf in, an jî teral in.‟

**Di derheqê gelê Ermenî, Asûrî-Sûryanû û hwd û eşîr-axayên Kurd de**

„Gelê Kurdan! Li dij şaristaniya ku ji her aliyî ve êriş dike, hûn nikarin hovîtiya xwe biparêzin. Dilê xwe ji bo gotina min a li ser hovîtiyê negirin. Ez vê gotinê di serî de ji bo xwe dibêjim. Ji xwe tawan a hukumetê ye. Ya ku ez dixwazim, parastina namûs û heyseta kurdîtiyê ye. Azadî û dadmendî(edalet) xwestin e û jê re xizmetkirin e…‟

Seîdê Kurdî, li dij neteweyên dost, bira û cîran yên wek Tirk, Ereb, fars, Sûryanî û Ermeniyan dijminatî û tundiyê ti bi awayekê rewa nabîne. Riya sûdwergirtina ji teknîk û mecalên di dest wan de şanî dide:

„Despotî û dîktatorî sedemên dijminatiyê bûn, ew mirin. Piştî dîktatoriyê bila dostanî bijî û her bijî! Ez bi mîsogerî ji we re dibêjim ku ji bo bextiyarî û selameta vî welatî, bi pêkanîna dostî û yekîtiya bi Ermaniyan re girêdayî ye. Lê ne bi awayeke zelîl, bi hêvişandina îzetê, destdirêjkirina aştiyê ye. Him jî ew hîşyar bûne, lê hûn hê di xew da ne. Û him jî ew bi ramana neteweyî bi hêz bûne. Hûn jî di nav dubendiyê de vêga vik û vala ne.‟

„Eger hûn dixwazin bi ser kevin, tenê bi çekên ku wan hûn têk birinê, ango ramana hîş û netewetiyê, bi mêyla pêşverûtî û dadmendiyê hûn dikarin wan têk bibin. Li gor min îro kî şûr lê de, ew derba şûr bi şûnve vedigere û li sêwiyên wan dikeve. Di vê demê de serkevtin êdî bi şûr pêknayê. Hewce ye ku şûr hebe, lê divê di bin destê aqil de be. Him jî sedemên dostiyê hene. Ji ber ku cîran in, cîranên dostiyê ne. Him jî ew hîşya bûne, li dinê bela bûne, tovên pêşveçûnê ber hev kirine û dê wî tovî li welatê me biçînin(biajon). Me mecbûrî şaristaniyê dikin, di mijara pêşveçûnê de bala me dikişînin û di me de ramanên neteweparêziyê hîşyar dikin. Ji ber van xalên girîng, divê bi wan re yekîtiya me hebe.‟

Çavkanî:

1. *Münazaratlar, İştimai Dersler, Şark ve Kurdistan Gazetesi,*
2. *Kürt Teavün ve TeraqîGazetesi, Nûbihar Dergisi u hwd ...*

Gotar

Gernas Koçer

Bedîûzeman û Mele Ebdulmtelîbê Gorandeştî

Ji bona hemû civak û gelan, bextereşîya herî mezin yek jê ew e ku dema çarenûsa nivîsandina dîroka gelan, yan jî ya civakan bi destê dijminê wan bête nivisandin. Mixabin gelek dîroknasên bê wijdan û nijadperest, li hemberî rastîya dîrokê xîyanetên mezin kirine û dîrok berûvajî nivîsandine. lewra kesên li dîrokê bêbextîyê bikin, ew dikarin li hemî nirxên mirovahîyê jî bêbextîyê bikin. Pêwîst bû ku her dîroknasek mînanî doktorê sonda hîpokrasîyê xwarî, çawa ku pêwîst e, ew bi peywîra xwe re tu caran xîyanet û cudatîyê neke. Dîroknas û lêkolînvan jî pêwist e, li hember pênûs û wijdana xwe, nirxên dîroka kîjan gelî dibe bila bibe, lê tu caran bêrêzîtî û xîyanetê neke û rastîyê binivîse. Bedbextîyek ya me Kurdan jî ew e ku gelek nirxên me yên dîrokî bi destê dijminê me hatine nivîsandin. Her wiha çarenûsa nivîsandina dîroka gelek navdarên me Kurdan jî bi destê dijminê me hatine nivîsandin. Mixabin ji ber vê çendê em hê jî rastîya kesayetîya navdarên xwe baş nasnakin.

Wekî tê zanîn, piştî wefata (Bedîûzeman)Seîdê kurdî cenazeyê wî, ji devera ku lê hatibû definkirin, bi dizî ve hate revandin. Heta niha jî gora wî, li kîjan derê ye nedîyar e. Çawa ku dijminê vî gelî Cenazeyê Seîdê Kurdî ji ber gelê wî veşartin, her wiha ewan xwestin ku nirx û babetên kesayetîya wî jî bi tevahî li ber gelê wî beruvajî bikin. Ta îro jî dixwazin, bi Gelê Kurd bidin bawerkirin ku (Bedîûzeman) xwedî kesayetîyeke bê hempa bû ye û fîlozefekî bawermendê Ola Îslamê bûye. Lê ne xwedî kesayetîyeke kurdperwer bûye. Ji bo azadîya Gelê Kurd jî tu caran nefikirîye. Girêdayî van nêzîkbûnên bi dijminane ve, wekî em dizanin di berhemên Bedîûzeman de jî gelek hevok û gotin hatine xerakirin(tehrîfkirin). Bi van tehrîf û lihevguhertinan hê jî dixwazin serê gelê me tevilhev bikin. Ne tenê li hember cenazeyê (Bedîûzeman) her wiha li hember fikr û ramanên wî jî bêrêziyeke ku mirovahî jê şerm bike heta niha jî didin berdewamkirin. Ew Cemaeta bi navê Nûr ku ew Bedîûzeman ji xwe re qaşo wek pêşengê tevgera xwe dibînin, lê armanca wan ya bingehîn ew e ku di bin navê îslamê de naveroka hemî nirxên

Bedîûzeman ji Netewa Kurd dûr bikin û bidin bawerkirin ku tu têkilîya wî bi mesela kurdperwerîyê ve tunebûye. Di vê mijarê de rola vê tevgerê gelekî mezin e.

Lê divan salên dawî de enîya rewşenbîr û nivîskarên Kurd ketine nava hewldan û lêkolînan. Nirxandin, nivîs û agahîyên gelekî grîng derêxistine ber çavan. Ez bawer dikim ta niha jî, ji gelek alîyan ve kar û xebat li ser kesayetî, nirx û rûmata (Bedîûzeman) berdewam e. Ez di wê hêvîyê de me ku di rojên pêşde di vê mijarê de kar û xebat wê wisa pêş bikeve, heta ku li ser Bedîûzeman bîranîn, semîner û konferansên netewî jî çêbibin û her wiha berhemên wî jî di nava xwendevanân Kurd de di beşên olî û felsefê de, di astên herî bilind de bêne xwendin.

Da ku bibe bersivek jibo wan misilmanên qelp ew ên ku Bedîûzeman ji xwe re wekî pêşeng dibînin, lê li dijî fikr û ramanên Bedîûzeman yên kurdewarî û li diji azadîya Gelê Kurd in. Her wiha da ku bibe rengînîyek ji bo arşîv û lêkolînên di derbarê Bedîûzeman de hatine berhevkirin, min jî xwest çend agahîyên ku tucaran nehatine nivîsandin û çapkirin û her wiha di nava gel de tucaran nehatine bihistin di vê nivîsê de bidim eşkerekirin.

Li gor sistema perwerdeya medreseyan cara pêşîn min li cem Mamoste Mele Ahmed dest bi xwendina beşa bi zimanê `erebî kirîye, her wiha bavên me jî birayên hev in. Mamoste Mele Ahmed niha li Tirkîyê sekreterê perwerda giştî yê Sendika bi navê DİVES´ê ye. Ewî jî piranîya xwendina xwe ya medresê hetanî asta bilind li cem Seydayê Mele Fexruddîn, li gundê Govkana ku girêdayî şaxa Wanê ye, xwendîye. Mamoste M. Ahmed gelek caran behsa wan salên di 1970´î de dema ku li gundê Govkanê dixwend dikir. Pir bi girîng û balkêşî ji me re behsa Mele Ebdulmutelîb dikir. Mele Ebdulmutelîb alimekî gelekî xwurt bûye. Ew li gundê Gorandeştê yê girêdayî şaxa Wanê dijîya. Paş navê wî digotin Mele Ebdulmutelîbê Gorantaş. Ew ji malbateke bi eslê xwe seyîd bû. Mamoste Mele Ahmed pir caran ji me re wiha behsa Mele Ebdulmutelîb dikir. Digot: „M. Ebdulmutelîb; her dû çavên wî hafiz bûbûn û di nava demsalên kaltîyê de dijîya. Lê hişmendî û zekaweta wî gelekî xwurt bû. Di navbera gundê Govkan û Gorandeştê de bi piyan kêm zêde saetek rê hebû. Em pir caran diçûn gundê Gorandeştê. Çiqas em biçûna gund, ji bo zîyareta Mele Ebdulmtelîb em diçûn mala wî û me li sohbeta wî guhdarî dikir. Sohbet û civata wî gelekî

xweş bû. Bi rastî destê mirov ji axaftinên wî ne diqetîyan. Zekaweteke ecêb li ser bû. Heta ku carînan li ser mijarekê ku em hemî jê agahdar bûn nîqaş derdiket, ji me re digot: ´Kurên min, ka filan pirtûkê bînin.´ Me jî pirtûk dianî û wî digot: ´De filan rûpelê vekin û li filan rêzê binêrin.´ Me jî pirtûk vedikir û lê dinêrî û bi rastî jî wekî wî digot wisa derdiket. Em li hember heş û bîrên wî matmayî diman. Lê taybetmendîya wî ya herî girîng ne ev tenê bû. Lewra ew telebê Seydayê Bedîûzeman bi xwe bû. Û bi salan li ber destê wî xwendibû û bi wî re hevaltî kiribû.“ Mamoste Mele Ahmed digot: „Em gelek caran dema em biçûna mala Mele Ebdulmutelîb, me ji wîre digot: ´Seyda ka ji me re behsa Seydayê Bedîûzeman bike.´ Bêhtirîn ji me re behsa wan salên dema ku li Wanê li cem Seydayê Bedîûzeman dixwend dikir. Digot: ´Rojekê Seyda gote min Ebdulmutelîb; navê te Ebdulmutelîb çênabe. Bi kurdî ango Koleyê Mutellib. Bila ji niha û pê ve navê te Abduşemed be.´ Kêfa min jî gelek pê hat û min got: ´Seyda dizane.´ Heta ku ez li cem Seyda Bediûzeman bûm, wî û feqeyan hemûyan ji min re Abduşemed digotin. „

Mamoste Mele Ahmed di derbarê Bedîûzeman de çi agahîyên balkeş û girîng yên ku wî ji devê Mele Ebdulmutelîb bihistibûn û ji min re gotibû, ez jî bi seranser li vir dinivîsim.

Mele Ebdulmtelîb dibêje: „Carekê min ji Seydayê Bedîûzeman pirsî.Min got: Seyda; dinava gelde dibêjin,xizir pêxember tif kirîye ser zimanê Bedîûzeman, ji ber vê jî derîyê gencîne (xezîne)ya ilmê li ber wî vebûye û bûye xwedîyê vê seqafet û irfanê. Min got: ´ Seyda, gelo ev rast e?´Seyda Bedîûzeman li min nihêrî û keniya û Got: ´Xweda şahid e, tiştekî wisa çênebûye. Heger qenciyeke Xweda bûbe wesîle ku derîyê gencîne(xezîne)ya ilmê li ber min vekiribe, ew jî Şêx Ahmedê Xanî ye. Lewra dema ku min li Bazîdê dixwend, her car ez diçûm ser gora Şêx Ahmedê Xanî û min pişta xwe disipart kêla wî û min dersên xwe mitale dikirin. Heta ku min li Bazîdê dixwend, her tim karê min ev bû û min gelek pirtûk li ber gora Şêx Ahmedê Xanî xwendin û qedandin. Min xwendina xwe bi vî awayî li wir berdewam dikir. Ez her demî di alîyê manewî de, xwe deyndarê Şêx Ahmedê Xanî dibînim. Ez dibêjim ev ilmê min hemî bereketa wî ye.´“

Dîsa mele Ebdulmtelîb dibêje:

"Rojek ji rojên biharê bû. Ez û birek Feqe li gel Seyda Bedîû-

zeman li keleha Wanê digerîyan. Seyda li peşîya me dimeşîya. Em çûn ser cihekî gelekî bilind û xeternak. Me hew dît ku ji nişka ve lingên Seyda ji ber wî xijikîn. Dilê me hate berdevê me. Di wê sanîyê de Feqeyekî hevalê me yê bi navê Mele Seîd, hema pêre bi Seyda Bedîûzeman girt û nehişt bikeve jêr. Piştî vê em bi Seyda re hatin cihekî hêsan, hema li wir du rik´at nimêj kir û piştî nimêjê, bi rengekî devliken ji me re wiha got: ´Ez di jîyana xwe de heta niha du caran bi xetereya mirinê re rû bi rû mame. Yek jê, ev ketina min ya niha bû. Yadin jî, dema ku ez leşker bûm, dîsa dewlet li hember kurdan di nava fikar û gumanan de bu. Komutanekî Leşkerî rojekê ji me pirs kir û got: ´di nava we de Kurd hene?´ Min û zabitekî, me destê xwe rakir û got: ´Em kurd in.´ Komutan bi kîn li me nihêrî lê tiştek ji me re negot. Paşê di demeke gelekî nêzik de ew zabitê Kurd bê ser û şûn winda bû. Dor hatibû min. Min her tim ji xwe re digot: wê niha min jî bibin bikujin. Lê ez bi tesaduf ji nava wê xeterêyê rizgar bûm."

Mixabin Seyda Bedîûzeman çawa ji nava wê xeterîyê rizgar dibe, ji me re şîrove nekir.

Dema ku em li wanê bûn, me li cem Seyda dixwend, ez û Mele Seîd timî bi Seyda re bûn. Em ne ku tenê wek feqeyên wî bûn, her wiha em ji wî re wekî hevalan bûn. Lewra fikra me ya Kurd perwerî yek bû. Em herdu jî di xwendina xwe de jêhatî bûn. Û bejna me herduyan jî wekî ya Seyda bilind bû.

Ji ber vê jî Seyda bi ku ve diçû, dixwest em tim li gel wî bin. Seyda ew yek kiribû mina hinbûnekê. Bi taybetî dema ku ji derve hewa xweş ba. Her roj du caran, sibeh û êvaran me hersîyan wê şal û şapikê xwe yên netewî li xwe bikirana û Seyda jî wê xencera xwe ya di kalan de bixista ber pişta xwe û em ê bi hev û din re li nava sûka Bajarê Wanê bigerîyana. Ji bo ku şal û şapikên me gelek sipehî bûn û bejna me jî wekî hev û din bilind bû. Birastî jî bala bajarîyên Wanê em gelekî dikişandin. Dema ku em bi hev re digerîyan, gelek caran Seyda ji me re wiha digot: ´Armanc lixwekirina van şal û şapikan yek jê ew e ku em bala gel û bajarîyan bikşînin ser xwe û ew jî van şal û şapikên sipehî û cindî li xwe bikin.´"

"Dîsa rojekê ez di civata Seyda Bedîûzeman de runiştîbûm, mijara me hate ser neteweyan û kesên baş û nebaş. Min ev ji Seyda pirs kir, min got: ´Seyda, gelo hûn li rewşa Kurdekî Fasiq û Tirkekî Misilman çawa dinêrin?´ Seyda Bedîûzeman

eynî wiha bersiva min da. Got: ´Ez hezar Kurdên fasiq bi qurbana Tirkekî Misilman dikim.´ Dema ku Seyda Bedîûzeman ev gotin got, berîya çûyîna wî ya Stanbolê bû. Piştî hingê dixwaze ji bo hindek daxwazan da ku bi raydarên osmanîyan re hevdîtinan pêk bîne, diçe Stanbolê. Piştî hewqas tengî û tehlî û her wiha ew rewşên aloz yên ku tê de jîyayî, ji serdema Osmanîyan heta bigihîje serdema komara Tirkîyê ka çi bi serê wî tê, piştî van dem û dewranan dîsa Seyda Bedîûzeman vegerîya Kurdîstanê û hate bajarê Wanê. Em wê demê bi sedan telebeyên Seyda Bedîûzeman diçûn serdana wî. Bi dîtina me gelekî dilşad dibû. Rojekê li dora Seyda em gelek kes rûniştîbûn. Seyda jî li ser nijadperestîya gelê Tirk ku çawa li hember kurdan in, diaxivî û her wiha behsa ji hev cudatîya rêwiştê (exlaq)ê Kurdan û Tirkan dikir. Bi taybetî ez rabûm ser çokên xwe û min ev ji Seyda pirsî. Min got: ´Seyda çend salan berî niha, min ji we ferqa di navbera Kurdekî (Fasiq) û Tirkekî Misilman de pirs kiribû. We jî hingê gotibû ku ez hezar Kurdên Fasiq bi qurbana Tirkekî misilman dikim. Gelo niha hûn çi dibêjin?´ Dema min wiha pirs kir. Xwedê şahid e, Seyda hema pêre pêre bersiva min da û got: ´Piştî ku hemî tişt min bi çavê serê xwe dîtin, Ez niha dibêjim, ez hezar Tirkên bisilman bi qurbana Kurdekî fasiq dikim! Dîyar bû ku Seyda derdê nîjadperestan gelekî kişandibû. Wisa ji wan tijî bûbû ku di wê civatê de ev gotin bi vî awayî bikar anîn."

Rojekê em û Seyda Bedîûzeman dîsa li gel hev bûn. Min ji wî pirs kir. Min got: ´Seyda di nava civaka der û dorên me de, dibêjin her ku Seyda çûye alîyê rojava û hatî, ew mîna berê, li ser Kurdîstan û kurdperwerîyê naaxive.´ Seyda wiha bersiva min da. Got: ´divê ku mirov tu caran gotinên sebokeran ji xwe re esas negire. Bila mirov Ayetên qurana xweda ji xwe re esas bigire.´ Û Seyda wiha berdewam kir. Got:´Ma di qur´anê de nabêje, (*Lîme teqûlûne ma la tefe`lûn*). Ango*; çima hûn dibêjin, tişta ku hûn nakin*? Tişta ku mirov bibêje pêwîst e, mirov wê bike jî. Li gora vê ayetê min li ser Kurdîstan û kurdperwerîyê çi gotibe, ez li ser gotina xwe me.´

Her wiha Mele Ebdulmutelîb digot: „Min Seyda Bedîûzeman, piştî serhildana şêx Seîd jî dît. Di wan demande rewşa Kurdan gelek ne baş bû. Dîsa hêvîyên Kurdan hemî şikestîbûn.“ Seyda Bedîûzeman bi xwe jî ketibû nava rewşekî gelkî aloz. Rojekê ez li cem Seyda bûm û min rewşa wê pêvajoyê hingê ji wî pirsî. Vê gotina Seyda ya hingê bandoreke gelekî mezin li min kir û tu

caran ji bîra min naçe. Gote min Abduşemed; „êdî lingê me ketîye ser sêla sincirî, sed mixabin, min bi ya Şêx Seîd nekir û lewra ev yek hat serê min. Heger min bi ya wî bikira, rewşa me wê pir cuda bûya. Lê ez çi bêjim, êdî feyde nake.

02.03.2012 -Siwisre

هەوالنامەی کتێب

## M. Malmîsanij:

Hevpeyvîn: **Zilkîf Xweşhêvî**

**Zilkîf Xweşhêvî:** *Birêz Malmîsanij hûn jixwe kesayetiîyekî naskirîne ji ber wî ez naxwazim we ji we bipirsim; lê ez dixwazim bipirsim gelo Malmîsanij wek nîvîskar û rewşenbîrekî kurd dixwaze çi bike? Ji nivîskarîya xwe çi hêvî dike?*

**M. Malmîsanij:** Berî deh salan min derheqê nivîskarên kurd ên li Swêdê de lêkolînek kiribû. Wê demê ez li ser vê pirsê jî sekinîbûm: Gelo nivîskarek çima dinivîsîne? Daxwaza wî/wê ji nivîsandinê çi ye? Bersiva van pirsan zehmet e. Nivîskar dikanin ji ber sebebên cihê-cihê binivîsin. Her kes ji bo eynî hedefê nanivîsîne. Gelek caran hin kes bi xwe jî nikanin sebebên nivîsandina xwe îzah bikin. Heke tu ji nivîskarekî/ê sebebên nivîsandina wî/wê bipirsî, dê bersivekê bide, lê carna dibe ku sebebên bingehîn ên nivîsandina wî/wê tiştinên din bin. Di binî de, di "background"ê de, dibe ku sebebên din hebin. Sebebên psîkolojîk, yan jî psîko-sosyal. Ji bo çi ez vana dibêjim? Nivîskarê kurd gelek caran dibêje ez ji ber welatperwenyê dinivîsim; ji bo welatê xwe, ji bo kurd û Kurdîstanê. Min berê jî li hin cîyan gotibû; di vîya de rastî heye, lê bi qenaeta min, ev bersiv bi serê xwe sebebê nivîsandinê îzeh nake. Bes nine. Sebeb ne tenê ew e. Ew faktorek e. lê sebebên cihê-cihê hene. Wek nimûne, hin kes dixwazin bibin navdar, bibin xwedî statûyeka baştir; hin kes ji nivîsandinê hez dikin, hin hene dixwazin mesajekê bidin civakê; hin kes dixwazin wextê xwe vala derbas nekin, bi tiştekî re mijûl bibin; ji bo hin kesan nivîsandin wek te repîyê ye, ji civakê îzolebûn e, bi nivîsandinê bi civakê re têkilî datînin û hwd. Hin kes ji bo peran dinivîsînin, lê li ba kurdan ez bawer nakim kesên wisa zêde hebin; çûnkî îro ji kitêbên kurdî pere nayê.

Ez ya xwe bibêjim. Ez ji zaroktîyê de ji xwendinê hez dikim. Ya min hezkirineke gelek zêde ye. Yanê ez di bist û çar saetan de bist û çar saet dixwînim. Di bîst û çar saetan de meriv nikane bîst û çar saet bixwîne, bêguman ez vîya dizanim; lê ez radikevim, îhtîyacîyên xwe yên maddî dibînim, wekî din ez dixwînim. Ez dikanim bibêjim ku jîyana min wisa derbas

bûye. Êdî ez hin bûme.

Ez dixwazim xizmetekê bikim; ev jî faktorek e. Di nivîskarîyê de tetmînbûneke manewî heye. Tesîra van tiştan dibe ku li ser min jî hebe lê ez bi xwe ji xwendin û nivîsandinê hez dikim. Heke ez jê hez nekim ez nikanim ewgas binivîsim.

Ez ji berê de dixwazim ji bo miletê xwe hin tiştan bikim. Ew neheqîya ku dewleta Tirkîyê li me kirîye, ji xortanîya xwe de min his dikir, ez pirr aciz dibûm. Dema ku min di xwendegehên tirkan de dixwend, min xwe ji tirkekî kêmtir jî mezintir jî nedidît. Ew ne ji min bilindtir ne jî nizmtir in. Loma ew neheqîya ku li me bûye, ez dixwazim li hember wê bixebitim. Tiştekî ku ji destê min hatîye min kirîye, ez dikim. Zimanê me hatîye qedexekirin, nehiştine ku em kurdbûna xwe bibêjin. Min li dijî van neheqîyan nivîsîye.

Dema ku min di lîseyê de dixwend, ne hemî dersên min lê dersa min a edebîyatê baş bû; kompozîsyona min pirr baş bû. Ji ber ku min jê hez dikir. Di wê demê de jî min nivîsandina hin tiştan ceriband, lê di destpêkê de min bi tirki dinivîsand.

Min di 1969an de li Dîyarbekirê lise, 1973an de li Enqereyê Fakulteya Îlahîyatê qedand. Tu jî dizanî, dema ku meriv xort e, hîn romantîk e. Wê demê min tirkî dinivîsand, lê hin tiştên min ên xusûsî hebûn. Deftereka min hebû, min tê de rojane dinivîsand, lê tiştên ku min nedixwest kesên din fêm bikira min ew bi kurdîya kirmancî (zazakî) dinivîsandin. Di destpêkê de min alfabeya kurdî nedizanî. Tiştên ku min dinivîsandin min bi alfabeya tirkî dinivîsandin lê wê têrê nivîsandina kurdî nedikir. Piştî ku ez hînî alfabeya erebî bûm, carna min herfên latînî bi herekeyên erebî (zîr û zeber) dinivîsandin. Yanê min du "alfabe" têkel dikirin. Em bêjin herfa K ya latînî, bi zeber (fethe) ya erebî dibû KE; bi zîr (kesre) dibû KI. Heke min bi herfên latînî WR binivîsanda û zeberek danîna ser herfa W, zeberek jî li ser herfa R, dibû "were". Ev alfabeya min a taybetî bû. îcar gava ku min bi vê alfabeya taybetî û bi kirmancî (zazakî) dinivîsand, tu kesekî nikanibû jê fêm bikira. Wê demê ji ber ku kurdbûn û zimanê kurdî gedexe bû, em bêjin heke yekî gilî bikira yan jî polis nivîsên kurdî li ba meriv bidîta, serê meriv diêşand. Merivan jî li gor xwe tedbîr digirtin.

Carna min tiştên kirmancî (zazakî) dinivîsandin lê ne bi awakî sîstematîk. Min li gor xwe, hin tiştên besît û

"zarokane" dinivîsandin. Min bi vî hawî dest bi nivîsandina kurdî kir.

Tiştekî din heye ku min berê jî gotîye. Tu jî dizanî, dema ku meriv edebîyata osmanî dixwîne tê de rastî gelek peyvên kurdî tê. Vî tiştî bala min jî kişandibû. Paşê, dema ku min di îlahîyatê de dixwend, carekê camêrek hat yûrda Dîyarbekirê (Il Enqereyê). Yekî Dîyarbekirî bû. Got, ez hatime dîtina hemşehrîyên xwe. Ez piçek pê re eleqedar bûm, em bûn semîmî. Rojekê ez birim mala xwe. Min li ba wî ferhengeke farisî dît û jê stend. Min ew ferheng hemî xwend. Ez dinêrim hin gotin wek kirmancî ne; "ma, şoma" filan. Min li îlahîyatê farisî xwend. Min jê hez dikir. Di dersa farisî de nota min timî ji dehê deh bû. Hîn dema ku min ew ferheng xwendibû, fikra amadekirina ferhenga kirmancî (zazakî) di serê min de çêbûbû. Min di dilê xwe de got, madem di vê ferhengê de hin gotinên farisî wekî kirmancî ne, ez jî dikanim ferhengeke kirmancî amade bikim. Lê wê demê kitêb yan jî nivîsên kurdî peyda nedibûn. Li ser kurdan bi tirkî jî kitêbên baş tune bûn. Heke faşîstekî jî li ser kurdan tiştekî binivîsanda, heqaret jî li wan bikira, min ew peyda dikir û dixwend. Her ku min çîrokên, yanê teorîyên sexte yên ku dibêjin kurd tirk in, "kart, kurt" filan dixwendin ez aciz dibûm.

Tê bîra min, li yûrdê, carekê hevalê min Behadîn (Bahattin), Dîwana Cîgerxwîn anî. Min bi heyecan jê deyn kir û bir nivîsî. -Behadîn ji Gimgimê (Wartoyê) bû. Min bihîst paşê bûye profesor. Wê demê min baş bi kurmancî nedizanî lê min ji edebîyatê, ji şiîrê hez dikir. Ji wezn û erûzê filan... Dema ku min ew şiîr dinivîsandin hem kurmancîya min baştir dibû hem jî min gelek ji wan şiîran jiber dikirin. Bavê min kurmancî dizanî û ji stran û şiîran hez dikir. Gava ez diçûm malê, min jê re dixwendin. Digot: "Ana ev li wê hene yan tu li ber xwe dibêjî?!" Bawer nedikir ku zimanê kurdî li ser kaxezê hebe. Carna min xelet dixwend, digot ne wisa ye; dema ku min dinihêrt, wek wî derdiket. Berîya wê kitêbê, dema ku min li Pîranê, li mekteba navîn (orta okul) dixwend, min kovara Dîcle-Firatê dîtibû. Tê de çend nivîsên kurt ên kurdî hebûn. Dîsa wê demê, rojekê hevalekî min gramera Kemal Badillî anîbû mektebê, min jê girt bir malê. Lê ez baş tênedigihiştim.

Di dawîyê de ez xwe bi xwe fêrî alfabe û gramera kurdî bûm û min di kovaran de nivîsî, kitêb nivîsîn. Ji sebebên girîng ên

nivîsandina min yek jî ev e: Di warê ziman, edebîyat yan jî tarîxa kurdan de hin tiştên ku ez balkêş dibînim ez dinivîsim da ku xwendevan jî hay ji wan hebin.

**Zilkîf Xweşhêvî:** *eirêz Malmîsanij di vir de ez vê pirsê jî ji we bikim. Çi lehçeyên kurdî bin çi jî zimanên bîyanî bin hûn bi çend zimanî dixwînin û dinivîsînin?*

**M. Malmîsanij:** Ez bi kirmancî (zazakî), kurmancî, soranî û goranî dixwînim. Goranîya min pirr baş nine, carna ez bi zehmetî fêm dikim yan jî fêm nakim. Ez dikanim tenê bi kirmancî û kurmancî binivîsînim.

**Zilkîf Xweşhêvî:** *Û tirkî?*

**M. Malmîsanij:** Belê ez tirkî jî dinivîsînim.

**Zilkîf Xweşhêvî:** *Te kîjan ziman xwendine?*

**M. Malmîsanij:** Min tirkî, swêdî, fransî, erebî û piçek îngilizî xwendîye lê erebîya min û îngilizîya min ne baş in.

Min li Unîversîteya Sorbonnê (li Parîsê), beşê "Etudes iraniennes" xwend. Li wir zimanên îranî lê bi giranî ziman û edebîyata farisî tên xwendin. Her-weha min li Unîversîteya Uppsalayê (li Swêdê) pehlevî û farisîya klasîk xwendin.

**Zilkif Xweşhêvî:** *Em bêne ser yekgirtina zimanê kurdî. Ez pirsên xwe li ser hev bibêjim. Ewê munaqeşeya li Başûr hate kirin hûn çawa dibînin?Ji bo standartkirina zimanê kurdî fikrên we çi ne? Û yekgirtina zimanê kurdî de gelo hinek lehçeyên kurdî dê bêne perawêzkirin yan na?*

**M. Malmîsanij:** Meseleya standardîzekirinê, ya yekîtîya zimanê kurdî û meseleya lehçeyan meseleyeke komplîke ye. Helkirina van probleman gelek zehmet e. Bi qenaeta min lehçeyên me, em bêjin kirmancî, kurmancî, soranî û goranî herçiqas lehçeyên kurdî ne jî ji hev dûr ketine. Rastîya me ev e. Sebebên vê jihevdûrketinê gelek in. Niha em nikanin dûr û dirêj li ser bisekinin. Netîce ew e ku ew ji hev dûr ketine û kurdên ku bi wan lehçeyan dipeyivin ji hevûdin fêm nakin. Digel ku kurd miletek in, lehçeyên cihê-cihê dipeyivin. Dewleteke kurdan a miştereк a ku van lehçeyan bigihîne hev, çênebûye û ev lehçe heta îro hatine.

Heke ez bi kurtî fikra xwe bibêjim, ez ji zû de çareya vîya wisa dibînim: Her lehçe divê heta mimkûn be bête axaftin, bête

nivîsandin, di komînîkasyonê de bête bikaranîn. Fersendeke demokratîk û azadane hebe ku her kes wek kurd bi hêsanî xwe îfade bike. Çarçova me kurdbûn e. Û digel vîya, polîtîkayeke zimanî hebe. Eger dewleta me tune be jî divê derheqê ziman de polîtîkayeke me hebe. Ew jî çi ye? Em dê giranî bidin alîyên miştererek ên van lehçeyan. Tiştên ku di nav lehçeyan de miştererek in divê em giranî bidin wan. Em bêjin heke çar-pênc formên cihê-cihê yên kelîmeyekê hebin, divê em a ku di lehçeyên din de heye tercîh bikin. Di tesbîtkirina termînolojîya îlmî de, divê ku meriv giranî bide tiştên miştererek û bala xwe bide ser hemî lehçeyan, ne tenê lehçeya xwe. Ji hemî lehçeyan îstîfade bike. Ne bi zihnîyeta navçegerî, bi perspektîfa millî li meseleyan binêre. Ji alîyê gramerê de jî divê ku meriv giranî bide alîyê formên miştererek. Bê ku tu lehçeyên din înkar bikî û bibêjî ez di ziman de şoreş çêdikim. Di ziman de şoreş nabe, evolusyon (evrim) dibe. Guhertin dê hêdî-hêdî, tedrîcî çêbibin, ne bi carekê. Ziman malê hemî milet e. Malê sinifên serdest e jî, yê bindest e jî; yê kurmanc e jî, yê kirmanc, soran û goran e jî. Ziman û lehçe bi hezar salan pêkhatine, di nav mehekê, salekê de ji ortê ranabin yan jî nabin yek.

Heke kurd, bi taybetî zana, sîyasetmedar û xwendeyên kurdan polîtîkayeke wisa bimeşînîn dê lehçeyên me bere-bere nêzîkî hev bibin. Heke di televîzyon, radyo, rojname û kovaran de ev lehçe bên bikaranîn, kurd dê hêdî-hêdî ji hev fêm bikin. Heke îmkanên xwendinê hebin, her kurd dikane di xwendegehan de lehçeyên dinjî hîn bibe. Evjî me nêzî hev dike.

Bi qenaeta min, li Kurdîstana Başûr, divê li herêmên kurmanc kurmancî, li herêmên soran sorani bibe zimanê perwerdeyê lê li her herêmê lehçeyên din jî bên xwendin. Bi vî hawî her kurd dikane di dema xwendina xwe de hînî lehçeyên din jî bibe.

Gava bi vî hawî rewşeke demokratîk hebe, dê herkes xwe rehet his bike û hîşên biratî û hemwelatî dê xurttir bibin. Dema ku meriv tade û neheqî nebînin dê li civakê reaksîyonên li dijî hev çênebin û hem meriv hem jî lehçe nêzikî hev bibin. Yan na, dema ku hin beşên civakê nikanibin xwe rehet îfade bikin, dê di nava civakê de problem mezintir bibin.

**Zilkîf Xweşhêvî:** *Wek pirsa dawî em bêne ser wê kitêba we ya bi navê "Said-i Nûrsî ve Kürt Sorunu" di vê kitêbê de jêderên we yek jê Necmettîn Şahîner e, yê dî jî Cemal Kutay e. Ev her du însan jî nêrîna wan a li mesela kurdî*

*dîyar e, negatîv e. Îca di vê kitêbê de hatîye ku têkilîya Seîdê Norsî yan jî Kurdî bi "Teşkîlat-i Mahsûsa" re ku rêxistina îstîxbaratî ye, heye, ev yek. A didiwan we di beşeke kitêbê de balê kişandîye ser wê yekê ku Seîdê Norsî "Serxwebûna Kurdîstanê nexwestîye" Îca pirs di vir de ev e. Ew her du jêder jêderên sehîh nînin. Gelo malûmatên ku we dane vedigerin ser wan jêderan yan jî hin jêderên dî jî hene? Derhegê endambûna Seîdê Norsî ya bi Teşkîlat-i Mahsûsa çi belgeyên muqnî hene? Û ya sisêyan gelo di dema Seîdê Norsî de çend kesan yan jî çend rêxistinên kurdî dawa serxwebûna Kurdîstanê dikirin? Yanî ew sernav neheqî nîne li Seîdê Kurdî? ji ber ku divê mirov çarçoveya sîyasîya wê demê jî li ber çav bigire.*

M. **Malmîsanij:** Çavkanîyên ku min ji bo nivîsandina wê kitêbê bi kar anîne, ne tenê yên Necmeddîn Şahîner û Cemal Kutay in. Di dawîya kitêbê de çavkanî hatine nivîsîn. Wekî ku li wir jî xuya ye, ji bo wê kitêbê herî kêm 60 çavkanî hatine bikaranîn. Di nava çavkanîyan de dibe ku yên xelet jî hebin. Min bi zanîn çavkanîyên xelet bikar neanîne lê heke bê ku ez bizanibim, çavkanîyên xelet hebin û kesek bikanibe xeletîya wan nîşan bide, ez dê gebûl bikim. Gava ku ez dinivîsim heta ku ji min tê ez hewl didim ku xeletîyan nekim. Digel vê hewlê, dibe ku min xeletî kiribin. Bi a min, xeletîkirin ne eyb e, ji ber ku em meriv in û em dikanin xeletîyan bikin. Lê heke meriv bi zanebûn, mexsûs tiştên xelet binivîse, ew eybeke mezin e. Ne tenê Necmeddîn Şahîner û Cemal Kutay, hin nivîskarên din jî dinivîsin ku têkilîya Seîdê Nûrsî bi Teşkîlat-î Mahsûsa re hebûye. Tê zanîn ku Seîdê Nûrsî tevî hin dilxwazên kurd ên din di Şerê Yekem ê Cihanî de hemberî rûsan şer kiribû. Ji ber ku şer di navbeyna Rûsya û dewleta Osmanî de bû, hêzên şer ji alî leşker û îstîxbarata Osmanî ve dihatin organîzekirin û îdarekirin. Li gor T. Özkanî, hêzên dilxwaz ên Cebheyê Qefgasê (Kafkas Cephesi gönüllü savaş birlikleri) ji alîyê Teşkîlat-î Mahsûsa hatibûn organîzekirin; Seîdê Nûrsî jî yek ji wan bû û di wî şerî de rutbeya "qaymegamê fexrî yê Alaya Suwarî ya Kurdên Dilxwaz" (Gönüllü Kürt Süvari Alayi'nin fahri kaymakami) dabûnê.

Li gor Îhsan Işikî jî Seîdê Nûrsî di Teşkîlat-i Mahsûsayê de wezîfe girtîye.

Eşref Sencer Kuşçubaşi lîderekî girîng ê Teşkîlat-î Mahsûsa bû. Li gor hin çavkanîyan ew damezrêner, li gor hin çavkanîyan jî

demekê serekê Teşkîlat-î Mahsûsa bû. Şerîf Mardîn dinivîse ku ev Eşref Sencer Kuşçubaşi dostê Seîdê Nûrsî bû û Seîdê Nûrsî di gonaxa bavê wî Mistefa Begî de sal û nîv mabû. Dîsa li gor Şerîf Mardîn, Seîdê Nûrsî piştî Serîhildana Bedlîsê (1914) tevî servîsa veşartî (gizli servis) bûye ku mebesta wî ji vê servîsê Teşkîlat-î Mahsûsa ye (Li vê kitêbê binêre: Şerîf Mardîn, Bedîûzeman Said Nûrsî Olayi).

Bi xebata Îttîhad-Terexî û Teşkîlat-i Mahsûsa, di dema şer de fetwaya cîhadê tê dayîn. Di heyeta amadekirina wê fetwayê de Şêxulîslam Xeyrî Efendî (Hayri Efendî) Û Seîdê Nûrsî jî hebûn. Ev Xeyrî Efendî mensûbê Îttîhad-Tereqqîyê bû û mason bû.

Di dema şer de Rûsan Seîdê Nûrsî hêsîr girtibû. Paşê ji Rûsyayê revîyabû û xwe gihandibû Stenbolê. Wê demê (1918), li ser daxwaza wezareta herbîyeyê, bi îmzaya Şêxulîslam Mûsa Kazim, wek xelatekê, payeya "mexrec"ê dan wî. Ev şêxulîslam jî mason bû. Wê demê, wezîrê herbîyeyê û berpirsîyarê Teşkîlat-i Mahsûsayê Enwer Paşa bû.

Lê Seîdê Nûrsî merivêkî dîndar û îslamîst (islamci) bû. Di sala 1908an de, di rojnameyên *Şark ve Kurdistan û Kürt Teavvün ve Teraqî Gazetesîyê* de nivisên kurdî û tirkî nivîsandibûn. Min ev nivîs wergerandin ser herfên latînî û di salên 1980yî de weşandin.

> **Zilkîf Xweşhêvî:** *Û projeya wî ya Medresetuz Zehra heye. Ji bo perwerdeya bi kurdî.*

**M. Malmîsanij:** Rast e; lê li wê jî zimanê erebî li pêş e. Bi gotina wî, "lisân-i Arabi vacib, Kürdî caiz, Türkî lazim" (zimanê kurdî wacib, kurdî caiz, tirkî lazim) e. Wekî ku min got, ew merivekî îslamîst e.

Di dema Cumhûrîyetê de li ser pirsa kurdan zêde nasekine. Bêguman ez dizanim ku wê demê şert giran bûn. Kemalîstan kurdbûn û zimanê kurdî gedexe kiribûn. Tade û neheqî zêde bû. Ew li surgunê bû. Her kes hatibû tirsandin.

> **Zilkîf Xweşhêvî:** *Ew mesela tedbîrê ye, ne ji bo şêxsê xwe û tirsê ye.*

**M. Malmîsanij:** Tu jî dizanî, di jîyana wî de çend dewre hene. Seîdê Berê (Eski Said), Seîdê Nû û Seîdê Sisîyan. Di dema Seîdê Berê de, di nivîsên wî de kurdbûna wî zêdetir xuya dike lê piştî wê dewreyê ne wekî berê ye. Ji sîyasetê dûr dikeve.

Tiştekî din jî, ew bi xwe dibêje: "Benim gibi ... bin millîyetçi Türkçüler kadar Türk mîletine bilfîl hizmet eden ... bir insan". "... Türklere hizmet ettim ve yüzde doksan dokuz menfaatli hizmetim Türklere olmuş".

> **Zilkîf Xweşhêvî:** *Bila xwêner şaş fêm nekin. Ev gotin li mehkemeyê wek gazinc hatine gotin. Yan na Seîdê Nûrsî li dijî turkçîtî û turancîtîyê ye. Heta di mehkemeya Denizli'yê de wisa dibêje: "Evet, hakiki insanlik ve fazilet mefkureleri etrafinda toplanmiş olan bu müslüman camialari sebepsiz biribirine düşman yapacak kadar böyle dar bir düşünüşün ve koyu Etrakçiliğin fikren muhalifi olmak bu milete hîyanet midir?"*

**M.Malmîsanij:** Ji xwe nabêje ez tirkçî me, dibêje "min ji tirkan re xizmet kirîye".

Ew merivekî karîzmatîk e, lê wekî her merivî ew jî dikane xeletîyan bike. Em bêjin, pesnê lîderên Îttîhad-Tereqqîyê yên wekî Enwer Paşa û Nîyazî dide. Em dizanin ku Îttîhad-Tereqqîyê di dema îqtîdara xwe de weşanên kurdî gedexe kirin, bi plan û program bi sed hezaran kurd ji Kurdîstanê derxistin şandin rojavayê Anadolîyê. Bona ku wan asîmîle bikin, bi plan û program ew ji hev bela kirin, şandin nava tirkan. Enwerê ku ew pesnê wî dide, yek ji qatilên herî mezin ê dinyayê bû.

> **Zilkif Xweşhêvi:** *Di kitêbên Seîdê Nûrsî li cîyeki pesnê Nîyazi Beg dide, lê li derhegê pesnê Enwer de min kitêbên wi de tişteki nedîye, gelo hûn li kû lê rast hatine?*

**M. Malmîsanij:** Di "Âsâr-i Bediîyye" de, di beşê "Nutuklar ve Makaleler" de (rûpel 392) wisa dibêje:

"Sen Selanik'te Îtîhat ve Teraqîile ittifak etmiştin, neden ayrildin?"

(...) "Ben ayrilmadim. Onlarin bazilari ayrildilar. Nîyazi Bey, Enver Bey gibi adamlarla şimdi de müttefikim."

> **Zilkîf Xweşhêvî:** *Ew pesnê ku tu dibêjî ji bo tu fikrên xwe zelal bikî- gelo berîya wê qetl û qîtala ku Îttîhadçîyan kirine, hatîye kirin yan piştî wî?*

**M. Malmîsanij:** Min behs kir, di dema şer de jî li dijî wan nebû.

> **Zilkîf Xweşhêvî:** *1908'an de yanî serdema damezrandina Meşrutîyeta II. de gelek pesnê rewşa nû û meşrutîyetê dide û pesnê mumeşîlê meşrutîyetê dide. Lê tiştê hûn dibêjin qetl û qîtala ku Enwer û Îttîhadçîyan kirîye di pêvajoya Cenga Cihan a Yekemîn de ye û Bedîuzzeman di wê demê de Îttîhadçîyan rexne dike. Ew pesnê ku hûn dibêjin piştî won karên wan ên qirêj nîne, berîya won e. Û di wê demê de gelek rewşenbîrên ne tirk destekê didine Îttîhad Te reqqîyê û hêvîya tiştekî nû ji Îttîhad Te reqqîyê dikin. Yanî wan tiştan mirov wek xeletî şîrove bike yan li gorî wê demê şîrove bike baştir e?*

**M. Malmîsanij:** Gelek kurdên xwende û sîyasetrnedar di destpêkê de bi Îttîhad-Tereqqîyê re bûn, paşê ji wan dûr ketin. Ev gotina te rast e. Lê Îttîhad Tereqqîyê hin di sala 1909an de weşanên kurdî gedexe kiribûn. Paşê jî rê neda ku kurd bi zimanê me bixwînin. Di dema şerî de kurd şandin rojavayê Anadolîyê. Bi kurtî Seîdê Nûrsî jî dikane xeletîyan bike.

> **Zilkîf Xweşhêvî:** *Wek prensîb tabî her însan dikare xeletî bike; lê ev tiştên hatin bahskirin gelo xeletî ne?*

M. **Malmîsanij:** Ma Seîdê Nûrsî însan nine? Xeletîyan nake?

> **Zilkîf Xweşhêvî:** *Ezbenî, ez dibêjim pesndayîna wî ya îttîhad Te reqqîyê berîya karê won ê girêj e yan piştî wî? Eger tu bêjî piştî wî, tê wê maneyê ku Seîdê Norsî dibe terefdarê zulma Îttîhadçîyan ne wisa?*

M. **Malmîsanij:** Ez nabêjim ku Seîdê Nûrsî bi zanîn piştgirîya zulma wan kirîye, lê bi çi nîyetê dibe bila bibe, piştgirîya wan xeletî bû. Wekî ku min got, di dema şer de jî piştgirîya wan kirîye. Dawîyê çi bû? Rewşa kurdan li meydanê ye. Zimanê wan hat gedexekirin, hebûna wan hat înkarkirin. Heke zanayên kurdan, lîderên kurdan wê demê xeletî nekirine, berpirsîyarên tirkan çawa kurd xapandin? Kesê zana ew e ku pêşîya xwe bibîne. Heke ez piştgirîya xelkê din bikim û ew ji xwe re dewleta xwe vejînin, paşê jî zimanê dîya min gedexe bikin, bêjin kurd tune ye, miletê min bikin koleyê xwe; her

roja Xwedê, serê sibê zarokên vî miletî mecbûr bikin ku bibêjin "varliğim Türk varliğina armağan olsun", êdî alimî û lîderîya min li kû ma?

**Zilkîf Xweşhevî:** *Tiştekî dîbibêjim 1909an de dema Munazarata xwe dinivîsîne rexne li îttîhad Te reqqîyê digire. Wek malûmat dibêjim.*

M. **Malmîsanij:** Ez jî nimûneyeka din bidim: Di meseleya "merkezîyet" û "ademê merkezîyet"ê de Seîdê Nûrsî rexne li Prens Sebaheddîn digre û dijî "ademê merkezîyet"ê derdikeve. Lê "merkezîyet" teza Îtihat-Tereqqîyê bû û wekî miletekî bindest zerara kurdan tê de hebû.

**Zilkîf Xweşhêvî:** *Pirsa min a dawî. Di wê demê de wek rewşenbîr yan wek komele ên ku dawa serxwebûna Kurdîstanê kirine hene yan na?*

M. **Malmîsanij:** Hene.

**Zilkîf Xweşhêvî:** *Kî ne, hûn dikarin bibêjin?*

M. **Malmîsanij:** Tevgera kurdî, di destpêka sedsala bîstan de tevgereke kulturî û demokratîk bû. Di dawîya Şerê Yekem ê Cihanî de hin welatperwerên kurd gihîştin wê bawenyê ku divê kurd ji bin bandora tirkan derkevin, bibin xwedî dewleta xwe. Van kesan di nava Kürt Teşkîlat-i İctimaîye Cemîyeti de cî girtin. Kesên wekî Memduh Selîm, Kemal Fewzî, hin Bedirxanzade û Cemîlpaşazade. Seîdê Nûrsî serbixwebûna kurdan neparastîye.

**Zilkîf Xweşhêvî:** *Mesele ne serxwebûnê parastîye yan na. Tiştê ez dipirsim divê mirov kesekî li gorî dema wî şîrove bike. Ji ber vî gasî kes nikare Seîdê Norsî tawanbar bike. Lewra civata kurd wê demê ji xwe wisa bûye.*

**M. Malmîsanij:** Ez kesî tawanbar nakim. Tu dipirsî, ez jî dibêjim wî serbixwebûna kurdan neparastîye.

**Zilkîf Xweşhêvî:** *Kitêba we de beşekî bi ser navê "Saîdî Nûrsî Bağimsizliği Istememîştî" heye wekî hemû kurdan serxwebûnê xwestibe û Seîdê Norsî nexwestibe. Ev tiştekî rast e?*

**M. Malmîsanij:** Di kitêba min de beşekî bi sernavê "Bağimsizliktan Yana Olmayişi" heye. Wî serbixwebûna

kurdan neparastîye, min jî ev nivîsîye. Min negotîye "hemî kurdan serxwebûn parastîye lê Seîdê Nûrsî neparastîye". Tiştekî din jî heye: Seîdî Nûrsî ne her kes e. Ne hemî kurdan, lê miletên din serbixwebûna xwe xwestin û konjonktura wê demê jî dest da, bûn xwedî dewlet. Iro zarokên wan, her serê sibê nabêjin "varliğim Türk varliğina armağan olsun". Yûnanîyan serbixwebûn xwestin, arnawudan xwestin, bûlgaran, sirpan, ereban, ermenîyan xwestin û bûn xwedî dewlet. Dewleta tirkan û farisan heye. Bê dewlet kî ma? Kurd man. Haya kurdên nezan û nexwende dibe ku ji wan miletan tune bû, lê haya zanayên kurd divê hebûya. Xuya ye ku hin kurdên wekî grûba Kürt Teşkîlat-i İctimaîye Cemîyeti jî wekî zana û lîderên miletên din wisa fikirîn: Serbixwebûn wekî hemî miletên din heqê me ye jî, em ne mecbûr in ji tirkan re xulamtîyê bikin. Lê bi piranî "alim" û giregirên me ji van re xwedî derneketin, yan xwe kerr kirin yan jî pişta xwe da van û ji koledarên xwe re xizmet kirin.

**Zilkîf Xweşhevî:** *Mesela Teşkîlat-i Mahsûsa we ji Necmetîn Şahîner girtîye wî jî ji Cemal Kutay girtîye. Cemal Kutay mirovekî mutemed nîne.*

**M. Malmîsanij:** Min çi ji kê girtîye min nivîsandîye. Heke xeletî hebe jî min bi zanîn, mexsûs nekirîye.

**Zilkîf Xweşhêvî:** *Tiştekî spesifîk em bipirsin we bi xwe îlahîyat xwendîye; lê hûn di fraksîyonên çep de bûne. Ji ber çi?*

**M. Malmîsanij:** Ez pêşî dîndar bûm lê min timî dixwend. Min nivîskarên îslamîst ên wekî Seyyîd Qutub, Muhemmed Qutub, Mewdûdî, Hesen el-Benna jî dixwendin. Ez li rejîmeke adilane û îdeal digerîyam. Min digot bila edalet hebe, wekhevî hebe, zulm tune be filan. Di netîceyê de ez gihîştim wê genaetê ku bi şerîeta îslamî rejîmeke adil ava nabe. Bo nimûne, di îslamê de bende (kole) û carîye hene. Azadîya jinan bi qasî mêran tune ye û hwd. Ez bûm sosyalîst.

**Zilkîf Xweşhêvî:** *Niha?*

M. **Malmîsanij:** Ez niha jî dîsa rejîmeke adil dixwazim. Di pratîka Sovyetan û Çînê de derket ku bi sosyalîzma yekpartîyî sosyalîzma rastîn çênabe. Avakirina rejîmeke adîlane ne hêsan e, lê digel wê jî divê meriv ji bo wê têbikoşe.